



Naveroka hejmara 12

Husein Muhammed

Rengdêr di zimanê kurdî de, r. 3

Pêşkêşkirina kitêba

Zayenda mê û nêr, r. 28

Emîr Hesenpûr

Zimanê kurdî û zimankujî, r. 29

Ergîn Opengîn

Parastin û guherîna zimanî, r. 36

Pêşkêşkirina ferhenga

Şarezor kurdî-inglîzî, r. 57

Yaron Matras û Y. G. Reershemius

Standardkirdinî bê dewlet, r. 58

Seyidxan Kurij

Fekî Çewligî de antişî karan (fiilan), r. 92

Deham Ebdulfettah

Lêker di zimanê kurdî de, r. 122

Hevdengî û pirdengî

di nivîsîna kurdî de, r. 154

Newzad Valêrî

Açarnayîş û açarnayox, r. 178

Xanna Omerxalî

Sembolîzma teyran di êzidîtiyê de, r. 185

Dengê C

Peydabûn û guherîna wî, r. 200

Yaron Matras & Y. G. Reershemius

Standardisation beyond States, p. 207

Michael L. Chyet

Kurmanji Kurdish Lexicography, r. 236

Zarname

Ferhengoka zimannasiyê, r. 250

Çawa binivîsim?

Rêbera rastnivîsînê, r. 168

Sernivîsar

Kerem bikin hejmareke nû ya kovara zimanê kurdî *Kanîzarê*. Em vê carê bi qasî 270 rûpelan vekolînên li ser ziman û rêzimana kurdî bi kurmancî, soranî, zazakî û inglîzî pêşkêş dikin.

Di vê hejmarê de **Husein Muhammed** vekolîna xwe ya li ser rengdêrên (hevalnav, sîfet, *adjective*) di zimanê kurdî de didomîne. Ew vê carê bi taybetî li ser cihê rengdêran di komik û hevokan de radiweste û herwiha cudahiyên bikaranîna rengdêran di lehceyên kurdî de dide ber hev. Nivîsarên wî yên din di vê hejmarê de li ser hevdengî û pirdengiyê di nivîsîna kurdî de û herwiha li ser dengê C di zimanê kurdî ne.

Vekolîna **Deham Ebdulfettah** li ser lêkerên (kar, fiil, *verb*) kurmancî di vê hejmarê de jî didome. **Seyidxan Kurij** jî dût û dirêj li ser lêkeran di zazakiya Çewligê de bi zazakî di vê hejmarê de dinivîse.

Emîr Hesepûr li ser siyaseta zimankuj ya Bakurê Kurdistanê dinivîse. **Ergîn Opengîn** jî li ser parastin û guherîna zimanî li heman deverê vedikole. **Michael Chyet** dîroka ferhengسازیya kurmancî bi inglîzî pêşkêşî me dike.

Yaron Matras û **Yay Gertrud Reershemius** derbarê standardkirina zimanên bêdewlet dinivîsin û zimanê kurdî, qereçî û yidişî wek nimûne bi kar tînin. Em vekolîna wan hem bi orijînalê wê ya inglîzî û hem jî bi wergera soranî ya Hesepûrê Qazî belav dikin.

Xanna Omerxalî remz û sembolîzma teyran di êzidîtiyê de behs dike. **Newzad Valêrî** li ser wergerandinê ji zimanekî li zimanekî din bi zazakî dinivîse.

Vê carê jî em du kitêbên kurdî didin nasîn û herduyan jî bi tevahiya wan dixin xizmeta xwandevanên kurd. Yek jê ferhenga mezin ya soranî-inglîzî ya **Şefîq Qezaz** e û ya din jî kitêbek li ser cinsê rêzimanî di kurmancî de ye ku ji aliyê jineke bi bernavê Keça Kurd ve hatiye nivîsîn.

Kerem bikin kovara xwe bixwînin û berhemên xwe bo wê bişînin!

RENGDÊR DI ZIMANÊ KURDÎ DE (2)



Husein Muhammed

5. CIHÊ RENGDÊRAN DI PEYVRÊZIYÊ DE

Mebest ji peyvrêziyê ew e ka li gor zimanî adeten kîjan peyv dikere pêş yan paş peyvên din yê heman hevokê yan komika navdêrî.

Li jêr em ê cihê rengdêran pêşî di hevokên bi lêkera "bûn" de diyar bikin û dû re jî cihê rengdêran di komikên navdêrî de.

5.1. Rengdêr di hevokên "bûn"ê de

Gava ku çawaniya navdêrekî an cînavekî bi alîkariya lêkera "bûn" bi rengdêrekî yan çend rengdêran tê diyarkirin, hingê forma lêkera "bûn"ê dikeve dawiya hevokê, navdêr an rengdêr dikeve destpêka hevokê û rengdêr jî dikeve/dikevin navbera wan. Bo nimûne:

- Ew baş e. (ew = navdêr, baş = rengdêr, e = formeke lêkera "bûn"ê)
- Ehmed baş û camêr bû (Ehmed = navdêr, baş û camêr = du rengdêr, bû = formeke lêkera "bûn"ê).

Di her zimanî de peyvrêzî ne wiha ye. Bo nimûne, di inglîzî de jî li destpêka hevokên wiha navdêr an cînav heye, wek kurdî, lê lêkera "bûn"ê tê dîv wî û rengdêr dikevin dawiya hevokê. Bo nimûne:

- It was good. ("Ew baş bû", peyv bi peyv "ew bû baş").
- Ahmad is good and kind. (Ehmed baş û camêr e, peyv bi peyv "Ehmed e baş û camêr.")

Eger di hevokên "bûn"î de hin peyvên din jî hebin, hingê ew adeten dikevin berî rengdêran:

- Ew ne baş e.
- Ehmed ne baş û camêr bû.

Li cihê lêkera bûn, herwiha bo nimûne lêkerên wek "xuyan, xuya bûn, diyar bûn" jî dikarin hebin:

- Ew (ne) baş dixuye.
- Ew (ne) baş diyar e.
- Ew (ne) baş xuya ye.

5.2. Rengdêr di komikên navdêrî de

Mebest ji **komikên navdêrî** (bi inglîzî *noun phrase*) navdêrek û ravekerên wê ne anku ew navdêr û hin peyvên din yên ku wê zêdetir rave dikin, pêtir didin nasîn.

Komika dikare ji navdêrekî tenê jî pêk were, bo nimûne:

- sêv
- agir
- muzîk

Di koma navdêrî de li gel navdêrî yek an çend rengdêr dikarin hebin:

- sêvên sor û geş / sêvên sorî geş
- sêvên sor û geş û gir / sêvên sorî geşî gir

Di komika navdêrî de li gel navdêrî û rengdêrî herwiha hoker jî dikarin peyda bibin:

- zebeşên gelek mezin (zebeş = navdêr, gelek = hoker, mezin = rengdêr)

Di komika navdêrî de dikare herwiha cih, jêder an jî armanca navdêrî li gel navdêrî hebe. Bo nimûne:

- sêvên di zembîlê de (cih)
- sêvên ji dikanê (jêder, serekanî)

- sêvên bo xwarinê (armanc)

Di komikên navdêrî de di kurdî de rengdêr li dûv (pey, piştî) navdêrî tê. Bo nimûne:

- sêva sor, sêveke sor, sêvên sor...
- zebeşê gir, agirekî geş, agirên geş...

Di komikên navdêrî de rengdêr raveker in (anku navdêran rave dikin, şirove dikin) û navdêr jî raveber in anku tên ravekirin (dikevin ber ravekirinê).

Di lehceyên din jî yên kurdî de navdêr berî rengdêrî tên. Di gelek zimanên din de jî – bo nimûne di erebî, fransî û spanî de wisa ye. Lê di hemû zimanan de ne wisa ye. Bo nimûne, di inglîzî û tirkî de rengdêrên raveker berî navdêrên raveber. Bo nimûne:

- kurmancî: mirovên baş (navdêr + rengdêr)
- inglîzî: good people (rengdêr + navdêr)
- tirkî: iyi insanlar (rengdêr + navdêr)

Di kurmancî, lehceyên din yên kurdî û zimanên din yên îranî de, adeten navdêrê raveber bi paşgîrêkê bi rengdêra raveber ve tê girêdan. Di rêzimana kurmancî de navê vê paşgîrê adeten “ravek” e, di zimannasiya navneteweyî de vekolînên zimannasî yên derbarê zimanên îranî de wê bi navê “izafe, ezafe” nas dikin.¹

Gava ku heman navdêr bi çend rengdêran were ravekirin, di kurdiya devkî de adeten ew rengdêr her yek bi alîkariya peyvika “û” li pey yê din tê rêzkirin. Bo nimûne:

- sêvên sor û geş û gir

Di zimanê nivîskî de “û” tenê dikeve navbera herdu rengdêrên dawiyê û di navbera rengdêrên din de bêhnok (,) tê danîn. Bo nimûne:

- sêvên sor, geş û gir

Eger di rêzika rengdêran de rengdêrek ne yekser navdêrî lê rengdêrekî din yê komikê rave bike, hingê ew adeten ne bi peyvika “û” lê bi paşgîrêkê yan ravekerê bi hev ve tên girêdan.

¹ Bo berfirehtir li ser girêdana navdêran bi rengdêran ve binêrin:

<https://zimannas.wordpress.com/2015/11/05/cemandin-u-giredana-navderan/>

Di rewşên wiha de adeten rengdêra yekem navê rengê ye. Li gor devokan paşgir dikare –î yan jî –ê be:

- kirasê şînî tarî
- kirasê şînê tarî

Eger mebest ne ravekirina rengdêrekî lê ravekirina zêdetir ya navdêrî bi xwe be, hingê ravekek li berî her rengdêrî tê dubarekirin:

- kirasê nû (y)ê jinan
- sêva sor (y)a geş
- kitêbên kevn (y)ên tozgirtî

Di kurmanciya nivîskî de adeten Y herdem dikeve pêşiya vê raveka navbera rengdêran. Di kurmanciya rojhilatî de carinan di axiftinê de jî li hin deveran wisa tê kirin. Lê di zimanê devkî de û bi taybetî jî di kurmanciya navendî de adeten Y tenê hingê lê tê zêdekirin gava ku rengdêra pêştir bi vokalekê bi dawî were. Bo nimûne:

- devkî (bi taybetî kurmanciya navendî): kirasê kevn ê peritî, sêva sor a gir
- nivîskî (carinan herwiha kurmanciya rojhilatî): kirasê kevn yê peritî, sêva sor ya gir

Li cihê raveka “ê” ya nêr li hin deveran “î” û li şûna raveka mê “a” jî li hin deveran “e” tê bikaranîn. Carinan heta heman dever herduyan dike “î” (bi taybetî kurmanciya rojavayî û hin deverên kurmanciya navendî) û hin dever jî wê bo herdu cinsên rêzimanî dikin “e” (hin deverên rojhilatî):

- kirasê kevn î peritî, sêva sor î geş
- kirasê kevn e peritî, sêva sor e geş

Eger di komika navdêrî de hoker û/yan cînav hebin, ew dikevin navbera navdêrî û rengdêrî. Bo nimûne:

- kitêba kevn (navdêr + rengdêr)
- kitêba gelek kevn (navdêr + hoker + rengdêr)
- kitêba wî ya kevn (navdêr + cînav + rengdêr)
- kitêba wî ya gelek kevn (navdêr + cînav + hoker + rengdêr)

Lê temamker (cih, jêder an armanc) jî komikê de hebe, ew dikeve dûv rengdêrî:

- kitêba bo xwandinê (kitêb = navdêr, bo xwandinê = temamker / armanc)

- kitêba ji kitêbxaneyê (kitêb = navdêr, ji kitêbxaneyê = temamker / jêder)

Di komikê de ev hemû birên rêzimanî dikarin bi hev re jî hebin:

- kitêba wî ya gelek kevn ya ji kitêbxaneyê (navdêr + cînac + hoker + rengdêr + temamker)

5.3. Peyvrêziya rengdêran di pileya berhevder û ya jorîn de

Di pileya berhevder de jî rengdêr di komikên navdêrî de dikevin pey wan navdêran ku rave dikin.

Bo nimûne:

- avahiyê bilindtir
- deşta berfirehtir
- odeya tengtir

Di piraniya pileyên jorîn yê rengdêran de jî dîsa rengdêr dikevin pey navdêrên ku rave dikin. Bo nimûne:

- avahiyê herî bilind, deşta herî berfireh, odeya herî teng
- avahiyê ji hemûyan bilindtir, deşta ji hemûyan berfirehtir, odeya ji hemûyan tengtir

Lê eger pileya jorîn bi paşgira “-tirîn” hatibe çêkirin, hingê du alternatîv hene: rengdêr di komika navdêrî de dikarin bikevin pêş an paş navdêran:

- rengdêr + navdêr: bilindtirîn avahî, berfirehtirîn deşt, tengtirîn ode
- navdêr + rengdêr: avahiyê bilindtirîn, deşta berfirehtirîn, odeya tengtirîn

Rengdêrên pileya jorîn yê ji erebî wergirtî (ekber, ehzen) tenê dikarin bikev berî navdêran, nikarin li pey wan bên:

- ehsen mirov (rengdêr + navdêr – ne mimkin e ku mirov bibêje “*mirovê ehsen”)

5.4. Peyvrêziya rengdêran di peyvsaziyê de

Gava ku rengdêr û navdêr bi hev re rengdêreke nû çêdikin, hingê di kurdî de rengdêr li dûv navdêrî tê anku navdêr dikeve berî rengdêrî. Bo nimûne:

- dilgeş
- serbilind
- guhbel
- zimandirêj
- bêhnxweşk

Di van peyvan de “dil, ser, ziman, guh, bêhn” navdêr û “geş, germ, bel, bilind, xweşk” jî rengdêr in.

Di her zimanî de ne wiha ye. Bo nimûne, di inglîzî de mirov li cihê “dilgerm” dibêje “warm-hearted” ji “warm” (germ) û “heart” (dil) anku heçku mirov bi kurdî bibêje “*germdil”.

Di kurdî de jî gelek caran mirov peyva “giranbiha” (û varyanta wê “giranbuha) di nivîsan de dibîne ku ji peyvên “giran” (rengdêr) û “biha” (navdêr) hatiye çêkirin. Lê di kurdî de hevwatera wê ya bi awayê “bihagiran” jî heye ku zêdetir li gor peyvrêziya kurdî ye û mirov dikare tercîh bike.

Wisa diyar e ku forma “giranbiha” neqilkirina ji farisî ye. Di farisî de ji kurdî zêdetir rengdêrên pêkhatî yên bi awayê rengdêr + navdêr heye. Bi heman awayî peyva “bedbext” jî bi rêya soranî ji farisî ketiye kurmançî jî ku dîsa bi şiklê rengdêr + navdêr e. Hevwatera wê ya kurmançî “bextreş” e ku dîsa li gor qalibê kurdî bi forma navdêr + rengdêr e.

Ji rengdêrên pêkhatî (hevedudanî) jî mirov dikare li gor qeyd û bendên giştî yên çêkirina navdêran ji rengdêran dîsa navdêran çêke. Bo nimûne:

- serbilind → serbilindî
- dilgeş → dilgeşî
- guhbel → guhbelî, guhbelîtî, guhbeltî...

Lê di çêkirina navdêran ji navdêr û rengdêran de çend rêbazên ji hev cuda hene:

navdêr + rengdêr = navdêr

Bo nimûne:

- bacan + sor → bacansor
- bacan + reş → bacanreş

navdêr + rengdêr + k

Bo nimûne:

- bacan + sor + k → bacansork
- bacan + reş + k → bacanreşk

rengdêr + navdêr

Bo nimûne:

- sor + av → sorav
- mê + kew → mêkew
- ciwan + mêt → ciwanmêt → ciwamêt → camêt
- xweş + mirov → xweşmîrov
- xweş + heval → xweşheval

Hin peyvên wiha hem wek rengdêr û hem jî wek navdêr tên bikaranîn (bo nimûne “camêt, xweşmîrov, xweşheval).

rengdêr + e + navdêr

- pîr + e + jin → pîrejîn
- pîr + e + mêt → pîremêt
- nêr + e + ker → nêreker

- dêl² + e + gur(g) → dêlegur(g)

Herwiha vê dawiyê di zimanê nivîskî de bi taybetî bi rengdêra “kurt” jî gelek peyvên wiha hatine çêkirin. Bo nimûne:

- kurt + e + çîrok → kurteçîrok
- kurt + e + roman → kurteroman
- kurt + e + helbest → kurtehelbest
- kurt + e + nûçe → kurtenûçe...

Heta peyveke wiha ya ji du rengdêran çêkirî jî heye:

- kevn + e + nû → kevnênû (destê duyem, bi inglîzî “second hand” anku tiştên bikarînayî yên ku dîsa – bi piranî bi erzanî – tîn firotin.)

Herwiha hin rengdêr bi qalibê hoker + lêker tîn çêkirin:

- xweşbêj
- rastgo
- kêmaxiv

Bi esl û şiklê xwe beşên pêşîn (xweş, rast, kêm) yên van peyvên pêkhatî rengdêr in lê ji aliyê rêzimanî ve ew li vê derê hoker in ji ber ku li gel lêkeran tîn bikaranîn, ne li gel navdêran. Di kurdî û gelek zimanên din de jî heman peyv ji aliyê rêzimanî ve rengdêr in eger li gel navdêran bîn bikaranîn û hoker in eger bi lêkeran re bîn xebitandin. Bo nimûne:

- xwarina xweş (xweş = rengdêr)
- xweş dixwin (xweş = hoker)

Di nivîsareke din de em ê paşî behsa wekhevî û cudahiyên hoker û rengdêran bikin.

Lê nimûneyên me yên pêkhatî “xweşbêj, rastgo, kêmaxiv” rengdêr in. Bo nimûne:

- hozanekî xweşbêj
- mirovên rastgo
- kesê kêmaxiv (yê ku hindik qise dike)

² Herwiha “dêhl, dihl”.

6. BIKARANÎNA RENG DÊRAN WEK NAVDÊRAN

Li jor di beşa peydabûna rengdêran de me behsa wê kiriye ku çawa hinek navdêr wek rengdêran tên bikaranîn. Bo nimûne, mirov peyvên “ker, şêr” yên bi eslê xwe navdêr bi maneya “bêaqil, wêrek” bi kar tîne gava ku dibêje “filan kes ker e” yan “bêvan kes şêr e”.

Li aliyekî din, rengdêr jî dikarin wek navdêr bên bikaranîn. Hinek rengdêr bi sabitî bûne navdêr jî. Bo nimûne, “pîr” bi eslê xwe maneya “temenmezin, extiyar, biûmr” dide lê herwiha bûye “serok, rêber”ê hin mezheb û terîqetan jî, bo nimûne yê pîrên elewî û êzidiyan.

Heta “kurdî” jî bi eslê xwe peyveke rengdêr e lê paşî wek navê zimanê me bûye navdêr jî. Bi heman awayî di kurdî û gelek zimanên din de (bo nimûne di inglîzî de) navên zimanan bi eslê xwe rengdêr in û wateya “têkilî filan milletî” (bo nimûne: kurdî = têkilî kurdan an gelê kurd) didin, wek “xwarinên kurdî, dawetên kurdî, cilên kurdî” û hwd.

Ji bilî hin rengdêrên ku wiha bi sabitî bûne navdêr, herwiha gelek rengdêrên din jî li gor bikaranîna xwe ya di hevokan de di wê rewşê de dibin navdêr tevî ku bi awayekî giştî û li derveyî hevokan tenê rengdêr in.

Di kurmancî de rengdêr bi du awayên ji hev cuda cihê rengdêran digirin. Kerem bikin em li vê nimûneyê binêrin:

- Kes-ekî mezin got.
 - 1) → Yekî mezin got.
 - 2) → Mezin-ekî got.

Wek ku tê dîtin, di veguherîna yekem (1) de “kes” – ku navdêr e – ketiye û paşgira wî ya “-ekî” maye ku di nimûneya yekem de bûye “yekî” li pêşiya rengdêrê ku di nimûneya me de “mezin” e.

Di veguherîna duyem de jî “kes” – ku navdêr e – ketiye lê îcar paşgira wî “-ekî” neqil bûye û bi “mezin”ê ve zeliqiye û “mezin”a bi eslê xwe rengdêr kiriye navdêr û wek navdêran li gor hejmar û cinsê rêzimanî çemandiye / tewandiye.

Ev diyarde ne tenê li ge raveka “-ek, -ekî” lê li gel hemû ravekên din jî yên navdêran mimkin e. Bo nimûne:

- xwişka mezin → ya mezin / a mezin
- birayê mezin → yê mezin / ê mezin
- mirovên mezin → yên mezin / ên mezin

Ev awayê avêtina navdêran ji komika navdêrê di hemû lehceyên kurmancî de heye. Formên bi Y (ya, yê, yên) zêdetir di kurmanciya rojhilatî û zimanê nivîskî de tînin bikaranîn. Formên bêyî Y (a, ê, ên) pirtir di kurmanciya navendî û rojavayî de û carinan jî di nivîsînê de peyda dibin.

Ji bilî vî awayî, bi taybetî kurmanciya rojhilatî herwiha forma din ya avêtina navdêran û herwiha ravekên wan jî bi kar tîne û li şûna wan paşgirên hejmar û cinsê rêzimanî dide dûv rengdêran. Bo nimûne:

- xwişka delal got → delalê got.
- birayê hêja got → hêjayî got.
- mirovên mezin gotiye → mezinan gotiye.

Wiha di pratîkê de rengdêr bi temamî tînin navdêrkirin û bi şert û mercên navdêran tînin bikaranîn tevî ku rengdêr bi xwe gava ku wek ravekerên navdêran li gel navdêran di heman komikê de tînin bikaranîn, di kurmancî de naçemin û paşgirên hejmar û cinsê rêzimanî wernagirin.

Ji aliyê cinsê rêzimanî ve rengdêrên navdêrkirî ducinsî ne anku li gor amaje û referansa xwe hem dikarin wek nêr û hem jî wek mê bên bikaranîn. Bo nimûne:

- yê mezin got, mezinî got
- ya mezin got, mezinê got

Ew ji bilî yekhejmarî, dikarin herwiha wek pirhejmar jî bên xebitandin. Bo nimûne:

- yên mezin got, mezinan got

Li aliyekî din, rengdêr di kurdî û gelek zimanên din de wek hoker (*adverb*) jî tên bikaranîn. Em ê vê meseleyê paşî di vekolîna xwe ya li ser hokeran de vekin.

7. BERHEVDANA LEHCEYÎ YA RENGDÊRAN³

7.1. Cudahî û wekheviya rengdêran di lehceyên kurdî de

Di vê beşa vekolîna xwe de em ê hewl bidin wekhevî û bi taybetî jî cudahiyên bingeîn yên rêziman û peyvsaziya rengdêran di navbera lehce anku zaravayên kurdî de pêşkêş bikin.

Heta niha rengdêrên kurdî yên ti lehceyan baş nehatine vekolîn û zimannas û rêzimanîvîsên me di hemû lehceyan de yan qet li ser rengdêran ranewestîne yan jî bi berawirdî li gel birên din yên peyvan, pir kêr li ser rengdêran nivîsiye.⁴

³ Agahiyên derbarê devokên kurdiya başûrî (feylî, kelhurî û kirmaşanî) ji rêzimana Îsmail Kemendar Fettah ya bi fransî li ser devokên kurdiya başûrî *Les Dialectes Kurdes Méridionaux* ne. Zanyariyên derbarê zazakî hem ji kitêba Roşan Lezgîn *Gramera kirdkî (zazakî)* û kitêba Zülfü Selcan *Grammatik der Zaza-Scprache* (rêzimana zimanê zazakî, bi almanî) ne û hem jî ez bo zêdetir agahiyên li ser zazakî spasdarî kekên hêja Hasan Aslan û Roşan Lezgîn im. Agahiyên derbarê soranî ji kitêba min *Kurterêzimana soranî* ya bi kurmancî ne lê min temam kirine lê dikarin di piraniya rêzimanên din jî yên soranî de bîn dîtin.

⁴ Mirov dikare wek nimûne kitêba Îsmail Kemendar Fettah ya bi fransî li ser devokên kurdiya başûrî *Les Dialectes Kurdes Méridionaux* û *Gramera Kirdkî (zazakî)* ya Roşan Lezgîn ya bi şirovekirin û berhevdana bi kurmancî bide. Fettah

Herçi berhevdana rengdêran di navbera lehceyên kurdî de ye, ew hê jî kêmtir bûye mijara vekolînan. Di hin berhemên rêzimana lehceyeke kurdî bi lehceyeke din de bi kurtî lê ne bi awayekî sistematîkî hin wekhevî û cudahiyên rengdêran û avakirin û bikaranîna wan hene⁵ lê ew jî tenê li ser hin beşên bingehîn yên du lehceyan in.

Tek hewldana pirlahceyî ya li ser rengdêrên kurdî kurtenivîseke Hasan Karaca û Hîwa Selam Xalid (Hewa Salam Khalid) e⁶ ku idia dike ku rengdêrên kurdî li gor kurmancî, soranî û zazakî di de ber hev. Di rastiye de ew bi awayekî pir giştî – û tevî gelek xeletiyên – behsa rengdêrên kurdî dikin û qaşo digihin wê qenaetê ku bikaranîna rengdêran di lehceyên kurdî de pir dişibe hev. Hema-hema ew qet behsa cudahiyên bikaranîna rengdêran di navbera lehceyên kurdî de nakin tevî ku bi sernavê nivîsara xwe û wek armanca wê soza berhevdana rengdêran di zaravayên kurdî de didin.

Di rastiye de rengdêr û bikaranîna wan di navbera lehceyên kurdî de bi çendîn awayan ji hev cuda ne ku mirov dikare wan cudahiyan wiha parve bike:

- cudahiyên peyvî yên rengdêran
- cudahiyên peyvsaziya rengdêran
- cudahiyên teşenasîya (morfolojiya) rengdêran

Li jêr em ê yek bi yek van cudahiyan binasînin.

7.2. Cudahiyên peyvî yên rengdêran

Li vê derê mebesta me bi “cudahiyên peyvî yên rengdêran” ew e ku di lehceyên kurdî de hin peyvên cuda bo diyarkirina heman rengdêran tên bikaranîn. Carinan jî peyv eynî ne lê wateya wan di hemîu

di kitêba xwe ya 900-rûpelî de tenê 9 rûpelan bo nasandin û şirovekirina rengdêran û bikaranîna wan terxan dike.

Lezgîn jî di berhema xwe ya 220-rûpelî de tenê 6 rûpelan bo nasandin û şirovekirina rengdêran vediqetîne.

⁵ Bo nimûne di “Gramera kirdkî (zazakî)” ya Roşan Lezgîn ya bi kurmancî li ser rêzimana zazakî yan jî di “Kurterêzimana soranî” ya Husein Muhammed de bi kurmancî de bi kurtî di navbera zazakî-kurmancî (Lezgîn) û soranî-kurmancî (Muhammed) de tê kirin lê ne bi awayekî berfireh û sistematîk. Bo nimûne, Lezgîn di kitêba xwe de qet behsa berhevdana rengdêran nake û anku nabêje ka mirov çawa pileya berhevder (komparatîv) û pileya jorîn (superlatîv) di zazakî de ava dike û bi kar tîne.

⁶ Adjectives in Kurdish language: Comparison between dialects:

https://www.academia.edu/28163746/Adjectives_in_Kurdish_language_Comparison_between_dialects

lehceyan de ne wek hev e. Li vê derê em ê vê diyardeya “cudahiyên peyvî yê rengdêran” ji çend aliyên wê ve bidin nasîn.

Helbet gelek rengdêrên kurdî di hemû yan piraniya lehceyên kurdî de hene û bi heman maneyê jî tîk bikaranîn. Lê di rastiyê de di binavkirina rengdêrên herî berbelav û sade de jî gelek cudahiyên giring hene.

Di meseleya hin rengdêran de lehce bi temamî peyvên ji hev cuda dixebitînin. Bo nimûne, li cihê “big” ya inglîzî bi kurmancî mirov dibêje “mezin”, bi soranî “gewre” û bi zazakî “pîl”.⁷ Ev peyv bi eslê xwe ne ji eynî rehî ne anku etîmolojiya wan ne eynî ye anku ew bi temamî peyvên ji hev cuda ne lê niha di van lehceyan de bi heman mebestên tîk bikaranîn.⁸

Beramberî rengdêr û navê rengê inglîzî “green” di kurmancî de “kesk”, di soranî “sewz” û di zazakî de “zergûn” e. Beramberî rengdêr û rengê inglîzî “black” di kurmancî û soranî de “reş” e lê di zazakî de “siya” ye û beramberî rengdêr û rengê inglîzî “blue” dîsa di kurmancî û soranî de “şîn” e lê di zazakî de “kewe” ye.

Hin caran heman rengdêr tenê di yek an çend lehceyan de peyda dibe lê di her lehceyê de nîne. Bo nimûne, peyvên “xurt” (bihêz, qewî, qayîm) û “xort” (genc, ciwan) de hene lê di soranî û kurdiya başûrî de peyda nabin. “Rind” (baş, qenc; spehî, delal) di zazakî û kurmanciya rojavayî de pir berbelav e lê di soranî û kurmanciya rojhilatî de peyda nabe.

Carinan di çend yan heta hemû lehceyan de jî heman peyv heye lê tenê li gor şertên dengnasî yê her lehceyê diguhere. Bo nimûne, kurmancî “xweş”, kurdiya başûrî “xüeş”, soranî “xoş”⁹ û zazakî “weş” yan kurmancî “zer” lê soranî û zazakî “zerd” yan jî kurmancî “hûr”, zazakî “hurdi” û soranî “wurd, wird”.

⁷ Helbet vê dawiyê “gewre” ji soranî ketiye kurmanciya nivîskî û “mezin” jî ji kurmancî derbazî soraniya nivîskî bûye lê dîsa jî peyva bingehîn ya kurmancî her “mezin” û ya soranî jî her “gewre” ye û xelk wan wisa bi kar tînin.

⁸ Ji aliyê etîmolojî ve “mezin” her maneya “mezin, gir” dide û hevrehê “megas” ya yûnaniya kevn û “magnus” ya latînî ye ku ew jî her wateya “mezin” didin. “Gewre” ya soranî bi eslê xwe ji “gewr” (boz) e û pêşî tenê bo mirovên mezin (por-boz, ser-spî) dihat bikaranîn lê paşî wateya wê belav bûye û niha maneya her tiştê mezin dide. Ew ji aliyê etîmolojî ve ne hevrehê “great” ya inglîzî, “grand” ya fransî yan “gross” ya almanî ye. “Pîl” ya zazakî bi eslê xwe hevrehê “pîr” (kal, temenê/umrê mezin) ya kurmancî ye lê maneya wê ji “umrê mezin” belav bûye û niha êdî wateya “her tiştê mezin” dide.

⁹ Li hin deverên kurmanciya rojhilatî jî (bo nimûne li Dihokê) “xoş” e, ne “xweş”.

Hin rengdêrên lehceyan ji eynî rehî ne lê wisa ji hev dûr ketine ku eger mirov maneya wan nizane, belkî nikare fehm bike. Bo nimûne, kurmancî “bilind” lê soranî û zazakî “berz” yan kurmancî û soranî “dirêj” lê zazakî “derg” yan kurmancî “kin” (kurt) û zazakî “kilm” yan kurmancî “çê(tir)” û soranî “çak”.

Carinan heman rengdêr di lehceyan de heye lê di tevahiya heman lehceyê de peyda nabe. Bo nimûne, di soranî û kurmanciya rojhilatî de peyva “kurt” (ne dirêj) heye lê di her devoka kurmancî de peyva “kurt” nîne ji ber ku kurmanciya rojavayî bi tevahî peyva “kin” û kurmanciya rojhilatî jî gelek dever dîsa peyva “kin” dixebitînin û peyva “kurt” bi kar naînin yan heta fehm jî nakin. Peyva “rind” ya li pêştir behskirî di zazakî de û di kurmanciya rojavayî de heye lê di kurmanciya rojhilatî de nayê emilandin.

Carinan heman peyva rengdêr di du yan çendîn lehceyan de heye lê maneya wê di lehceyan de ne wek hev e. Bo nimûne, “xas” ya bi eslê xwe ji erebî di piraniya lehceyên kurdî de bi maneya “xusûsî, taybetî, spesyal, nayab” tê bikaranîn lê di kurdiya başûrî¹⁰ de ew wateya “baş, qenc, rind” dide. Dîsa di kurmancî de “fire(h)” maneya “ne teng” dide lê di kurdiya başûrî de ew wateya “gelek, pîrr” dide. Di soranî de peyva “law” maneya “xort, genc” dide lê di kurmancî (bi taybetî kurmanciya rojhilatî) de ew wateya “keşxe, xweşik, baş” dide.¹¹

7.3. Cudahiyên peyvsaziya rengdêran

Mebest ji peyvsaziya rengdêran çêkirina rengdêran ji rengdêr an peyvên din yê heyî ye. Hemû lehceyên kurdî rengdêran bi pêşgir û paşgir û herwiha bi pêkanîne (bi hev ve girêdana du yan zêdetir peyvên serbixwe) çêdikin.

Piraniya pêşgir û paşgir jî di hemû lehceyên kurdî de eynî ne lê hin cudahiyên giring jî hene ku em ê li jêr behsa wan bikin.

Rengdêrên bi wateya neyînî (yên ku tiştek nîne, ji tiştekî bêpar e, mehrûm e) di hemû lehceyên kurdî de bi pêşgir “bê-” tî avakirin, wek “bêhêvî, bênamûs, bêxwê”.

¹⁰ Mebest ji kurdiya başûrî devokên feylî, kelhurî, kirmaşanî û hwd. ne.

¹¹ Di kurmanciya navendî de “law” bi piranî wek navdêr bi maneya “kur” tê xebitandin.

Dijwateya “bê-“ di kurmancî de “bi-“, di soranî de “be-“ û di kurdiya başûrî de li hin deran bi “we-“ û li hin cihan jî “be-“ ye. Bo nimûne, bi kurmancî “bimal, bijin, bimêr” û bi soranî “bemał, bejin, bemêrd”. Di zazakî de li cihê vê pêşgira lehceyên din adeten paşgira –in bi kar tîne, bo nimûne “sol-in” (bixwê, têrxwê, sûr, şor – ji “sol” anku “xwê”) lê di çend peyvan pêşgira “bi-“ jî heye (wek “bixeyr” anku “bixêr” û “baqil” < bîaqil).

Di kurmancî de bi pêşgira “ne-“ hem rengdêr û hem jî rehê dema niha yê lêkeran dikare bibe rengdêr:

- ji rengdêran: merd → nemerd, baş → nebaş, xweş → nexweş
- ji rehê lêkeran: -zan- → nezan, -mir- → nemir

Di soranî û zazakî de jî rehê lêkerê bi pêşgira “ne-“ rengdêrên neyînî çêdikin, bo nimûne:

- -zan- → nezan

Lê di soranî de rengdêr adeten bi pêşgira “na-“ û di zazakî de jî bi pêşgira “nê-“ ve tên girêdan. Bo nimûne:

- kurmancî: xweş → nexweş
- soranî: xoş → naxoş¹²
- zazakî: weş → nêweş

7.4. Cudahiyên teşenasiya rengdêran

Mebesta me ji teşenasiya (morfolojiya) rengdêran li vê derê du tişt in:

- çemandina / tewandina rengdêran
- berhevdana rengdêran

Di beşên li jêr de em ê her yekê ji wan bi hûrgilîtir vekolin.

¹² Di soranî de hem “naxoş” û hem jî “nexoş” heye. “Naxoş” maneya tiştêkî ne xweş dide, “nexoş” jî wateya kesên nexweş / nesax / êşewî dide. Lê “nexoş” di soranî de tiştêkî istisnayî ye û forma li gor qalibê giştî “naxoş” e, wek “namerd” (li cihê “nemerd” ya kurmancî) yan “nahez” (hev wateya “nehez, necis” yê kurmancî).

7.4.1. Cudahiyên çemandin û girêdana rengdêran

Ji aliyê çemandinê ve rengdêrên di kurmancî de di pratîkê de neçembar (netewbar) in anku li gor cins û hejmara rêzimanî naçemin anku natewin. Bo nimûne:

- jina qenc
- mêrê qenc
- mirovên qenc

Wek ku tê dîtin, rengdêra me ya nimûne “qenc” her bi eynî şikl û dirûvî ye tevî ku carekê ew li peyveke mê (jin), carekê bi peyveke nêr re (mêr) û carekê jî bi peyveke pirhejmar (mirovên) ve hatiye girêdan.

Lê wek ku li jor di beşa bêcinsîtiya rengdêran di kurmancî de jî hatiye gotin, di zazakî de – wek di hin zimanên din de jî, bo nimûne di almanî, erebî, fransî û spanî de – rengdêr jî li gor cins û hejmara rêzimanî diguherin. Di zimannasiyê de ji vê guherîna li gor cins û hejmara rêzimanî re “lihevkerin” (bi inglîzî “argument”) tê gotin.

Em nimûneyên xwe yê dîsa dubare bikin:

- nêr: daro *derg* (darê *dirêj*)
- mê: dara *derge* (dara *dirêj*)
- pirhejmar: darê *dergî* (darên *dirêj*)

Cudahiyêke din ya kurmancî û zazakî di bikaranîna rengdêran de ew e ku ravekên kurmancî hem li gel rengdêran û hem jî li gel navdêr û cînavan eynî ne, di rewşa diyar de yekhejmara mê “-a”, yekhejmara nêr “-ê” û pirhejmar “-ên”. Bo nimûne:

Kurmancî:

- navdêr + navdêr: dengê Azadî, bejna Azadî, çavên Azadî
- navdêr + cînav: dengê min, bejna min, çavên min
- navdêr + rengdêr: dengê xweş, bejna dirêj, çavên reş

Lê di zazakî de ravekên ku navdêran bi rengdêran ve girê didin ji ravekên ku navdêr û cînavan bi navdêran ve girê didin cuda ne li gel navdêrên yekhejmar yên nêr cuda ye.

Zazakî:

- navdêr + navdêr: vengê Azadî, beşna Azadî, çimê Azadî
- navdêr + cînav: vengê mi, beşna min, çimê min
- navdêr + rengdêr: vengo weş, beşna dirêj, çimê reş

Di kurmancî de komikên navdêrî yên bi navdêr, rengdêr an cînav ravekirî di rewşa çemandî û neçemandî de wek hev in. Bo nimûne:

- deng → bi/ji dengî
- bejn → wê bejnê

Lê

- dengê xweş → ji dengê xweş
- bejna bilind → li bejna dirêj
- çavên reş → bi çavên reş

Wek ku tê dîtîn, navdêrên komikî yên bi ravek êdî di kurmancî de naçemin.

Lê di zazakî de komikên navdêrî yên bi rengdêr di rewşa çemandî û ya neçemandî de li gel navdêrên yekhejmar yên nêr û yên pihejmar ne wek hev in (lê yekhejmara mê wek hev e). Yekhejmara nêr û pihejmar di halê çemandî de hem bi raveka xwe û hem jî bi paşgirên xwe ji halê neçemandî cuda ne. Bo nimûne:

- vengo weş (dengê xweş) → vengê weşî ra (ji dengê xweş)
- bejna berze (bejna bilind) → bejna berze ra (ji bejna bilind)
- çimê siyayî (çavên reş) → çimanê siyayan ra (ji çavên reş)

Mirov dikare hemû formên rengdêrên zazakî wiha pêşkêş bike (bi peyva “pîr” anku “extiyar, biumur, temenmezin”):

hejmara / cinsê rêzimanî	neçemandî	çemandî
yekhejmar, nêr	pîr	pîrî

yekhejmar, mê	pîre	pîre
pirhejmar	pîrî	pîra(n)

Li vê derê hêjayî bibîranînê ye ku ev formên cuda wek ravekerên navdêran li gel navdêran tên bikaranîn, ne wek kurmancî “pîrî, pîrê, pîran” ku bêyî navdêran an li şûna navdêran tên xebitandin.

Ji nav lehceyên din yên kurdî, sîstema rengdêrên hewramî jî bi piranî wek ya zazakî ye. Bo nimûne peyva “pîr” (extiyar, biûmr, temenmezin) li gor hejmar, cins û tewangê wiha ye:¹³

hejmara / cinsê rêzimanî	neçemandî	çemandî
yekhejmar, nêr	pîr	pîrî
yekhejmar, mê	pîre	pîrê
pirhejmar	pîrê	pîra(n)

Soranî û kurdiya başûrî jî wek kurmancî çemandina rengdêran li gor hejmar, cins û tewangê naguherînin. Anku di van lehceyan de rengdêr hema-hema wek di kurmancî de tên bikaranîn. Bo nimûne:

Soranî:

- jinêkî pîr (jineke pîr)
- piyawêkî pîr (zelamekî pîr)
- çend kesêkî pîr (çend kesên pîr)

Lê dîsa jî di soranî û kurdiya başûrî de rengdêr ne wek di kurmancî de rût û bêpaşgir in. Sebeb ew e ku paşgirên diyariyê (*definite*) di soranî û kurdiya başûrî de dikarin li şûna navdêran, rengdêran bigirin. Bo nimûne:

Soranî:

- kitêb-eke ([filan] kitêb, bi inglîzî *the book*, bi erebî *el-kitab*)

¹³ Nimûneyên hewramî ji D. N. MacKenzie *The Dialect of Awroman (Hawraman-i Luhon)*, r. 14 (bi verastkirina ortografîyê ji aliyê min ve): <https://zimannas.files.wordpress.com/2016/01/hewrami.pdf>

1) → kitêb-eke-y kon (kitêba kevn)

2) → kitêb-e kon-eke (kitêba kevn)

- Anku paşgira yekhejmariya diyar (-eke) dikare yan bi navdêrê ve be (kitêb-eke-y kon) yan jî bi rengdêrê ve were girêdan (kitêbe kon-eke)

Herwiha paşgira pirhejmariya diyar (-ekan) jî dikare yan bi navdêrê ve be (kitêb-ekan-î kon) yan jî bi rengêran ve bên bestin (kitêbe kon-ekan):

- kitêbekan ([filan] kitêb [pirhejmar], bi inglîzî *the books*, bi erebî *el-kutub*).

1) → kitêb-ekan-î kon

2) → kitêb-e kon-ekan

Di kurdiya başûrî de adeten paşgirên wiha bi rengdêran ve (ne bi navdêran ve) tên girêdan. Di iraniya devokên kurdiya başûrî de paşgira yekhejmariya diyar –ege û paşgira pirhejmariya diyar jî –egan e:

Kurdiya başûrî:

- maŀ-e giran-egê (mala giran, xaniyê bihagiran)
- maŀe giran-egan (malên giran, xaniyên bihagiran)

Di soranî û kurdiya başûrî de herwiha cînavên pêvekîrî jî dikarin bi rengdêran ve bên zeliqandin.

Bo nimûne bi soranî (kitêb, kevn):

Yekhejmar

Pirhejmar

kitêbe kon-eke-m (kitêba min ya kevn)

kitêbe kon-ekan-im (kitêbên min yên kevn)

kitêbe kon-eke-t (kitêba te ya kevn)

kitêbe kon-ekan-it (kitêbên te yên kevn)

kitêbe kon-eke-y (kitêba wê/wî ya kevn)

kitêbe kon-ekan-î (kitêbên wê/wî yên kevn)

kitêbe kon-eke-man (kitêba me ya kevn)

kitêbe kon-ekan-man (kitêbên me yên kevn)

kitêbe kon-eke-tan (kitêba we ya kevn)

kitêbe kon-ekan-tan (kitêbên we yên kevn)

kitêbe kon-eke-yan (kitêba wan ya kevn)

kitêbe kon-ekan-yan (kitêbên wan yên kevn)

Li dût paşgirên diyariyê herwiha raveka –î / –y jî peyda bibe ku wê peyva dût xwe ve girê dide. Bo nimûne bi soranî:

- kitêbe kon-eke-y Azad (kitêba Azadî ya kevn)
- kitêbe kon-ekan-î Azad (kitêbên Azadî yên kevn)

Wek ku ji tabloya jortir û ji nimûneyên li pey wê jî diyar dibe, peyvrêziya soranî (û herwiha ya kurdiya başûrî jî) di vê meseleyê de ji peyvrêziya kurmancî cuda ye. Wek ku me li jortir diyar kiriye, di kurmancî de cînavên xwedîtîyê dikevin navbera navdêr û rengdêran lê di soranî de cînav tên dawiyê.

Bo nimûne:

- kurmancî: kitêba min ya kevn (navdêr + cînav + rengdêr)
- soranî: kitêbe kon-ekem / kitêbe kon-eke-y min (navdêr + rengdêr + cînav)

Eger hoker jî di komikê de hebe, hingê peyvrêzî wiha ye:

- kurmancî: kitêba min ya gelek kevn (navdêr + cînav + rengdêr)
- soranî: kitêbe zor kon-ekem / kitêbe zor kon-eke-y min (navdêr + hoker + rengdêr + cînav)

7.4.2. Cudahiyên berhevdana rengdêran

Cudahiya din ya morfolojîk di navbera lehceyên kurdî de di meseleya rengdêran de awayên cuda yên pileyên anku dereceyên **berhevdana rengdêran** (bi inglîzî *adjective comparison*) in.

Di hemû lehceyan de her sê pile (sade, berhevder û jorîn anku pozîtîv, komparatîv û superlatîv) bi yek an çend awayan tên diyarkirin. Lê awayên diyarkirina van pileyan hinekî ji hev cuda ye.

Pileya sade

Di hemû lehceyan de pileya sade bêyî ti paşgir, pêşgir an peyvikeke taybet e ya berhevdanê ye. Bo nimûne:

- kurmancî: Ew *xweş* e.
- soranî: Ew *xoş* e.
- zazakî: Ey *weş* o. (nêr)

Eger mirov du tiştên bi çawaniya xwe di eynî pileyê de bide ber hev û diyar bike ku filan çawaniya wan eynî ye, mirov di lehceyên cuda de daçekên wiha bi kar tîne:

- kurmancî: *hindî*, (bi) *qasî*, *temetî*, *hingî*, *wek*
- soranî: *wekû*, *ewendey*
- zazakî: *hendayê*, *bi qasê*

Ji yên kurmancî “*hindî*” bi berfirehî di kurmanciya rojhilatî de û “*bi qasî*” (yan tenê “*qasî*”) di kurmanciya navendî de tîk bikaranîn. “*Temetî*” (an “*temet*”) li hin deverên kurmanciya rojhilatî, “*hingî*” jî li hin derên kurmanciya navendî û rojavayî li kar in.

“*Hindî*, *hingî*” yên kurmancî bi zelalî hevrehên “*hendayê*” (li hin deveran “*hondê*”) hevreh in û “*ewendey*” ya soranî jî hevrehê wan e. Dîsa “*bi qasî*” (carinan “*bi qasê*”) ya kurmancî û “*bi qasê*” ya zazakî jî eynî gotin in û ji peyva “*qas*” in ku kurtkirina ji peyva “*qiyas*” ya ji erebî ne.

Bo nimûne:

- kurmancî: Ez *hindî* te dirêj im / ez *bi qasî* te dirêj im / ez *temetî* te dirêj im.
- soranî: min *ewendey* to dirêj im.
- zazakî: ez *hendayê* to derg a.

Pileya berhevder

Pileya berhevder di kurmancî, soranî û kurdiya başûrî de adeten bi paşgira **-tir** tê avakirin. Bo nimûne:

- *kurttir* → *kurttir*
- *nû* → *nûtir*

Di hewramî de ew paşgir bi forma **-ter** e. Bo nimûne:

- *req* → *reqter* (*reqtir*)

Di zazakî de paşgira **-êr** xwedî heman wezîfe ye.

- derg → dergêr (dirêj → dirêjtir)
- kilm → kilmêr (kurt → kurttir)

Ji aliyê etîmolojî ve hemû ev paşgirên lehceyên cuda ji eynî rehî ne û hevrehên wan di gelek zimanên din jî yên hindûewropî de peyda dibin.¹⁴

Paşgira zazakî –êr wisa peyda bûye ku pêşî T bûye D, dût re bûye Y û taliyê jî Y û E bi hev re bûne Ê. Bi kronolojîkî wisa qewimiye:

- -ter → *-der → -yer → -êr

Ji bilî paşgirên piçekê ji hev cuda bûyî (kurmancî, soranî û kurdiya başûrî –tir lê hewramî –ter û zazakî –êr), herwiha ji aliyê morfolojî ve jî hewramî û zazakî ji kurmancî, soranî û kurdiya başûrî di vê mijarê de cuda ne:

Wek di pileya sade de, di pileya berhevder de jî di zazakî û hewramî de rengdêr li gor cins û hejmarê rîzmanî diçemin lê di kurmancî, soranî û kurdiya başûrî de wek hev in. Bo nimûne:

	nêr	mê	pirhejmar
kurmancî	kurikê <i>dirêjtir</i>	keçika <i>dirêjtir</i>	mirovên <i>dirêjtir</i>
zazakî	lajeko <i>dergêr</i>	keyneka <i>dergêre</i>	merdimê <i>dergêrî</i>

Bêyî ku em meseleyê dirêj bikin, hemû paşgirên rengdêran yên zazakî û hewramî yên li jortir di tabloyan de hatine diyarkirin herwiha li pey paşgira berhevdanê ya hewramî –ter û ya zazakî –êr jî tîn.

Lê cudahiya ji vê jî berçavtir ew e ku paşgira –êr di axiftina zazakî de li ber nemanê ye û piraniya qisekeran êdî forma sade li gel peyvika alîkar “hîna” (yan jî hevwatera wê ya ji tirkî wergirtî “daha, deha, diha”) dixebitînin. Bo nimûne:

- hîna derg (dirêjtir)
- deha gird (girtir, mezintir)

¹⁴ Binêrin: <https://ku.wiktionary.org/wiki/-tir>

Bo nimûne, di zazakiya bakurî anku ya devera Dêrsimê de avakirina pileya berhevder bi paşgira –êr (yan varyanta wê ya –yer) êdî qet nemaye.¹⁵ Heta carinan peyvika “hîna” yan “deha” jî nayê bikaranîn. Loma li şûna zazakî ya standard hevoka “Lajek keyneke ra *dergêr o*” (Lawik ji keçikê *dirêjtir e.*), li Dêrsimê wiha tê gotin (hevok li gor devok û dengnasiya zazakiya Dêrsimê) “Lazek çêneke ra *derg o*” ku bi peyv bi peyv dibe “lawik ji keçikê *dirêj e.*”

Peyva “hîna” û hevwaterên wê “hê, hêj, hên, hêna, hîn, hêsta...” di kurmancî de jî di pileya berhevder tîn bikaranîn lê herdem li gel paşgira –tir.

Lê paşgira ji “diha, deha, daha” ya ji tirkî “daha” di kurmancî de jî êdî di axiftina gelek kesan de şûna paşgira kurdî digire:

- Ev diha xweş e. (Ev xweştir e. Ev hê xweştir e.)

Di soranî, kurdiya başûrî û hewramî de cihê paşgira –tir (bi hewramî –ter) qayim e û nakeve. Ketina paşgira –êr (= -tir) ji zazakî û carinan jî ketina –tir ji kurmancî bi zelalî ji ber tesîra tirkî ye û ji xwe gelek caran bi peyva “diha” ya ji tirkî “daha” wergirtî tê veguhastin.

Di pileya berhevder de daçekên ji hev cuda di lehceyên cuda de tîn bikaranîn:

- kurmancî: ji
- soranî: le
- kurdiya başûrî: (li gor deveran) le, de, je, ej, we, ve...
- hewramî: ce
- zazakî: ra

Bo nimûne:

- kurmancî: Keçik *ji* kurikê *dirêjtir e.*
- soranî: Kiçeke *le* kureke *dirêjtir e.*
- kurdiya başûrî: Kiçege *le/de/je* kurege *dirêjtir e.*
- zazakî: Keyneke lajekî *ra* *dergêr a.*

Pileya jorîn

¹⁵ Zülfü Selcan *Grammatik der Zaza-Sprache*, r. 563 – 564.

Bo sazkirina pileya jorîn ya rengdêran di kurmancî, soranî, hewramî û kurdiya başûrî de li gel çend alternatîvên din herwiha paşgira **-tirîn** jî heye. Ev paşgir an hevrehêke wê ya din di zazakî de qet peyda nabe.

Di zazakî de pileya jorîn bi alîkariya hokera “tewr” tê avakirin:

- derg → tewr derg (dirêj → dirêjtirîn)
- berz → tewr berz (bilind → bilindtirîn)

Kurmanciya navendî û kurmanciya rojavayî (lê ne kurmanciya rojhilatî) jî bi alîkariya hokera “herî” (carinan “here, helî, hele”) wek zazakî pileya jorîn çêdikin:

- dirêj → herî dirêj
- bilind → herî bilind

Hem di axiftina zazakî de û hem jî di ya kurmancî de li gelek deverên Bakurê Kurdistanê peyva “tewr” ya zazakî û ya “herî” ya kurmancî gelek caran bi peyva tirkî “en” tîn veguhastin:

- tirkmancî: en dirêj (dirêjtirîn, herî dirêj)
- tirkzazî: en derg (tewr derg = dirêjtirîn, herî dirêj)


Heta di lehceyên din jî yê kurdî de bikaranîna paşgira **-tirîn** bo çêkirina pileya jorîn ya rengdêran di axiftinê de nadir e. Hem kurmancî, hem jî soranî, hewramî û kurdiya başûrî jî li şûna wê formeke wek “ji hemûyan... -tir” bi kar tînin.

Bo nimûne, li şûna “dirêjtirîn”:

- kurmancî: ji hemûyan / giştan / tevan dirêjtir
- soranî: le hemuwan / giştan dirêjtir
- kurdiya başûrî: le giştigan dirêjtir

Kitêbek li ser cinsê rêzimanî:

Zayenda mê û nêr



Kitêba *Zayenda mê û nêr* kitêbeke vekolînê ya teqrîben 100 rûpelî ye li ser cinsê rêzimanî (zayenda rêzimanî) anku mê û nêr di kurdî (kurmancî) de.

Kitêb ji aliyê nivîskareke jin ya bi bernavê **Keça Kurd** ve hatiye nivîsîn û sala 2001 li Berlînê hatiye çapkirin. Heman nivîskar xwedî kitêbeke din ya li ser etîmolojiya hin peyvên kurdî ye ku me berê di kovara Kanîzar de daye nasîn.

Nivîskara kitêbê li gor mijaran (bo nimûne "cîh û war", "gul û kulîlk", "reng" û hwd.) yek bi yek li cinsê wan yê rêzimanî vedikole û pêşkêş dike.

Kovara Kanîzar û malpera Zimannas bi serbilindî vê berhemê dixin ber destê xwandevanên zimanê kurdî:

<https://zimannas.files.wordpress.com/2017/05/zayend.pdf>

Zimanê Kurdî û Zimankujî Li Tirkîyeyê*

Emîr Hesepûr

Dema hûn li wateya ziman binêrin, piranî hûn ê bibînin ku ji ziman re alava ragihandinê tete gotin. Ev hema hema rast e, ji ber ku bilî ziman em xwedanê alavekê din ya ragihandinê nîn e. Alava sereke ya ragihandinê ziman e. Lê divêt em bizanin ku ziman ji bilî vê jî xwedan wateyekê ye. Di heman demê de, ziman wek alava têkoşînê ji bo desthilatîyê jî tê bi kar anîn; û dikare bibe çekeke girîng di diyarkirina têkiliyên desthilatîyê de.

Şeş hezar sal berê bû ku zimên şeweya nivîsê girt. Ji vê demê heta niha, ziman ne tenê bi şeweya nivîskî maye; lê bi teknolojiya ku her bi pêş ve diçe re nivîs, di heman demê de li ser radyo, televizyon, înternet, û di nav filman û pirtûkan de jî hatiye bi kar anîn. Ziman tê bi kar anîn, ji vê wêdetir tê qetilkirin jî; carina nîşanên awarte bi dest dixê û tê methkirin, carina jî wek alava ciyawazîyê tê bi kar anîn.

Îro, em baş nizanin bê kanî li dinyayê çend ziman hene. Lê li gor lêkolînê heta niha hatine kirin mirov dikare bêje ku nêzîkî heft hezar (7000) ziman hene. Ev heft hezar ziman, di navbera xwe de gelekî ne-wekhev in. Weke mînak, zimanê Îngilîsî. Wek ku hûn dizanin ev ziman li ser dinyayê ji aliyê çar sed milyon mirovan tê axaftin, û ev bi taybetî di warên ilm, teknoloji, aborî, edebiyat û bi piranî jî wek zimanê çandê tê bi kar anîn. Ji aliyekî dî jî gelek ziman hene ku nivîsa wan nîn e. Ev zimanên hanê kû gelek kêmkê kes pê diaxive, pêvajoyên xwe yên mirinê dijîn. Wesa tê texmînkirin kû heta dawîya sedsala 21ê nivê wan zimanan wê ji holê rabin. Dibe ku ew ziman ji aliyê 20 kesan, an 100 kesan an jî 100 000 kesan tene axaftin. Ev zimanên hanê li ber mirinê ne. Ne-wekheviya navbera zimanan de, ne tenê di navbera zimanên biçûk û mezin de heye. Ne-wekhevî di navbera zimanên herî mezin de jî heye. Weke mînak, Fransîzî heta dawîya sedsala 19 û 20an jî zimanê diplomasiya serdest bû. Lê di nav sedsala 20ê de li hemberî Îngilîsiyê, Fransîzî gelek paş ket.

Aniha, em bizîvirin Tirkîyeyê, û ne-wekheviyên navbera zimanên di Tirkîyê de. Gelek ji we

seyahatnameya Evlîya Çelebî ya ku 300-400 sal berî hatiye nivîsandin, dizanin. Evlîya Çelebî, ji herêma Balkanan heta Kurdistanê geriyaye û çend mehan jî li Bedlîsê maye . Di van deman de, Bitlîs bajerekê xwedî 25 000 mirovan bû û paytexta eyaleta Bedlîsê bû. Di qonaxa mîrê Bitlîsê de pirtûkxaneyekê zor dewlemend hebû. Di nav vê pirtûkxaneyê de bi taybetî pirtûkên destnivîsî û yên li Ewropayê hatine berhevkirin hebûn. Bi saya Seyahatnameya Evlîya Çelebî, em dibînin ku li Bedlîs, Amed û bajarekê din ku wî ziyaret kiribû, mirovan bi gelek zimanan dinivîsand û diaxaft. Weke mînak, helbestên mîrê Bedlîsê yên ku bi kurdî, tirkî, erebî û farisî nivîsandine hene. Di navbera wan zimanan de ne-wekvehiyek tune ye. Wî bi hêsanî ew her çar ziman jî bi kar anîne. Ev, ji wî re rewşeke normal bû. Bi rastî ne tenê mîrê Bedlîsê, lê mirovên dî yên derdora qonaxê û yên xwendin nivîsandin dizanîn jî wiha bûn.

Ew ziman tev wekhev bûn. Mirovan di nav axaftinên xwe de ev her çar ziman jî dikarîbûn bi kar bînin. Lê ew jî balkêş e ku jinan nedikarî çavkaniyên nivîskî bixwînin. Ev maf ji mêran re hatibû dayîn. Lê em dikarin bêjin di navbera wan zimanan de rêzkirineke aşkera hebû. Ji ber ku ji aliyê çand, edebiyat, ol û hunerê zimanê erebî pêşketî bû. Pişt re farisî û pişt re jî tirkîya Osmanî dihat. Her çend rêzkirineke wiha hebe jî, rewşenbîrên ku xwendî bi wan her sê zimanan diaxaftin. Tu arîşe tune bûn. Ez vê bi taybetî dibêjim, ji ber ku dema em li serdema pêş-modernîzmê dinêrin ku netewperwerî hêdi hêdi belav dibû, rewş qet jî ne wiha bû.

Heke em li zimanê kurdî binêrin, hindî ku ez dizanim şeweya nivîskî ya ewil a kurdiyê pênc sed sal berê niha hatiye dîtin ku wê demê erebî, farisî û tirkîya Osmanî serdest bûn. Dema helbestvanên wê demê Melayê Cizîrî û Ehmedê Xanî, helbestên xwe bi kurdî dinivîsandin tu sultanên Osmanî nedigot 'hûn çima bi wî zimanî dinivîsin? Hûn nikarin bi wî zimanî binivîsin.' Ew azad bûn. Bi rastî jî bi wî awayî, wan zimanê xwe pêş ve bir û gencîneyeke edebî afirandin.

Em niha bêne serdema nûjen. Li vir, sala 1876 an pir girîng e. Ji ber ku ev sala reforman e. Bi qanûna yekemîn re tirkîya Osmanî bû zimanê fermî yê dewleta Osmanî. Hûn jî dizanin piştî wan salan, Tanzimat, Tevgera Reformê ya 1908an, şoreşa Jon Tirk an û li dawiyê jî avakirina Komara Tirkîyeyê hat. Fermîkirin û yekkirina ziman, dibû serdestiya tirkîya osmanî di hemî waran de. Tenê bikaranîna wî zimanî di dibistan, dadgeh, nexweşxane û hemî saziyan de dihate tesdîkkirin (pesnîkirin). Li serdema pêş-modernîzmê-ew dem digihe sala 1870an-qedexekirin an sînorkirina tu zimanan nayê

pêş çavan. Ji bilî zimanê fermî tu zimanên dî nayên qebulkirin. Sala 1923an, di avakirina Komara Tirkîyeyê de, bi pêşketina bîrdoziya netewperestiyê ve Tirkî, wek yekane zimanê neteweyî hate qebulkirin. Feraseta yek ziman, yek millet û yek çand di hate çespandin. Ev rewş dibû ku bi rêya tirkîyê kurdî bête kuştin.

Em heman diyardeyê (phenomen), li Îranê jî dibînin. Dema Şah Riza de, farsî wek zimanê fermî hate çespandin. Di encama wiya de jî, zimanên weke Tirkî, Tirkîya Azerîyan, Kurdî, Bellucî, Turkemenî ku li ser axa Îranê di hatin axaftin bi tepeserkirinên qestî re rû bi rû man. Em dikarin ji qanûnan fam bikin ka ev e li Tirkîyeyê çawa hatiye peyitandin. Gelek qanûn hene ku bikaranîna kurdîyê qedexe dikin. Li gel malan, bikaranîna kurdîyê di mekanên umûmî, radyo, televizyon, kitab, her cure materyalên nivîskî de û ji bilî wan axaftina bi wî zimanê gelemperî hatiye qedexekirin. Em di warê linguistikê (zimannasî) de ji wê rewşê re zimankujî, an jî tevkujiya linguistikî dibêjin.

Dem a em behsa zimankujî dikin, em behsa siyaseteke zimankujîyê dikin. Hin dewlet, bi qestî wan siyasetan bi amûrên hukukî û kargerî/îdarî dimeşînin ku zimanek ji holê rabe. Di wan siyasetan de, ev ziman her tim kêmtê dîtin, qedexekirin û axaftina vê dibe sûc û bi serde jî dibejin ew ne zimanek e; lê zaravayek e. Bi gotineke din, li vir pîrsgîrêka zimên di heman demê de pîrsgîrêka wekhevî, mafên mirovatî û edaletê ye jî. Ji ber ku, dema hûn serdestiya zimanekê ji bo kuştin û tepeserkirina zimanekê dî bikin, hûn mafên mirovên ku bi wî zimanî diaxifin jî binpê dikin.

Li Tirkîyeyê, tekoşîna ji bo vî zimanî bi taybetî ji sala 1960'an heta niha tê meşandin. Weke mînak, dema Mehmet Emin Bozarslan di sala 1960'an de alfabekek ji bo zarokên biçûk nivîsand, karê wî bi şidet hate astengkirin, û divêt bête bîra me ku li hember vê neheqiyê resistansek jî çêbibû. Lê em dibînin ku ew rewşa neheqiyê îro ne wiha ye. Min bi xwe vêya dît. Ez ev hefteya berê ji bo "Rojên Edebiyatê" li Amedê bûm. Di van rojên hanê de gelek civînên li ser polîtîkayên zimanê Kurdî û pîrsgîrêkên wê hatine dar xistin. Gelek rewşenbîr û akademisyen ji Ermenistan, Îran, Sûriye, Ezerbeycan, Iraq, Ewropa û bakûrê Emrikayê hatibûn. Di van rojan de broşûrekê Şaredariya Amedê kevtê destê min ku tê de, şaredariyê behsa girîniya pakîjbûna bajarê dikir. Li ser vê broşûrê, "Diyarbakir mala min e" hatibû nivîsîn. Di beşên dî yên broşûrê de Tirkî, Kurmancî û Zazakî/ Dimilkî hatibû bikaranîn. Bi fikra min, di nav dewletekê ku zimankujî tê de bi demekê direj bûye siyaseta fermî, ev bi rastî jî pêşketineke zor girîng e. Vêya jî, di rêya demokrasiya civak û siyaseta Tirkîyeyê de gavakê mezin e. Ez bawerim ku ev serfirazî him bi saya tekoşîna Tirkan him jî bi ya Kurdan, Mehmet

Emin Bozarslan, Yaşar Kemal û İsmail Beşikçi ku demeke dirêj li ber vê zimankujiyê tê koşiyar hate bidestxistin.

Helbet ev tekoşîn hêj bidawî nebû ye. Ev jî bi wê dîtinê re hevaheng e ku dibêje 'demokrasi tu caran temam nabe'. Tê iddiakirin ku modernîte projeyek e ku tu caran nehatiye temamkirin; ez jî dibejim ku demokrasî projeyek e ku tu caran nehatiye temamkirin. Divê Kurd di vê pêvajoyê de jî weke berê tekoşîna xwe bidomînin. Ji ber ku, ev tiştên ku wan heta niha kirî bi rastî jî zor derasayî (awarte) ne. Divê ev yêk wekî serfirazyekê bête binavkirin.

Pêwîst e ku hewlên Kurdan ên piralî yên ji bo derbirîn, pêşxistin û belavkirina ziman û çanda xwe, di demeke ku ewqas di bin zextan de bûn, baş bêne nirxandin. Kurdan tekoşîna xwe di nav şert û mercên nebaş (pêkutî) de bi rojname, radyo, pirtûk, alfabe û televizyonan de domand. Û di nav siyaseteke ziman a wiha de serfiraziyeke girîng bi dest xist û heta rê û rêzik jî danîn. Kurdan nîşan da ku, hêj siyaseta fermî ya dewletê ev e qebul nekirî, ew dikarin çî bikin. Divê ev e bête dîtin û ber bi wî alî ve pêş ve biçin.

Em dibînin ku merhaleyeke girîng a vê tekoşînê di sala 1991an de pêk hatiye. Wan rojan de hikûmeta Ozal bi zagonan destûr da ku kurdî hin cihan û hin rewşan de bête bikaranîn. Bi van zagonan, kurdî hedî hedî ji statûya sûcdariyê xelas bû. Ew tekoşîn, 2 sal berî bi guhartinên zagonî yên ji bo Yekitiya Ewropê hatiye derxistin heta niha didome. Helbet ev reformên nû ne bêqusur in (rêk û pêk) in. Lê em dibînin ku bi van ve ji bo pêşerojê gavên gelek girîng têne avêtin. Heke ev gavên hanê bidomin, li Tirkîyeyê dê siyaseta zimankujiyê xelas be û çarçoveyeke toleransê de ji bo kurdîyê bi cî bibe. Di rewşekê wiha de kurdî nikare bibe zimanekê fermî lê belê dê bigihe statuyeke baş. Weke mînak, kurdî, niha di dibistanên fermî de nayê fêrkirin. Em nikarin bêjin ku li ser televizyon û radyoyan de jî têra xwe belave ye. Ev tenê pirsgirekên fermî ne; lê vê zêdetir jî he ye. Ji ber 80 salên bindestiyê gelek Kurd niha nikarin bi zimanê xwe binîvîsin û bixwînin. Weke mînak, niha hin pirtûk, rojname û kovarên hefteyî bi kurdî têne weşandin; lê gelek Kurd hene ku dikarin bi zimanê xwe biaxivin lê nikarin van weşanan bixwînin. Li vir de pirsgireka bingehîn ne ew e ku gelek zaravayên kurdîyê hene; wek ku tê

zanîn li Tirkîyeyê bi du zaravayên kurdî tê axaftin; Kurmancî û Zazakî. Lê pirsgireka bingehîn ev e ku Kurd heta niha tu caran bi zimanê xwe nehatine perwerdekirin.

Ev rewş ji bo her çi zimanekê wiha ye. Heke hûn zimanekê di dibistan, zanîngeh an jî lêkolînan de bikarînin, hûn nikarin mijarên entellektuelî bi vî zimanî derbibirin. Ez bi xwe him li vir, li Tirkîyeyê, him jî li Ewropayê ev tiştî dibînim. Kurdên Tirkîyeyê dema tî rex min bi kurdî diaxivin. Lê dema ez radibim ew dîsa dest bi tirkî dikin. Çima? Ji ber ku, kurmanciya wan ev e ku wan tenê malên xwe de bikarîne û kurmanciyeke dorteng e. Ji ber vê qasê ew nikarin xwe bi rehetî îfade bikin. Lê em Kurdên Iraqê binerin, rewşa wan qet ne wiha ye. Ew dikarin bi hev re li ser siyaseta, civaknasî û edebiyatê biaxivin. Siyaseta fermî ya dewleta Tirkîyeyê kurdî biçûk xistiye. Vê siyaseta gotiye ku Kurdî bi rastî ne zimanek e. Ev devokekê gundiyan e û bi peyvên farsî, erebî û tirkî pêk hatiye.

Di van demên dawî de, hin siyaseta-medarên Tirkîyeyê behsa bicihkirina modela Fransayê dikin. Ger em li vê modelê binêrin; zimanê fermî fransîzî ye û zimanên dî wek rotonî (bretonî) an jî baskî jî azad in. Tu pêkutî(zext) li ser van zimanan tune ye. Ji ber vê qasê, dema ev siyaseta-medarên Tirkîyeyê behsa modela Fransayê dikin ev dibêjin ku divê zimanê fermî disa tirkî be, lê zimanên dî jî azad bin. Wateya vê çi ye? Kurdên Tirkîyeyê dikarin çap û weşanên xwe bê pêkutî bikin û bi kar bînin. Lê divê em bizanin ku ev bi kêr tu tiştî nayê. Ez dibêjim ar-manca vê siyaseta ew e ku bi usûlekê demokratîk kurdî bi xwe bi xwe bimire.

Siyasetên dewlet û hikûmetên berê, rêya zimankujiyê hîlbijartibûn, lê êdî ev siyaseta xelas dibe. Niha ziman dikeve destên televîzyon, sînema û çanda popûler. Dibêjin kurdî di van endustriyan de azad e. Ji vê re jî dibêjin pirçandî û pirzimanî.

Em dibînin ku îro, di hefteyekê de du ziman dimirin. Sedema mirina van zimanan ev e ku ev ziman jî aliyên televîzyon, sînema û çanda popûler nayêne bikarînin û ji ber vê jî zarok û ciwanên van gelan zimanên xwe di nav xwe de naaxivin û li zimanên xwe xwedan nabin. Di nav cengeleke wiha de- ku hun dizanin li cengelê de tenê yê xurt/biqewet dikarin xwe bidomînin- divê ev ziman (kurdî jî di nav wan de ye) bêne parastin. Ji ber vê hindê, tenê destûra axaftinê ne bes e. Divê ev ziman wek zimanên perwerdehiyê, hiqûqê, teknolojiyê û aboriyê bêne bikarînin ku ev ziman bikarin bijîn û pêş ve biçin.

Zarokekê Kurd çawa dikare zimanê xwe pêş ve bibe? Tenê yek kanalê televîzyon heye ku bi kurdî tê

weşanê dike. Li gora ez dizanim nezîkê 200 kanalên tirkî hene. Ev zarok dikarin bi tirkî her cur kanalan temaşe bikin, lê ne bi kurdî. Di rewşeke wiha de bivê nevê zarok di bin bandora vî zimanî de dimînin ku ew ziman li ser zimanê wî(zarokî) serdest e. Ev rewş ne tenê bi televizyonan sînorkirî ye. Di hemî radyoyan, taybetî jî filîm û leyîstokên komputeran de zimanên cuda cuda tên bikaranîn. Lewma ew zarok naxwazin zimanê ku li malê tê axaftin bi kar binin. Ev jî di demekê qurt de rêya mirinê ji bo wî zimanî amade dike. Ne mimkun e ku zimanêke wiha pêş ve biçê. Helbet guhertinên zagonan û reformên di vê riyê de heta niha hatine pêkanîn gelek watedar in. Divê ev pêvajoyên bête domandin. Lê bi pejiwandina modela Fransayê, ku jê re dibejin pirçandîtî û pirzimanî, dê kurdî hedî hedî bimire. Ez nabejim pirçandîtî kêra tu tiştî nayê. Bi rastî, li ber siyaseta berê ya "yek ziman û yek çand" ev gelek giring e jî. Ev gavekê gelek rast e, lê ne bes e. Ji xwe bi esasî bêfaydebûna pirçandîtî û pirzimanîyê ji ne-wekheviya ziman û çandan peyda dibe.

Belam, li ber modela Fransayê modelekê dî tu ye? Heye. Em dikarin modela Kanadayê wek mînakekê bidin. Di vê modelê de du zimanên fermî û 57 zimanên herêmî hene. Ew zimanên herêmî, zimanên wan mirovan in ku hêj Ewropî nehatî vê derê li wir pê dihate axaftin. Ji bilî van gelek zimanên dî jî ji Ewropayê hatine vê derê. Mirovên bi erebî, kurdî, almanî, swedî, tirkî, îtalyanî û hin zimanên dî jî diaxivin hene. Lê tenê inglîzî û fransîzî zimanên fermî ne. Siyaseta pirçandîtiya Kanadayê ji bilî wan du zimanên fermî zimanên dî jî dihundurîne. Wateya vê jî ev e ku bi rastî gelek kêr ji wan 57 zimanan dê heta dawîya sedsala 21an. Belkî tenê heşt ji wan dê bimînin. Ez wesa bawer dikim ku, li Kanadayê, heta dawîya sedsala 21an zimanên weke tirkî, kurdî an jî almanî êdî nema dê bêne axaftin. Ez tenê behsa modelekê nakim, ez behsa siyaseta hikûmeta Kanadayê jî dikim. Di nav gelheya Kanadayê ya 33 milyonan, 8 milyon mirov fransîzî diaxivin. Zora ku li Tirkiyeyê hatiye serê kurdiyê, li Kanadayê nehatiye serê fransîziyê... Lê divê em vê jî bibînin ku li ber inglîzî, fransîzî di statuyêke wekhev de nebû. Her çiqas fransîzî zimanêke perwerdehiyê bû ku di dibistan, zanîngeh û weşangeriya giştî de dihate bi kar anîn, dîsa jî bi inglîziyê re wekhev nebû. Inglîzî zimanê serdest e. Ji ber vê hindê, ji bo ku fransîzî wek yek ji zimanên fermî yê dewletê bigihe statuya inglîziyê, Hikûmeta Federal a Kanadayê politikayêke pêşxistina fransîziyê danî. Heke malek bivê zarokên wan bi fransîzî bêne perwerdekirin, hikûmet hemî rêyan bikartîne û perwerdehiyê fransîzî ji bo wan amade dike. Zarok jî ji kreşê (zarokxane) heta zanîngehê bi fransîzî tên te perwerdekirin. Li parlamentoya Kanadayê her du ziman jî tên axaftin. Parlamenterek dikare bi fransîzî û yekî/e dî jî bi inglîzî biaxive. Dîsa weke mînak, keybanûya Britanyayê fransîziyê gelek baş diaxive û dema tê Kanadayê bi her du zimanan jî

diaxive. Modelekê wiha hem demokratiktir e hem jî mirov dikare vê modelê li Tirkîyeyê tetbîq bike. Ger modelekê wiha li Tirkîyeyê heba Leyla Zana demekê dirêj li girtîgehê de nedima. Divê di parlamentoya Tirkîyeyê de hem tirkî hem jî kurdî bête axaftin. Divê mirov ji wiya netirse. Ev tiştêkê zor baş e.

Kanada dewleteke federal e. Lê di dewletekê yekgirtî de jî ev model pekan e. Baweriya min ew e ku dewletekê federal li kemperî dewletekê yekgirtî de demokratiktir e. Lê di dewletekê yekgirtî de jî çareseriyên ku mirov bikare pêk bîne hene. Tenê bila rêyên diyalog û niqaşan bête danîn û reform bidomin. Di encama wiya de jî kurdî dê ji statûya zimanekê sûcdar bigehe statûya zimanekê fermî.

Di zimanzaniyê de tiştêk heye ku jê re plansaziya zimên têtê gotin. Bi pilansaziya zimên mirov dikare statûya zimanekê diyar bike. Weke mînak, berê li gor siyaseta fermî ya Tirkîyeyê, kurdî zimanekê sûcdar bû, lê niha ev zimanek e ku têtê nasîn. Lewma, statûyek, payeyek bi dest xistiye. Pilansaziyekê dî jî pilansaziya qestî ye (purpose planning). Ev plansazî jî, ji bo pêşvebirina bastûrên (hêmanên) bingehîn ên zimanekê ne. Li gor vê pilansaziyê, karên wek nivîsandina pirtûkên rêzimanî, amadekirina ferhengên, pêkanîna alfabeyan û metodên ferkirina wî zimanî têtê afirandin. Vê gavê ev plansazî ji bo Kurdan ne mimkin e; lê divê derhal bête çêkirin.

Weke encam, ev statûya kurdîyê ya heta niha hatiye bidestxistin bi saya tekoşîna Kurdan û Tirkan a bi hev re ye. Rast e, dibe ku pêvajoya Yekitiya Ewropayê jî lezek dabe vê tekoşînê; lê heke ne bi saya vê tekoşînê bûya, statûya (rewş) îro nedihate bidestxistin. Ev rewş jî dike ku mirov bextewar bibe.

**(1) Ev deq, nivîsara axaftina Emîr Hassanpourî ye ku li Zanîngeha Bogazîçiyê di panela Mafên Ziman de pêşkeş kiribû.*

Werger: Şerif Derince

Destpêkek bo Çarçoveyên Teorîk ên Parastin û Guherîna Zimên û Hin Împlikasyonên Wan li ser Rewşa Zimanê Kurdî

PARASTIN Û GUHERÎNA ZIMANÎ

Ergîn Opengîn

1. Destpêk

Wekî ku li her kesî ve eyan e zimanê kurdî ligel Îran û Sûriyeyê li Tirkîyê jî bêpar e ji her cure piştgirî û handanê. Berevajî, wan dewletan, heta radeyekê Iraq jî tê de, carinan bi dizî û kirî be jî, gelekî bi plan û stratejî tim doza lawazkirina zimanê kurdî û guhartina zimanê kurdan a ser zimanên xwe ve, kiriye. Rewş û dînamîkên parçeyên din ji ber egera pratîk a spesîfîkbûnê li derveyî mijara vê gotarê, li Tirkîyeyê hêzên kurdan ên polîtîk ên serdest û kom û şexsên rewşenbîr tim bi vê diyardeyê (fenomen) hesiyayî bûne, lê heta wan salên dawî ku êdî polîtîkayên dewletê yên piştaftinê ên rapêçer, û bêtevdîriya kurdan, encamên xwe yên xweristî û jênager raxistine mexderê û her wiha di polîtîkayên hêzên serdest ên kurdan de gelek guherîn pêk hatin, meyl û girîngiyeke pir zêde li ser mijara rewşa zimên û axêverên zimên berhev bû ku êdî ji sînoren propagandayêke xwe bi xwe û acizker ava bûye, û bûye benîştê devê her kesê ku dixwaze bi xwe û binivîse. Piraniya argûmanên hêzên kurdan ên serdest êdî li ser zimên in û her wiha di nava gel bi xwe de jî kêr zêde dikare behsa hişyariyêke ji wî layî ve bê kirin. Lê belê, ligel ew hind nîqaş û girîngiya li ser zimên, belawelayî û bêplaniyêke aşkera heye di nava tevger û aktîvîzma zimanê kurdî de. Bi ya me konferansa 'Parastin û Perwerdehiya Zimên' a ku di 18-19'ê meha sermawezê de li Amedê hate lidarxistin jî, nekarî perspektîf û formûlasyonên nûjen û zanistî û pratîk pêşkêş bike; encamnameya konferansê dîsa zêde jî ji bang û bangewaziyên her çî sazî an jî rêxistineke polîtîk wêdetir neçû. Gelek kes meseleyê wekî 'çî bê kirin jî ji çineyîyê çêtir e' dinirxîne lê wekî ku Crystal (2000) diyar dike, helwesteke wiha ji xêrê zêdetir zerarê digehîne zimên ku ew çend wext e ev rastî ji aliyê çend weşangerên kurd ên şareza ve jî hatiye piştrastkirin. Ji bilî çend gotarên nisbet bi yên din birêkûpêktir çî plan û pêşniyar nayên kirin ku bi ya me sebebê wê yekê bêhaybûna giştî ya ji lîteratûra çarçoveyên teorîk ên bi mijarê re eleqedar

û pêşniyar û argûmanên pratîk e. Ji ber heman bêagahiyê ye ku hêj jî pêngava ewil a teswîrkirina rewşa heyî bi daneyên quantîtâtîf (çendanî) nehatiye kirin lewre jî hemû argûman û tespîtên ku têne kirin sûbjektîf in û ji layê zanistî ve bêpalpişt in. Her wiha her çi tevgereke xwedanê armanca sîstematîkî û zanistiyê, divê plansaziya xwe ji analîzên rewşa heyî bide destpêkirin.

Bi vê gotarê em dê hewl bidin ku ji têgeha bingehîn a 'xetereya bo zimanekî' (language endangerment) û sîmptomên wê yên sereke dest pê bikin û argûmanên layengiriya parastina zimên bi çend paragrafan pêşkeş bikin û paşî çend çarçoveyên teorîk bi kurtî rave bikin û rewşa kurdî bi yek ji wan çarçoveyên teorîk, Jîndariya Etnolînguîstîk a Giles (1977) ku di 1977'an de weşand, analîz bikin. Ji bo bercestekirina analîz û raveyan em dê li cihînan daneyên lêkolîneke hêj nehatî sepandin bidin. Bi vê gotarê hêviya me ew e ku em xizmetê lipeydakirina "bersiveke zanistî, sîstematîk, fêambar û dikare pêk were" (Çîçek 2006) bikin ji bo pirsra 'divê em çi bikin'. Danîna rênexşeyê şênber li derveyî çepera vê xebatê ye.

2. Xetereya bo zimên

"Nîşaneyên lawazbûna zimên (language decline): Zimanekî ku lawaz dibe, çepera erdê wê teng dibe û axêverên wê yên yekzimanî (monolingual) her ku diçe kêmtir dibin. Kesên ku pê diaxivin dibin duzimanî (bilingual) lewre bi pêwîstiya fêrbûna zimanê serdest (dominant, fireh) dihesin. Ew gelheya duzimanî jî her ku diçe zêdetir pîr dibe. Zimanê serdest têdikeve nav her zêdetir 'qadên jiyane' û her wiha her ku diçe xwe li ser zêdetir 'fonksiyonên zimên' ferz dike. Zimanê bindest (dominated language) her kêmtir tê bikaranîn û nihayet bi şiklê 'zimanê malê' dikeve nav xetereyê. Tê heye diglosia 2 (diglossia, du-glotî), bo demekê hukmî bike bi şiklê ku her zimanekî qadên xwe yên bikaranînê hebin, lê belê bes heke ew rewşa diglosyayê sabît nebe, zimanê serdest dê dewamê li meşa (pêşketin) xwe bike." (Wardhaugh 2002: 19) 3

Berî ku em bikevin nav kîtekîten mijarê çêtir e ku em der barê xetereya bo zimên de bibin xwedan

agahî û feraset da ku bi awayekî tîtîz û birêkûpêktir boçûnan bi pêş bixin. Lewre ev beş dê li dûv bersivên wan pirsan be: ‘Dixetereyêdebûna zimên (language endangerment) çi ye?’, ‘Mirov çawa dikare tê bigihe ku zimanek di xetereyê de ye?’, ‘Ast û merhaleyên xetere û metirsiyê çi ne?’, ‘Sîmptomên sereke yê xetereya bo zimên çi ne?’

Dema behsa xetereya bo zimên tê kirin, mirov bi rihetî dikare çend fikrên gelemperî derpêş bike wekî, axêverên zimên kêr dibin û fonksiyonên wî zimanî kêr dibin û hwd. Lê belê li gorî David Crystalî (2000) tiştê zehmet diyarkirina sînorên xetereyê ye; gelo piştî çend axêveran êdî behsa xetereyê ji holê radibe? Zimanekî ku bes 100 axêver lê mabin teqez di xetereyê de ye lê Brenzinger (1998:93) zimanê Yoruba ku gelheyeke 20 milyon mirovî pê dipeyive jî dixê nav zimanên di xetereyê de ji ber serdestiya Îngiliziyê di perwerdeya bilind de. Ji ber vê hindê, mirov nikare asta xetereyê rasterast hejmara axêveran ve girêde, lewre pê gelek faktorên din e ew mijar, bo nimûne, ‘rêjeya fêrbûna zarokan a wî zimanî, helwesta gelî ya li hemberî zimanê xwe, bandora zimanên din ên ku zerere didin wî zimanî’ û hwd. Dîsa jî danasîna Kincadeî (1991:160-3) gelek tiştan lê zelal dike ku wiha dibêje: “Zimanekî di xetereyê de ew ziman e ku têra jiyînê axêver lê hene lê belê ji bo ku bijî pêdivî bi şert û mercên guncan û piştgiriya civakî heye”.

Bi awayekî gelemperî ziman wekî zimanên ewle, di xetereyê de û wînda têne dabeşkirin (kategorîzekirin) ku Micheal Krauss (1992:4) nosyona ‘moribund’ê lê zêde dike ku ew zimanên moribund êdî wekî zimanên zikmakî nayên fêrkirin li zarokan (Crystal 2000). Yanî di wan zimanan de veguhestina navnifşî (intergenerational transfer) ji beyn (navê) çûye. Senifandina Wurmî (1998:192) hindekî cudatir e ji yê din ji ber ku bi tenê ji bo zimanên lawaz hatiye duristkirin ku bi ya me pêşkeşkirina wê girîng e.

Zimanên bi potansiyela xetereyê: Ew ziman ji layê civakî û aborî ve bi dezavantaj in û di bin pêkutiyên dijwar ên zimanekî firehtir de ne û her wiha zarokên ku wan zimanan wekî makeziman fêr dibin hêdî hêdî kêr dibin.

Zimanên di xetereyê de (ji niha pê de ZX): Kêr an jî tu zarokên ku wan zimanan fêr dibin nîn in, axêverên herî temenbiçûk ên bi wî zimanê dizanin, ciwan in.

Zimanên di xetereya dijwar de: axêverên herî temenbiçûk ên wî zimanî dor 50 an jî zêdetir salî ne.

Zimanên ‘morîbund’: Bi tenê çend axêverên baş lê mane ku ew jî bi piranî pîr in.

Zimanên qeliyayî: Tu axêverên wan nemane.

Ev senifandin helbet ji bo têgihîştineke berfirehtir pêwîst e, lê belê bi ya me bi tena serê xwe têr nake ku mirov zimanan bi awayekî têkûz bixe nav wan pênaseyan. Lewre em dê niha semptom û taybetiyên xetereya bo zimanan û zimanên di xetereyê de rêz bikin. James Crawford (1996) di gotara xwe ya ku tê de ji bo sebeb û çareseriyên windabûna zimanan heft hîpotezan pêşkêş dike de, wekî sîmptomên ZX wan xalan destnîşan dike:

- Hejmara axêverên ZX dadikeve;

- Kesên salmezin dikarin bi awayekî rewan biaxivin, ne yên ciwan, ji ber ku ciwan zimanekî dîtir tercîh dikin (bi piranî zimanê civaka serdest);

- Bikaranîna zimên a di ‘qadên jiyânê’ ên ku caran (berê) ewle bûn, kêr dibe. Bo nimûne, li dêr, helkeftên çandî, dibistan, û ji hemûyan girîngtir li malê;

- Hejmareke her zêdetir ê dayikbavan nikarin zimanê xwe fêrî zarokên xwe bikin. Ligel çar xalên li jor mirov dikare wan sîmptomên hanê jî wekî nîşaneyên ZX bihesibîne: ji layê lînguîstîkî ve fonksiyonên zimên kêmtir dibin heta ku hindê ji wan fonksiyon namînin û hindê din jî bi zimanekî dîtir tene bicihanîn; di struktura zimên de gelek guherînên neyînî pêk tên bo nimûne gelek rewşên têkhelebûna kodan (code-mixing) tên dîtin. Di wan têkhelebûna kodan de piranî taybetiyên zimanê di kontaktê de (contact language) tevli zimên dibin û çawanî û bikaranîna zimên qels dikin. Her kes wan cure axaftinan dibihîze li derdora xwe ku tê de lêkerên bi formên tirkî hatine kişandin û peyvên fonksiyonan wekî yalniz, sadece, daha xweş û hwd. pîr in. Pîrbûna peyvên fonksiyonan⁴ bi xwe, di struktura zimên de xetereyêke têra xwe mezin e lê bi ya me êdî di kurdî de diyardeyên di lîteratura zimannasiyê pîr kêr qewimî pêk tên. Bo nimûne, Odlin (1989: 82) diyar dike ku transfera morfemên bestî/girêdayî 5 (bound morphemes) pîr zehmet e û peydabûna wan a di zimanan de tiştêkî awarte ye. Lê bihîstina hevokên wekî ‘mêze eger hatibise bêje min’ qet ne zehmet e di kurdî de, her wiha dîsa morfema bestî ya bi tirkî ‘miş (bi qewlê kurdan ‘mîş’)’ bûye alîkarê herî

mezin ê piraniya kurdîaxêvên li Tirkiyeyê. ‘-se’ û ‘-miş’ her du jî morfemên bestî ne û têkelbûna wan a bo zimanekî din ne tiştêkî asayî ye lê xuya ye ku ‘rewşa kontakta zimanan’ a tirkî-kurdî gelek zerarên bingehîn dane kurdî ku ew morfem û hêj gelekên din êdî bûne malê kurdî.

Ji bo tespît û têgihîştina sîmptomên di halê hazir ê zimên de heyî tecrûbeyên her kesekî helbet mimkûn dike ku gelek fikr û boçûn bîn bipêşxistin lê ji bo sepandin û analîzkirineke t êkûz a wan xalên der barê ZX de divê daneyên statîstîkî hebin ku fikr û encamên ku em ji rewşa heyî derdixin ji s ûbjektîfîyê derkevin. Nexwe her kesek ji me dikare bes ji çavdêriyên xwe yê li derdora xwe bidêre ku ew her çar xalên li jor destnîşankirî û dirêjahiya nîqaşa sîmptomên xetereyê, di nava kurdan de meyleke qewî ye. Ji ber vê hindê di vê beşê de bes ji bo têgihîştineke baştir em ê wekî mînak kurteanalîzeke encamên çend anketan pêşkêş bikin da ku bi acîlî û ferz bûna lêkolînên zanistîî spesîfik bêtir diyar bibe.

Di tabloya li jêr de bikaranîna zimên a li gorî kesê/a ku pê re tê axaftin (interlocutor) hatiye pirsîn. Ew tekilî kêm zêde di jiyana her kesî de hene, lewre di wan t êkiliyan de tercîhên li ser bikaranîna zimanê axaftinê, zimanê serdest ê da-nûstandinên mirovî jî heta radeyeke bilind pêş dibînin.

Axivger	Temen	Zayend	Ligel xwîsk û birayên	Ligel xizman	Ligel derbarvan	Ligel hevalên nezik	Ligel zanokan	Ligel Karmendên dewletê
A	54	M	K	K	K	K	K	T
B	40	M	K	K	K	KT	T	T
C	28	J	K	KT	K	KT	KT	T
D	18	J	T	KT	KT	K		T
F	12	M		K	KT	K		T
E	9	M	T	T	T	T		T
G	7	M	T	T	T	T		T

Tablo.1⁶

Wekî ku mînakên di tabloyê de diyar dikin ku li gorî temen bikaranîna zimên diguhere. Tekane têkiliya ku sabît maye 'ligel karmendên dewletê' ye, di yên din de di rexê kurdî de guherîneke zimên heye ber bi tirkî ve her ku temenê beşdarî biçûktir dibe. Heke têkiliya statîk nehesibînin di hemû cure têkiliyên din de ji bo kesên salmezînan zimanê kurdî zimanê serdest e, di temenê navsere de bi qasî hev e bikaranîna her du zimanan û ji bo her du zarokên dawî tu cihê kurdiyê nemaye êdî.

Windabûna zimên (language loss) zêdetir bi wateya windabûna zimanekî ji bo kes an komekê tê bikaranîn. Dema ku ziman li seranserê welatê xwe winda dibe û tu kesê ku pê biaxive nemîne, hingî ew dibe 'mirina zimên' (language death). Li gorî wan pênaseyan mirov dikare tê derxe ku windabûna zimanekî li nav civakê, ji bo wê civakê mirina wî zimanî ye. Lê belê, bo nimûne em li rewşa kurdî bi gelemperî bifikirin, her çend mirov bikare behsa mirineke di çarçoveya zimanê şexs û koman de bike jî mirov nikare wê tespîtê ji bo zimanê kurdî bi giştî bike, lewre li vir nebe jî li başûrê Kurdistanê zimanê kurdî jîndar e û tu behsa mirina wî li wir nîn e. Ji ber vê hindê terma mirina zimên ku gelek kes ji bo kurdî bi kar tînin, wisa diyar e ku ne durist e. Niha heke em piştî vê kurtenixandina terman dîsa li tabloya xwe binêrin, em dibînin ku meyleke guherîna zimên heye bi ser tirkî ve. Veguheştina zimên a navnîfîşî qut bûye û ji bo kesan halê windabûna zimên xuya ye, lê tu împlikasyonên mirina zimanê kurdî jê nayên derxistin.

Di heman lêkolînê de, ji bo pirsên der barê bikaranîna zimên a di qadên jiyane de encamên ligel yên tabloya jorîn paralel, hatine bidestxistin. Bi qasî ku temenê beşdarî mezin be, rêjeya giştî ya axaftina di qadên jiyane yê wekî navmal, tax, sûk, lîstîk, kar, dibistan, dawet, serdanên cejn û xizman, cenaze, daireyên dewletê (wekî nexweşxane, şaredarî, walîtî), medya, çapemenî, weşan de jî bilind bû û bi daketina temen re rêjeya bikaranîna zimên a di wan waran de jî diket. Ev encam helbet ne diyarker in ji bo rewşa kurdî, lê belê ji bo teswîrkirina xwezaya xetereya bo zimên daneyên girîng in ku ew derbirîna Mari Rhydwenî (1998) jî bi heman awayî balê dikêşe ser faktora takekesî û guherîna reftarên jiyane di windabûna zimên de:

“Windabûna zimên ne windabûna têgehekê ye, lê bêtir ew tişt e ku dema mirov tevgerên xwe

diguhêrin û zimanê xwe venaguhêze zarokên xwe, pêk tê. Bi tevahî mirovan re girêdayî ye û nabe wekî pirsgirêkeke entellektuelfî mudaxale lê bê kirin bo çareserkirinê.”

3. Çima em zimanê xwe biparêzin?

“Ez fêrî zimanê xwe nehatibûm kirin. Dayika min dibêje ku bavê min nexwestiye em fêr bibin, ji ber ku di dibistanê de wî dîtibû ka hevtemenên wî çiqas zehmetî kêşaye ji ber ku ew ewil fêrî Hualapî bûbûn û zimanê dibistanê bi tevahî îngilîzî bû. Lewre jî ez û birayê xwe nehatibûn fêrkirin. Ez xwe temam hîs nakim... Carinan xwe ji hevtemenên xwe dût hîs dikim, ji wan ên ku di temenê min de ne û bi zimanê min diaxivin û dizanin ku ez bi zimanê xwe nizanim. Ku li nasnameya xwe germ bûm û bi kêmasiyên xwe hesiyam, ez ji zarokên îro re dibêjim ku heke hûn bi zimanê xwe nezanin hûn ê jî wekî min hîs bikin.” Ciwanekî Hualapanî (Amerîka), (di nav. Hornberger 1996: 101).⁷

Em çima zimanê xwe biparêzin? Ev pirs, di çavpêketina ewil de wekî pirseke gelekî hêsan û asayî tê hizra mirov, lê belê di rastiya xwe de yek ji mîhengên her tevger û liveke bo parastina zimên e bersiveke birûkûpêk û qanihker a vê pirsê. Lewre em gelek caran nas û xizmên xwe dibînin ku bi tirkîyeke pir şkestî û lawaz diaxivin lê belê heman kes li xwe danaynin zimanê xwe fêrî zarokên xwe bikin. Ew helwesta bidûrxistina zarokan ji zimanê xwe, ew qas berbelav e ku di nava kesên xwedan hestyariya neteweyî de jî heta bi dereceyeke mezin tê dîtin. Gelek caran em jî vê yekê bo wan wekî tercîha wan qebûl dikin û xwe xûs dikin, ligel ku dilmayîn jî çêdibe û carinan jî dema ku ligel wan dikevin nîqaşa girîngiya zimên, di destê me de argûmanên xurt nîn in ku pê wan qanih bikin.

Ez bi xwe li Stenbolê şahidê diyalogeke wiha bûm ku vê rewşa heyî pir baş dinimîne: Zilamekî dilxwazê zimanê kurdî dixwaze nasekî xwe teşwîq bike ku zarokê xwe fêrî kurdî bike û wiha pê de diçe: ‘Binêr keko niha bizane sibe dusibe kurê te mezin bû û xwest here Diyarbekirê cem xizmên xwe, hingî ew ê çawa bi zarokên min re biaxive? Ew ê pir nexweş be ji wî re ha.’ Gelekî aşkera ye ku ew argûman sernagire û nasê wî jî qanih nake, ji ber ku zilam jî nasê wî jî dizanin ku wan (zarokên wan) zimanekî

hevpar heye ku pê têtikiliyê daynin û ew jî zimanê serdestan e. Ji ber vê hindê, niha pêde nabe ku argûman li ser hêza zimên a wekî 'tekane navgîna têtikiliyê' be, ji ber ku ne rast e.

Argûmanên wisa divê bêne bipêşxistin ku di rewşa duzimanî de jî tercîhê bixe ser zimanê zikmakî. Ew argûman li layê Crystal (2000) ve wiha têne rêzkirin: pêdiviya bi cudahiyan, ziman wekî nimînerê nasnameyê, ziman wekî bîrên dîrokî, bexşa zimên a bo sercema zanyariyên mirovatiyê. Belê berî her tiştî divê argûmana sereke ew be ku ziman, 'tekane navgîna kifşkirin û peydakirina tiştên mexsûs bi mîrata gelekî' ye (Crystal:2000). Dema em ji yekî/ê re behsa muhafizekirina zimên dikin, divê pê bidin hesandin ku mîrata me ya herî xwerû û xweser e ew. 'Mileteke bê ziman mileteke bê dil e' dibêje pendeke Welsh'an, û Zana Farqînî tiştêkî nêzî wê pendê derdibire û dibêje 'Ziman hestiyê piştê yê neteweyan e'. Dîsa gotineke din digot ku 'her zimanek perestgehek e ku bi ruhên wan kesên ku bi wî zimanî diaxivin neqîşandî ye'. Bi vî rengî hêza zimên a di tayînkirin û peytandina nasnameya gelekî de dikare were bipêşxistin ji ber ku nasname ye ku endamên civakê dide nasîn û taybetiyên 'me' û 'wan' pêk tîne (Crystal 2000). Qîmeta zimên a di bargîriya wî ya dîrokî de dîsa pir girîng e. Yekî ku bi qestî xwe ji zimanê xwe dûr dixê bi awayekî xwe ji dîroka xwe jî dûr dixê, heta xwe jê cuda dike. Dîsa fêrbûna her çend zêde zimanan argû-manêke din e. Lewre kesên ku bi zêde zimanan dizanin di nav hemû civakan de wekî kesên rew-şenbîr û şareza tîna nasîn û her wiha lêkolînên li ser babeta norolînguîstîkê çespandiye ku kesên ku bi du yan zêdetir zimanan mezin dibin an jî piştê fêr dibin, ji aliyê mêjiyî ve xwedan perfor-manseke çêtir in. Jê wêdetir, rewşa kurdî ya stratejîk dikare bibe argûmanêke pragmatîk. Kurdî, her çend cudatîyên zaravayan pîçekî bi arîşe be jî, di nava sînorên çar welatan de xwedan cograf-yayeke fireh e û statûya wî li Başûr her ku diçe baştir dibe. Gelek zanîngehên Başûr bo ciwanên kurdan bûne deriyên alternatîf. Bazirganiya di navbera wan dewletan dîsa faktoreke girîng e. Argûmanên bi vî rengî pragmatîk dikare bêne zêdekirin.

4. Çend çarçoveyên teorîk ên parastin û guherîna zimên

Dibe ku gelek kes ji aliyê xwe ve rêyên çareseriyên daynin ji bo parastin û berîlêgirtina guhe-rîna zimên û tevgerên zimên ên sîstematîk wekî karên beredayî bibînin û bibêjin ku 'heke tu bi zarokên

xwe re bi kurdî biaxivî wa ye zimanê te ji xetereyê xelas bû'. Di nav kurdan de jî kesên ku wiha difikirin hene û di payeyên bilind de ne jî, lê lazim e ji wan bê pirsîn 'gelo mirov heta çi radeyekê azad e di tercîha hilbijartina zimanê têkiliyê de di konteksteke duzimanî an jî pirzimanî de?' 'Dayikek çawa dikare zarokê xwe wisa mezin bike ku zarok nekare bi dapîra xwe (ku dayika dayîkê bi xwe ye) re biaxive?' 'Çawa gundiye ku bi egereke ji egeran berê wî ketiye bajêr û mala xwe li wir daniye, ligel ku jê re wekî îşkenceyê ye jî dixwaze zimanê malê biguherîne ser zimanê serdest?' Pirsên bi wî rengî dikare bêne zêdekirin lê xuya ye ku dînamîkên ne ew qasî basît hene di paşxaneyê wan de.

Der barê wê xalê de, tespîta Bradley (2002:1) fikreke çaktir e bêguman ku dibêje, 'Piraniya sosyolînguîstan (zimanzanên bi aliyê civakî yê zimên ve dilepikin e.o.) diyar dikin ku mi-rina zimên ne ji ber devjêberdanê (devjêberdana bikaranîna zimên e.o.) basît a di navmalê de ye, lê bêtir, ew devjêberdan ji ber guherîna helwesta li hember prestîja zimên e'. Lewre ji bo têgihîştina dînamîk û xwezaya guherîna zimên ku prestîjê jê kêr dibe û bi wê têgihîştinê jî duristkirina tevgerên parastina zimên, pêdivî bi çarçoveyên teorîk heye ku tu tiştî li derve nehêle û dema li ser wan mijaran dest bi kar û xebatan tê kirin, mirov dilrihet be, piştî xwe bispêre formûlasyonên ji tecrûbeyên cihê pêkhatî.

Bi ya me di wê mijarê de tespîteke bikêrhatî jî ya Fishmanî ye (1991) ku dibêje: 'bêyî veguhastina navnifşî, tu parastina zimên ne mimkûn e; her wiha bêyî parastina zimên (qest tevgereke bi hişmendiya parastina zimên e, e.o.) çavkaniya hewlên veguhastina navnifşî tim dê zêftir û biçûktir be'. Wêdetir li gorî Crystal (2000: 93) divê ew kar di nav çarçoveyê teorîk de bêne kirin, ji ber ku ew ê 'rêberiyê li tespîtên li ser rewşa heyî û nirxandin û teşhîsa wan bike'; her wiha çarçoveyê bi wî rengî 'dê mimkûn bike ku têkiliyên di navbera faktorên xetereyê tînin de diyar bikin', û 'dê bihêlin ku der barê asta xetere/daketina/lawazbûna zimên an jî rewşa vejînê de hîpotezên ampîrîk pêk bên'. Lê belê wekî Fishman (1991:87) diyar dike ku 'di babetên civakî de tu carî dermanekî bo hemî derdan nîn e' lewre ji bo peydakirina çareseriyên rasteqîne divê rewşa heyî gelekî baş û hûrgulî bê analîzkirin.

Di hejmarê 7'an a ZEND'ê de birêz Cuma Çîçekî (2006) hewleke bi wî rengî dabû û bi ya me gelekî birêkûpêk bû jî, lê belê ji ber ku zêdetir bi şiklê analîzên sêbjektîf bûn û tu sêd ji teoriyên heyî wernegirtibû, gotar, wekî analîzeke hûr û kûr lê ne têra xwe berfireh mabû. Di vê beşê de bi mebesta

ku bi ronîya wan teoriyan analîzên berfirehtir bêne kirin em ê çend çarçoveyên teo-rîk û kurteşîroveyên li ser sepandinên objektîf ên rewşa kurdî bidin.

4.1 Çarçoveya Teorîk a Bradleyî

“Biryara ‘dev ji zimanê xwe berdanê’, her gav, ji guherîneke di ‘xwe-baweriya’ civakê de dertê. Di rewşên guherîna zimên de, mirov dikare bibîne ku endam, pirî caran nişên nû yên civaka hindikayî, civakên xwe biçûk (inferior) dibînin. Ew endam pirî caran, bi xwemalkirina (adopt) zimanê (û nasnava civakî) gruba serdest, hewl didin ku nasnava xwe ya civakî ya ‘negatîf’ biguherînin... Bi vî awayî, divê guherandina zimên wekî stratejiyêke guhartina pozîsyona xwe ya ‘negatîv’ a wan kesan bê qebûlkirin ku nasnava xwe ya civakî, negatîf dibînin. Di rewşên ku ev stratejî ji aliyê hemû endamên civaka zimanekî bê bijartin de, mirov dikare ji navê rabûna zarê kevn bipê.” (Brenzinger, Heine û Sommer 1991:38)

Di wê jêwergira li jor de diyar e ku prestîja zimên a hem di nava civaka serdest û hem jî ya di nava civaka zimên bi xwe de gelekî girîng e; heta belkî girîngtirîn faktor be ji bo diyarkirina rêje û coşiya bikar(ne)janîna zimên. Yanî, her çend ‘dev ji zimên berdana’ li navmalê wekî sêsebebê guherîna zimên bê dîtîna jî, divê li bingeh û rîşeyên wê diyardeyê bîna kolan û ew diyardeya derasayî bê analîzkirin. Di lîteratûrê de guherîna helwestên axêveran li hemberî zimanê xwe ji ber kêmprestîjîya zimên, wekî sêsebebê proseyê ku bi ‘guherîna zimên’ ve encam dibe, tê nîşandan. Zimanên xwedan kêmprestîjîyê ên ku tûşî guherîna tîna jî, ew ziman in ku li gund û cihên gundewar mirov pê dipeyivin û bi taybetiyên xwe yê wekî statûya hindikayî de bûn; modêleke aborî ya kevn-xerab, statûya hindikayî, statûya polîtîk a duhemî (bindest), dînen tradîsyonal, şeweyîyanên tradîsyonal, [an jî] karên lipaşmayî tîna nasîn; û di perwerdeya fermî de yan qet an jî pir kêmprestîjîyê tîna bikaranîn (Brenzinger et al. 1991:38).

Pênc faktorên ku Bradley ji bo diyarkirina prestîja zimên û bi wî awayî jî têgihîştina rêyên domandina

bikaranîna zimên, destnîşan dike ew in: statûya hindikayî; derfet û beşdariya li bazar û saziyan; hêza çandî; perwerde; û koçberî (Bradley 2002:1). Helbet girîngiya her yek ji van faktorên ne wekî hev e û her wiha ji bo kontekstên cuda girîngî û diyarkeriya her yekê dê cuda be. Lê dîsa jî hin hîpotezên giştî hene der barê wan de. Li gorî angaştekê, nifûseke zêde ya axêveran, an jî statûyeke sivik a hindikayiyê, îhtimala veguhastina zimên zêdetir dike. Duyem, derfet û beşdariyeke zêde li bazar û saziyan, ligel kêmtir bikaranîna zimanê zikmakî di korelasyonê de ne (paralel in). Li gorî hîpoteza sêyem, cihê ku hêza çandî zêf dibe, hêza zimanî jî zêf dikeve ligel wê. Çarem, asteke bilind a perwerdeya bi zimanê serdest dikare bibe sebebê zêdetir windabûna zimanê zikmakî. Dawî, wisa tê ba-werkin ku koçberiyê zêde, ligel xwe bikaranîna zimanê hindikayî jî kêmtir dike (Hawkins û John 2001).

4.2 Berevajîkirina Guherîna Zimên

Di xebata xwe ya giranbiha ya bi navê 'Reversing Language Shift' (Berevajîkirina Guherîna Zimên, (ji niha pê ve BGZ) de, Joshua A. Fishman (1991) bingeheke teorîk û azmûnî datîne ji bo xebatên li ser ZX. Berî ku têkevin nava kitekitên formûlasyonên wî yê teorîk me divê çend îdiayên wî yê pratîk pêşkêş bikin. Li gorî Fishmanî her zimanek ji bo pêdivî û nasnava civakê hin fonksiyonên bi cih tîne ku ew fonksiyon bi zimanekî dîtir ne mimkûn e bi cih bîn. Di konteksteke 'kontakta zimanan' (language contact) de ew fonksiyonên têkel dibin; gelek caran zimanê serdest piraniya fonksiyonên zimanê civakê vedigire. Lewre her çî hewlên BGZ divê ber bi parastina wan cudahiyan fonksiyonên mexsûs ên zimanan be. Wate, di konteksta duzimanî an pîrzimanî de divê fonksiyonên her zimanekî bêne parastin û bi qasî ku mimkûn be ew fonksiyonên têkel nebin. Bi vî awayî duzimanîyeke stabîl û sabît û hevseng dikare bê peyitandin. Ev xal pir girîng e bi ya me, ji ber ku ji bo zimanekî civakê bîndest ne mimkûn e ku doza yekzimanîya bi zimanê xwe bê kirin, lewre ne helwesteke realîst e; lê belê doza pêkanîna û parastina konteksteke duzimanîyeke hevseng dikare bê kirin, wêdetir, ji bo zimanê hindikayî tekane rê jî ev e jixwe.

Dîsa Fishman diyar dike ku divê xebatên BGZ di du eniyan de bêne kirin, yek, plankirina kuliyatê

(corpus planning) û yeka duyê jî plankirina statûyê. Dema hin mirov xwe bi rêk dikin ku li ser fonksiyonên civakî yan jî nav û nasîna zimanekî tiştinan bikin, karê wan dibe 'plankirina statûyê'; û dema armanca wan têxebitîna li ser peyv (vocabulary), bilêvkerin an jî her çî aliyê dîtir ê zimên be, ew bi karê 'plankirina kuliyatê' radibin. Hewlên BGZ divê xwe bêxin bin barê wan her du eniyên bi hev re.

GIDS a (Graded Intergenerational Disruption Scale: Skalaya Qutbûna Navnifşî) Fishmanî ji heşt astên rewşên zimanan pêk tê. Bi vê tabloyê cihê zimanekî di xetereyê de ango asta wî ya metirsiyê tê tespîtkirin. Bi wê tespîtê mirov dikare taybetiyên rewşa zimanê xwe û yek û yek qede-meyên ku divê mirov pê re hilkişê bibîne. Li gorî wê formûlasyonê, asta GIDSê çend bilind bibe berdwamiya navnifşî (intergenerational continuity) û îhtimala parastina zimên a kom an civakekê ew hind dadikeve/kêm dibe.

Layê zefî	Ast 8	Ew qas kê m axivger mane ku divê civak norm û rêzikên zimên ji nû ve ava bike; gelek caran pisporên ji derve pêwîst in (mn. lînguîst).
	Ast 7	Nifşên mezin bi coş û kêfxweşî zimên bi kar tînin lê belê zarok fêrî zimên nabin.
	Ast 6	Sosyalîzebûna zarokan a zimên û nasnameyê di nav mal û civakê de pêk têt.
	Ast 5	Sosyalîzasyona zimên piranî li ser xwendin û nivîsandinê ye, gelek caran bi şiklê fêrkirina xwendin û nivîsandina bi zimanê yekem di dibistanên ne-fermî de.
Layê qewî	Ast 4	Zimanê yekem ligel zimanê neteweyî yan fermî di perwerdehiya fermî de tê bikaranîn.
	Ast 3	Zimanê yekem di qada karxaneyên civaka firehtir (serdest) de, li derveyî sînorên zimanê yekem, tê bikaranîn.
	Ast 2	Xizmetên hikûmetî (dewletî) yên sivik (bingehîn) û medyaya herêmî vekirîye bo zimanê yekem.
	Ast 1	Zimanê yekem di asta herî bilind a hukûmetî (dewletî) de tê bikaranîn.

Tablo 2. Adaptasyona Skalaya Qutbûna Navnifşî ya Fishmanî (Graded Intergenerational Disruption Scale) (Malone: 2003)

Li gorî GIDSê, asta 8, rewşa herî xerab û xeternak e bo zimanekî. Lewre di wê astê de gelek kê m kes bi wî zimanî diaxivin û dîsa pir kê m kes hene ku pê re biaxivin. Bi wî awayî her astekê taybetiyên xwe hene û di tabloyê de bi kurtî hatine dayîn. Tiştê girîng ew e ku GIDS, wekî rêberekê ye ji bo zimanên di xetereyê de. Ji bo her astekê di pirtûkê de analîzên kûr û pêşniyarên pratîk hene. Li gorî formûlasyonên GIDSê zimanekî di astên jorîn de divê ewil pêdiviyên asta xwe bi cih bîne, paşê dikare dakeve 'yek ast jêr'. Ango nikare di ser astekê re biqewêze yeke jêrtir. Bi ya me, zimanê kurdî di wê tabloyê de di asta şeşan de bi cih dibe. Niha em hinekî asta şeşan rave bikin ku asta xetereya zimanê

kurdî, rewşa wî ya nisbet bi zimanên din ên di xetereyê de û her wiha yek û yek pêngavên ku divê bavêje zelaltir bibin.

Asta 6, asta herî stratejîk e di xebatên BGZ de; ji ber ku di vê astê de zimanê devkî hêj jî tê veguhestin bo nifşên nû û civak li cihina berhev e, ne ji hev cuda. Dîsa zimanê di wê astê de zi-manê têkiliyên înfornel û devkî ye di navbera her sê nifşên malbatê de. Zimanê serdest, ji bo babetên fermî û teknîk bi kar tê. Helbet em nikarin bibêjin bi tevahî rewş wiha ye ji bo zimanê kurdî lê belê girîngiya asta şeşan jî jixwe ji wir tê. Ango di wê astê de divê hewl ji bo wê hindê bin ku kes û malbatên bi wî zimanê najîn an jî têra xwe rewan naaxivin peyda bikin û bi xêra handanan, duristkirin û sepandina normên civakî û her çî çalakiyên din, di nav mal-malbat-tax-civakê de zimên bikin navgîna têkiliyên rojane. Ango divê mirov ewil di nav malbatê de, paşê li taxê û axirîn di nav civakê de bi pêdiviya zanîna bi zimên bihesin. Wekî ku diyar e di vê astê de tiştê ku bê kirin peyitandina hişmendiya zimên e di malbat û taxê de û bi vî awayî duristkirina civakeke ku bikare bi serbilindî li pişt argûmanên xwe yê der barê zimên de bisekine. Heke em taybetiyên malbatê yê wekî girtîbûna bo derve, mahremiyet û faktora hezkirinê bifikirin, girîngiya malbatê ji bo pêkanîna civakeke wisa, aşkeratir dibe. Diyar e, mirov hêdî hêdî bi wan rastiyan dihesin ku hem ji aliyê dewletê ve hem jî ji aliyê siyasetmedarên kurd ve çalakiyên micid têne kirin ku kelk ji wê hêza malbatê bê wergirtin.

Birêz Cuma Çiçek (2006) der barê girtina kursên zimanê kurdî de tespîten muhîm dike û digihe encama 'daxwaza hînbûna zimanê kurdî ne zêde ye' û encameke din jî lê zêde dike û dibêje ku siyasetmedar, rewşenbîr û sazî û dezgehên sîvîl yê gelê kurd, ji bo ku zimanê kurdî bikaribe li hemberî siyaseta pişevker ya dewletan xwebûna xwe bidomîne û bi pêş ve biçe, siyaseteke zimên çênekiriye. Ligel qebûlkirina wan tespîtan me dil lê ye çend tiştan lê zêde bikin: Bi ya me siyaseteke wan a xelet hebûye û sedemê ku ji bo girtina kursan hatiye nîşandayîn jixwe argûmaneke wê siyasetê bû anga divê zimanê kurdî bi awayekî fermî di dibistanan de bibe zimanê perwerdehiyê. Divê bê zanîn ku bi weşandina biryarnamayan ne mimkûn e çareserî bi dest bikeve. Lewre dema mirov formûlasyonên li jor difikire, qelsî û xeletiya wan argûmanan yekser xwe didin der. Ji ber ku divê berî bidestxistina wan mafan, dawaya duristkirina civakeke ku bikaribe azadî û derfetên wan mafan ragire pêk bê da ku bo nimûne siberoj kurs û dibistan bê elaqe nemînin. 8 Wekî din, jixwe ya ku dê standina wan mafan mimkûn bike civakeke ku bi dil û can û samîmî li dûv berjewendiyên zimanê xwe ve ye.


Bi ya me pêşniyarên pratîk ên birêz Çîçekî, ji bo wan armancên bingehîn rast û pêkan in, lewre tê de nirxandineke pir baş a hêz û perspektîfên civaka kurd heye (bnr. Çîçek 2006).

4.3 Teoriya Jîndariya Etnolînguîstîk

Ev teoriya Jîndariya Etnolînguîstîk (ethnolinguistic vitality; ji niha pê ve JE) ji aliyê Giles et al. (1977) ve di 1977'an de hatiye duristkirin. JE wekî 'faktorên ku dikin ku komek, di rewş û têkiliyên nav-komî de wekî komeke xweser (cuda) û yekgirtî tev bigere' tê pênasekirin (Giles, Bourhis, û Taylor 1977: 25). Li gorî vê teoriyê, JE ya civakeke hindikayî xwedan tesîreke zor e li ser helwesta parastina zimên. Giles, faktorên wekî statû, demografî, piştgiriya dam û dezgehî (institutional support) û kontrolê rêz dîke di nav faktorên JE'ya civakê de. Ew sernav di nav xwe de dabeş dibin û her yekê hêmanên xwe hene. Hêmanên ku statûyê pêk tînin: statûya aborî, civakî, dîrokî û zimên li nav an jî li derveyî civaka serdest. Hêmanên demografîyê, ewên ku têkildarî hejmar û belavbûna endamên civakê ne li herêmekê an jî li seranserê welatekî. Ligel wan rêjeya zarokanînê, rêjeya zewacên têkel, û awayên koçberiyê jî di nav faktora demografîyê de ne. Piştgiriya dam û dezgehî û kontrol: heta çî radeyekê koma etnolînguîstîk (civaka wî zimanî) piştgiriya fermî û ne-fermî werdigire ji sazîyên cihê cihê, ji çapemenî û weşangeriyê, perwerdehî, xizmetên hikûmetî, pîşesazî, ol, çand û siyasetê. Dema quwet û lawaziya civakê di wan her çar waran de tê nirxandin, jîndariyeke kê-m-zêde wekî kê-m, navînî, an jî bilind derdikeve jê re (Yagmur 2004).

Vê teoriya ku me pir bi kurtî salox da, tex-mîneke pir rasterê heye di warê parastina zimên de: makezimanên civakên xwedan JE'yeke bilind dê bêne parastin, û yên xwedan JE'eke kê-m dê bi zimanekî serdest bêne guhartin (Yagmur: 2003). Ango di konteksteke du yan pirzimanî de civakeke bi JE'ya bilind dê ziman û taybetiyên xwe yên çandî biparêze û yên bi JE'ya kê-m dê asîmîle bibin. (Bi

mebesta bercestekirin û têgihîştineke çêtir em tabloyeke vê teoriyê li jêr didin (bnr. tablo 3).



Tablo 3: Jîndariya Etnolînguîstîk û Bandora wê ya li ser Rewşa Zimên (Yagmur 1997: 27)

4.3.1 Kurtenirxandineke Faktorên JE'yê li ser Rewşa Zimanê Kurdî

Civaka kurd û zimanê wê, hêj di avakirina komara Tirkiyeyê de bi yasayên destûrê û sepandinên pratîk wekî civak û zimanekî 'mehrûmkirî' (deprived) xuya dike û ew rewş heta niha ligel ku dem û destûr guherîne jî kêm zêde wekî berê maye. Ne hewce ye yek bi yek kiryarên ji wan yasa û hişmendiyên paşketî rêz bikin, lewre gelekî aşkera ne lê belê bi tenê bibîrxistina redkirina hebûna her çi zimanekî ji bilî tirkî li ser axa Tirkiyeyê di destûrê de (bo nimûne made 39 û hewlên fermî yên ji bo ji beynbirina wî zimanê bi rêya xerabkirina belavbûna civaka kurd, bi mebesta ku yekgirtina civakî têk biçe (bnr. Bulut 1998), û her wiha qebûlên xwedêgiravî zanistî yên der barê kok û dîroka kurdan û raveyên li ser zimanê wan, dê têr bike ku em helwesta dewletê ya li hemberî ziman û civaka kurd têbigihin (bo nîqaşeke berfirehtir bnr. Akin 2006). Di konteksteke wiha de ku rêveberî bi hemû derfet û şiyana xwe bi karê tepeserkirinê radibe, mirov nikare behsa tu piştgiriya dam û dezgehî bike, berevajî vê yekê mirov dikare qala mehrûmbûna ji her çi piştgiriya dezgehî bike. Wiha jî çend akademîkên li ser mijarê xebat kirî kiryarên dewleta tirk bi terma 'zimankujî/zimanqirî' bi nav dikin (ligel yên din Akin 2006, Hassanpour 1997, 2004).

Ev helwesta rêveberiyê bû û mirov dikare vê helwestê heta radeyekê li civaka serdest jî mal bike lewre kêma kes ji wan li hemberî rewşê reaksiyonên micid bi pêş xistine. Layê dîtir, ligel pêşketinên polîtîk û guherînên di sîstema rêveberiyê de şêwe û bikaranîna hêz û otorîteyê jî hinekî guheriyê, di wan salên dawî de û kurd jî di rêveberiyên herêmî de xwedan tesîr in û her wiha bi rêya rêxistinên civakî jî di qada civakî de warek (sphere-sfer) vebûye ji bo zimên û di wî warî de piştgiyaya dezgehî carinan bi şiklê festîvalan carinan bi şiklê bikaranîna zimanê kurdî di qada fermî de û carinan jî bi şiklê weşandina pirtûk, belavok, salname û hwd. dirûv digire. Bi vî awayî, niha mirov dikare heta radeyekê behsa piştgiyaya dezgehî bike jibo zimanê kurdî (ji bo niqaşeke berfireh bnr Çîçek 2006).

Faktora dîrokîbûnê jî mirov dikare ji layê kurdî ve girê bide lewre civaka kurd zimanê xwe wekî zimanekî kevnare qebûl dike. Lê belê, berevajî vê yekê, bikaranîna kurdî ya di warên cihê de û proseya modernîzasyona wî ku heta dereceyekê aniye, li ser axêveran têsîreke pir neyînî jî kiriye. Axêverê zarê herêmî dema bikaranîna zimên a di televîzyon û medya de û her wiha axêverên bi forma standard diaxivin, dibîne, ji rastî û qîmeta zarê xwe dikeve şikê yan jî berevajî zêdetir bi zarê xwe ve diçespe û reflekseke pir neyînî pêk tîne li hemberî formên standard. Ev diyarde, statûya zimên a li cem milletê dadixe. Her wiha, cihê zimên, di jiyana cemawerî de layekî dîtir ê statûya zimên a di nava civakê de ye. Bo nimûne, di nav kurdên Îranê de, cih û girîngiya zimên ew qas peyt e ku yekî/e ne-kurd bêt û li bajarekî wan bi cih bibe, mecbûr e ku xwe fêrî zimanê kurdî bike; cihê zimanê kurdî di nava gel de wê yekê li wan ferz dike, lewre zimanê serdest e di nava civakê de. Mirov bi rihetî dikare îdia bike ku di konteksta kurdên Tirkîyeyê de cih û fonksiyona zimên ne ewqas mezin e. Faktora aborî, bi ya me, her û her li dijî kurdî û kurdan bûye. Ji ber ku bi nebûna daneyên îstatîstîkî ev nirxandin têne kirin, mirov nikare tespîten gelek qewî bike, lê belê dema mirov feqîriya giştî ya li herêmên kurdan difikire û her wiha helwesta dewlemendên kurdan a li hemberî zimên û reflektkirina zimanê kurdî wekî zimanê feqîr û gundiyan bi rêya medya û weşanan lê zêde dike, tabloyeke ku piştewaniya îdiayên me yên sûbjektîf dike, diyar dibe. Heçî demografiya kurdan e, kurd berî bi bîst salên dawî her li war û herêmên xwe yên kevn dijiyan û niha ligel ku koçberiya bîst salên dawî ew rewş heta cihekî têk daye jî, dîsa welatê kurdan pîraniya nifûsa kurdan dihewîne. Her wiha li cihên ku kurdan koçkirinê jî meyleke bihevrejîyanê hebûye di nava wan de ku wê yekê tesîra neyînî ya koçberiyê li ser zimên

kêm kiriye. Zarokanîna zêde di nav kurdan de û meyla giştî ya zewaca navxweyî (di nav civaka kurd de) faktorên ligel zimên in.

Analîzên JE'yê li ser du bingehan têne kirin: yek JE'ya objektîf, û ya duyem JE'ya sêbjektîf. JE'ya objektîf, bi analîza daneyên statîstîkî û qualîtatîf (çawanî) ên der barê çar faktorên sereke yên JE'yê têne kirin; û JE'ya sêbjektîf jî bi analîza bersiv û nirxandinên axêverên wî zimanî ên der barê wan faktorên de têne kirin. Li vir, bi nirxandinên jorîn ku di nebûna her çî daneyên statîstîkî de ku bi tenê bi dane û agahiyên qualîtatîf hatine kirin, armanca me ne ew e ku JE'ya zimanê kurdî zelal bikin, jixwe ev yek ne mimkûn e jî, lê belê diyarkirina hin xetên giştî yên JE'ya zimanê kurdî ye ku bi wan nirxandinan xwendevan dikare hin fikran li ser JE'ya zimên bi pêş bixe.

5. Encam

Me bi vê xebatê destnîşan kir ku ji ber nebûna daneyên statîstîkî û agahiyên zanistî di mijareke ew qas pêdivî bi boçûnên zanistî heyî de, xebat û hewlên ji bo parastina zimanê kurdî têne kirin ne bi pergala in û heta radeyeke bilind ji lîteratûra zanistî ya cîhanê ya bi mijarê re eleqedar ne haydar in ku êdî ligel hişyariya giştî ya li ser zimanan xebatên zanistî yên di wî warî de pir zêde bûne. Ji ber vê hindê, divê tevger û saziyên kurd xwe ji wê gencîneyê nehêlin, xebatên xwe li gorî teorî û tecrûbeyên zanistî dîsa bi rêk bikin û planeke xebatê ya di wê çarçoveyê de bi pêş bixin. Helbet, wekî ku di nava gotarê de hate diyarkirin divê tu kes li hêviyê nebe ku teorî û formûlasyon bi awayekî tekûz li rewşa zimanê kurdî bîn û teqîbkirin û sepandina yek ji wan mişkûleyên zimên çareser bike; bêtir, divê ew teorî û formûlasyon ku li jor girîngiya wan a ji bo her çî tevgereke zimên hate ravekirin, li gorî dînamîk û mercên civak û zimên ên heyî bêne analîzkirin û di proseya diyarkirina armanc û duristkirina plana xebatan de wekî çavkanî îstîfade jê bê kirin.

Dîsa hate dîtin ku mijara parastin û guherîna zimên diyardeyên pîralî ne ango birrek faktor hene di paşxaneyê wan de; lê dawîya dawîn têne û di-gihe encama ku parastina zimên, qirareke civakê ya cemawerî ye li ser domandina bikaranîna zimên û guherîna zimên, zêdetir qirarên şexsî ne sebar et bi dev ji zimanekî berdan û naskirin û qebûlkirina yekî dîtir. Teorî û formûlasyonên di wî warî de ku

çendek ji wan hatine ravekirin, dikarin rêyên baş li ber tevgerên zimên ve kin ku ew qirara cemawerî bi layê 'parastinê' ve bidêre, ne bi layê guherandinê ve.

Jêrenot

1) Lêkolîna navborî xebateke sosyolînguîstîkî ye û ji aliyê Ergin Opingin û Kadir Gokgoz ve tê meşandin. Armanca wê ew e ku rewşa zimanê kurdî ya di 'qadên jiyane', bikaranîn û bijartina zimên de, bi aneketekê teswîr bike ku ew anket li gorî çend çarçoveyên teorîk hatiye duristkirin û ji ber sedemên peydanebûna butçeyê du sal in ku li hêviya sepandinê ye. Daneyên ku di gotarê de hatine pêşkêşkirin ji pîlotê hatine bi dest xistin ku pîlot bi qewlê pêş-xebata eslî ji bo teselîkirina bikêriya anketê, ligel 54 kesan li çend taxên Stenbolê hatiye çêkirin.

2) Dîglosya (diglossia): konteksta ku du ziman lê tene bikaranîn lê her zimanekî fonksiyonên xwe yê xweser hene û têkilî qadên hev nabin.

3) Jêwergirên ku me di wê gotarê de bikaranîne bi îngilîzî bûn û me wergerandine ser kurmancî. (1)

4) Peyvên wateyî (content word an jî open class) û peyvên peywirî (function word an jî closed class) du polên peyvan in. Peyvên wateyî xwedan wateyekê ne û di zimanekî de potansiyela wan bêdawî ye. Bo nimûne: kompûter, heliz, dêr û hwd. Heçî peyvên peywirî ne ew jî xwedan wateyêke rêzimanî ne û hejmar û potansiyela wan bi sînor e. Bo nimûne: heçî, ligel, bes û hwd. Îcar zor asayî ye ku peyvên wateyî ye ji zimanekî bikevine nav zimanekî din û hejmara wan zêde bibe lê belê peyvên fonksiyonan ne wisa ye lewre ew wekî qorzîberan in ji bo zimanekî û têkelbûna wan nîşaneyên rewşeke xerab e ji bo wî zimanê ku werdigire.

5) Ew morfem in ku serbixwe bêwate ne, tim bi morfemeke din ve tene bikaranîn.

6) Divê neyê jibîrkirin ku ew dane bes ji bo zelalkirina mijarê ne nexwe tu îdiayên giştî pê re nîn in; her wiha li Stenbolê yanî ne li warê zimên ê mîratî hatine berhevkirin.

7) <http://web.mit.edu/linguistics/www/mitili/langu-age%20loss.html>

8) Li vir mebest ne ew e ku divê dev ji têkoşîna ji bo mafên dewletî-sazûmanî bê berdand bêtir girîngiya pêwîst a ji bo bingehdanîna wan mafan e û heke kurs ji bo danîna wê bingehe alavek bin, parastin û sûdwerigirtina ji wan ji bo niha ji gelek tiştên din ferztir bû.

9) Made 3: Zimanê zikmakî yê hevvelatîyên Tirkiyeyê Tirkî ye. Qedexe ye ku:

a) Ji xeynî Tirkî, zimanên din wekî zimanên zikmakî bêne bikaranîn û ji bo belavkirina wan zimanan çalakî bêne kirin;

b) di civîn, xwepêşandanên kolanan, poster, nîşane, tabela, afîş û agahiyên bi wî şiklî de, zimanekî din ji xeynî Tirkî bê bikaranîn, heta ku zimanên bi qanûnê nehatine asêkirin jî, her çend ji berpîrsiyarên herêmî destûr hatibe standin jî kaset, tomarên dengî, fîlm û hemû pergal û navgînên derbirîn û belavkirinê bi wan zimanan bêne bikaranîn.

Çavkanî

Akin S. (li ber çapê ye). Private Teaching of Kurdish in Turkey: Problems and Prospects [Fêrkariya Kurdî ya Taybet li Tirkiyeyê: Pîrsgirêk û Pers-pektîf]. (werg. Derince, Ş. & Opengin, E.). ZEND

Bradley D. (2002). Language attitudes: The key factor in language maintenance. Di nav David Bradley and Maya Bradley (ed.) Language Endangerment and Language Maintenance de. London. U.K.: RoutledgeCurzon. 1-10

Brenzinger M., Bernd, Heine û Gabriele Sommer. (1991) Language death in Africa. Di Robert H.

Robins û Eugenius M. Uhlenbeck (ed.) Endangered Languages. Oxford, U.K.: Berg. 19-44

Brenzinger M., (1998). Various ways of dying and different kinds of deaths: scholarly approaches to language endangerment on the African continent. Di nav Matsumara (ed.) de, 85-100. (di Crystal 2000 de hatiye neqlkirin).

Bulut F. (1998). Kürt Sorununa Çözüm Arayışları, Stenbol: Ozan Yayinlari

Crawford J. (1996). Seven Hypothesis on Language Loss: Causes and Cures. Di nav Stabi-lising Indigenous Languages de G. Cantoni (ed.).

Crystal D. (2000). Language Death. Cambridge: Cambridge University Press.

Çiçek C., (2006). Pêşniyazeke Planeke Giştî ji bo azadkirin û bilindkirina statuya zimanê kurdî. Zend payîz 2006: 32-42

- Giles H., Bourhis, R. Y., & Taylor, D. M. (1977). Towards a Theory of Language in Ethnic Group Relations. Di nav Language, Ethnicity and Intergroup Relations, H. Giles (ed.). London, Academic Press.
- Hassanpour A. (2006) Li Tirkîyê zimankujî û zi-manê kurdî. (werg. Derince, Ş.). Yazınca 7, 19-26
- Hassanpour A. (1997). Kurdistan'da Milliyetçilik ve Dil 1918-198. Stenbol: Avesta Yayinlari
- Fishman J. A. (1991) Reversing Language Shift. Clevedon, England: Multilingual Matters.
- Hawkins J. P. û John, S. R. (2001). Mamean. Di nav David Carrasco (ed.) The Oxford Encyclopedia of Meosamerican Cultures: The Civilizations of Mexico and Central America (hej. 2). Oxford. U.K.: Oxford University Press. 159-163.
- Kincade M. D. (1991). The decline of native languages in Canada. Di Robins and Uhlenbeck (ed.) de, 157-76.
- Krauss M. (1992). The world's languages in crisis. Language 68. 4-10
- Odlin T. (1989). Language Transfer. Cross-linguistic influence in language learning. New York, Cambridge University Press
- Rhydwen M. (1998). Strategies for doing the impossible. Di Ostler (ed.) de, 101-6. (Di Crystal 2000 de tê neqlkirin).
- Suwilai P. û Malone, D. (2003). Language development and language revitalization in Asia. http://www.sil.org/asia/ldc/plenary_papers/suwila_and_dennis_malone.pdf
- Wardhaugh R. (1987). Languages in competition: dominance, diversity and decline. London: Blackwell Publishing
- Yagmur K. (2004). Language Maintenance Patterns of Turkish Immigrant Communities in Australia, and Western Europe: the impact of majority attitudes on ethnolinguistic vitality perceptions. International Journal of Sociology of Language, 165, 121-142
- Yagmur K. û Akinci, M. A. (2003). Language use, choice, maintenance and ethnolinguistic vitality of Turkish speakers in France: Intergenerational differences. International Journal of Sociology of Language. 164, 107-128
- Yagmur K. (1997). First Language Attrition among Turkish Speakers in Sydney. Studies in Multilingualism, Vol. 7, Tilburg, Tilburg University Press.

Şarezor: ferhengeke mezin ya kurdî-inglîzî



Ferhenga Şarezor ya kurdî-inglîzî (*The Sharezoor Kurdish-English dictionary*) mezintirîn ferhenga soranî-inglîzî ye ku heta niha hatiye amadekirin. Ferheng yekalî ye anku ew peyvên kurdî (soranî) rêz dike û maneya wan bi inglîzî dide lê ew ne ferhengeke inglîzî-kurdî ye anku peyvên inglîzî rêz nake û wan li kurdî wernagerîne.

Şarezor ferhengeke teqrîben bi 600 rûpelên A4 e. Ferheng ji aliyê **Şefîq Qezaz** ve hatiye nivîsîn ku demekê di hikûmeta Başûrê Kurdistanê de wezîr jî bû.

Di ferhengê de peyvên kurdî li gor alfabeya kurdî-erebî hatine rêz kirin lê li ber serpeyvan herwiha awayê xwandina wan bi alfabeya kurdî-latînî jî hatiye diyarkirin (ji bilî herfa Ş ku wek ş hatiye diyarkirin – herwiha L-ya qelew jî wek l hatiye nivîsîn.) Lê peyvên ji peyva serekî çêkirî û herwiha hevokên nimûne tenê bi alfabeya kurdî-erebî hatine nivîsîn.

Li aliyekî din, rêzkirina herfan li pey hev li gor alfabeya kurdî-erebî hinekî berovajî hatiye pêkanîn: Herfa "elîf" ji aliyê çepê yê kitêbê ve dest pê dike wek alfabeya latînî.

Şarezor bi zelaî baştirîn ferhenga soranî-inglîzî ye ku ti caran hatiye danîn. Ew ne tenê peyvan rêz dike û werdigerîne lê herwiha hevwaterên wan yan peyvên têkilî wan jî gelek caran pêşkêş dike.

Di ferhengê de bi piranî tenê peyvên soranî hatine rêz kirin lê danerê ferhengê cih daye hinek peyvên kurmancî jî yên ku di soranî de peyda nabin û ew bi stêrkekê (*) nîşan kirine.'

Kovara Kanîzar û malpera Zimannas bi serbilindî vê berhemê dixin ber destê xwandevanên zimanê kurdî:

<https://zimannas.files.wordpress.com/2017/05/sarezor.pdf>

Standardkirdin be bê Dewlet



Têbînîy wergêrr: em nûsîney mamostayan Yaron Matras û Gertrud Reesemius le sempozyomêk da sebarete be "Standard kirdinî zimananî neteweyî" pêşkêş kirawe ke le 2-3 Fêvrîyey sallî 1991 le layen zankoy Hamburg û Enîstîtûy perwerdeyî UNISÇO le Hamburg bestirawe. Lem wutare da nûseran pêşîne û rewî pêşweçûnî standardî Kirmancîy Jûrû be taybetî le henderan tawutuwê deken. Dîyare ew wutare çuwar sall û nîw ber le damezranî yekem têlêvîzîonî mangîley Kurdî û ew pêşweçûnane nûsrawe wa lew 18 salley duway pêşkêş kiranî em base, ew standardey zimanî Kurdî be xoyewe dîwe. Lew maweye da be deyan qamûs û roman billaw bûnetewe, be Kirmancîy Jûrû film û şano sazkirawin û êsta ne kanallêk, bellkû çendîn kanallî têlêvîzîonî be Kirmancî bername billaw dekenewe, û be deyan mallperrî întirnêti hen û tenanet rojnameyekî rojaneş, nek le henderan bellkû le zêdî cugrafiyayî xoyda bew standardey zimanî Kurdî billaw debêtewe.

Legell eweşda, em wutare girîngîyekî taybetî heye bo rûnkirdinewey hêlle serekîyekan û dewllemend kirdinî nêwerokî ew miştûmirrey êsta sebarete be çemkî "standard" û "standard kirdin" dekrê û herweha agadar bûn le barudoxî zimananî dîkeş ke hiç piştîwanî dewlletîyan nebûwe le rewî "standard bûn" da.

Cêyî xoyetî lêre da be kurtîş bê nûseran be xwênerewey Kurd binasênîn. Yaron Matras êsta pirofêsoorî zimannasîye le zankoy Manchester le Birîtanîya û pisporrî serekîye le biwarî zimanî Romanî (zimanî Qereçîyan) le astî cîhanîda. Le zankoy 'Ibirî Urşelîm zimannasîy giştî û 'Errebî û le zankoy Tubîngn le Allman zimannasî berawurdkarane û zimannasîy Jêrmenî xwêndûwe, û her lewê le biwarî dûzimaneyetî (bilingualism), komellnasîy ziman (sociolinguistics), lehce nasî (dialectology) û herweha zimangele Jêrmenîyekan û zimananî Rojhellatî Nêwerrast pisporryetî peyda kirdûwe. Le zankoy Hamburg derecey mastr û dukturay wergirtûwe, lewê le pêşda le ser komellnasîy zimanî Kurdî, duwayeş wekû şîkirdineweyekî karkirdîy – şêwenasî sebarete be zimanî Romanî pisporryetî

peyda kirdûwe. Wek yarmetîderî lêkollînewe le zankoy Hamburg beş wext karî kirdûwe û dersî gutûwe, û wekû karbedestêkî pêwendî rêkxirawey nahkûmetî Romanî (NGO) karî kirdûwe ber le wey le sallî 1995 le zankoy Manchester dabmezrê. Lew demîyewe ke xwêndkarî piley lîsans bûwe sebarete be zor zimanî corbecor û le şwênî corbecor lêkollînewey meydanî kirdûwe– zorbey ew lêkollînewe meydanîyane sebarete be zimananî jêr metirsî û kemayetî bûn: jargonî Çêwdarî Cûleke, Cênîs, Romanî û Angllorromanî, Firîsîyayî Bakûrî, lehcekanî başûrî Rojaway Allmanî, Yiddîş, Aramî Nwê, Kurdî, Ladîno, û Domarî, û le merr zimane taybetîyekan. Wek pisporr bo govarî corbecorî akadêmîk û bo şûragelî corbecorî danî yarmetî lêkollînewe karî kirdûwe, her weha rawêjkarî damezrawey wekû şûrray Ewrrûpa (The Council of Europe), Enîstîtûy Open Society û binîyatî Next Page bûwe.

Henûke le dewrey lîsans le zankoy Manchester dersî komellnasîy ziman dellêtewe, her weha le dewrey lîsans û dewrey duktura da, mamostay dersî pêwendî zimanî, zimannasîy Romanî, piragmatîks û lehcekanî ye û leser pêwendî zimanî û piragmatîks le dewrey duktura sêmînar deda. Ta êsta çendîn kitêb û be deyan wutarî le biwarî corbecorî zimannasane û le wane zimanî Kurdî billaw kirdûwetewe.

Yay Gertrud Reershemius profêsoorî zimannasîy Allmanî ye le zankoy Aston le Birmingham le Brîtanîya û yek le pisporrani nasrawî zimanîy Yiddîş e. Ew biwaraney lêkollîneweyan têda deka birîtîn le şêwezare nastandardekanî Allmanî, zimane kemayetîyekanî Jêrmenî Rojawa (Yiddîş û Allmanî Newî), pêwendî zimanan, piragmatîks, komellnasîy ziman, ders gutinewe û fêr bûnî Allmanî wekû zimanî dûyem yan zimanêkî dîke, lêkollînewekanî Allmanî – Cûlekeyî. Cêgirî berrêweberî lêkollînewe ye le mediresey zimanan le zankoy Aston le Bîrmingam. Le sallî 2003 le gell Yaron Matras kitêbêkî le ser rêzimanî Allmanî Newî (şêwezarî Firîsîyayî Rojhellatî) billaw kirdûwetewe.

Emin zor spasî berrêz Dr. Ce'ferî Şêxulîslamî dekem bo pêdaçûnewe bem wergêrrane û pêşnîyaze bekelkekanî.

Standard Kirdin be bê Dewllet: Nimûney Zimananîy Yiddîş, Kurdî û Romanî

Nûsînî : Yaron Matras û Gertrud Reershemius

Wergêrran le Inglîsîyewe: Hesenê Qazî

1. Pêşekî

Ta çend sede lemewber, standarde edebîyekan le nêw zor komellgeyan le sertaserî cîhanda birîtî bûn le sercemî ew deqe dînîyaney ke yekdest kirabûn. Şêwaz û rêzimanî ew deqane le ber dekirane û duwacar kopî dekirane û dekrane be hewênî çalakî edebî zîyatir.

Ca boye şêwezari zimanî parranewe û îbadet, qanûn û rûdawgêrranewe bo xoy bû be samanêkî girîngî kultûrî. Le serubendî modêrinî êmeda, hewl û têkoşan bo dananî normêkî standard bo kodî zimanêkî neteweyî zor car hawrrê bûwe legell serhellhênanî dewlletgelî neteweyî. Mafî dewllet bû ke dîyarî bika çî norrmêk bibê be îmtîyazî dawudezga dewlletîyekan bo bekarhênanî kodêkî yekgirtû wekû amrazêk bo rêsadananî bo pêwendî cemawerî. Eme rengdanewe û guwastinewey eweye ke xellik be " kelepûrî neteweyî" yan " kultûrî neteweyî" xoyanî dadenên. Bellam başe, dewrî standard kirdinî modêrrn cige lewey ke amrazêk bê bo dawudezga dewlletîyekan çî ştêkî dîkeye û, "zimanêkî neteweyî" be bê ewey le wizey dabê pişt be destelatî organekanî hukûmet bibestê çon detuwanê peyda bê û serhellhêne?

Lem nûsiraweye da, ême bem meseleyewe xerîk debîn û, sê zimanî kemayetî êtnîkî be yekewe berawurd dekeyn Yiddîş – zimanêkî sedekanî nêwerrast be reçellekî Allmanîyewe ke Cûlekekanî Urrûpay Rojhellat qisey pêdeken: zimanî Kurdî, zimanêkî Bakûrîy Rojaway êranî ke 20 mîlyon xellik le herêmi Kurdistan, de çuwarçêwey sinûre dewlletîyekanî Tirkîye, Sûrîye, 'êraq, êran û Yekêtî Sovîyêt da qisey pêdeken: û Romanî – zimanêkî be rreçellek Bakûrî Rojaway Hîndî ke be texmîn 15-10 mîlyon xellkî roma (qereçîyekan) le Urrûpa û emrîkayekanda qisey pêdeken. ême lem lêkollîneweyeda lew rêbaze derrwanîn ke çon standard kirdin debê be erkî destpêşxerî axêweran xoyan duway çendîn wec pêwendî çirrupirr legell çendîn dezgay berrêweberî dewlletî û zimangelî dewlletî ke le pêwendîyekanyan le gell danîştûwan û dezgay corbecorî wullatanî xane xwê yan hêzî dagîrkerda, her kameyan bekaryan hênawe.

Ême her weha hêndêk cîyawazî girîngîş le nêwan çendîn hokargelî paşxanîş le ber çaw degrîn: bo nimûne, Yiddîş û Romanî cige le seretay here zûy hebûnyanda nebê, qet zimanî damezraw nebûn le nawçeyekî cugrafîyayî da. Ca boye ewan her dûkyan nimûney aşkray " zimangelî tarawge"n. Bellam, le layekî dîkewe, Kurdî yek le zimane here girîngekanî Rojhellatî Nêwerrast e u, sererray hewlî cor be cor le layen dagîrkeranewe bo ewey bituwênnewe û danîştûwanî resen û xocêyî Kurdistan der biken, hêştas zimanî zorbey xellkiye le herêmekeda. Lehcekanî be pêyî zincîrey zimanî – cugrafîyayî billaw debinewe û, duwacar degenewe zimane xizmekanyan wekû Lurrî û Farsî. Le ber helumercî sîyasî le mawey sedey rabirdû da, standardkaranî yekêk le şêwezare serekîyekanî Kurdî,

wate Kirmancî, neyantuwanîwe le çuwar çêwey wullatekey xoyanda be amancekanyan bigen û boye nêwendî çalakî edebî bew şêwezare guwstirawetewe bo naw Kurdekanî danîştûy henderan le Urrûpay Rojava.

Wekû nimûneyekî dîkey cîyawazî le nêwan pêvajoy standard kiranî ew sê zimanane debê derecey xwêndewarî denaw ew kultûraneda le berçaw bigîrdirê. Zimanîy Yiddîş berewpêşçûnî şêwezarekî standardî edebî le kultûrêkî heta billêy xwêndewar da nîşan deda, ke lew kultûre da beşî here gewrey çalakî edebî bedezgayîkiraw birîtî bû le lêkollînewe û billawkirdinewey nûsrawe û deqe dînî û pîrozekan. Bellam zimanî Kurdî û zimanî Romanî her kamyar bandestî nerîtî zarekî danîştuanêk nîşan deden ke zorbeyan hêşta nexwêndewarin, wate be hîç cor nasîyawî û zanyarîyan nîye le merr têknîkî qa'îde ronanî nûsraw bo ziman. Ca boye, zorbey xellik bellgey edebî zanistîy bekomell yan kultûrî û her weha bellgey nûsrawî mêjûy şexisî xoyanyan nîye.

2. "Standard" çî ye?

(Ferguson 1961) zimanêkî standard wekû zimanêkî taqane, û norrmêkî be berbillawî pesndkiraw pênasê deka, ke tenê be allugorrêkî kemewe yan çeşnawçeşnîyekî kemewe bo hemû mebestekanî bekarhênanî ziman dekar dekirdirê. Ew be aşkirayî em têgeyştine giştîye le "standard" û derecey xwêndewarî bûmî ("nûsîn") de nêw komellgeyekî axawtin da le yekitrî cwê dekatewe. Derecey lanî zorî xwêndewarî bûmî le nêw komellgeyekî axawtin da katêk derdekewê û xoy nîşan deda ke lêkollîneweyekî zanistî mak be berdewamî û bê pisanewe billaw bibêtewe, le katêkda ke le serewey terazûy standard kirdinda ême komellgey ewto debînîn ke têyanda lanî kemî çeşnawçeşnî norrm bedî dekrê hem le zimanî qise pêkirdin û hem le zimanî nûsînda. Be reçaw kirdinî pênasekirdinî Ferguson, standardkirdin debê be pêvajoyekî yekgirtnewey zimanî le nêw komellgeyekî le berçaw gîraw dabindirê, ke karlêkerî hem le ser pêwendî nûsraw û hem le ser pêwendî zarekî hebê. Be boçûnî Ray 1963) derfetî hebûnî şêwezarekan yan şêwe zimanî standard nekraw de nêw komellgey axawtin, le pall zimanî " standard" da kêşeyekî ewto nîye. Legell eweşda, standard bo xoy wekû şêwezarekî ziman dadendirê ke bekarhênanî le nûsîn, rêziman û qamûs da yekgirtûye.

be pêyî boçûnî Haugen ([1972] 1969, [1972] 1966 û le cêgey dîkeşda) pêdawistî bo bekarhênanî zimanêkî norrm daner bo xoy pêwendî peyda dekatewe be erkî nûsîn wekû amrazêkî pêwendî le nêwan axêweranda ke zeman û mekan le yekitrî cwê kirdûnetewe û natuwanin pişt be sitratêjîyekanî rîtm, derewey zimanî û tenanet şîkirdinewey aşkray zimanî bibestin bo ewey temî

xirap lêkdanewe û xirap lêtegeyştin birrewênnewe. Standard kirdin û pilan dananî ziman birîtîye le amadekirdinî qa'îde û rêsay norrm daner bo rênwênîkirdinî nûseran û axêweran be taybetî lew komellgeyaney axawtinda ke yek dest nîn. Ca boye zimanêkî "standard" birîtîye le komellêk rêsa û qa'îde ke be berbillawî pesindkrawin û be derecey yekem wek pêwerêke bo nûsîn. Serhellhênan û billaw bûnewey zimanî standard be çendîn qonaxanewe bestirawetewe, qonaxî yekem be "hellbijardinî norrm" yan destnîşankirdinî ew şêwezarey ke debê standard bikrê pênase dekirê. Qonaxî dûyem birîtîye le qa'îde danan û girdewekoyî "çodification" (berewpêşbirdinî sîstêmî nûsîn), ke ber le destnîşankirdinî şêwezarekeye. Katêk ew hengawane hellgîranewe, "ronîştin"y norm dekirê destpêbika. Le rastîda zorbey hewllekanî yekgirtinewe dekrê lew kelebere bixzêndirên çunkû lew qonaxe daye ke berhemhênanî qamûs, kitêbî rêziman, û kitêbî rênwênî şêwaz û amrazekanî dîkey norrm daner karî here girîngin. Duwacar, dahatûy standard be "cêbecêkirdin û pêroyî lê kirdinî" bestirawetewe, wate, qebûllkirdinî le layen dawudezga, nûseran, billawkirdinewe û be taybetî le layen amrazî rageyandinî giştî pêwendîyewe ([1972] 1969 Haugen, her weha birrwane Çobarrubias 1983).

Le xuwarewe ême le peyda bûn û serhellhênanî şêwezare nûsrawekanîy Yiddîş, Kurdî û Romanî derrwanîn û ew engêzane be yekewe berawurd dekeyn ke destpêşxerî edebî le zimanî bûmî, hellbijardinî şêwezar, qa'îde ronan, xo girtin û ronîştin da cext dekenewe û eweş lêk dedeynewe ke ew şêwezare nûsrawey pêş xirawe ta çend cêbecê kirawe û reçaw kirawe. Ême standard kirdin be koy ew qonaxane dadenêyn. Be le berçawgirtinî helumercî serhellhênanî zimane êtinîkîye kemayetîyekan û nebûnî hîç dawudezgayekî hukûmetî le pişt ewan, ême serincêkî taybetî dedeyne ser ew dewrey her kam le destpêşxeranî ew pêvajoyane gêrrawyaneyan.

3. Standard kirdinîy Yiddîş: dirêjkirdinewey nerîtî edebî

Şîkirdinewey xuwarewey ême be pêwîstî şîkirdineweyekî mêjûyî ye: le ber jênosîdî Cûlekekanî Urrûpa le layen Nazîyekanewe le mawey şerrî Dûyemî Cîhanîda êsta tenê jimareyekî zor kem le axêweranî Yiddîş le Urrûpa hen û hîç komellgey Yiddîşziman le Urrûpa nemawetewe. Le astî cîhanîda, komellgey here gewrey Yiddîşziman dekrê le nêw wecî yekemî koçberanî Cûleke le Bakûr û Başûrî Emrîka û le Israyîl bibîndirên. Komellge ortodoksekan le Israyîl, Dewllete Yekgirtûwekanî Emrîka û şwênî dîke ta radeyek zimanî Yiddîş wekû zimanî yekem le pêwendîyekanî nêwan wecan û le keş û heway nêw mall da bekar dehênin. Dekrê bigutrê ewan tenya komellgene ke lem rojgare da Yiddîş bekar dehênin. Bo mawey çendîn sedan, Yiddîş zimanî qise pêkirdinî Cûlekanî Urrûpay Rojhe

llat bûwe. Le sedekanî nêwerrastda rawedûnanî Cûlekekan bûwe hoy koçî bekomellî ewan le nawçekanî Allmanî zimanî Raynî Xuwarû (Lower Rhine) berew Urrûpay rojhellatî Sillavî- ziman. Penaberekan zimanî xoşyan legell xoyan bird: 'Ibirî, zimanî nerîtî pîrozî ewan û, Yiddîş ke ew serubendî hêşta şêwezarî Nêwerrastî Allmanî Serû bû, jimareyekî zor wuşey be reçellek 'Ibirî têda bû. Yiddîş ke le komellgey axawtinî Allmanî hellbirrabû, serbexoyane dirêjey be pêşweçûnî xoyda. Ta berayîyekanî Sedey Bîstem Cûlekekanî Urrûpay Rojhellat her dûk zimanekan, wate 'Ibirî û Yiddîşyan, wekû dûzarêtêkî (diglossia) ronîştû bekar dehêna.

Her kam le zimanekan erkî damezraw û ronîştûy xoyan hebû: 'Ibirî zimanî nûsînî dîn û felsefe, têkellawî û pêwendîy zanayane, sened û bellge û peymanan bû. Yiddîşîş zimanî qise pêkirdinî rojane bû. Bellam Yiddîş zor zû wekû zimanî nûsînî xellkî perwerde nedîtû, be taybetî jinan pêş xira. Perwerde nedîtû bew manayey ke le pile û payey xwêndin û perwerdey cûlekeyîda perwerdenedîtû ew kesane bûn ke neyandetuwanî 'Ibirî bixwêninewe û binûsn. Le ber ewey ke becêhênanî dînî Cûleke hemîşe girêdirawe be xwêndinewe û qiseleserkirdinî kitêbî pîroz, sîstemêkî perwerdeyî ewto saz kira ke fêrî hemû mindallêkî kurrî dekird "zimanî pîroz" bixwênêtewe. Legell eweşda, ew zimaney dersekanî pê degutrawe Yiddîş bû, û kiçan tenê fêrî xwêndinewe û nûsînî Yiddîş dekiran. Ca boye tenanet goya perwerde nedîtûwanîş deyantuwanî bixwêninewe û binûsn. Bellge here berayîyekan be zimanî Yiddîş birîtîn le namey taybetî, wergêrdirawî Tewrrat yan kokirawey çîrokî cindoke û perî, bo ewey çend nimûneyekman bas kirdibê. Yiddîş her le seretawe bew pîtane denûsra ke amrazî pêwendî nûsraw bûn le nêw komellgey Cûlekedda – wate pîtekanî elfubêtkey 'Ibirî. Bo ew mebeste hêndêk allugorr le elfubêyî 'Ibirîda kira bo ewey bo derbirrînî konsonantekan biguncê û bibête sîstemêkî dengnûs, herwek bo Cûlekeyî- Farsî û Cûlekeyî – êspanîyayî (Latino) kira.

Ta kotayîyekanî Sedey 18hem barudoxî dûzarêtî destî kird be hellweşan. Be duway nedarî û lawazî heşîmetî Cûleke le Urrûpay Rojhellatda jimarey kesanî perwerde nedîtû zîyadî kird. Heta dehat xellik zîyatir û zîyatir her deyantuwanî tenê be Yiddîş bixwêninewe û binûsn. Zimanî Yiddîş bû be babetî gengeşe û miştumirrî îdêolojîk. Çassidism, ke bizûtneweyekî dînî bû û le ser binemay 'îrifanî Cûlekeyî hellnrabû, zimanî Yiddîşî be zimanhallî resenî xellkî sade û reşurrût dadena û her boyeş be zimanêkî lebarî dezanî bo becêhênanî parranewe û rêsay dînî. Le çaw rûnakbîrîy Cûleke da: Haskala, Yiddîş tenê jargonêkî bêtam bû ke debû nehêlîdirê û fit bikrê. Bizûtinewey kirêkarîy Cûleke, be taybetî "Bund", zimanî Yiddîşî pêşxist û kirdî be beşêk le platform û bernamey xebatî kultûrî xoy. Zionism Yiddîşî be

pelleyekî reşî kultûrî qêzewenî tarawge dadena ke debû 'Ibirî modêrn cêgey bigrêtewe. Wuşyarîy zimanî, awêtey bîr û boçûnî sîyasî û dînî berz bûwewe.

Peresendinî çapemenî le mawey Sedey Nozdeyemda dewrî here girîngî gêrra bo berew pêşbirdinî zimanî edebî Yiddîş. Yekem weriznamey Urrûpay Rojhellat be zimanî Yiddîş le sallî 1623 le Werşew derkewt. Le sallî 1817 yekem rojnamey rojane be zimanî Yiddîş le Buxarêst derkewt û ta sallî 1912 nizîkey 100 werizname be zimanî Yiddîş le sertasey Urrûpa billaw kiranewe, lewane 20 rojnamey rojane (birwane "Cüdisçes Lexiçon" çapemenî Cûlekeyî"). Edebîyatêkî Yiddîş serî hellhêna û her le seretawe arastey berew amrazî baw û gelwîst, wate çapemenî bû. Romanekanî nûseranî here nasrawî Yiddîş wekû Mendele, Şolem Aleiçem, û Şolem Aş, yekmcar wekû romanî zincîreyî le rojnamekanda billaw kiranewe. Ca boye katêk hewlidan bo damezrandinî standardêkî yekgirtû destîpêkird zimanêkî modêrnî nûsînî Yiddîş le ara da hebû.

Her zû le seretawe, standardkaranî Yiddîş legell kêşey corawcorî lehcan berewrû bûn. Lehcegelî Bakûrî Rojhellatî Yiddîş (NEY) ke le dewruberî Vilna le Lithuania qiseyan pêdekira, lehcey Başûrî Rojhellatî Yiddîş (SEY) ke le Wolhynia, Podolia, Bessarabia û Romania qiseyan pêdekira û lehcey Nêwendîy Rojhellatî (ÇEY), ke le Lehêstan qisey pêdekira (lehcegelî Rojawayî Yiddîş ke le nawçe Allmanî zimanekan qisey pêdekira kewte ber pêvajoyekî tuwandnewey wurde wurde û emeş peyda bûnî şêwezarekanî Cûlekeyî – Allmanî be dû dahat, birwane(Weinberg 1969). Ew sê lehcan le hêndek layenî dengsazî û wuşewe cîyawazîyan heye, û le binaxey wuşe (serif)îşda. Yiddîşî modêrnî nûsîn be her sê lehcekan serî hellhêna, egerçî her kam le lehcekan bekarhênanî taybetî bedezgayîkirawî xoy bedest hêna. Le sedey Bîstemda, Yiddîşî Başûrî Rojhellatî zimanî tîyatir bû, Yiddîşî Bakûrî Rojhellatî le çapemenîda bandest bû, û pexişan be têkellawêk le lehcegelî Yiddîşî Başûrî Rojhellatî û Yiddîşî Nêwendî Rojhellatî denûsra. Ew erkane pêwendîyan be dabeşbûnî cugrafîyayî nêwendekanî çalakî kultûrî û, hellbet lehcey bûmî nûserkanewe hebû (birwane. Şçaeçter 1977:38-39).

Kame şêwezar debû wepêş bixrê bo standard kirdin û yekgirtinewe? be dawerî kirdin be pêy zorbe, wa wêdeçû Yiddîşî Başûrî Rojhellatî bandest bê, le sallî 1925 mamostayan û zanayan Enîstîtûy Zanistîy Cûleke YIVO) yidiwser visensaftlixer institut) yan damezrand. Ew enîstîtûwe ke nêwendî le Vilna, le Lithuania bû, bernameyekî aşkray hebû bo standard kirdin û yekgirtinewey bekarhênanî zimanî Yiddîş. Zorbey endamanî YIVO bo nimûne Max Weinreich, be Yiddîşî Bakûrî Rojhellatî qiseyan dekird, û temayan girt lehceyî Yiddîşî Bakûrî rojhellatî, ke rûnakbîranî Vilna qiseyan pêdekird, wekû

pêwer damezrênin (Şaçter 1977). Ew enîstîtûye xizmetî gewrey kird be pêvajoy standard kirdinî zimanî Yiddîş, rênûsêkî standardî gellalle kird û lewe da serkewt pêşweçûnî zimanî Yiddîş yan "awsbaw" y wate dirêjbûnewey le pêwendî legell zimanî Allmanîda pêş bixa (birwane Kloss 1967) karlêkerî Allmanî le ser rênûsî Yiddîş – wekû nîşandanî hawtay rîşeyî wavêlêkî dirêjî Allmanî be /h/ be duway vawêlekeda hellgîra û fit kira. Yiddîş debû pêroyî le xallbendî bika, egerçî wuşe 'Ibirîyekan le henbaney wuşeyî Yiddîş da rênûsî 'Ibirî xoyan parast, sererray xallbendî Cwêyan le zimanî Yiddîş da. Bem şêweye dûzarêtî(diglossia) le nêw sîstêmî rênûs da parêzra. Legell eweşda, rênûsî standardî YIVO ew zimane edebîye modêrîneyî Yiddîşî ke le ara da bû le berçaw nedegirt, ke ta rradeyekî zor le ser binemay Yiddîşî Başûrî Rojhellatî û nêwendîy Rojhellatî dandirabû. Sereray pile û payey standardî YIVO le lay zor le zanayan, ew standarde neytuwanî pesindêkî berbillaw bedest bihênê.(Şaçter 1977:36). Şaçter be texmîn dellê le rastîda lewaneye kemtir le %1 le nêw axêweranî bûmîda – hîç ejimarêk be destewe nîye - le barudoxî Rojaneda ew şêwazare standardkirawe bekar bihênin. Le mawey sallanî 1920 kan le Yekêtî Sovyêt hewill dira rênûsî Yiddîş çaksazî têda bikrê. Ewe tenya hewllêk bû ke bo standard kirdinî Yiddîş be piştîwanî dawdezagay dewlletî berrêweçû. Ew çaksazîyey Sovyêtî hewllî da pirênsîpekanî fonêtîkî le ser gişt sîstêmî rênûsda pîyade bika. Ca boye, wuşe 'Ibirîyekan îtir çibirr be pêroyî û reçaw kirdinî rêsa rênûsîyekanî 'Ibrî nedenûsran, bellkû be pêyî telefuzkirdin û derbirrînyan le zimanî Yiddîş da denûsran.

Korr û komelle nerîtîyekan le ast ew çaksazîye milyan sawî û xorragirîyan kird û em rêformeş duwacar le ber gorranî sîyasetî zimanî Yekêtî sovyêt, ke pêşxistinî zimane kemayetîyekanî kirde fîday tuwandineweyan le nêw zorbey Rûs – zimanda, sernekewt.

4. Ezimûnî zimanî Kurdî: corawcorî standardekan

Le akamî koç û koçberî da, Kurdî nek her le herêmî Kurdistan ke le nêwan Tirkîye, Sûrîye, 'êraq, êran û Yekêtî sovîyêt da dabeş kirawe qisey pêdekirê, bellkû zimanî nizîk nîw mîlyon muhacîrî Kurdîşe le Urrûpay Rojava. Pêvajoy standard kirdinî zimanî Kurdî hêşta zor sawaye. De rastîda, zorbey Kurdekan le êran, Sûrîye, û Tirkîye hêşta be zimanî bûmî xoyan nexwêndewarin. Lew wullatane sîyasetî resmî pêşî be berewpêşçûnî şêwezarêkî edebî serbexo girtûwe be nikûllîkirdin lewey Kurdekan be zimanî xoyan perwerde bikrên û mafî billaw kirdnewey kerestey çapkîrawyan be zimanî Kurdî hebê. Boye pirrojey zimanî û edebî tenê be çalakî nihênî bizûtnewe berhellstkarekan sinûrdar bûwe. Le Yekêtî sovyêt û 'êraq zimanî Kurdî, be lanî kemewe bo çend sallan piley zimanêkî kemayetî hebûwe, û standardkirdinî zimaneke be rresmî piştîwanî lêkirawe. Cîyawazî zor û berçawî lehcekan

Le nêwan ew şêwezaraneş le Başûr û Bakûrî Kurdistan qiseyan pêdekrê û guşarî kultûrî le layen her kam le îdare dewlletîyekanewe le ser zimanî Kurdî bûwe hoy serhelldanî pêvajoy cîyawazî standard kirdin. Boye ême dekrê sê şêwezarî edebîy Kurdî cîyawaz le yekitrî hellawêrîn.

a. Şêwezarî Silêmanî

Standardêkî baş damezrawî edebîye, ew şêwezare le ser binemay dîyalêkitî Soranî beşe Başûrîyekanî Kurdistan le 'êraq û êran dandirawe, û bew corey ke le şarî Silêmanî qisey pêdekrê. Yekem çalakî edebî bew lehceye ew şê'rane weber degirin ke le Sedey 19yemda billaw bûnewe, le katêkda yekem weriznamekan le kotayî ew sedeye da derkewtin.

Standard kirdinî ziman le layen îdarey Birîtanîyayîyewe dine dedira, û le nêw ew îdareyeda hakmî Birîtanîyayî û lêkolerewe E.Soane kesî here berçaw bû, û le ber guşarî Birîtanîyayîyekan bû ke le sallî 1931 da Soranî wekû dûyem zimanî resmî le 'êraq nasra. Ew şêwezare be elfubêtkewekî allugorrkirawî 'Errebî – Farsî denûsrê, û vawêlekan le sîstêmêkî rênûsî fonêmîk da cêyan kirawetewe her be heman şêwey ke Yiddîş allugorrî le elfubêyî 'Ibrî da pêk hênawe. Soranî zimanî xwêndinge Kurdîyekan, edebîyatêkî hemûlayene, mîdîya û tenanet zankoyanîş bû le hêndêk le beşekanî 'êraq, ta ew katey ke le sallanî 1970kanda otonomî kultûrî Kurdî le layen hukûmetewe hellweşêndira.

b. Kurdîy Standard le Yekêti sovyêt

Le ser binemay lehcey Kirmancîy Bakûrî dandirawe bew şêweyey le beşe Başûrîyekanî komarî Hermenistan qisey pêdekrê, le dewruberî şarî Yêrîwan, Kurdî nûsraw le Yekêti sovyêt elfubêyî Sîrîlîk be kar dehênê ke le sallanî 1940kanda dahatûwe. Elfubêy Kurdîy – Sovîyêt le layen komellêk le zimannasanewe ke le enîstîtûy lêkollînewekanî êranî Lênîngirad karyan dekird gellalle kira, û ew dahênaneyan le ser binemay lêkollîneweyekî çirrupirr bû sebarete be kerestey lehceke. Boye hewlyan dawê dengikan le rênûs da be wurdî derbikewin û nîşaney le merr xoyan hebê. Legell eweşda be karhênanî ew rênûse ta radeyekî zor her sinûrdare be zimannasan û rûnakbîran le nêw be texmîn 100.000 Kurd le Yekêti sovyêt da. Billawkirawekan birîtin le pexişan, çendîn kitêbî medrese û he

rweha qamûs û kitêbî rêzimanî Kurdî. Jimareyek le billawkirawekan be aşkira tenê le merr rênûs û standard kirdinin (Bakaev 1983(Kurdoev 1957, E'vdal 1958). Miro dekrê ta ew cêye biçê û bew akame biga ke rêjeyekî saxte heye le nêwan ew karey le Yekêtî sovîyêt kirawe sebarek be şîkirdnewey şêwezare kurdîyekan û wexo kirdinî rênûsêkî standard, û ew serincey ke bîrurray giştî bew karaney dawê hem le nêwxoy wullat û hem le derewe. Hellbet, kordolojîstekan, bo hewlêkî ewto zor qerzdarî Sovîyêtin.

c. Şêwezarî Bedirxan

Ke be şêwezarî 'Hawar' îş nasrawe, em standardî nûsîne yekemcar le layen Mîr Celadet Bedirxan le weriznamey "Hawar"da, ke le nêwan sallanî 1932 û 1943 le Dîmîşq û Beyrût billaw debûwewe nasêndira. Ew şêwezare le ser binemay ew lehce Kirmancîye ye ke le nawçekanî Cizîre û Hekarî, le ser sinûrî Tirkîye- Sûrîye û Tirkîye - 'êraq qisey pêdekrê. Ew lehceye nerîtêkî dûrudirêjî heye wekû amrazî nûsîn û degatewe dastane hemaşîyekanî sedey 11 hem.

Serhellhênanî wekû wesîleyekî modêrnî edebî dekrê ta derkewtinî rojnamey "Kurdistan" le sallî 1898 şwêngêrrî bîkrê, "Kurdistan" le layen rûnakbîranî patrawî Kurd le Qahîre û Istanbûll derdeçû, be bekarhênanî pîtî 'errebî.

Elfubêy modêrrnî Bedirxan xetî latîn bekardehênê bew şêweyey ke lesallî 1928 be çaksazî zimanî Tirkî le Tirkîye bo nûsînî Tirkî wexo kira be lê zîyad kirdinî çend pîtêk. Ew elfubêye be rrêgey jimareyek rojname û billawkirawe le nêw Kurdekanî Tirkîye û Sûrîye da billaw kirawe ke lew wullatane û le tarawge derdeçûn, û duwatir ew rêkxstine nihênîyaney Kurdekan we xoyan kird ke seryan lew qedexe resmîyey desû ke leser billawkirawe Kurdîyekan dandirabû. Leweta kodetay nîzamî le Tirkîye le sallî 1980 tenanet ew core çalakîye edebîye nihênîyaneş rawestawin. Pêşweçûnî zîyatirî zimanî nûsînî Kirmancî sinûrdar kirawe be bizûtinewe patrawekan le Urrûpay Rojawa, be şêwey serekî le Swêd, Almanî Rojawa, Bêlîjk, Feranse û Holend.Çendîn derzen rojname le ser binemay pêwerî "Hawar" êsta be berdewamî lew wullatane derdekewin. Zorbey ewan le layen rêkxistine nasyonâlîstîyekanî henderanewe billaw dekrênewe û be asayî tenê degene dest heşîmetî endamyan. Leber sinûdarbûn û bertengî deretanî billawkirdnewey xwêndewarî be zimanî zigmakî le nêw muhacîran le henderan, nebûnî piştîwanî resmî û nebûnî enîstîtûgelî zimanî didanpêdahatû û

lêweşawe, rojnamenûsan, nûseran û xwênerewani Kurd tûşî zincîreyek dûrrêyan hatûn ke be şêwezarî "Hawar" çareser nekrawe. Corawcorî lehce û karlêkerî xestî zimananî edebî le wullatanî corbecorî eslî ke muhaceretyan lêwe kirawe û ew wullataney muhaceretyan bo kirawe bûwete hoy têkewlêkeyî, û le zor nimûnanda rênûsêkî sererroyaney lêkewtûwetewe leber nebûnî peymanêk sebarete be rênûsêkî yekgirtû le nêwan ew Kurdaney wa le Urrûpay Rojava dejîn û denûsn. Şêwekanî ke ew têkewlêkeyî û şipirzeyîyey rênûs karî lêkirdûn hem nwênerayetî kirdinî fonêm û hem sinûrî wuşan degrêtewe (birwane Matras 1989). Ew seregêjîye zor car serhelldeda çunkû ew wuşaney dadetaşrên û dekardekrên zor car karî taqe kesî nûseranyanin.

Nebûnî yekêtî dekrê bigutrê berhellstêke le ser rêgey peyda bûnî xwêndewarîyekî modêrnî Kurdî, çunkû eme be şêweyekî cîdî gorrînewey ezmûn û kerestey edebî le nêwan şêwezare cîyawaze edebîyekan berteng deka. Legell eweşda, be le ber çaw girtinî helumercî peydabûnî le wullatanî corbecor da, miro debê be çawî rêzewe lew hewlane birwanê ke plandarêjanî ziman deyden bo guncandinî her kam le şêwezare edebîyekan legell dewrubere komellayetî sîyasî û zimanîyekanyan. Xwêndewarî Kurdî bê ewey xoy lê biparêzrê pêwendî peyda deketewe be dûzmaneyetî û dû xwêndewarêtî: zimanî Kurdî qet yekem zimanî edebî nebûwe û xwêndewarî Kurdîş ta radeyek tefennunîye. Ca boye hîç Kurdêkî taqzimana nîne ke xwêndewarîyan be Kurdî hebê, û ne Kurdî taqzimanêş heye ke xwêndewarîyan be çî zimanêkî dîke hebê. Xwêndewarî Kurdî be rêgey xwêndewarî le zimanî resmîy dewlletî da wedest dê û şêwezare edebîyekanîş be pêy wullatanî eslî cîyawazin, hem le rûy mêjûyîyewe (hellbijardinî lehceyek bo bekarhênan wekû şêwazêkî standard û hellbijardinî sîstimêkî nûsîn) û hemîş le rûy hawzemanîyewe (bekar hênanî wuşey xuwazrawe). Asoy dahatû wênaçê be taybetî şêwezarî Hawar, ke qet hîç core piştîwanîyekî hukûmetî lê nekirawe, lew core hokarane cwê bikatewe. Le dirêjxayenda çalakî edebî le henderan le waneye bibête hoy hestan û peyda bûnî nuxbeyekî sîyasî kultûrî, ke, eger şansî bidrêtê bo damezrandinî otonomîyekî kultûrî le Kurdistan, le waneye ew zimane edebîye legell xoy bibatewe û ew core enîstîtûwane damezrêne ke pêwîstin bo rêwşwên daran bo gîrugiriftekanî rênûs û wuşe sazî.

Le kurt xayen da rêkxistine Kurdîye muhacîrekan amancyan eweye xwêndewarî [be Kurdî] le nêwan ew wece genctiraneyda ke le Urrûpa dejîn billaw bikenewe. Legell eweşda, pirrojey ewto zor kemin, û hawkarîyekî kemîş heye le layen karbedestanî wullatanî muhacîr bo hatû û meyl û mirxêkî zor kem le layen Kurdekanewe ke her êsta le nêwan wefadarîy be xwêndewarî be zimane dewlletîyekanî ew

wullataney lêwey hatûn le layekewe, û zimanî ew wullataney boy hatûn le layekî dîkewe gîryan kirdûwe.

5. Romanî: mil le ber mil nanî dijwarîyan

Romanî wekû lehceyekî Hîndî geştiye Urrûpa hawkat legell derperrandin û derkirdinî gelî Romanî le zêdî esllîyanewe û le berayîyekanî Sedekanî Nêwerrast da wekû koyle le layen împiratorî Byzantine ra raguwêzrane Urrûpa. Ew zimane binaxey ristesazî û wuşesazî ke le zimanekanî Hîndîy Bakûrî da hawbeşin parastûwe, egerçî zimanekanî Ballkan karlêkerîyekî zoryan lêkirdûwe bo hêndêk taze kirdinewey berçawî nehwî û wuşewe. Gelî roma, be sedan sall, gelêkî rawniraw, ferq û cîyawazî legell kiraw û nedar bûn le sertaserî wêşikarroy [qarre] Urrûpa da.

Ta em sedeye, Sedey Bîstem xwêndewarî le kultûrî Romanî da, şitêkî pê nezandiraw bû, û nerîtî zarekî tenya girêyêkî kultûrî bû ke ew gewretirîn kemayetîye bêwullatey Urrûpay be yekitrî debestewe. Yekem hewldan bo bekarhênanî Romanî wekû zimanî nûsîn le mawey sallanî 1920kan û 1930 yekanda le Yekêtî Sovîyêt destîpêkird, wekû beşêk le sîyasetî giştî geşepêdanî bekar hênanî zimanî kemayetî. Be pêy destpêşxerî dewletî enîstîtûyekî perwerde damezra bo pêgeyandinî mamosta, û lêkollînewe le fonêtîkî zimaneke be mebestî yarmetîkirdin be sazîkirdinî normêkî yekgirtûy rênûs bo bekarhênan le medresekanda berrêweçû. Jimareyek kitêb û billawkirawe derkewtin û bizûtneweyekî zimanî peregir le biwarî perwerde, film, tîyatir û wergêranda çalak bû (birwane Puxon 1981). Legell eweşda, standard kirdinî Romanî le Yekêtî Sovîyêt tak kewtû mayewe û le derewey Sovîyêt pêy nedeandira. Le akamî komellkujî (Holoçawst) gelî Roma le cengey Şerrî Dûyemî cîhanîda bizûtnewey zimanî Romanî xaşebirr kira. Duway şerr, zimanî nûsrawî Romanî carêkî dîke serî helldawe wekû zimanî şêrî rûnakbîranî Romanî zîyatir le Bulxaristan, Yogosllavîya û Mecaristan da. Bizûtneweyekî rêkxirawî zimanî ta sallî 1971 danemezra. Lew salleda Yekêtî Nêwneteweyî Romanî le Lenden damezra. Le mawey bîst sallî rabirdû, û ta ew duwayîyaneş, bekarhênanî Romanî nûsraw tenê le layen korrêkî piçûkî derzenêk zimannas, rûnakbîr û ew têkoşeraney ke ser be Yekêtî Nêwneteweyî Romanî bûn bekar dehat. Hêndêk lewan wekû lan Hançoçk, Marçel Çortiyade, û Cusuf Saip û kesanî dîke le biwarî ziman da çalak bûn hem bo şîkirdinewey û hem bo norm bo dananî. Yekêtî Nêwneteweyî Romanî le konfiransekey da gellalley elfubêyekî yekgirtûy xiste ber bas bo ewey le pêwendî nameyî, le edebîyat, bo nûsînî qamûs, kitêbî rêziman û le wergêrranî Incîl da bekar bihêndirê. Gowarî "Rroma" ke ser be Yekêtî Nêwneteweyî ye

û le sallî 1974 damezrawe tenê carubar şê'r û çendîn nûsrawey kurtî be zimanî Romanî billaw kirdûwetewe. Tenê çend derzen billaw kirawe û kitêb be zimanî Romanî hene, be pêçewaney be sedan berhemî ke sebare be zimaneke billaw kirawinetewe.

Le Yugoslavîya ta rradeyek Romanî nûsraw zor be berbillawtir dekar dekirdirê, beşêkî le ber billawbûnewey bernamey hewtûwaney radyo û têtêvîzyonî be zimanî Romanîye. Le Swêd, Norruwêj û lew duwayîyaneşda le Mecarstan çendîn kitêbî medrese û mindallan û herweha bernamey xwêndewar kirdinî gewresallan hen. Qonaxêkî nwê henûke bo standard kirdinî zimanî Romanî destîpêkirdûwe be peyda bûnî rêxirawey sîyasî û mafî medenî Romanî hem le Urrûpay Rojhellat û hem le Urrûpay Rojava.

Le sallî 1989 bemlawe têkellawî û pêwendîyekî çirrtir le nêw yekêtîyekanda heye be dem zîyadbûnî hewil û têkoşan bo hawseng kirdin û yekxistinî çalakîyekanî mafî medenî Romanî le sertaserî Urrûpa da. Êsta jimareyek rojname û xebername billaw debnewe ke beşêk le nêwerokyan be zimanî Romanî denûsrên û her weha jimareyekî le zêde billavok û name ke rûyan le heşîmetî endamî yekêtîye Romanîyekane û be zimanî zigmakî denûsrên. Be giştî, rêkkewtin le ser çilonayetî rênûs be pêyî sîstêmî rênûsî zimanî dewletî ew wullatane ye ke ew çalakîyaney têda dekrê. Ew rastîye zor car hewldanêkî girîng dexate ser estoy berdengekan bo ewey pêwendî nêwneteweyî şwêngêrrî biken û billawkiranewey billawkirawekan le astî wullatêkda sinûrdar deka. Gişt xellkî Roma dû zimanen, bellam tenya kemayetîyek denêw Romakanî Urrûpaye da xwêndewarî çalakin. Kultûrî Romanî takû êsta be girdibrî zarekî bûwe. Le rastîda, zor le komellge romanîyekan tirsî eweyan heye standard kiranî zimanekeyan lewaneyê hatine nêw û agadabûnî na-Rromakan lemerr komellgekeyan hasan bika, be taybetî ew karbedeste îdarîyaney ke mebestyane dirêje be çawedêrî nerîtî xoyan be ser komellgeke da biden û hengawî azarderane be dijî Roma hellbihênnewe.

Le rastîda, xwêndewarîy Romanî êsta wekû erkêk bo gorranî boçûn sebare be pêdawîstîye kultûrî û sîyasîyekan serhelldehênê, û hewil deda xorrêkxistinî sîyasî û kultûrî le wullatanî corbecor û le Urrûpa da be giştî berew pêş berê (birrwane ew kitêbey Hançoçk, ke le jêr çap daye). Herwekû nimûney Kurdî, xwêndewarîy Romanîş le biwarî xwêndewarîy çalak da be lanî kemewe le ser binçîney zimanêkî dîkeye (û her boyeş le nêw rûnakbîranda be sinûre) û zîyatir bestirawetewe be çalakî nasyonalîstîyewe ta ewey girêdiraw bê be çalakîyekanî mafî medenîyewe. Be le ber çawgirtinî ewey ke zorbey Romakan le derfetî destrageyiştin be seretayîtirîn şêwey xwêndin û perwerde û pêgeyiştin bê beşin, billawkirdinewey x wêndewarî de nêw ewanda le hallî hazir da lewaneyê wek

xeyallêk weber çaw bê. Helumercî sîyasî û komellayetî xellkî Roma le hallî hazir da be zehmet derfetî ewe bo zorbey ewan derrexsênê lew çuwarçêwe bedezgayîkirawane nizîk bibnewe ke bo xwêndewar bûn pêwîstin, û ew dawudezga Romanîyaneş ke êsta hen derfet û serçawey pêwîstî darayîyan nîye bo ewey bituwanin pere be çalakîyekanyan biden. Pêşkewtinî zîyatir bestirawetewe be şans û derfetî nuxbey rûnakbîr ke debê serbexoyî kultûrî xoyan wekû kemayetî bêwillat le Urrûpa damezrênin. Wa wêdeçê pêdawîstî be xomandû kirdin û bangeşey dillsardkerewey zor sallî dîke hebê le nêw danîştûwanî zorbey na- Romanî û dezga destelatdarekanyan da bo ewey wekû kemayetîyekî kultûrî û zimanî didanyan pêda bihênin û bîyannasn.

6. Berew Şêwenasîyekî Standard Kirdinî na Resmî

6.1 standardkirdin bo çî? gorran lenerîtî zarekîyewe boedebî

Fişman (1989) amaje deka be pêwendî nizîkî nêwan standard kirdinî zimane kemayetîye êtinîkîyekan û pêwîstî yan engêze bo selmandinî mîratî zimanî û kirdey zimanî. Standard kirdin peyweste be pêvajoy modêrn kirdin ke zor car nasyonalîzimî be dû da dê, be le berçawgirtinî gorran le pêkhatey komellayetî û nimûnekanî pênasekirdinda û pêdawîstî be seqamgîr kirdinî mexrecêkî berîntirî hawbeş le komellge da. Ca, em pêvajoye le hêndêk baranewe bazineyî ye, çunkû nasyonalîzim, her ke modêrn kirdin wurûjandî û wexoy xist, zor car amancî gerranewe ye bo ser reçellek yan "pakî" êtinîkî – kultûrî. Barî zimanî yan komellnasî zimanî em nasyonalîzime beyekewe girê dirawin û lew nimûneyeda birîtin le parastinî ziman, her nebê lew nimûnaneyda, ke modêrn kirdin herreşe deka bibête hoy gorrînî ziman û le akamda ziman le nêwçûn, û parastinî zimanî kemayetî debê berrêgey destpêşxerî rêkxistû desteber bîkrê.

Le her sê nimûney ew zimananey çawiman lêkirdin wa wêdeçê hîç "metirsî" rastewxoy le nêwçûnî tewawî zimanî le gorrêda nebê. Ber le komellkujî Cûlekan Holoçawst, Yiddîş sererray sedan sall pêwendî legell zimanî dîke mabûwewe le ber ewey erkî denêw komellgey Cûleke da be başî dîyarî kirabû. Sin'atî kirdin û koç û koçberî bo nêwende şarîyekan çînêkî kirêkarî muhacîrî Cûlekey lêkewtewe ke hêsta be tewawî legell zimanî zorbe, - zimanî xeyrî Cûleke - nasyawî peyda nekirdibû, wate Lehîstanî, Rûsî, Mecaristanî, û htd – bo ewey bituwanê be şêweyekî çalakane le karubarî

rojane yîyanî komellayetî û sîyasî da beşdarî bika. Be peydabûnî em çînî kirêkare Cûlekeye, şarstanîye Yiddîşzimane pêdawîstî be hebûnî çapemenîyekî xeyre dînî be zimanî Yiddîş hate gorrê. Nerîtî edebî ke le nêw komellge Cûlekekanî Urrûpa da rîşeyekî qûllî hebû handerî yekem destpêşxerîyekan bû lew biware da, çunkû nebûnî amrazêkî pêwendî nûsraw le nêw yekem wecî ew muhacîre xerîbe şarnîşînaneda be napesind we berçaw dehat. 'Ibrî, amrazî nûsînî nerîtî, îtir çibirr neydetuwanî ew erke bigêrrê, çunkû bûne pirolêtarya pêkhatay perwerdey gorrîbû: kirêkaran ne katî eweyan hebû û ne derfetî ewe ke be sallanî dirêj be xwêndinî dîniyewe xerêk bin ke pêwîst bû bo fêr bûn û lê rahatinî zimanî pîroz.

Xellkî Roma, ke hellawardinî komellayetîyan ta em rojgareş her berdewame, zimanekey xoyan wekû hellgirî serekî ezmûnî kultûrî xoyan parastûwe, egerçî hêndêk le lehcekanî ew zimane kewtûnete ber karlêkerî û wuşexuwastinewe lew zimananey ke legellîyan depêwendî dabûn. Legell eweşda, perwerdey resmî ewan hemîşe be zimanî dewlletî bûwe û zimanî Romanî neytuwanîwe biçête nêw hîçkam le biwarekanî ew sîstêmewe. Pêwendî nûsraw le nêw komellgey Romanî da zor degmene yan be kirdewe her nîye. Xwêndewarî ta radeyekî zor besnûre be têkellawî legell dawdezgay berrêweberî zorbe û kultûrî zorbe, be bekarhênanî zimanî zorbe. Ca boye xellkî Romay xwêndewar xwêndewarî xoyan le derewey zimanî xoyan û le derewey kultûrî girûpekeday bekar dehênin. Ewan lewaneye netuwawbibnetewe, bellam zorbey ezmûnyan be zimanî dûyeme û bew zimane "enbar" dekirê (birwane Hancockk, le jêr çap daye).

Tuwanewey zimanî le Kurdistan bawe le nêw wecî dûyemî muhacîran bo şare nakurdîyekan, hem le beşekanî Rojaway Tirkîye û hem le Urrûpa. (ême em hellsengandîney xuwarewe tenê le ser şêwezarî Kirmancî dekeyn ke le Kurdistanî Tirkîye û Kurdistanî Sûrîye qîsey pêdekirê, çunkû ewe zimanî nûsînî Kurdîye lew nawçaneda (şêwezarî "Hawar") ke hîç katêk be resmî nenasrawe).Le Tirkîye û le Sûrîye, wexo kirdin û pejrandinî zimanî dewlletî wekû zimanî yekem deşê le layen zorbe û dawdezgakanîyewe biselmêndirê û girê bidrê be baştir kirdinî derfet û şansî miro bo serkewtin.Le Urrûpa, zor le xêzane muhacîrekanî xellkî Kurdistanî Tirkîye zimanî Tirkî wekû zimanî yekemî nêw xêzan wexo deken bo ewey derfetî pêwendî kirdinî mindallekanyan legell destlaldare resmîyekan le wullatî eslî xoyan birrexisênin, bêtû bedillxuwarzî xoyan biçnewe yan be zorî bîyangêrrnewe ewê. Tuwanewey zimanî ta radeyekîş karlêkerî le ser rûnakbîran heye ke asoy perwerdeyî xoyan be zimanî dûyem (be Tirkî) berîntir kirdûwe û le wuzeyan da nîye be şêwezimanî bûmî xoyan bîrurra tazekanyan bas biken, ray guwêzin yan berew pêşî berin.

Bo nimûne, xwêndikaranî Kurd, her ke bîyanewe bas le zanist yan ew têknîkane biken ke le çuwarçêwey dawdezgay zorbe da fêryan bûn, be asayî kodî qise kirdin berew Tirkî degorin (birwane Redider & Rehbein 1987). Standard kirdin lew nimûnaney da çawîyan lêdekeyn, zîyatir lewey ke hewllêk bê bo parastinî zimanî zarekî bo ewey komellge be giştî le destî neda, be mebestî berîntir kirdinî bekarhênanî zimanî bûmî lew biwarane daye ke le barî nerîtîyewe ew erkane zimanî dewllet yan zimanî zorbe ray perrandûn. Lew rûwewe standard kirdin mebestî yekangîrkirdinî xulqandinî rûnakbîranî xwêndewar legell komellgey bûmî ye, ta ewey ewan bo zorbe " le kîs bida". Le heman katda standard kirdin hewllîş deda bo pênasandinî çalakî nwêy kultûrî û boçûn be komellge zimanîyeke xoy, hênanî xwêndewarî bo nêw zimanêk ke tenê nerîtêkî zarekî heye pêwîstî be hêndêk gorran le bayexî kultûrî da heye û dirêj kirdinewey çalakî kultûrî dexuwazê. Lemerr zimanî Yiddîş ewe be manay mil le ber milnanî destelatî nerîtîy xaxamî û çuwarçêwe daxirawe pitewe perwerdeyîyekanî bû ke pêwendî nûsrawî le nêw komellgekeda her bekarubarî dîniyewe besnûr û berteng dekird.

Le nimûney Romanî da têgey " zimanêkî nihênî" ke komellge le beramber kontirrollî derewe da deparêzê bere bere cêy xoy deda be şêweyekî nwê le parastinî kirawe, û bedezgayîkirawî komellge. Têkoşeranî mafî medenî hewil deden zimanî Romanî wekû zimanî nûsîn bekar bihênin bo ewey hasankarî biken bo pêwendî nêwneteweyî le nêwan yekêtîyekananda û pere bew pêwendîyane biden.

Hawşan legell ew pêvajoye êsta rewtek peyda bûwe destelatî nerîtî rêberanî komellgeke berperç dedatewe, ew destellatey ke her birîtî bûwe le wey ke dezgay îdarî na-Rromanî be qise be rresmî nasîwin û ew rewte deyewê rêberîyekî nwêy sîyasî hellbijêrê ke bo destelat û destrroyştûyî xoy pişt be piştîwanî cemawerî bibestê û platformêkî sîyasî rûn û gellallekirawî hebê. Bo nimûne, bellgeyekî de laperreyî – yek lew yekem bellge bernameyîyaney ke be Romanî nûsrawe - wek pêşniyarêk pêşikêş kira be yekem konfirransî fêdrasyonî Rromanîy Urrûpa "EUROM " ke le mangî Novambrî sallî 1990 berrêweçû.

Ezmûnî Kurdîy Kirmancîş her nimûneyekî awa nîşan deda, wate hewil û têkoşanî nuxbey rûnakbîr le tarawge bo saz kirdinî dîyalogêkî nwê legell komellgekeyan le ser binemay bîr û ramanî nwêy komellayetî û sîyasî ke ew nuxbeye xoy emane le derewey komellgey bûmî xoy fêr bûwe. Le beşî xuwareweda ême zor le nizîkitrewe çaw lew erkane dekeyn ke rûnakbîranî xawen dû kultûr xistûyanete ser şanî xoyan le pêvajoy standard kirdinî ziman le derewey dawdezga dewlletîyekananda.

6.2 Ew erkey rûberrwî xwêndewaranî dû zimane debêtewe

Le 30-ê ûtî 1908, konfirransî be nêwbangî lemerr pilewpaye û standard kirdinî zimanî Yiddîş le Çerinovitz,,pêtextî Bukovina, (êsta beşêke le Yekêtî Sovîyêt) destî pêkird. Destpêşxerî saz kirdinî ew kobûneweye Nathan Birnbaum, (1937-1864) bû. Ew le şarî Vîyena le dayk bibû û lewê gewre bibû, zimanî zigmakî Allmanî bû, duway tewaw kirdinî medresey huqûq le Vîyena le sallî 1887, Birnbaum bû be rojnamenûsêkî çalak. Le sallanî berayî pîşey xoyda, Birnbaum zayonîstêkî serlepênaw bû: ewe Birnbaum bû ke zarawey (allmanî) ("Zionismus") darrişt bo nêwzed kirdinî ew bizûtnewe sawaye. Le mawey sallanî 1880 û 189 kanda ew le Vîyena werznamey "Selbst- Emanizipation "y billaw dekirde. Duwacar ew le zayonîzim dabirra le ber ewey ke kultûrî Cûlekey- tarawgey berperç dedayewe.

Birnbaum Cûlekayetî Urrûpay Rojhellatî, be taybetî zimanekey, Yiddîşî, be derbirrînêkî resenî Cûlekebûn dadena. Ew le ser ew bawerre bû, zimanêkî Yiddîşî nwêkirawe, lemper û parêzgarîyeke le ast ew guşaraney bo tuwandnewe dehêndirên. Boye zimanî Yiddîş debê perepêbidrê û standard bikrê.

Brinbaum boxoy debû le pêşda Yiddîş fêr bê. Le sallî 1904 ew destî kird be billaw kirdinewey wutar be zimanî Yiddîş, û le nêwan sallanî 1908 û 1911 da le Çerinovitz dejya, û lewê sernûser û îdîtorî dû rrojnamey "Dos Folk " û "Dokiter Birnboym Voxnblat " bû. Ew le konfirransî Çerinovitz be zimanî Yiddîş qisey kird, bellam be zimanî Allmanî bexêrhatinî mîwanekanî kird bo ew cêjney be boney konfirransekewe berpa kirabû (birrwane Fişman 1980:53). Birnbaum (ke xoy fêrî lehcey Yiddîşî Rojhe llatî – Nêwendî kirdibû!) tenya "Yiddîşîstêk" nebû ke debû fêrî zimaneke bê. Nimûneyekî dîke Vladimir Medem e(1923-1879), sîyasetmedarêkî hellkewtû le bizûtnewey " Bund" da (birrwane176 1-5 117 : 1972 Encyclopaedia Judaica)

Jîyannamey Birnbaum û medem le pêwendî legell ew astey ke zimanî Yiddîşyan dezanî û duwaye engêzey wan bo fêrbûn û pêşxistinî bekar hênanî renge hêndêk seyr weberçawbê. Legell eweşda, perwerdî modêrrn ke le derewey fezayî Yiddîş – axêweran da be dest hatibû be lêbirrawî debê wekû mexrecêkî hawbeş dabindirê bo zorêk le çalakan û têkoşeranî rêbazî bizûtnewey zimanî Yiddîş. Max Weinreiç, haw damezrêney Enîstîtûy Zanistîy Cûleke YIVO, le zankoy Allmanî Marburg dersî xwênd:

Mordkhe Şaçeçter, nwênerêkî hellkewtûy wecî genctirî, YIVO têzî xoy pêşikêşî zankoy Allmanî – axêwerî Vîyena kird. Ewane tenê çend nimûneyekin lewey ke çon standard kirdin wekû erkêk peywest û girêdiraw be perwerdey modêrrn, zanist û bîrkirdinewe le nerîtî "resen" yan bûmî serhe lldeda be danî erkî ewto be şêwe zimanî nawçeyî û bûmî ke be asayî ew core erkane tenê standarde neteweyîye be resmî nasrawekan detuwanin rayan perrênin. Ew takuterayaney ke hem le keş û heway bûmî xoyan û fezay derewey komellgey xoyan agadarin û lêy dezanin nuxbeyekî rûnakbîr pêk dehênin ke detuwanê ezmûn û zanist billaw bikatewe û weîguwêzê.

Rrêformkarî zimanî Kurdî wate Celadet 'Alî Bedirxan le sallî 1893 le Istanbûll le dayik bû le nêw binemalleyekî cêy rêzî xellkî Cizîrey nawçey Botan da le ser sinûrî Tirkîye Sûrîye. Binemalley Bedirxan çendîn serhelldanyan le herêmî xoyanda le nêwerrast Sedey 19 hemda be dijî fermanrrewayî 'Usmanî rêberî kird bû. Katêk împiratur Sulltan 'Ebdulhemîdî Dûyem destelatî bedestewe girt, aştbûneweyekî nwê û sîyasetî yekangîr kirdinî legell eşrafe Kurdekan weber girt. Endamanî binemalle here destrroyştûwe Kurdekan le Istanbûll xwêndyan û le îdarey 'Usmanîda pile û payey gewreyan be dest hêna (birrwane Kendal 1984). Le birî wefadarîyan le ast dewlletî Islamî – 'Usmanîda, ewan azadîyekî zîyatiryan diraye bo çalakî kultûrî. Bedirxanîyekan ke wek xwêndikar yan karmend, le tarawge de jyan legell bîrurramanekanî bizûtnewe neteweyîyekanî Urrûpa û çemke modêrrnekanî dîyarîkirdinî çarey xo nûsînî sîyasî û kultûrî nasyawîyan peyda kird. Ewan destyan kird be billawkirdinewey weriznamey dû zimaney Tirkî – Kurdî ke têyanda hewlyan deda hawnîştimananyan han biden bo wexo kirdin û pîyade kirdinî hêndêk lew ramanane le wullatî bûmî xoyanda, Kurdistan. Ew kirrukaş û têkoşanany binemalle raguwêzran bo birayan Celadet û Kamiran û ewan dirêjeyan pêda, ewan herdûkyan duway ewey komarî nwêy nasyonalistî Tirkîye le sallî 1923 damezra berew tarawge derperrêndiran. Le mawey de sallanî duwatir da Celadet û Kamiran jimareyek rojname û her weha çend kitêbî rêzimanî Kurdîyan billaw kirdewe (karî serekî celadet, "Grammaire Kurde" rêzimanî Kurdî, le duway mirdinî le Parîs le layen Roger Lesçot, we billaw kirayewe. (birrwane 1977 Bedir Khan & Lesçot), ke le ser binemay lehcey xoyan Cizîrî yan Botanî dandirabû û elfubêtkeyekî nwêşyan be bekar hênanî pîtî Latîn dahêna. Ew elfubêtkeye nizîkîyeky zorî legell elfubêtkey modêrrnî Tirkî heye û belanî kemewe ewe desteber deka ke rûnakbîranî Kurd naçalakaneş bûbê fêrî bûn wekû tenya zimanî resmî le komar da, wate zimanî Tirkî. Ca boye zimanî Kurdî ezmûnî dahênanî nwêy têda kira hem le barî şîkirdinewey binemakanî be pêy mêtodî modêrrnî zimannasî û hem çapemenîyekî sîyasî hebû ke wekû amrazêkî zanîyarîder û dineder helldesûrra. Ta nêwerrastekanî sallanî 1960e kanî xayand bo ewey çapemenî ewto rabiguwêzrête nêw Kurdistanî

Tirkîye xoy le layen nuxbeyekî çalakî sîyasî ke le peyda bûnî bizûtnewey berhellistkarî çep le Tirkîye îlhamyen werdegirt û têtîda beşdar bûn. Jimareyek lew têtîkoşerane, ke neyantuwanî serincî girûpe gewretire berhellistkare Tirkekan berew ew zordarîye taybetîye kultûrî û komellayetîyey le Kurdistan da hebû rabikêşin lew rêkxirawane hatine derê û fêdrasyonî Kurdî xoyan û partî sîyasî lemerr xoyan damezrand. Bellam hêştta heman şêwe rêbazî stiratêjî tebilîxî yan hebû, ewan destîyan kird be billawkirdnewey kerestey çapkiraw be Kurdî, bew hîwayey cemawer dengbiden û amadeyan biken bo xorragirî le beranber hengaw û cûllanewekanî hukûmetda. Amrazî rageyandinî giştî nihênî hanî afirandî kultûrîşî da, û jimareyekî kem karî edebî, rêziman, qamûs û her weha pexşanî nerîtî çap kiran (birwane Badilli 1965,, Anter 1967, demo 1977, le gell şitî dîke). Duway ewey erteş le Marsî 1971 da destelatî be destewe girt billaw kirdnewey kerestey ewto zor diwartir bû, û be duway kodetay dûyemî erteş le Sêptabrî 1980 da be tewawî rawesta. Êsta le tarawgey Urrûpay Rojava, billawkirdinewey kerestey çapkirawî bawî Kurdî her le guwên heman nimûney pêşûye. Teqrîben giştî le layen fêdrasyone sîyasîyekanewe billaw dekirênewe be mebestî wegerxistinî heşîmetî muhacîrî Kurd bo piştîwanî le dozekey. Ew kesaney lew core werizname û rojnamaneda denûsn birîtîn le xellkî dûzimane, ke be asayî ew deme têtîkellawî çalakî berhellistkarî bûn ke le zankoyekî Tirkîye (yan Sûrîye), yan le derewey wullat xwêndûyane, û le keş û heway nakurdî da le sîyasetewe gilawin – belanî kemewe wecî pîrtiryan - kirdnewey dewre û polî fêrkirdinî xwêndewarî be Kurdî be giştî beşêke le çalakîye sîyasîyekanî ew fêdrasyonaney tarawge, û herweha billaw kirdnewey çapkiraw be zimanî Kurdîş: kitêb û rojname, ke tenê bo babetî sîyasî yan edebî terxan kirawin, le kobûnewe sîyasîyekanda denasêndirên û defiroşrên.

Le zorbey wullatanî Urrûpa fêdrasyonî muhacîranî Kurd takû êsta neyantuwanîwe lewe da serkewtû bin destelatdaran razî biken be danî mafî xwêndin be mindallanî Kurdî muhacîr be zimanî zigmakî xoyan le çuwar çêwey şebekey xwêndinî resmî da. Tenê le Swêd, ke xwêndin be zimanî zigmakî bo mindallanî muhacîr mafêkî qanûnîye, bernamey ewto heye. Bellam tenanet lewêş, kitêb û kerestey xwêndin zor keme. Ca boye zorbey ewane be pêy destpêşxerî fêrkaranî dû zimanewe amade dekirên be wergêrran yan her nebê wexo kirdinî ew çemkaney le kitêbekanî xwêndinî zimanî zorbe da hen, bo ewey dersî Kurdî billênewe. Jimareyekî kem ke " be pîşe" nûserî Kurdin, wate ew kesaney ta êsta be mawey çendîn sall le çalakî berbillawî edebî da beşdarîyan kirdûwe û karekanyan hem resen e û hem awêneyekî " rasteqîne" ye le şêwe jîyanî nerîtî Kurdî, be asayî tenê le nêw rûnakbîranî Kurd da denasrên ke bo xoyan le çalakî kultûrî yan sîyasîda beşdarin. Ca boye, desteyekî rûnakbîr hen ke normgel û mêtodgelî perwerdeyî û sîyasî komellge xwêndewarekanî ke dîwîane " werdegêrrine ser"

zimanî Kurdî bo ewey le nêw xellk da billawyan bikenewe, û desteyekî zor piçûki tir heîye karasanî bo girûpî yekem deka be rêgey berhemhênanî xwêndewarî nuwê û " resen"î xomallî.

Bo ewey kotayî bem beşe bihênîn ba be kurtî çaw le dewrî rûnakbîranî Romanî bikeyn bo berewjûrbirdinî xwêndewarî bew zimane. Be giştî lêreşda heman nimûne debînîn: le ber ewey kultûrî Romanî be tewawî zarekîye, yekem kesani be Romanîyan nûsîwe ew core kesanen ke hewil deden ew ezmûney le keş û hewayekî na- Romanîda bedestyan hênawe biguwêznewe nêw ew zimane bo ewey kultûrî komellgey xoyanî pê dewllemend biken. Lêreşda, bestên û çuwarçewey em têkoşane çalakî sîyasî yan mafî medenîye. Yekem bekarhênanî çirrî Romanî nûsraw be ewe destîpêkird ke Hançoçk (1988) nêwî lê denê hewlekanî damezrêneranî Yekêtî Nêwneteweyî Romanî bo " yekgirtinewe". Seyr eweye, zorbey ew karaney sebareet be kêşekanî standard kirdinî Romanî kiran rûy le heşîmetî Romanî xoy nebû, bellkû le nêw zimannasan û ew kesaney pêyan xoş bû lêy bizanin le derewey komellge keda billaw kiranewe û ta destîpêkirdinî serubendî dîsan saz kirdinewe le dewuletanî Rojhellatî Urrûpay xayand ke xellkî Roma bituwanin yekêtîyekanî lemerr xoyan damezrênin. Êsta ew yekêtîyane rojname û billawkirawe derdexen ke le nêw heşîmetî endamanyanda billaw dekrênewe.

Ew billawkirawaney ke be zimanî Romanîş keresteyan têdaye hemûyan dû zimanen û zorbey nêwerokî billaw kirawekanyan wêdeçê be zimanî dewlletî bê. Nûserekanîş, her wekû nimûney Kurdî, rûnakbîrin ke zorbeyan çûne medrese yan zankoy dewlletî û le çuwarçewey bizûtnewey cemawerî le pênav dêmokrasîda beşdarîyan kirdûwe û le barî sîyasîyewe têyda çalak bûn, ber lewey rûbikene damezrandinî bizûtneweyekî Romanî le pênav mafî medenîda. Xwêndewarî Romanî hêştâ le nêw xellkî Roma da begiştî billaw nebûwetewe, bellkû zîyatir le nêw endamî yekêtîyekanda besnûre.

Le hêndêk le wullatanî Urrûpay Rojawa, karî mafî medenî le nêw muhacîran û penaberanda ke le wullatanî cor be corî Urrûpay Rojhellatewe hatûn pişt be zimanî Romanî debestê wekû tenya zimanî hawbeş. Ca boye ew beyanname û bultene xeberîyaney le layen çalakanewe le nêw endamanî yekêtî da billaw dekrênewe carubar be zimanî Romanî. Ew yekêtîye Romanîyaney ke hewlî pêwendî legell yekitrî deden be Inglîsî yan Almanî, carcarîş be Feranseî bo yektrî denûsn, bew şertey wergêrr hebin weryangêrrin. Legell eweşda, le zor nimûnanda, çalakanî yekêtîyekan be zimanî Romanî denûsn. Boye Romanî nûsraw, amrazêkî kemayetî pêwendî û name gorrînewe ye tenanet le nêw çalakanî xwêndewar û rûnakbîrî Romanîş da. Herçende destroyştûyî Yekêtî Nêwneteweyî Romanî le nêw cemawerî heşîmetî Romanî be giştî kemîş bê, hîç guman lew rastîye da nîye ke çalakîye

xwêndewarîyekanî degate têkoşeranî yekêti û le sertaserî Urrûpa û hanyan deda bo ewey be zimanî bûmî xoyan binûsn. Be awrrikanewe û temaşakirdinî ew nimûnaneq qiseman lêwe kirdin, ême allqeyekî endamanî cût ziman, cût kultûr û xwêndewarî komellgegelî nexwêndewar debînîn ke kewtûnete ber karlêkerî têknîkî billawkirdinewey giştî bîrurramanan û le katî pêwendî legell hêndêk le dawdezgakan û bizûtnewe îdêolojîyekanî komellgey zorbe da fêryan bûn û lêyan rahatûn.

Be têgeyîştin û pêzanînî berijewendîye taybetîyekanî girûpî xoyan, ewan hewil deden hêndêk lew bîr û rayane rabiguwêzine nêw xellkî xoyan, be bekar hênanî heman kereste û amrazî bangeşe û tebilîxî. Yekem erkî duway cêbecêkirdinî gîrugirifte têknîkîye here berayîyekan wekû hellbijardinî sîstemêkî nûsîn – ême hêndêk le xuwarewetir basî ew gîrugiriftane dekeyn - rêge xoş kirdin û asankarîye bo peyda bûn û derkewtinî bazneyekî berdewam le takuterayan bo ewey xwêndewarî be zimanî bûmî berewjûr berin. Duwaye endamanî ew bazneye meydanî mirx û berijewendî yektrî dewllemend deken, û duwacar ew hewllane degate dahênan û le berdestdabûnî kerestey çapkiraw be zimaneke wek: çapemenî, edebîyat û bangewazî sîyasî, û wergêrran. Kemayetîyek le nêw ew bazneye da hewil deda bo saz kirdinî pirdêk û lêkbestinî xwêndewarî û nerîtgelî zarekî bûmî, dewllemendî û samane kultûrîyekanî wekû beytubaw û çîrokî gel yan goranîyekan denûsêtewe û amadeyan deka bo ewey be çapkirawî billaw bikrênewe. Lew xalle daye ke xwêndewarî be zimanî bûmî le barî çonîyetîyewe zor pitewtir le nêw kultûrî komellgeke da rodenîşê û dademezrê, egerçî hêştasê ême tenê le gell girûpêkî zor kem le kesanî çalak le biwarî xwêndewarî bûmîda serukarman heye.

Le gişt ew pêvajoye da, ew têkoşere du zimanyaney têwey gilawin hem bîr lewe dekenewe bîrurramanî taybetî ke pêwendîyan be nasêney komellgekewe heye billaw bikenewe, hem ew hest yan wuşyarîye lemerr nasêney komellgeke be rrêgey xwêndewarî bûmîda wekû amrazêk billaw bikenewe. Ca boye, ewan hem debê mil le ber milî ew erke binên ke karekanyan nêwerokêkî lebarî ewtoy hebê ke serincî giştî berew lay xoyan rakêşin û hemîş torrêkî billawkirdinewe damezrênin bo billaw kirdinewey kerestey nûsraw. Lew bareyewe hebûnî dawdezga û ew damezrawaney le berdest dan bê emla û ewla zor girîngin.

6.3 Dewrî Dawdezga Û Enîstîtuwekan

Dû şêwey serekî berewjûrçûnî bedezgayîkirawî zimane nûsrawe kemayetîyekan ke xerîkî serhe llhênanin debê le ber çaw bigîrê. Yekyan peyda kirdin û wedesthênanî cemawerêkî berînî

"bekarhêner" ya cemawerî berînî xwênerewe ye, ewî dîkeşyan mebestî yekxistinî bekarhênanî ew formaneyê ke le zimanî nûsrawda hatûne gorrê. Be asayî, rojname û bernamey radyoyî (ke standardêkî axaftin dadenê)zîyatir lew kereste û kitêbî rênuwênîyane billaw debnewe ke le layen akadêmîye zimanîyekanewe derdeçin, egerçî ewey duwayîyan renga plandananêkî zor wurdîrî bo bekarhênanî ziman le layen xellkî pirofêşinllewe têda bê.

Lem nimûnaney ke ême lêyan derrwanîn billawkirdinewey cemawerîy ew karaney berhem dehêndirên ta çî dereceyek têhellkêşî lêkollînewey akadêmîk û hewlî yekgirtinewey dekirên? ba le zimanî Romanîyewe dest pêbikeyn, ke le her dûk nimûnekey dîke tazebawtir e û hêştî le qonaxî seretayî pêşxistinî pêvajoy standard kirdin daye. Zor lew – renga zorbey ew –têkoşeraney ke be zimanî Romanî denûsn le konfirransekanî Yekêtîy Nêwneteweyî Romanî û miştûmirrekanîşîda beşdarî deken sebarete be yekxistinî rênûs, rêziman û bekarhênanî wuşe. Legell eweşda, ewan hemûyan le billawkirawekanyanda rênûsî zimanêkî dewlletî bekar dehênin bo nûsînî Romanî eweş le ber layenî pirratîk: çunkû ewan be asayî karekanyan le çuwarçêwey ew dewlletey têyda dejîn billaw dekenewe, rênûsî zimanî dewlletî bo cemawerî xwênerewe hasantire. Rênûsêkî yekgirtûy Romanî hêştî wekû xû û xidey zimannasane le nêw endamanî Yekêtîy Nêwnetewî da ke le pêwendî nêwan xoyanda be karî dehênin. Ew rênûse nakrê robinîşê û dekar bikrê çunkû Yekêtîy Nêwneteweyî be hîç cor destî be amrazî rageyandinî giştî ranaga û derfetî bekarhênanî nîye.

ême pêştir basî ew dewreman kird ke çapemenî Yiddîş û edebîyatî Yiddîş gêrawyetî le pêkhênan û damezrandinî zimanêkî modêrnî edebî Yiddîşda. Billawkirdinewey Yiddîşî nûsraw le Urrûpa, be berawurd kirdin legell nimûney Romanî qazancêkî zor serekî hebû: Yiddîş amrazî perwedey giştî bû le fêrge nerîtîyekanî Cûlekan "xeyder" (medresey seretayî) û le "talmed-toyre" (medresey nêwendî) û le "yesive" (Enîstîtûy Xwêndinî Amadeyî Dînî). Legell eweşda, zimanî Yiddîş lew core medrsane da tenê amrazî raguwêstinî zanist bû, nek babetêkî polekan, ca boye serincêkî zorî nedediraye.

Be duway destpêşxerî le layen bizûtnewey kirêkarîyewe, be taybetî çalakanî "Bund" medresey modêrnî Yiddîş le Urrûpay Rojhellat damezrêndiran. Duway Şerrî Cîhanî Yekem serubendî bûjanewe û xemllînî sîstêmî perwerdeyî Yiddîş bû le Urrûpay Rojhellat. Le Ukraine û Rûsîyey Sipî le nêwan sallanî 1921-1931 da 1165 fêrgey Yiddîşziman hebûn. Le akamî gorranî sîyasetî zimanî Yekêtîy sovîyêt le mawey sallanî 1930ekanda, zorbey ew fêrgane daxiran – le Lehîstan le sallî 1921, 60 fêrgey seretayî Yiddîşziman û 35 polî sawayan le 44 şaranda, hebûn. Her lew salle da rêkxirawî nêwendî

fêrgey Cûleke ("Tsentrîrale yidise sul-organizatsie" yan "Tsiso") damezra. Ta sallî 1929 ew rêkxiraweye 219 enîstîtû, le wane 114 fêrgey seretayî, 46 polî sawayan, 52 medreseş şewane, sê xwêndingey amadeyî û medreseyekî perwerde kirdinî mamostayanî berrêwe debird. Rêkxiraweyekî dîke le Lehîstan, komelley fêrge û kultûr ("Sul- un Kulturfverband "), hewt fêrgey seretayî berrêwe debird. Çendîn derzen medreseş le herîmî Balltîk le berayî sallanî 1930kanda be zimanî Yiddîş perwerdeyan deda (birwane Enççilopaedia Cudaiça 1972:433-437).

Ewe nazandirê gelo ew medresane norrmêkî standardyan bekar dehêna yan na, çi ewaney le layen Enîstîtûy Zanistîy Cûleke YIVO we berrêwe deçûn yan ewaney le sayey rrêform da le Yekêtîy sovîyêt hebûn. Le beşekanî dîkey Urrûpay Rojhellat bizûtnewey medrese û xwêndin be zimanî Yiddîş hellweşa ca çi le ber gorranî sîyasetî dewlletî le Yekêtîy sovîyêt, yan le ber Nazîsm û şerr. Henûke, çendîn medreseyî Yiddîş le Dewllete Yekgirtûwekanî Emrîka, Arijantîn û Israyil hen.

Zorbey ewane medreseş nerîtîn ke be zimanî Yiddîş perwerde pêşkêş deken, bellam zimanî Yiddîş wekû babetêk be ders nallênewe. Be giştî ew core damezrawane çaw le hewlekanî standard kirdinî rênûsî Yiddîş helldebwêrin. Reçaw kirdinî norrm û pêwer be pêy ew norrmaney Enîstîtûy Zanistîy Cûleke YIVO daynawe hêştta le layen Komîtey Cêbecêkirdinî Rênûsî Standardkrawî Yiddîş (ÇISYO), berrêwedeçê, ke le sallî 1958 le Dewllete Yekgirtûwekanî Emrîka damezrawe (birwane Gold 1977:318-319).

Kurdî êsta sê şêwezari nûsinî heye ke le ser binemay cîyawazî lehcekan, her kamêkyan elfubêtkey ew zimane serekîyey ke pêwendî letekda heye bekardehênê. Le çuwarçêwey ew norrmey Bedirxan ke le "Hawar" da dayrriştûwe hêştta dereceyekî berçaw le corawcorî rênûs û wuşeyî berçaw dekwê. Legell eweşda ke wexokirdinî lehcey Cizîrî Bedirxan zorêk le gîrugiriftekanî serif û wuşerronan çareser deka, cêy serince amajey pêbikrê ke lemawey bîst sallî rabirdû da çendîn qaîdey rênûs le Urrûpa seryan helldawe û be berbillawî dekar kirawin le çuwarçêwey ew binemayey da ke Bedirxan daynawe, egerçî ewan be pêçewaney ew şêweyen ke Bedirxan xoy bekarî hênawe (bo wurde rîşall le ser em babete birwane Matras 1989). Aşkiraye ewane akamî allugorrî xobexoyîn le nêw nûseran û sernûseranî billawkirawekan le maweyekî dîyarî zemanî da, ta ewey ke cêbecê kirdinî qaîde û rêsay ewto bin ke le layen akadêmîyekewe dandirabê, şitêkî ke her bûnî nîye. Be birryarêkî seretayî lemerr pêroyîkirdin le "Hawar", billawkirawe û rojnamekan egerî ladan û corawcorî yan llêllî û narrûnî teng dekenewe û hawkat norrmeke be xwênerewanî tuwanayekî û nûseran denasênin.

Legell eweşda, le ber gîrugiriftî bewurde rîşallî zortir, yekxistinewe pêvajoyekî le serexo û nasîstematîke. Enîstîtûy Kurd le Parîs be destelatî here lêweşawe le biwarî karubarî zimanî dadendirê, bellam pêşniyarekan û raspardekanî be asayî nagate lay sernûserî rojnamekan û ew gowar û billawkirawaney be berbillawî billaw debinewe.

Be gerranewe ser ewey Haugen ([1972]1969) be qonaxekanî pilandarriştinî zimanî dadenê, miro dekirê bew akame biga le pêvajoy standard kirdin le bê dewlletîda allozîyek le nezmî mentîqî da heye le çaw ew hengawaney ke le şwênî dîke le layen dawdezgay destelatdar û nêwendîyekanda heldegîrin. Yekem destbjêr kirdinî norrm zor car le nêw komellgeyekî axawtin da cîyawaze, çunkû becêhênanî amojgarî enîstîtûwekan – rojnamekan, weşangerekan û, le nimûneyî Yiddîş da, sîstêmî cemawerî fêrgekan – be pêwîstî çawerrêy birryarêkî nêwendî naken bo destbjêr kirdinî şêwezarekî standard. Ca boye qa'îde ronan û girdewekoyî bê bername û cêbecêkirdinî zor car wepêş destbjêr kirdinî norrm be şêweyekî bekomell dekewê û be tewawî kemterxemî dekirê le ronîştinî norrm. Tenê duwatir desteyekî piçûk le standardkaran be pêy destpêşxerî takî xoyan le dewrî yek kodebnewe. Pêşniyarekanî desteyekî ewto hem detuwanê pêvajoyekî ke berrêwe ye dewllemend bika û he mîş detuwanê neyka, bellam be dillnîyayîyewe natuwanê ew pêvajoye bigêrrêtewe qonaxî seretay destpêkirdinî û boye lewe da sernakewê pêşweçûnekey kontirroll bika.

Xallî dûyem eweye, lêweşaweyî û destelatî ew girûp yan dawdezgayaney ke le cîyat gişt takekanî nêw komellgeyek erkî destbjêr kirdinî norrm, qa'îde ronan û girdewekoyî û ronîştinî norrmeke be estowe degirin be pêwîstî berztir nîye lew dawdezgayaney ke cêbecêyan deken. Akamî eme rikeberîyekî berdewam, azad û çareser nekrawe le nêwan gişt ew layenaney le pêvajoy standard kirdinda beşdarin. Be dillnîyayîyewe lêweşaweyî û destelatî akadêmîk serçaweyekî cêyî rêze lew kêberkêyeda, bellam destrageyiştin be cemawerêkî berbillaw le bekarhêneran wêdeçê qazancêkî girdbraney hebê. Her boye ew norrmaney Enîstîtûy Zanistîy Cûleke YIVO bo zimanî Yiddîşî danan ta radeyekî zor le layen ew nûseraney wa be lehcekanî Nêwendî û Başûrî deyannûsî û billawyan dekirdewe gwêyan pênedra û be hênd negîran. Sîstêmî medrese be asayî le layen fêdrasyone komellayetî û sîyasîyekanewe berrêwe deçûn ke nuxbey kultûrî û akadêmîkî lemerr xoyan hebû, û lew sîstêmeda çi cêyekyan bo Enîstîtûy Zanistîy Cûleke YIVO terxan nekirdibû.

Sebarete be zimanî Romanî, corawcorî û fireçeşnî şêwey nûsîn haw terîbe legell jimarey nûseran, û wa dadendirê ke her nûserey qa'îde û rêsay lemerr xoy le berçaw bigrê û cêbecêy ka, ke dîyare hemîşeş wa derinaçê. Egerçî be nakokîş dabîndirê Kurdî ew zimaney, ke nermîyek le xoyewe nîşan

nada bo pirrkirdinewey nêwanî sê şêwazî serekî edebî, bellam şêlgîrîyekî zîyatirî pêwe dîyare bo reçaw kirdin û cêbecêkirdinî ew norrmaney ke bo her kam le şêwezare edebîyekan hen. Eweş be bê guman akamî ew rastîyeye ke destbjêr kirdinî norrm û qa'îde ronan û girdewekoyî le rastîda ber le berrêwe birdin û cêbecêkirdinyan kirawe. Corawcorî û fire çeşinî le nêwxoy şêwezarî " Hawar" da zîyatir le ber nebûnî hengawî ronîştandine, qonaxêk ke "qellembazî" be ser da dirawe, çunkû ne çalakî nihênî û ne çalakî le tarawge le destyan hatûwe rênwênîyekî lebar û hemûlayeney normdaner birrexisênin. Le gişt pêvajoy standard kirdinî na- hukûmetî da, nebûnî destelat pêwendî û têkellawî nêwan cêbecêkirdin û ronîştandin berteng deka û deyxate hellwêstêkî lawekîyewe.

6.4 Qa'îde Ronan Bo Axawtin: Hêndêk Gêre û Kêşey Têkinîkî

Coracorî ewey ême be " şêwezare edebîye serekîye Kurdîyekanî" da denêyn cîyawazî rêzimanî û serifî le nêw her kam lew şêwezarene da kemtir dekatewe. Nûseranî tarawge legell eweşda pêroyî le norrmî Bedirxan deken carubar le lehcey Cizîrê ladedin ew katey wuşey ewto bekar dehênin ke "Hawar" xoy dekarî nekirdûn. Şêwey rênûsî ew wuşane be pêy nimûney dengsazî ew lehce Kurdîy Kirmancîyey nûser qisey pêdeka denûsirên. Ca boye tenanet duway destbjêr kirdinî norrmî seretayîş, nûsîn hêşta be pêy qa'îde ronanî katîy zimanî axawtin dekirê, emeş karlêkerî heye le ser yekxistinewey ziman le layekewe û corawcorî şêwe zimanîyekan le layekî dîkewe. Le katêkda corawcorîy le Yiddîşî nûsraw da le ber destbjêr kirdinî normî cîyawaze, Romanî nûsraw be tewawî pêroyî le nimûney kodekanî zimanî axawtin deka. Boye wexo kirdin û reçaw kirdinî norrmî şêwezarek le beramber kodekanî lemerr zimanêkî axawtinî (tak) da pêwîstîyekî seretayîye ke berew pêşçûnî standard kirdinî pêwe bestirawetewe. Le derewey meseley destbjêr kirdinî norrm, zimanekan lemerr ewey ke ta çende corawcorîy lehceyîyan pêwe dîyare cîyawazîyan legell yektrî heye. Lem sê nimûneyey êmeda, Yiddîş kemtrîn derecey corawcorî lehceyî têda bedî dekirê. Gişt lehcekanî dû layene le yektrî têdegen: cîyawazî taybetîyan le dengî vawêlî fonolojî, car û bar le cîns û dox, û hêndêk şitî wuşeyî û her weha bekarhênanî wuşey xuwazrawe da heye ke le zimane corbecore Urrûpayîyekanayan wergirtûwe ke le gellîyan le pêwendî da bûn. Ew lehce Kurdîyaney ke le Tirkîye û Sûrîye qiseyan pêdekrê giştyan ser be Kurdîy Bakûrî Rojawayî yan destey Kirmancîy Rojawayî (cige le rêzperrî Zaza nebê, ke ême be zimanêkî cîyawazî dadenêyn ke zor le Kurdî nizîk

e). Serreray firerengî lehceyî berçaw le nêwanyanda, wa wêdeçê gişt axêweran le lehcey Cizîrî ke le layen "Hawar"we dekar kira têbigen. Boye coracorîy û fireçeşinî lehceyî nabê berhellistêkî cîdî bê bo ew xwênerewaney hêştâ aşnayetîyan legellî nîye. Dîsan lêreş da zimanî Romanî dekewête rîzî here xuwarewe lemerr ew hokaraney karlêkerîyan heye le ser be birr bûn û karîgerî standard kirdin: corawcorîy û fireçeşnî lehceyî le zimanî Romanî da çî sinûrî nîye û le gişt biwarekanî rêzimanda bederewe (dengsaî, wuşe saî, riste saî û wuşey qamûsî). Ta radeyekî berbillawîş, be taybetî le zimanî nûsraw da, wuşey xuwazrawe dekar dekirdirê, emeş le ber xuwastinewe û qerzkirdinî kultûrî lew biwaraney le nûsîn da basyan lêwe dekirê. Be le ber çawgirtinî cîyawazî zor le nêw ew zimananey da Romanî pêwendîyan pêwe peyda deka û her kam lewan boy debne serçawey lê xuwastinewey wuşe, boye corawcorîy û fireçeşnî le şewekanî nûsînî Romanî da degate lanî here zor.

Ême lêre da hellbijardinî rênûsêk debînîn ke xoy girêdeda be hokarî piratikî destwêrregeştû. Ca boye ew elfubêtkewey le layen formî here destwêrregeştûy xwêndewarî berdest bekar dehêndirê werdegîrê û bekardehêndirê nimûney here aşkira lêreda şewezare nûsrawe cîyawaze Kurdîyekanin, ke elfubêtkewey zimane dewlletîyekanyan wergirtûwe. Yiddîş elfubêtkewey 'Ibrî be kardehênê ke elfubêtkewey hawbeş û bawe le nerîtî nûsraw da bo gişt komellge Cûlekekan le sertaserî dinya da, bê le berçawgirtinî ewey ke zimanî axawtîyan çî bê. Le ber ewey perwerde û xwêndewarî le nêw komellge Cûlekekanda dawdezga û damezrawey nêwxoyî bûn, rênûsî 'Ibrî bo nûsînî Yiddîş sistêmi nûsînî here destwêrregeştû bû. Romanî rêsay cîyawazî rênûsî bekar dehênê, bellam le têkellawî û pêwendîy nêwineteweyî da hemîşe rênûsî Roman (Latînî) dekar deka eweş le ber ewe helldebjêrdirê çunkû be berrbilawî le Urrûpa û Emrîkakan da billaw û bawe.

Pêwendî nêwan dengeziman (phoneme) û dengenûs (grapheme) biwarî here gewrey afirandinî her nûserêkî take. Bê le berçawgirtinî ew rêsayey rênûsî ke wek arastey xoyan dekarî deken, nûseranî Romanî cûtokey gîrî henaseyî konsonantî gîre deng (voiceless stops) be lê zîyad kirdinî denge nûsî h denûsn. Le ber ewey cige le zimanî Allbanî nebê, le hîç zimanêkî dîkey Urrûpayîda cîyawazîyekî ewtoy fonolojî nîye, ême dekrê eme be dahênanêkî makî Romanî dabinêyn ke be pêy boçûnî nûseran lemerr pêkhatay fonolojî û ew şikllaney le ber dest dan dahêndirawin. Nûseranî Kurdî tarawge pîtî /rr / yan le normî Bedirxan zîyad kirdûwe, bo nîşandan û cwêkirdinewey denge zimanî /r / y (kiz le î qellew), û /r/, yan bo nwênerayetî denge konsonantî xişokî gerûyî /r/ danawe. Le layekî dîkewe, parastinî dûzarêtî(diglossia) le sistêmi nûsînî Yiddîş da be parastinî rênûsî 'Ibrî ew wuşaney reçellekî 'Ibrîyan heye be pêçewaney têgey fonolojîye. Legell eweşda, agadarî ewan sebarete be rêzimanî

Yiddîş (wuşê qamûsîyekanî) û wuşyarîyan lemerr nerîtî edebî û rîşenasîye ke lem nimûneye da dinederyane.

Duwacar, kêşey lemerr pirsî wuşê dataşîn zîyatir le hemû miştumirrêk ew rêgeye nîşan de da ke bizûtnewe zimanîyekan tēmawin le nêwan modêrn kirdin û nasyonâlîzim da, le nêwan hênanî nirxî tēknîkî û kultûrî bo nêw zimanekeyan lew dewrubere we ke le gellî le pêwendî dan û parastinî petêtî yan resenayetî da. Bo bizûtnewey zimanî Yiddîş, pêdagirî le ser serbexoyî Yiddîş le zimanî Allmanî ke zorî lê nizîk bû le serûy hemû karekanî bangeşeyî da bû. Legell eweşda, be dem ewewe key Yiddîş bû be zimanî rageyandinî giştî zarawey modêrnî le Allmanîyewe xuwastewe. Dîyare ew pêvajoye ta radeyek dekra be le berdest bûnî wuşey "resen"î 'Ibrî tēhellbihêndirêtewe, ke wekû serçaweyekî taybetî berdewam bo lê xuwastinewey wuşê bo zimanî Yiddîş bekelke.

Nûseranî Kurdî beşî Kurdistanî Tirkîye tēdekoşin le nûsîn da ew wuşane le zimanî Tirkî wer negirn ke le zimanî axawtîyan da bawe. Akamî ewe zor car degate zêdebûnî wuşey xuwazrawey 'Errebî yan Farsî le nûsînyanda, û emeş zor be "resen" tir hest pêdekrê, çunkû bûnî ew core wuşane le Kurdî da degerrêtewe ber le pêwendî çirî zimanî le gell Tirkî modêrnîda. Ca boye birryar dan sebarete be dekarhênanî serçawey wuşey xuwazrawe dekewête ber boçûnî sozawî û ezmûnî şexisî lemerr her kam lew zimananey ke pêwendîyan legell hebûwe. Le zimanî Romanî da, saz kirdinî nawî mana le awellnawan û nawî lêkdiraw be rêgey darriştinî pêçellpêçî doxî xawenêtî ke le zimanî axawtînda baw nîye bere bere debête şêwazêkî cîyawazî edebî. Ew core dahênanane be asayî le xowe saz bûn, wate be pêy bername nekrawin û hemû xwêneweran lêyan tēdegen. Le miştûmirrî sebarete be wuşê xuwastineweda gelêk boçûn û pêşnîyar hen le rêsa danan bo rênûsî ew wuşê Urrûpayîyaney xuwazrawinetewe bigre ta degate bekarhênanî wuşaraney zarawey "resen"y sanskirît (birrwane Coşî 1991).

6.5 Berawurd Kirdinî Helumercî Paşxan, Engêze û Encam

Le beşî pêşû da ême nîşanman da ke berawurd kirdinî rewî qa'îde bo danan û girdewekoyî debê em hokaraney xuwarewe le berçaw bigrê: şêwezarî zimanî û tēgeyîştinî dû layene sebarete bew zimaney le ber bas daye, destbjêr kirdinî norrm le hember rêsa danan bo zimanî qîsekirdin ke le rewteke da werdegîrê, deretanî destwêrrageyîştin be sîstêmî nûsîn, pêwendî nêwan tēgey fonolojî û le berdest dabûnî şikl bo nûsîn, û duwacar pile û hellkewtî zimananî pêwendî le kêşey nêwan bekarhênanî "modêrn" û "resen" y zimanda. Lem beşeda, ême hêndêk le hokare girînge paşxanîyekan kurt

dekeynewe ke karlêkerîyan heye le ser pêvajoy standard kirdin le derewey dawdezga dewlletîyekan û le bê dewlletî da be girêdanî wan le pêwerêkî berawurdkarane bo hellsengandinî standard kirdin:

1. Billaw bûnewey komellgey zimanî

Yiddîş : tarawge

kurdî : zorbey çewsawe, dûre wullat

Rromanî : tarawge

2. Bûnî xwêndewarî le nerîtî kultûrî da

Yiddîş : be ber billawî billaw bûwetewe

kurdî : tenê le nêw nuxbey dînî da

Rromanî: her nîye

3. Astî xwêndewarî le zimanî na-bûmî da

Yiddîş : be zimanî dînî – pîroz

kurdî : tenê wecî cewan

Rromanî : tenê kemayetî le nêw wecî cewan da

4. Dewrî modêrrn kirdin le berewjûrbirdinî xwêndewarî bûmî

Yiddîş : şarnîşînî û pêdawîstî be pêwendî- giştî xeyrî dînî

Kurdî : pêwendî le gell bizûtnewe nasyonalîstîyekan le Urrûpa û legell berhellistkaran

Rromanî : dêmokratîk bûn û be dezgayî bûnî rîkxistinî – xoyî

5. Dewrî nasyonalîzim le berewjûr birdinî xwêndewarî bûmî

Yiddîş: bizûtnewey neteweyî kirêkaran

Kurdî: xorragirî nihênî û le derewey wullat

Rromanî : bizûtnewey rêkxistûy mafî medenî

6. Bekarhênanî dezgayî xwêndewarîy bûmî

Yiddîş : çapemenî, partîye sîyasîyekan, fêrgekan, tîyatir

Kurdî: fêdrasyonekan le derewey wullat

Rromanî : yekêtîyekanî mafî medenî

7.fêrkirdin le medrese

Yiddîş : ta radeyek heye

Kurdî : her nîye (cige le pirrojey taq û loq nebê)

Rromanî : her nîye (cige le pirrojey taq û loq nebê)

8. Destpêşxerîyekan bo Yekgirtinewe

Yiddîş : Enîstîtûy zanistîy Cûleke YIVO

kurdî : destpêşxerî şexisî (Bedirxan)

Rromanî : Yekêtîy Nêwneteweyî Romanî

9. Têkellawî û pêwendî le nêwan destpêşxerî akadêmîk bo yekgirtinewey ziman û ew dawdezgayaney debê cêbecêyan ken.

Yiddîş: ta radeyek le nêw çapemenîda heye

Kurdî: le çuwarçêwey "Hawar" da herdûk nimûnekan yek degirn' duwatir- têkellî kem û lawaz

Rromanî: têkellawî berdewam, bellam be karlêkerîyekî lawazewe

10. Ew biware serekîye zimanîyaney ke le zimanî nûsraw da coracorî û fire çeşnîyan heye

Yiddîş: dezgay dengî wavêl, wuşe xuwastinewe lew zimananey legellyan le pêwendî daye cige le 'lbrî nebê

Kurdî: fonolojî, sinûrî wuşan, wuşe xuwastinewe, dataşînî wuşey nwê

Rromanî: fonolojî, morfolojî, wuşey qamûsî, wuşe xuwastinewe, wuşe dataşîn, sîntaks (nehu, ristesazî)

7. School instruction

Yiddish: Partly exstent

Kurdish: Non-existent (except individual projects)

Romani: Non-existent (except individual projects)

8. Unification initiatives

Yiddish: YIVO

Kurdish: Personal initiative (Bedir Xan)

Romani: International Romani Union

9. Interaction between academic language unification initiative and implementing institutions

Yiddish: Partly existent within the press

Kurdish: Within "Hawar" both instances unite; later - weak interaction

Romani: Regular interaction, but with weak effect

10. Main linguistic domains of variability in the written language

Yiddish: Vowel notation, borrowings from contact languages other than Hebrew

Kurdish: Phonology, word-boundaries, borrowings, lexical innovations

Romani: Phonology, morphology, lexicon, borrowings, innovations, syntax

7. Kurtey bas

Le standard kirdinî derewey dawdezugay dewlletî û le bê dewlletîda, plandarriştinî zimanî le rîzî ew hengawane la deda ke debê le pêvajoy standard kirdinî rêkxiraw da hellbihêndirênewe bo ewey karîgerî hengaw û tegbîre norrm danerekan desteber bîkrên. Ca boye ewe cêy pirsîyare gelo dekrê miro le nimûney awa le cêda basî " plandarriştinî zimanî" bika.Serhellhênanî (xeyrî hukûmetî)

xwêndewarî bûmî le komellgeyekî nexwêndewar da debê têkellawî û pêwendîyekî hawterîb, û ta radeyek, tenanet rikeberaney hebê le nêwan ew dawdezgayaney cêbecêkerin le layekewe û enîstîtûwe norrm danerekan le serêkî dîkewe. Le katêkda dawdezgay cêbecêker hem bîr le billawkirdinewey berînî xwêndewarî bûmî û ramanî taybetî dekenewe bo ewey şêweyekî nwê le seqamgîrîy komellge berew jûr berin, dawdezga norm danerekan hewil deden rêsa û qa'îdey nûsîn yek bixen. Egerçî be ruwallet hîç nakokîyek le nêwan amancekanî ewanda nîye, cêbecêkirdinî ew norrmey gellalle kirawe pêdawîstî be girêdanêkî leserewe bo xuwarewe heye ke rêge deda be destellatî norrm daner dawdezga û enîstîtûy cêbecêker berrêwe berê. Bellam sîlsîle merratîbêkî awa ronîştû û pitew, katêk standard kirdin wekû erkêkî xeyrî hukûmetî encam dedrê, le gorrê da nîye.

Ca boye rewî pêvajoyekî taybetî standard kirdin û akamekey ta radeyekî zor bestirawetewe be komellêk hokarî paşxan ke hellwêstî destpêkirdinî dîyarî deken. Be şîkirdineweyekî wurdî ew core hokarane lewaneye bituwanîn be lanî kemewe pêşbînîyekî giştî bikeyn sebarete be xesllet û karîgerî herdû nîşanekanî pêvajoyeke bo billawkirdinewey xwêndewarîy bûmî û cêbecêkirdinî norrmêkî yekgirtû. Le nêw ew hokarane da ême çawman le billaw bûnewey komellgey axawtin, hebûnî xwêndewarî le nerîtî kultûrî da, û ast û erkî xwêndewarî xeyrî bûmî le komellgegelî dû zarêtî da kirdûwe. Ême basî gorranman kird le pêkhate komellayetîyekan û le deretaneke (modêrn kirdin) û le serhellhênanî dawdezgay nwê û destelladaranî komellge wek ew hokaraney ke bekarhênanî xwêndewarî bûmî dewrûjênin û berew jûrî deben. Zor car bizûtnewe sîyasî û nasyonalistîyekan way lêdê debne hellgirî bekarhênanî dezgayîkirawî şêweyekî nûsînî zimanî bûmî. Be pêy destpêşxerî ewan, dekrê ders gutnewe û fêr kirdin be zimanekê le medrese berrêwe biçê, û le doxêkî awa da billaw bûnewey xwêndewarî bûmî rehendî nwêy lê debêtewe.

Serkewtinî destpêşxerîyekan bo yekgirtinewey derdekewê be derece û astî têkellawî û pêwendî nêwan dawdezgay akadêmîk, damezrawe norrm danerekan û ew dawdezgayaney cêbecêyan deken bestirabêtewe.

Lêreş da, miro debê serinc bidate ser helumercî zimanî û helumercî komellnasîy ziman: Destbjêrkirdinî şîwezarî norrm daner le zimanî nûsraw da şêlgîrîyekî gewretir nîşan deda le kod danan bo zimanî axawtin, egerçî le nimûney le yek tenegeyştinî dû layene û corawcorî û fireçeşnî berbillaw le zimanekeda destwêrrageyştin be norrmêkî ewto le waneye zor diwartir bê. Cige le gêre û kêşey " têkinîkî" qa'îde ronan – destbjêr kirdinî norrm, hellbijardinî sîstêmî nûsîn, rênûs û dahênanî

wuşe -- standard kirdinî cemawerî (xeyrî hukûmetî) le billaw kirdinewey xwêndewarî bûmî da tûşî be tûşî rişd û mahêkî taybetîyewe debê. Le helumercêkda ke kemayetîyekî bêwullat yan zorbeyek nikûllî le mafî dekrê bo geşepêdanî kultûr û zimanî xoy, billawkirdinewey xwêndewarî bûmî û hawseng kirdinî karî here dişware.

Dîsan lêreş da debê amaje bikeyn bew pile û payeyey ke xwêndewarî û be taybetî xwêndewarî be dezgayîkiraw le nêw komellge da heyetî. Komellgelî Cûleke hemîşe nerîtêkî xwêndewarîyan debûjandewe le ser binemay deqe pîrozekanî 'Ibrî le jîyanî rojaney komellge da. Xwêndewarî ewto şitêkî razênerewe û be birîqe nebû, bellkû le ber bawerrêk bû. Ew bawerre parêzra bû, bellam be duway gorranî komellayetî da, jimareyekî lezêdey xellik çibirr îdî le wuzeyan da nebû be ser rêziman û gişt wuşey qamûsî zimanêkî dûyemda zall bin bo ewey xoyan xwêndewar ken.

Ewe geşte hellbijardinî elfubêtker 'Ibrî bo nwênerayetîkirdin û pênuşînî zimanî axawtin. Lew kultûre nexwêndewaraney ke basyan lêwe kira, Kurdî û Rromanî xwêndewarbûn bestirawetewe be xwêndewarbûn be zimanî dewlletî û emeş girêdirawe be destwêrrageştin be kultûrî zorbe û dawdezga û damezrawekanî.

Xwêndewarî be zimanî bûmî le pêşda le layen nuxbeyekî piçûkewe dine dedrê ke le çuwarçêwey qalbî kultûrî komelley zorbe da helldesûrrê. Ca boye billaw kirdinewey xwêndewarî bûmî hîç nebê hêndêk le towekanî kultûrî bêgane deguwêzêtewe. Le ber ewey helumercî bedezgayîkirawî karêkî ewto be asayî le ber dest danîye, xwêndewarî bûmî be çuwarçêwe û bestênî nasyonalîstî yan çalakî mafî medenî besinûre.

8. Jêderekan

Anter, Musa (1967) Kudce-Turkce Sozluk. Istanbul, Yeni Matbaa.

Badilli, Kemal (1965) Turkce izahli Kurtce girameri (Kurmanci, lehjecesi). Ankara: Ankara Basim ve Ciltevi.

Bakaev, Cerkez X. (1983) Osnovy Kurdiskoj ortogiraffi. Moscow: Akademia Nawk.

Bedir Khan, Emir Djeladet & Roger Lescot (1970) Grammaire Kurde (Dialecte kurmandji). Paris: Maisonneuve

Cobarrubias, Juan (1983) "Language planning: The state of the art." Cobarrubias, Juan and Joshua A. Fishman (eds.) Progress in Language Planning. International Perspectives. Berlin/New

York/Amsterdam: Mouton. 3-26.

E'vdal, Emin (1958) Xebnerna k'ordiye r'astnvisandine. Yerevan: Akademia Olmi ya R'SS Ermenie.

Encyclopaedia Judaica. (1972) Vol. 1-16. Jerusalem: Keter.

Ferguson, Charles A. (1961) "The language factor in national development."

Anthropological Linguistics, 4:1, 23-27.

Fishman, Joshua A. (1977) "The phenomenological and linguistic pilgrimage of Yiddish: Some examples of functional and structural pidginization and depidginization."

Fishman, Joshua A. (ed.) Advances in the Creation and Revising of Writing Systems. The Hague:

Mouton. 293-305.

_____(1980) "Attracting a following to high-culture functions for a language of everyday life: The role of the Tshernovits Language Conference in the 'Rise of Yiddish'."

International Journal of the Sociology of Language, 24, 43-73

_____(1989) Language and Ethnicity in Minority Sociolinguistic Perspective.

Clevedon/Philadelphia: Multilingual Matters.

Gold, David (1977) "Successes and failures in the standardization and implementation of Yiddish spelling and romanization." Fishman, Joshua A. (ed.) Advances in the Creation and Revising of Writing Systems. The Hague: Mouton. 307-369.

Hancock, Ian (1988) "Reunification and the role of the International Romani Union." Roma, 29, 9-17.

_____(forthcoming) "Standardization and ethnic defence in emergent non-literate societies:

The Gypsy and Caribbean cases." To appear in: Acton, Thomas and Morgan Dalphinis

(eds.) Language, Blacks and Gypsies. London: Karia Press.

Haugen, Einar (1966 [1972]) "Linguistics and language planning." The Ecology of Language, ed. By E. Haugen. Stanford: Stanford University Press. 159-186.

122

_____(1969 [1972]) "Language planning, theory and practice." The Ecology of

Language, ed. By E. Haugen. Stanford: Stanford University Press. 287-295.

Joshi, Anirudh (1991) "Some suggestions for the standardization of the Romani language." In:

Roma, 33/34, 38-42.

Judisches Lexikon.(1927-1930) Vol. 1-4. Berlin: Judischer Verlag.

Kendal (1964) "Die Kurden unter der osmanischen Herrschaft." Chaliand, Gerard (ed.) Kurdistan

und die Kurden. Vol. 1. Gottingen: Gesellschaft fur Bedirohte Volker. 37-79.

Kloss, Heiniz (1967) "'Abstand Langwages' and 'Ausbaw Langwages4.'" Anthropological Linguistics, 9, 29-41.

Kurdoev, Kanat (1957) Grammatika Kurdiskogo jazyka (kurmandizi). Moscow: Akademija Nawk.

Matiras, Yaron (1989) Probleme der Sprachstandardisierung am Beispiel der Orthographie des Kurdischen. M.A. Thesis. University of Hamburg.

Puxon, Grattan (1981) "Romanes und die Romani Sprachbewegung". Zeitschrift fur Kulturaustausch, 31:4, 455-459.

Ray, Punya Sloka (1963) Language Standardization. The Hague: Mouton & Co. Redder,

Redder, Angelika And Jochen Rehbein (eds.) (1987) "Dokumentation: Kurdische Studenten unterhalten sich uber Kultur." Redder, A. And J. Rehbein (eds.) Arbeiten zur interkulturellen Kommunikation (Osnabrucker Beitrage zur Sprachtheorie 38). 2226.

Schaechter, Mordkhe (1977) "Four schools of thought in Yiddish language planning." Michigan Germanic Studies, 3:2, 34-65.

Uemo, Ereb (1977) flvane Kurd. Istanbul: Ozigurluk Yolu.

Weinberg, Weriner (1969) Die Reste des Judischdewtschen. Stuttgart/Berlin/ Koln/Mainiz: Kohlhammer

~ ~

Serçawey em witare

Matras, Y., & Reershemius, G. (1991). Standardization beyond the state: The cases of Yiddish, Kurdish and Romani. In U. V. Gleich and E. Wolff (Eds.), Standardization of national languages: Symposium on language standardization, 2-3 February 1991. Hamburg: UNISCO Institute for Education

Fekî Çewlîgi De Antişî Karan (Fiilan)

Seyîdxan KURIJ

1. NAMEKERDIŞÎ LEHÇEYÊ MA

Verî peşkeşkerdişî karî xo, ez wazena taye çîyanî peroyî ser o agahdarî bidi goştaran?

Seke yeno zûnayış miyanî şarî ma de çend nameyî no lehçeyê kurdî estî. Ez kirdkî sey yew lehçeyê kurdî qebûl kena. No vînayê min o, no rid ra ez no nuşte de zi îna nûsena. Şarî ma yê Çolîg, Depi, Palî û Pîran no lehçe ra vûnî “kirdkî”. Şarî Dêrsim vûno “kirmanckî”, Şarî Sêwregî û dormeyî zî vûno “dimilî”. Şarî Gimgim zî vûno “Zonê ma”, la zonê ma xo ser yew name nîyo. Çimkî herkes ziwanî xo ra vûno “Zone ma” yanî bi trikî “Bizim dilimiz”. Şaro bîn zi no lehçeyê ma ra vûno “Zazakî”. Nê seranî pêyinan bi taybetî xortî, yew qisim kirdî zi vûnî “zazakî”. Ewropa de zi hêna zaf nameyî “zaza” yeno karardiş.

2. CAYÊ KE TEDE KIRDKÎ YENA QISÊKERDIŞ

Kirdkî sey cografya hema hema têna Bakurî Kurdîstan de yena qisêkerdiş. Tayê lehçeyê kurdanî “Şebek” zi kirdkî hesibnêni, la alaqayî lehçeyê Şebekan û kirdkî çin o. Lehçeyê Şebekan hêna zaf hewremî ra nezdî ya.

Bakurî Kurdistan de hema hema bajar ke homojen têna te de kirdkî yeno qisêkerdiş çin o. Bajarî ke hêna zaf sey bajarî kirdkî qisêkerdoxan yenî zûnayış Çewlîg û Kalan (Tunceli) yî. Dêrsim yew mintiqaya hîra ya, no rid ra mi îta de Kalan nuşt. Goreyî cigêrayîşî ma cayî ke tede kirdkî yena qisêkerdiş nê yî: merkezî Çewlîgî û piyerê qezayan de. Zerrê bajarî û piyerê qezayanî Kalan de. Zerrê bajarî Xarpêt û qezayanî Xarpêt ra Pali, Depi, Maden, Kovanciyan, Qerebegûn û Sivrîce de. Zerrê Amêd û qezayanî Amed ra Licê, Pîran, Çermûg, Şenguş, Hazro, Hêni, Gel, Pasûr û Erxenî de. Qezayanî

Sewas ra Zara, Îmranli, Ulaş, Kangal, Hafîk, Divriği û Gürün de. Qezayanî Erzirom ra Hınıs, Aşqe, Tatos û Çat de. Zerrê Erzingan û qezayanî Cimîno, Kemax, Manse (Mose,Çayirli) û Têrcan de. Gimgim, Sêwregî, Aldûş, Aksaray, Sason, Motkî de û tayê dewanî Poturge, Argûwan, Gumuşxane – Kelkît û Şîran, Sariz û Ardahan û Qers de yeno qisêkerdiş.

3. KIRDKÎ DE FEKÎ

Kirdkî de çend fekî estî. Ferqî beyntarê fekanî kirdkî zaf gird nîyo. Esas merdim nêşkeno fekan sed ra sed cêmîyan ra vejo, yanî kategorîze bikero. Çike fekî zaf kotî têmiyan. Ge –ge taye çîyan de di mintiqayî seypîye yî, la eynî di mintiqayî yewna çî de cîya yî. Na ray her mintiqa yewna yew mintiqa de seycê yî.

Lakîn hancî zî ma eşkenî taye hususîyetanî fekî Çewlîg ra behs bikeri.

Wext ke ma vûnî fekî Çewlîg qestî mi mekezî bajarî Çewlîg nîyo. Ma heme dewanî Çewlîg, Bongîlan û Dara Hêni, Pali, Depi, Kovancilar û Qerebegûn zî mîyanî nê fekî de hesabnênî.

Ez roja verên ra ha mîyanî xebatê Grûba Xebate ya Vateyî de ya. Grûba Xebate ya Vateyî hama karan ser tam yew xebat nikerda, la taye çîyî tespît kerdî. No rid ra ez îta de taye çîyan bi xebatê na grûb de miqayese kena.

4. FÎL (KAR)

Qalî ke yew kar, yew gure, yew bîyayîş, yew hereket û yew hal îfade kenî, înan ra fîil vacîyeno.

4.1. Mesderî Karan (Fîilan)

Her fîil yew halî xo yo infinitif yanî bi mastar esto. Kirdkî suffiksî mesderî karan mintiqa ra mintiqa cîya cîya yî. Çewlîg de sey suffiksî mesderanî karan “yîş” û “iyayîş” yenî şoxilnayîş.

Nimûneyî:

Ruenayîş, kişîyayîş, nusîyayîş, vajîyayîş, nuştîş,

“Yîş” eslê xo de “îş”o. La wext ke kokî karî bi herfa vengin biqedîyo, o wext “y” sey herfa pêragirêdayen kuena beyntarê di herfanî vengin a û “îş” beno “yîş”.

Nimûneyî:

Dayîş, gêrayîş,

La kokî karî bi herfa bêveng (sessiz harf) biqedo, o wext no “iş” nibêdilîyeno.

Nimûneyî:

Berdiş, kerdiş, wendiş, werdiş, girotiş

Taye mintiqayan de sey suffiksî mesderî karan “ene/”yene” yeno şoxilnayîş.

Nimûneyî:

Fekî Çewlîgi	Taye mintiqayî bînî	Grûba Vate
wendiş (okumak)	wendin, wendêne, wendeni, wenden	wendene
werdiş (yemek)	werdin, werdine, werdêne, werdeni, werden	werdene
şîyayîş (gitmek)	şîyayene, şîyayeni, şîyayen, şîyayêne	şîyene
bîyayîş (olmak)	bîyayêne, bîyayine, bîyayene	bîyene
zanayîş (bilmek)	zanayêne, zanayin	zanayene

4.2. Karî ra Name viraştîş

Kirdkî de hem “ene” / “-yene” hem zi “-iş / “-yîş” suffiksî mesderî yî. Zafê mintiqayan de suffiksî “ene” / “-yene” sey mesderî, suffiksî “-iş / “-yîş” sey nameyî vajîyênî. Labele Çewlîg de suffiksî “-iş / “-yîş” hem sey suffiksî mesderî hem zi sey nameyî vajîyênî. Grûba Vate suffiksî “ene” / “-yene” sey mesderî, suffiksî “-iş / “-yîş” sey nameyî şuxilnena.

Nimûneyî:

Fekî Çewlîgi	Taye mintiqayî bînî	Grûba Vate
wendiş (okuma, okumak)	wendene (okumak)	wendiş (okuma)
werdiş (yeme, yemek)	werdene (yemek)	werdiş (yeme)

şîyayîş (gitme, gitmek)	şîyene (gitmek)	şîyeyîş (gitme)
kerdiş (yapma, yapmak)	kerdene (yapmak)	kerdiş (yapma)

4.3. Karo Nêmcet (Kopula, koçaş, olmak, to be)

Sey zafê ziwanan kirdkî de zi yew karo nêmcet esto. No kar tena demo nikayin (present) de ancîyeno. No kar nameyan, sifatan yan zî zamîran dima yeno û maneyo newe dano înan. İngilizi de no kar ra “to be” û tirkî de zi “olmak” vajiyeno.

No kar cîya nusîyeno.

Nimûneyî:

Fekî Çewlîgi	Taye mintiqayî bînî	Grûba Vate
ez a (benim)	ez ûne, ez o, ez û	ez a
ti yî (sensin-eril)	ti yê	ti yî
ti ya (sensin-dişil)	ti ya	ti ya
wi yo (odur-eril)	o wo	o yo
ya ya (odur-dişil)	a wa	a ya
ma yî (biziz)	ma yîmê	ma yê
şima yî (sizsiniz)	sima yê	şima yê
yi yî (onlardır) ê yê		ê yê

Nimûneyî:

ez a (benim)	Ez Çoligij a. (Ben Bingöllüyüm.)	Ez qic a. (Ben küçüğüm.)
ti yî (sensin)	Ti Çoligij î. (Sen Bingöllüsün.)	Ti gird î. (Seb büyüksün.)

Negatîfî no karî:

Ez nîya. (Ben değilim.), Ti nîyî. (Sen değilsin.), Wi nîyo. (O değil.), Ya nîya. (O değil.), Ma nîyî. (Biz değiliz.), Şima nîyî. (Siz değilsiniz.), Yi nîyî. (Onlar değiller.)

4.4. Karî “Bîyayîş” î

Nimûneyî:

Fekî Çewlîgi	Taye mintiqayî bînî	Grûba Vate
ez bena, ez beno (ben olurum)	ez benû, ez ben	ez bena, ez beno
ti benî (sen olursun)	ti bena	ti benî
wi beno (olur-eril)	o beno	o beno
ya bena (o olur-dişil)	a bena	a bena
ma benî (biz oluruz)	ma, benê, ma beme	ma benê
şima benî (siz olursunuz)	sima benê, şima benê	şima benê
yi benî (onlar olurlar)	ê benê, î benê	ê benê

4.5. Karo pîyabeste (Bileşik Fiil)

Karo pîyabeste çend çeşît o. Ma îta de panc çeşîtan ser vîndenî û înan bi mintiqayanî bînan de miqayese kenî.

4.5.1. Preverbo (ön fiil) Yewheceyin + Kar

Preverbî zaf zîwanan de estî. Kirdkî de zi preverbî estî. Preverbî yenî vernîyê karan. Wext ke preverbî ameyî vernîye karan, yewna yew mana danî verban. Yew preverb û yew kar yenî pêhet û pîya yew karo newe virazenî. Preverbî yewheceyin estî û preverbî zaf heceyin estî.

Yanî preverb+kar: karo pîyabeste.

Çend preverbî yew heceyinî (ön fiil): a, de, ra, ro, we, pa, pê, po, tê, to

Ne karan ra Nimûneyî: akerdîş, dekerdîş, pakerdîş, wedartîş, radayîş, pêşanayîş, wekerdîş

Antişî nê karan goreyî şîweyan di çeşîd î. Grûba Vate her di qede antişî zî şuxilnena.

Nimûneyî:

Fekî Çewlîgi	Taye mintiqayî bînî	Grûba Vate
--------------	---------------------	------------

kerd a (açtı)	akerd	akerd, kerd a
kerd de (doldurdu)	dekerd	dekerd, kerd de
kerd pa (taktı)	pakerd	kerd pa, pakerd
kerd we (söktü)	wekerd	kerd we, wekerd
na rue (koydu)	rona	na ro, rona

4.5.2. Preverbo Zafheceyin + Kar

Preverbî zafheceyin zî estî. Nê preverbî zafheceyin û kar yew karo newe virazenî. Preverbo zafheceyin û kar cîya nusîyênî.

Çend preverbî zaf heceyinî (ön fiil): pira, pede, tede, tira, bere, piye, pîyera

Nimûneyî:

Fekî Çewlîgî	Taye mintiqayî bînî	Grûba Vate
da pirye/pire/peru (vurdu)	pêro da	da pêro, pêro da
na pîyera (sardı/derledi/kurdu)	pêra na	na pêro, pêra na
kerd pede (doğradi)	pede kerd	kerd pede, pede kerd

4.5.3. Name + Fîl

Ge-ge yew name û yew kar yenî têhet, newe yew karo newe virazenî. Nê çeşît karo pêrabesteyan de name û kar cîya nusîyênî.

Nimûneyî: awk dayiş, bawer kerdiş, pers kerdiş, cûn dayiş, dawet kerdiş.

4.5.4. Sifet + Kar

Ge-ge yew sifet û yew kar yenî têhet, yew karo newe virazenî. Nê çeşît karo pêrabesteyan de sifet û kar cîya nusîyênî.

Nimûneyî: berz kerdiş, derg bîyayîş, qelew bîyayîş, pak kerdiş, weş bîyayîş, weş kerdiş.

4.5.5. Kar + Kar

Ge-ge yew kar pa yewna kar (karo ardimkerdox) yeno têhet, yew karo newe virazenî. Nê çeşît karo pêrabesteyan de nê her di karî yewbînî ra cîya nusîyênî.

Nimûneyî: dayîş kiştîş: öldürtmek, dayîş vatiş: söyletmek, dayîş girotiş: aldirtmak, dayîş wendiş: okutmak.

4.6. Fîlî transîtîf û fîlî întansîtîf

Fîlî ke nesne genî înan ra fîlî transîtîf, fîlî ke nesne nigênî înan ra fîlî întansîtîf vacîyeno. Perro bîn ra fîlî întansîtîf yew hal, yew rewş nîşan danî.

Nimûneyî:

Fîlî transîtîf	Fîlî întansîtîf
ardiş	ûmeyîş
wendiş	şîyayîş
nuştîş	rakotiş
kiştîş	merdiş

4.7. Karan de Negatîfiye (Filer de olumsuzluk)

Kirdkî de karî bi “nê”, “ne”, “ni” û “me” benî negatîf.

Kar û “nê”, “ni” û “me” pîya nusîyênî.

Fekî Cewlîg de hale negatîfî (olumsuz) ye karan goreye deme

karî bedilîyeno. Ca-ca bi prefîksî “ni-”, ca-ca bi “niye (ne)-” ca-ca zi bi

“me-” yeno şoxilnayîş.

Hancî fekî Çewlig de ca-ca antişî karan (fiil çekimi), goreye maki û

neri ye kesânî yewhumaran (eril ve dişil tekil şahıslara gore) bediliyenî.

Maki: m

Neri: n

Nimûneyî: nişkena, niwena, niwunena, nişimena, ninusena, nikenena, nidûna, nivûna, meke, mevac, mewir, medi, mekuir, mewirz. Halê emir de “me” yeno şoxilnayiş.

5. Partîkelî demo nikayinî û demo ameyoxî yê karî (Fiilin şimdiki zaman ve gelecek zaman partikeli)

Kirdkî de demo nikayinê karî û demo ameyoxê karî bi partîkel zi virazîyênî.

5.1. Partîkelî demo nikayinî yê karî (Fiilin şimdiki zaman partikeli)

Partîkelî demo nikayinî yê karî semedê pêro şîweyan: hawo, haw, hew, haya, hay, hey, hê, ha, ho, wo, wa, ya, yê, yo. Fekî Çewlîg de Partîkelî demo nikayinî yê karî, “ha”, “ho” û “hê” yî.

Nimûneyî:

Ez ha wûnena. (Ben okuyorum.)

Ti (eril) hê wunenî. (Sen okuyorsun.)

Ti (dişil) ha wunena. (Sen okuyorsun.)

Wi (eril) ho wuneno / wunenu. (O okuyor.)

Ya (dişil) ha wunena. (O okuyor.)

Ma hê yenî. (Biz geliyoruz.)

Şima hê wunenî. (Siz okuyorsunuz.)

Yi hê wunenî. (Onlar okuyorlar.)

5.2. Partîkelî demo ameyoxî yê karî (Fiilin gelecek zaman partikeli)

Partîkelî demo ameyoxî yê karî semedê pêro şîweyan: dê, do, ko, ka, go, ro, yo.

Fekî Çewlîg de Partîkelî demo nikayinî yê karî, “go” ve “ko” yî.

Nimûneyî:

Ez go biwunî. (Ben okuyacağım.)

Ti go biwunî. (Sen okuyacaksın.)

Wi go biwuno / biwunu. (O okuyacak.)

Ya go biwuno /biwunu. (O okuyacak.)

Ma go biwuni. (Biz okuyacağız.)

Şima go biwunî. (Siz okuyacaksınız.)

Yi go biwunî. (Onlar okuyacaklar.)

Fekî Çewlîg de herfî “o” kuweno, tena “g” maneno.

Nimûne: Ti g’ biyeri. (Sen geleceksin.)

6. GOREYÎ DEMÎ ANTIŞÎ KARAN

6.1 – Demo Nikayin (Şimdiki Zaman)

Fekî çewlîgi de pratîk de di formî demo nikayin estî. Înan ra yew demo nikayin o (şimdiki zaman). Ê diyin sey demo hîra (geniş zaman) yo, la pratîk de no formî diyin zî sey demo nikayin yeno şoxilnayiş.

6.1.1 – Formo yewin yê demo nikayin:

a) Karo transîtif (geçişli fiil)

Fîil: Werdiş / Werdene (Yemek)

Pozîtif

Ez ha/ho weno (n). (Ben yiyorum).

Ez ha wena (m). (Ben yiyorum).

Ti hê wenî (n). (Sen yiyorsun).

Ti ha wena (m). (Sen yiyorsun).

O (wi) ho weno (n). (O yiyor).

A (ya) ha wena (m) (O yiyor).

Ma hê wenî. (Biz yiyoruz).

Şima hê wenî. (Siz yiyorsunuz).

Ê (yi) hê wenî. (Onlar yiyorlar).

Negatîf

Ez ha /ho niweno (n). (Ben yemiyorum).

Ez ha niweno (m). (Ben yemiyorum).

Ti he(ê) niwenî (n). (Sen yemiyorsun).

Ti ha niwena (m). (Sen yemiyorsun).

O (wi) ho niweno (n). (O yemiyor).

A (ya) ha niwena (m) / yemiyor.

Ma he niwenî. (Biz yemiyoruz).

Şima he niwenî (Siz yemiyorsunuz).

Ê (yi) he niwenî. (Onlar yemiyorlar).

Zamîrî zereyî parantezî fekî Çewlîg de yenî şoxilnayiş.

Çekuyê (cumle) nimûnê :

Ez ha saye wena (Ben elma yiyiorum)

A (ya) ha xîyar newena. (O salatalik yemiyor)

b) Karo întansîtîf (geçişsiz fiil)

Fîil : Amêyiş/Ameyene (Gelmek). (Ca ca de „imeyiş“ yan zî „umeyiş“ zi vacîyeno).

Pozîtîf

Ez ha / ho yeno (n). (Ben geliyorum).

Ez ha yena (m). (Ben geliyorum).

Ti hê yenî (n). (Sen geliyorsun).

Ti ha yena (m). (Sen geliyorsun).

O (wi) ho yeno (n). (O geliyor).

A (ya) ha yena (m). (O geliyor).

Ma he yenî. (Biz geliyoruz).

Şima he yenî. (Siz geliyorsunuz).

Ê (yi) he yenî. (Onlar geliyorlar).

Zamîrî zereyî parantezî fekî Çewlîg de yenî şoxilnayiş.

Negatîf

Ez ha niyeno / neno / nîno (n). (Ben gelmiyorum).

Ez ha niyena / nena / nîna (m). (Ben gelmiyorum)

Ti hê niyenî / nenî / nînî (n). (Sen gelmiyorsun).

Ti ha niyena / nena / nîna (m). (Sen gelmiyorsun).

O (wi) ho niyeno / neno / nîno (n). (O gelmiyor).

A (ya) ha niyena / nena / nîna (m). (O gelmiyor).

Ma hê niyenî / nenî / nînî. (Biz gelmiyoruz).

Şima hê niyenî / nenî / nînî. (Siz gelmiyorsunuz).

Ê (yi) hê yenî / nenî / nînî. (Onlar gelmiyorlar).

Çekuyê(cumle) nimûnê :

Ez ha dew ra yena (Ben köyden geliyorum)

Ti hê ça ra yenî?. (Sen nereden geliyorsun?)

6.1.2 – Form diyin yê demo nikayin:

No formî demo hîra yo, la pratik de sey demo nikayin zî yeno şoxilnayiş.

6.2 – Demo Hîra (Geniş zaman)**a) Karo transîtîf (geçişli fiil)**

Fîil: Wendiş / Wendene (Okumak)

Pozîtîf	Negatîf
Ez waneno (n). (Ben okurum).	Ez niwaneno (n). (Ben okumam).
Ez wanena (m). (Ben okurum).	Ez niwanena (m). (Ben okumam).
Ti wanênî (n). (Sen okursun).	Ti niwanênî (n). (Sen okumazsin).
Ti wanena (m). (Sen okursun).	Ti niwanena (m). (Sen okumazsin).
O (wi) waneno. (O okur).	O (wi) niwaneno. (O okumaz).
A (ya) wanena. (O okur).	A (ya) niwanena. (O okumaz).
Ma wananî. (Biz okuruz).	Ma niwananî. (Biz okumayız).
Şima wananî. (Siz okursunuz).	Şima niwananî. (Siz okumazsınız).
Ê (yi) wananî. (Onlar okurlar).	Ê (yi) niwananî. (Onlar okumazlar).

Zamîrî zereyî parantezî fekî Çewlîg de yenî şoxilnayış.

Çekuyê(cumle) nimûnê :

Ez her şand lacî xo rê kitabî „Rindo“ waneno (Ben her aqşam oğluma Rindo `nun kitabını okurum.)

Alan(o) her roj kitabî “Soro” waneno. (Alan her gün Soro`nun kitabını okur.)

b) Karo întansîtîf (geçişsiz fiil)

Fîil : Amêyiş/Ameyene (Gelmek). (Ca ca de „imeyiş“ yan zî „umeyiş“ zi vacîyeno).

Pozîtîf	Negatîf
Ez yeno (n). (Ben gelırım).	Ez niyeno /nêno / nîno (n). (Ben gelmem).
Ez yena (m). (Ben gelırım).	Ez ha niyena / nena / nîna (m). (Ben gelmem)
Ti yenî (n). (Sen gelırsın).	Ti niyenî / nenî / nînî (n). (Sen gelmezsin).
Ti yena (m). (Sen gelırsın).	Ti niyena / nena nîna (m). (Sen gelmezsin).
O (wi) yeno (n). (O gelir).	O (wi) niyeno / nêno / nîno) (n). (O gelmez).
A (ya) yena (m). (O gelir).	A (ya) niyena / nena nîna (m). (O gelmez).
Ma yenî. (Biz gelırız).	Ma niyenî / nenî / nînî. (Biz gelmeyiz).
Şima yenî. (Siz gelırsınız).	Şima niyenî / nenî / nînî. (Siz gelmezsiniz).
Ê (yi) yenî. (Onlar gelırlar).	Ê (yi) niyenî / nenî / nînî. (Onlar gelmezler).

Zamîrî zereyî parantezî fekî Çewlîg de yenî şoxilnayış.

Çekuyê(cumle) nimûnê :

Ê (yi) her roj yêni keyeyî ma (Onlar hergün bize gelirler)

O (wi) her roj bi minubus yeno Çewlig (O hergün Minibus ile Bingöl`e gelir)

A (ya) qet nîna keyeyî ma (O hiç bize gelmez)

6.3 – Demo Ameyox (Gelecek Zaman)

Hetî çewlig de di formî no demî êstî.

6.3.1 – Formo yewin yê demo ameyoxî (Gelecek zaman):

No formî demo amayeyî û formo diyin yê demo nikayin û formî demo hîra yew î.

La pratîk de formo yewin yê demo ameyeyî hêna zaf bi zarfanî wexta (zaman zarfi) pîya yeno şoxilnayiş.

Nimûne: Ez siba nê kitabî wanena. (Yarin bu kitabi okuyacağım.)

Ez siba şina Çewlîg. (Yarin Bingöle gideceğim)

a) Karo transîtif (geçişli fiil)

Fîil: Wendiş / Wendene (Okumak)

Pozîtif

Ez waneno (n). (Ben okuyacağım).

Ez wanena (m). (Ben okuyacağım).

Ti wanênî (n). (Sen okuyacaksın).

Ti wanena (m). (Sen okuyacaksın).

O (wi) waneno. (O okuyacak).

A (ya) wanena. (O okuyacak).

Ma wananî. (Biz okuyacağız).

Şima wananî. (Siz okuyacaksınız).

Ê (yi) wananî. (Onlar okuyacaklar).

Negatîf

Ez niwaneno (n). (Ben okumayacağım).

Ez niwanena (m). (Ben okumayacağım).

Ti niwanênî (n). (Sen okumayacaksın).

Ti niwanena (m). (Sen okumayacaksın).

O (wi) niwaneno. (O okumayacak).

A (ya) niwanena. (O okumayacak).

Ma niwanenî. (Biz okumayacağız).

Şima niwanenî. (Siz okumayacaksınız).

Ê (yi) niwanenî. (Onlar okumayacaklar).

Zamîrî zereyî parantezî fekî Çewlîg de yenî şoxilnayiş.

Çekuyê(cumle) nimûnê :

Ez (n) no kitabî siba waneno. (Ben bu kitabi yarın okuyacağım)

A rojnameyî „Dema Nû” siba wanena (O yarın „Dema Nû” gazetesini okuyacak)

Ez (m) no nuşte rojna wanena. (Ben bu makaleyi başka bir gün okuyacağım)

b) Karo întansîtîf (geçişsiz fiil)

Fîil : Amêyiş/Ameyene (Gelmek). (Ca ca de „imeyiş” yan zî „umeyiş” zi vacîyeno).

Pozîtîf

Negatîf

Ez yeno (n). (Ben geleceğim).

Ez niyeno / nêno / nîno (n). (Ben gelmeyeceğim).

Ez yena (m). (Ben geleceğim).

Ez niyena / nena / nîna (m). (Ben gelmeyeceğim)

Ti yenî (n). (Sen geleceksin).

Ti niyenî / nenî / nînî (n). (Sen gelmeyeceksin).

Ti yena (m). (Sen geleceksin).

Ti niyena / nena nîna (m). (Sen gelmeyeceksin).

O (wi) yeno (n). (O gelecek).

O (wi) niyeno / neon / nîno) (n). (O gelmeyecek).

A (ya) yena (m). (O gelecek).

A (ya) niyena / nena nîna (m). (O gelmeyecek).

Ma yenî. (Biz geleceğiz).

Ma niyenî / nenî / nînî. (Biz gelmeyeceğiz).

Şima yenî. (Siz geleceğiz).

Şima niyenî / nenî / nînî. (Siz gelmeyeceksiniz).

Ê (yi) yenî. (Onlar gelecekler).

Ê (yi) niyenî / nenî / nînî. (Onlar gelmeyecekler).

Zamîrî zereyî parantezî fekî Çewlîg de yenî şoxilnayiş.

Çekuyê(cumle) nimûnê :

Ti (n) siba yenî îta?. (Sen yarın buraya gelecek misin?)

Ez (m) siba yena (Ben yarın geleceğim)

6.3.2 – Form diyin yê demo ameyox:

a) Karo transitif (gecişli fiil)

Fîil: Wendiş / Wendene (Okumak)

Pozîtîf**Negatîf**

Ez go biwanî (n) (Ben okuyacağım)	Ez go niwanî (n). (Ben okumayacağım).
Ez go biwanî (m) (Ben okuyacağım)	Ez go niwanî (m). (Ben okumayacağım).
Ti go biwanî (n). (Sen okuyacaksın)	Ti go niwanî (n). (Sen okumayacaksın).
Ti go biwanî (m). (Sen okuyacaksın)	Ti go niwanî (m). (Sen okumayacaksın).
O (wi) go biwano (n). (O okuyacak).	O (wi) go niwano (n). (O okumayacak).
A (ya) go biwano (m). (O okuyacak).	A (ya) go niwano (m) (O okumayacak).
Ma go biwani. (Biz okuyacağız).	Ma go niwani. (Biz okumayacağız).
Şima go biwanî. (Siz okuyacaksınız).	Şima go niwanî. (Siz okumayacaksınız).
Ê (yi) go biwanî. (Onlar okuyacaklar).	Ê (yi) go niwanî (Onlar okumayacaklar)

Zamîrî zereyî parantezî fekî Çewlîg de yenî şoxilnayiş.

Qalkerdîş de herfe “o” kuwena. Nimune: ti g’ biyerî, ya g’ niyero, ma g’ biyerî.

Ca ca de herindê “go” de “ko” yeno şoxilnayiş.

Nimune: ti ko biyerî, a ko niyero.

b) Karo intransitif (gecişsiz fiil)

Fîil : Amêyiş/Ameyene (Gelmek). (Ca ca de „imeyiş“ yan zî „umeyiş“ zi vacîyeno).

Pozîtîf**Negatîf**

Ez go biyêrî (n). (Ben geleceğim).	Ez go niyerî (n). (Ben gelmeyeceğim).
Ez go biyêrî (m). (Ben geleceğim).	Ez go niyerî (m). (Ben gelmeyeceğim)
Ti go biyêrî (n). (Sen geleceksin).	Ti go niyerî (n). (Sen gelmeyeceksin).
Ti go biyêrî (m). (Sen geleceksin).	Ti go niyerî (m). (Sen gelmeyeceksin).
O (wi) go biyero (n). (O gelecek).	O (wi) go niyero (n). (O gelmeyecek).
A (ya) go biyero (m). (O gelecek).	A (ya) go niyero (m). (O gelmeyecek).
Ma go biyeri. (Biz geleceğiz).	Ma go niyerî. (Biz gelmeyeceğiz).
Şima go biyerî. (Siz geleceğiz).	Şima go niyerî. (Siz gelmeyeceksiniz).
Ê (yi) go biyerî. (Onlar gelecekler).	Ê (yi) go niyerî. (Onlar gelmeyecekler

Zamîrî zereyî parantezî fekî Çewlîg de yenî şoxilnayış.

6. 4 – Demo Vîyerteyo Dîyar (Dili Geçmiş Zaman)

a) Karo transitif (gecişli fiil)

Fîil: Wendiş / Wendene (Okumak)

Objê yewhumar bo/Objeyo Yewhumar (Nesne tekil olunca)

Pozîtîf

Negatîf

Mi wend (n). (Ben okudum).	Mi niwend (n). (Ben okumadım).
Mi wend (m). (Ben okudum).	Mi niwend (m).(Ben okumadım).
To (tu) wend (n). (Sen okudun).	To (tu) niwend (n). (Sen okumadın).
To (tu) wend (m). (Sen okudun)	To (tu) niwend (m). (Sen okumadın).
Ey (yi) wend (n). (O okudu).	Ey (yi) niwend (n). (O okumadı).
Aye (yay) wend (O okudu)	Aye (yay) niwend (m). (O okumadı).
Ma wend. (Biz okuduk).	Ma niwend. (Biz okumadık).
Şima wend. (Siz okudunuz).	Şima niwend. (Siz okumadınız).
Înan (yin) wend (Onlar okudular)	Înan (yin) niwend. (Onlar okumadılar).

Zamîrî zereyî parantezî fekî Çewlîg de yenî şoxilnayış.

Çekuyê(cumle) nimûnê :

Mi di ray destanê Memê Alan wend. (Ben iki defa Memê Alan destanını okudum)

To vizêr kamyew Kitab wend? (Sen dün hangi kitabı okudun?)

Objeyo zafumar (Nesne çoğul olunca)

Pozîtîf

Negatîf

Mi wênd/wendî (n). (Ben okudum).	Mi niwênd/nîwendî (n). (Ben okumadım).
Mi wênd (m). (Ben okudum).	Mi niwênd (m).(Ben okumadım).
To (tu) wênd (n). (Sen okudun).	To (tu) niwênd (n). (Sen okumadın).
To (tu) wênd (m). (Sen okudun).	To (tu) niwênd (m). (Sen okumadın).
Ey (yi) wênd (n). (O okudu).	Ey (yi) niwênd (n). (O okumadı).

Aye (yay) wênd. (O okudu).	Aye (yay) niwênd (m). (O okumadı).
Ma wênd. (Biz okuduk).	Ma niwênd. (Biz okumadık).
Şima wênd. (Siz okudunuz).	Şima niwênd. (Siz okumadınız).
Înan (yin) wênd. (Onlar okudular).	Înan (yin) niwênd. (Onlar okumadılar).

Zamîrî zereyî parantezî fekî Çewlîg de yenî şoxilnayış.

Çekuyê(cumle) nimûnê :

Mi hefteyo verên di kitabî Malmîsanij (wênd/wendî). (Ben geçen hafta Malmisanij`ın iki tane kitabını okudum)

Aye vizêr Ronîya rê di sonikî wêndî (O dün Roniya`ya iki masal okudu)

b) Karo intransitif (gecişsiz fiil)

Fîil : Amêyiş/Ameyene (Gelmek). (Ca ca de „imeyiş“ yan zî „umeyiş“ zi vacîyeno).

Pozîtif

Negatîf

Ez ameya (n). (Ben geldim).	Ez niameya (n). (Ben gelmedim).
Ez ameya (m). (Ben geldim).	Ez niameya (m). (Ben gelmedim).
Ti amê (n). (Sen geldin).	Ti niamê (n). (Sen gelmedin).
Ti ameya (m). (Sen geldin).	Ti niameya (m). (Sen gelmedin).
O (wi) ame (n). (O geldi).	O (wi) niame (n). (O gelmedi).
A (ya) amê. (O geldi).	A (ya) niamê (m). (O gelmedi).
Ma amê. (Biz geldik).	Ma niamê. (Biz gelmedik).
Şima amê. (Siz geldiniz).	Şima niamê. (Siz gelmediniz).
Ê (yi) amê. (Onlar geldiler).	Ê (yi) niamê. (Onlar gelmediler).

Zamîrî zereyî parantezî fekî Çewlîg de yenî şoxilnayış.

Çekuyê(cumle) nimûnê :

O vizêr ame keyeyî ma. (O dün bize geldi)

Ez gure ra saet heşt de ameya. (Ben saat sekiz de işten geldim)

Ez amo, Ez amêyo zi vacîyeno

6. 5 – Demo Vîyerteyo Nedîyar (Miş`li geçmiş zaman)**a) Karo transitif (gecişli fiil)***Fîil: Wendiş / Wendene (Okumak)***Objeyanê nêran de (eril nesnelerde)****Pozîtîf****Negatîf**

Mi wendo (n). (Ben okumuşum).

Mi niwendo (n). (Ben okumamışım).

Mi wendo (m). (Ben okumuşum).

Mi niwendo (m).(Ben okumamışım).

To (tu) wendo (n). (Sen okumuşsun).

To (tu) niwendo (n). (Sen okumamışsın).

To (tu) wend (m). (Sen okumuşsun).

To (tu) niwendo (m). (Sen okumamışsın).

Ey (yi) wendo (n). (O okumuş).

Ey (yi) niwendo (n). (O okumamış).

Aye (yay) wendo. (O okumuş)

Aye (yay) niwendo (m). (O okumamış).

Ma wendo. (Biz okumuşuz).

Ma niwendo. (Biz okumamışız).

Şima wendo. (Siz okudunuz).

Şima niwendo. (Siz okumamışsınız).

Înan (yin) wendo. (Onlar okumuşlar)

Înan (yin) niwendo. (Onlar okumamışlar).

Zamîrî zereyî parantezî fekî Çewlîg de yenî şoxilnayiş.

Çekuyê(cumle) nimûnê :

Mi Kitabî Zinar Silopî „Doza Kurdistan“ wendo. (Ben Zinar Silopî`nin „Doza Kurdistan“ kitabını okumuşum)

Objeyanî maykan de (dîşil nesnelerde)**Pozîtîf****Negatîf**

Mi wenda (n). (Ben okumuşum).

Mi niwenda (n). (Ben okumamışım).

Mi wenda (m). (Ben okumuşum).

Mi niwenda (m).(Ben okumamışım).

To (tu) wenda (n). (Sen okumuşsun).

To (tu) niwenda (n). (Sen okumamışsın).

To (tu) wenda (m). (Sen okumuşsun).

To (tu) niwenda (m). (Sen okumamışsın).

Ey (yi) wenda (n). (O okumuş).

Ey (yi) niwenda (n). (O okumamış).

Aye (yay) wenda. (O okumuş).

Aye (yay) niwenda (m). (O okumamış).

Ma wenda. (Biz okumuşuz). Ma niwenda. (Biz okumamışız).
 Şima wenda. (Siz okumuşsunuz). Şima niwenda. (Siz okumamışsınız).
 Înan (yin) wenda. (Onlar okumuşlar). Înan (yin) niwenda. (Onlar okumamışlar).

Zamîrî zereyî parantezî fekî Çewlîg de yenî şoxilnayiş.

Çekuyê(cumle) nimûnê :

Mi sonikê Pîr û Lûy wenda. (Ben Pîr û Lûy masalini okumuşum)

Obje yo Zafhumar (Nesne çogul olunca)

Pozîtîf

Negatîf

Mi wêndî (n). (Ben okumuşum). Mi niwêndî (n). (Ben okumamışım).
 Mi wêndî (m). (Ben okumuşum). Mi niwêndî (m). (Ben okumamışım).
 To (tu) wêndî (n). (Sen okumuşsun). To (tu) niwêndî (n). (Sen okumamışsın).
 To (tu) wêndî (m). (Sen okumuşsun). To (tu) niwêndî (m). (Sen okumamışsın).
 Ey (yi) wêndî (n). (O okumuş). Ey (yi) niwêndî (n). (O okumamış).
 Aye (yay) wêndî (O okumuş) Aye(yay) niwêndî (m). (O okumamış).
 Ma wêndî. (Biz okumuşuz). Ma niwêndî. (Biz okumamışız).
 Şima wêndî. (Siz okumuşsunuz). Şima niwêndî. (Siz okumamışsınız).
 Înan (yin) wêndî. (Onlar okumuşlar). Înan (yin) niwêndî. (Onlar okumamışlar).

Zamîrî zereyî parantezî fekî Çewlîg de yenî şoxilnayiş.

Çekuyê(cumle) nimûnê :

Mi zaf kitabî M.Emîn Bozarslan wêndî (Ben M. Emin Bozarslan`nın çok kitabını okumuşum.)

b) Karo intransitif (gecişsiz fiil)

Fîil : Amêyiş/Ameyene (Gelmek). (Ca ca de „imeyiş“ yan zî „umeyiş“ zi vacîyeno).

Pozîtîf

Negatîf

Ez ameyo (n). (Ben gelmişim). Ez niameyo (n). (Ben gelmemişim).
 Ez ameya (m). (Ben gelmişim). Ez niameya (m). (Ben gelmemişim).

Ti ameyî (n). (Sen gelmişsin).	Ti niameyî (n). (Sen gelmemişsin).
Ti ameya (m). (Sen gelmişsin).	Ti niameya (m). (Sen gelmemişsin).
O (wi) ameyo (n). (O gelmiş).	O (wi) niameyo (n). (O gelmemiş).
A (ya) ameya. (O gelmiş).	A (ya) niameya (m). (O gelmedi).
Ma amêyî. (Biz gelmişiz).	Ma niamêyî. (Biz gelmemişiz).
Şima amêyî. (Siz gelmişsiniz).	Şima niamêyî. (Siz gelmemişsiniz).
Ê (yi) amêyî. (Onlar gelmişler).	Ê (yi) niamêyî. (Onlar gelmemişler).

Zamîrî zereyî parantezî fekî Çewlîg de yenî şoxilnayiş.

6. 6 – Demo Vîyerteyo Nikayin (Şimdiki Zamanın Hikayesi)

a) Karo transitif (gecişli fiil)

Fîil: Wendîş / Wendene (Okumak)

Pozîtif

Negatîf

Mi wendînî(n) (Ben okuyordum/okurdum).	Mi nîwendîn (n). (Ben okumuyordum).
Mi wendînî (m). (Ben okuyordum).	Mi niwendînî (m).(Ben okumuyordum).
To (tu) wendînî (n). (Sen okuyordun).	To (tu) niwendînî (n). (Sen okumuyordun).
To (tu) wendînî (m). (Sen okuyordun).	To (tu) niwendînî (m). (Sen okumuyordun).
Ey (yi) wendînî (n). (O okuyordu).	Ey (yi) niwendînî (n). (O okumuyordu).
Aye (yay) wendînî. (O okuyordu)	Aye (yay) niwendînî (m). (O okumuyordu).
Ma wendînî (Biz okuyorduk).	Ma niwendînî . (Biz okumuyorduk).
Şima wendînî (Siz okuyordunuz).	Şima niwendînî. (Siz okumuyordunuz).
Înan (yin) wendînî (Onlar okumuyordular)	Înan (yin) niwendînî (Onlar okumuyordular).

Îta de herîndê wendînî de (wendên/wendêni / wendîyeni) zî yeno şoxilnayiş.

Zamîrî zereyî parantezî fekî Çewlîg de yenî şoxilnayiş.

Çekuyê(cumle) nimûnê :

Wext ke o ame zerre mi kitab wendîyeni. (O içeri geldiğinde ben kitap okuyordum).

b) Karo intransitif (gecişsiz fiil)

Fîil : Amêyiş/Ameyene (Gelmek). (Ca ca de „imeyiş“ yan zî „umeyiş“ zi vacîyeno).

Pozîtif**Negatîf**

Ez ameynî (n). (Ben gelirdim).	Ez niameynî (n).(Ben gelmezdim).
Ez ameynî (m). (Ben gelirdim).	Ez niameynî (m). (Ben gelmezdim).
Ti ameynî (n). (Sen gelirdin).	Ti niameynî (n). (Sen gelmezdin).
Ti ameynî (m). (Sen gelirdin).	Ti niameynî (m). (Sen gelmezdin).
O (wi) ameynî (n). (O gelirdi).	O (wi) niameynî (n). (O gelmezdi).
A (ya) ameynî. (O gelirdi).	A (ya) niameynî (m). (O gelmezdi).
Ma ameynî. (Biz gelirdik).	Ma niameynî. (Biz gelmezdik).
Şima ameynî. (Siz gelirdiniz).	Şima niameynî. (Siz gelmezdik).
Ê (yi) ameynî. (Onlar gelirlerdi).	Ê (yi) niameynî. (Onlar gelmezlerdi).

Zamîrî zereyî parantezî fekî Çewlîg de yenî şoxilnayış.

Çekuyê(cumle) nimûnê :

Ez gure ra ameyni keye ke rayîr ser de raştî to ameya. (Ben işten eve geliyordum ki yolda sana rastladım).

6. 7 – Demo Vîyerteyo Nedîyar o Veren (Mişli Geçmiş Zamanin Hikayesi)**a) Karo transitif (gecişli fiil)**

Fîil: Wendiş / Wendene (Okumak)

Objeyanî nêran de (eril nesnelerde)**Pozîtif****Negatîf**

Mi wendibi (n). (Ben okumuştum).	Mi niwendibi (n). (Ben okumamıştım).
Mi wendibi (m). (Ben okumuştum).	Mi niwendibi (m).(Ben okumamıştım).
To (tu) wendibi (n). (Sen okumuştun).	To (tu) niwendibi (n). (Sen okumamıştın).
To (tu) wendibi (m). (Sen okumuştun).	To (tu) niwendibi (m). (Sen okumamıştın).
Ey (yi) wendibi (n). (O okumuştı).	Ey (yi) niwendibi (n). (O okumamıştı).

Aye (yay) wendibi. (O okumuştı) Aye (yay) niwendibi (m). (O okumamıştı).
 Ma wendibi. (Biz okumuştuk). Ma niwendibi. (Biz okumamıştık).
 Şima wendibi. (Siz okumuşdunuz). Şima niwendibi. (Siz okumamıştınız).
 Înan (yin) wendibi. (Onlar okumuşlardı) Înan (yin) niwendibi. (Onlar okumamışlardı).

Zamîrî zereyî parantezî fekî Çewlîg de yenî şoxilnayış.

Çekuyê(cumle) nimûnê :

Mi kitabî Nuri Dersimî cuwa ver wendibi. (Ben Nuri Dersimi`nin kitabini daha önce okumuştum)

Objeyanî maykan de (dışıl nesnelerde)

Pozîtîf

Negatîf

Mi wendibî (n). (Ben okumuştum). Mi niwendibî (n). (Ben okumamıştım).
 Mi wendibî (m). (Ben okumuştum). Mi niwendibî (m).(Ben okumamıştım).
 To (tu) wendibî (n). (Sen okumuştun). To (tu) niwendibî (n). (Sen okumamıştın).
 To (tu) wendibî (m). (Sen okumuştun). To (tu) niwendibî (m). (Sen okumamıştın).
 Ey (yi) wendibî (n). (O okumuştı). Ey (yi) niwendibî (n). (O okumamıştı).
 Aye (yay) wendibî. (O okumuştı). Aye (yay) niwendibî (m). (O okumamıştı).
 Ma wendibî. (Biz okumuştuk). Ma niwendibî. (Biz okumamıştınız).
 Şima wendibî. (Siz okumuştunuz). Şima niwendibî. (Siz okumamıştınız).
 Înan (yin) wendibî. (Onlar okumuştular). Înan (yin) niwendibî. (Onlar okumamıştılar).

Zamîrî zereyî parantezî fekî Çewlîg de yenî şoxilnayış.

Çekuyê(cumle) nimûnê :

Mi sonikê Pîr û Lûy verî wendibî (Ben Pîr û Lûy masalını daha once okumuştum)

Obje yo Zafhumar (Nesne çoğul olunca)

Pozîtîf

Negatîf

Mi wêndibî (n). (Ben okumuştum). Mi niwêndibî (n). (Ben okumamıştım).
 Mi wêndibî (m). (Ben okumuştum). Mi niwêndibî (m).(Ben okumamıştım).
 To (tu) wêndibî (n). (Sen okumuştun). To (tu) niwêndibî (n). (Sen okumamıştın).

To (tu) wêndibî (m). (Sen okumuştun). To (tu) niwêndibî (m). (Sen okumamıştın).
 Ey (yi) wêndibî (n). (O okumuştun). Ey (yi) niwêndibî (n). (O okumamıştı).
 Aye (yay) wêndibî. (O okumuştun). Aye (yay) niwêndibî (m). (O okumamıştı).
 Ma wêndibî. (Biz okumuştuk). Ma niwêndibî. (Biz okumamıştınız).
 Şima wêndibî. (Siz okumuştunuz). Şima niwêndibî. (Siz okumamıştınız).
 Înan (yin) wêndibî. (Onlar okumuştular). Înan (yin) niwêndibî. (Onlar okumamıştılar).

Zamîrî zereyî parantezî fekî Çewlîg de yenî şoxilnayış.

Çekuyê(cumle) nimûnê :

Mi cuwa ver tarixî Kurdistan ser zaf kitabî wêndibî, la kitabî Martin von Bruniessen mi re zaf enteresan ame. (Ben dah önce Kurdistan tarihi ile ilgili çok kitab okumuştum, fakat Bruniessen`in kitabı bana çok ilginç geldi.

b) Karo intransitif (gecişsiz fiil)

Fîil : Amêyiş/Ameyene (Gelmek). (Ca ca de „imeyiş“ yan zî „umeyiş“ zi vacîyeno).

Pozîtif

Negatîf

Ez ameybîyo (n). (Ben gelmiştim).	Ez niameybîyo (n). (Ben gelmemiştim).
Ez ameybîya (m). (Ben geliştin).	Ez niameybîya (m). (Ben gelmemiştim).
Ti ameybî (n). (Sen gelmiştin).	Ti niameybî (n). (Sen gelmemiştin).
Ti amebîya (m). (Sen gelmiştin).	Ti niameybîya (m). (Sen gelmemiştin).
O (wi) ameybi (n). (O gelmişti).	O (wi) niameybi (n). (O gelmemişti).
A (ya) amêybî. (O gelmişti).	A (ya) niamêybî (m). (O gelmemişti).
Ma amêybî. (Biz gelmiştik).	Ma niamêybî. (Biz gelmemiştik).
Şima amêybî. (Siz gelmiştiniz).	Şima niamêybî. (Siz gelmemiştiniz).
Ê (yi) amêybî. (Onlar gelmiştiler).	Ê (yi) niamêybî. (Onlar gelmemiştiler).

Zamîrî zereyî parantezî fekî Çewlîg de yenî şoxilnayış.

Çekuyê(cumle) nimûnê :

Ez cuwa ver nîamêybîyo no Bajar. (Ben daha önce bu şehire gelmemiştim).

6. 8 – Demo Vîyerteyo Nikayin (Gelecek Zaman Hikayesi)**a) Karo transitif (gecişli fiil)***Fîil: Wendiş / Wendene (Okumak)***Pozîtif****Negatîf**

Mi go biwendeni/ (n).(Ben okuyacaktım).

Mi go niwendeni (n). (Ben okumayacaktım).

Mi go biwendeni (m). (Ben okuyacaktım).

Mi go niwendeni (m).(Ben okumayacaktım).

To (tu) go biwendeni (n). (Sen okuyacaktın).

To (tu) go niwendeni (n).(Sen okumayacaktın).

To (tu) go biwendeni (m). (Sen okuyacaktın).

To (tu) go niwendeni (m).(Sen okumayacaktın).

Ey (yi) go biwendeni (n). (O okuyacaktı).

Ey (yi) go niwendeni (n). (O okumayacaktı).

Aye (yay) go biwendeni. (O okuyacaktı)

Aye (yay) go niwendeni (m). (O okumayacaktı).

Ma go biwendeni. (Biz okuyacaktık).

Ma go niwendeni (Biz okumayacaktık).

Şima go biwendeni. (Siz okuyacaktınız).

Şima go niwendeni (Siz okumayacaktınız).

Înan (yin) go biwendeni. (Onlar okumayacaktılar).

Înan (yin) go niwendeni. (Onlar okumayacaktılar).

Îta de herîndê biwendeni de (biwendîyeni/biwendêni /biwendîn) zî yeno şoxilnayiş.

Zamîrî zereyî parantezî fekî Çewlîg de yenî şoxilnayiş.

Çekuyê(cumle) nimûnê :

Mi ko/govizêr kovarê Deng biwêndiyeni, la waxt mi çin bi (Ben dîn Deng dergisini okuyacaktım, fakat zamanım olmadı).

b) Karo intransitif (gecişsiz fiil)*Fîil : Amêyîş/Ameyene (Gelmek). (Ca ca de „imeyîş“ yan zî „umeyîş“ zi vacîyeno).***Pozîtif****Negatîf**

Ez biameyni (n). (Ben gelecektim).

Ez niameyni (n). (Ben gelmeyecektim).

Ez biameyni (m). (Ben gelecektim).

Ez niameyni (m). (Ben gelmeyecektim).

Ti biameyni (n). (Sen gelecektin).

Ti niameyni (n). (Sen gelmeyecektin).

Ti biameyni (m). (Sen gelecektin).

Ti niameyni (m). (Sen gelmeyecektin).

O (wi) biameyni (n). (O gelecekti).	O (wi) niameyni (n). (O gelmeyecekti).
A (ya) biameyni. (O gelecekti).	A (ya) niameyni (m). (O gelmeyecekti).
Ma biameyni. (Biz gelecektik).	Ma niameyni. (Biz gelmeyecektik).
Şima biameyni. (Siz gelecektiniz).	Şima niameyni. (Siz gelmeyecektiniz).
Ê (yi) biameyni. (Onlar gelecektiler).	Ê (yi) niameyni. (Onlar gelmeyecektiler).

Zamîrî zereyî parantezî fekî Çewlîg de yenî şoxilnayiş.

Çekuyê(cumle) nimûnê :

Ez vizêr biamêyni kê şima, la ez bacê şiya sinema.(Ben dün size gelecektim, fakat sonra sinemaya gittim.)

6. 9 – Demo Vîyerteyo Nikayin (Sanal Gecmiş Zaman, Gelecek Zamanın Hikayesi)

a) Karo transitif (gecişli fiil)

Fîil: Wendiş / Wendene (Okumak)

Pozîtif

Negatîf

Mi go biwendenî (n). (Ben okuyacaktım).

Mi go niwendenî (n). (Ben okumayacaktım).

Mi go biwendenî (m). (Ben okuyacaktım).

Mi go niwendenî (m).(Ben okumayacaktım).

To (tu) go biwendenî (n).(Sen okuyacaktın).

To (tu) go niwendenî (n).(Sen okumayacaktın).

To (tu) go biwendenî (m).(Sen okuyacaktın).

To (tu) go niwendenî (m). (Sen okumayacaktın).

Ey (yi) go biwendenî (n). (O okuyacaktı).

Ey (yi) go niwendenî (n). (O okumayacaktı).

Aye (yay) go biwendenî. (O okuyacaktı).

Aye (yay) go niwendenî (m).(O okumayacaktı).

Ma go biwendîyeni. (Biz okuyacaktık).

Ma go niwendîyeni. (Biz okumayacaktık).

Şima go biwendenî. (Siz okuyacaktınız).

Şima go niwendenî. (Siz okumayacaktınız).

Înan(yin)go biwendenî.(Onlar okumayacaktılar).Înan(yin)go niwendenî.(Onlar okumayacaktılar).

Îta de herîndê biwendenî de (biwendîyeni/biwendêne /biwendîn) zî yeno şoxilnayiş.

Îta de herîndê “go” de “ko” zî yeno şoxilnayiş.Qalkerdîş de herfe “o” kuwena. Nimune: mi g’ biwendeni, tu g’ biwendeni, ey g’ biwendeni.

Zamîrî zereyî parantezî fekî Çewlîg de yenî şoxilnayış.

Çekuyê(cumle) nimûnê :

Mi go vizêr kovarê Deng biwêndiyeni, la waxt mi çin bi. (Ben dÛn Deng dergisini okuyacaktım, fakat zamanım olmadı).

b) Karo intransitif (gecişsiz fiil)

Fîil : Amêyiş/Ameyene (Gelmek). (Ca ca de „imeyiş“ yan zî „umeyiş“ zi vacîyeno).

Pozîtif

Negatîf

Ez go biameyni (n). (Ben gelecektim).

Ez go niameyni (n). (Ben gelmeyecektim).

Ez go biameyni (m). (Ben gelecektim).

Ez go niameyni (m). (Ben gelmeyecektim).

Ti go biameyni (n). (Sen gelecektin).

Ti go niameyni (n). (Sen gelmeyecektin).

Ti go biameyni (m). (Sen gelecektin).

Ti go niameyni (m). (Sen gelmeyecektin).

O (wi) go biameyni (n). (O gelecekti).

O (wi) go niameyni (n). (O gelmeyecekti).

A (ya) go biameyni. (O gelecekti).

A (ya) go niameyni (m). (O gelmeyecekti).

Ma go biameyni. (Biz gelecektik).

Ma go niameyni. (Biz gelmeyecektik).

Şima go biameyni. (Siz gelecektiniz).

Şima go niameyni. (Siz gelmeyecektiniz).

Ê (yi) go biameyni. (Onlar gelecektiler).

Ê (yi) go niameyni. (Onlar gelmeyecektiler).

Zamîrî zereyî parantezî fekî Çewlîg de yenî şoxilnayış.

Qalkerdiş de herfe “o” kuwena. Nimune: Ez g’ biameni, ti g’ biameni, wi g’ biumeni.

Çekuyê(cumle) nimûnê :

Ez go vizêr biamêni kê şima, la ez bacê şîya sinema.(Ben dÛn size gelecektim, fakat sonra sinemaya gittim.)

7. RAWAYÎ (KÎPLER)

7. 1 – Raweyî Waştîşî (İstek Kipi)

a) Karo transitif (gecişli fiil)*Fîil: Wendiş / Wendene (Okumak)***Pozitif****Negatif**

Ez biwanî. (Ben okuyayım).	Ez niwanî (Ben okumayayım).
Ti biwanî. (Sen okuyasın).	Ti niwanî. (Sen okumayasın).
O (wi) biwano (n) (O okuya).	O (wi) niwano (n). (O okumaya).
A (ya) biwuno (m). (O okuya).	A (ya) niwano (m). (O okumaya).
Ma biwani (Biz okuyalım).	Ma niwani (Biz okumayalım).
Şima biwanî (Siz okuyasınız).	Şima niwanî. (Siz okumayasınız).
Ê (yi) biwanî. (Onlar okuyalar).	Ê (yi) niwanî (Onlar okumayalar).

Zamîrî zereyî parantezî fekî Çewlîg de yenî şoxilnayiş.

Cumle yo (çeku) nûmune:

Ti wazenî, ez to re kitabî Ema biwanî. (İstersen sana Ema `nın kitabını okuyayım).

Ez tu rê sonikê Apo Faris biwanî?. (Sana Apo Faris masalını okuyayım mı?)

b) Karo intransitif (gecişsiz fiil)*Fîil : Amêyiş/Ameyene (Gelmek). (Ca ca de „imeyiş“ yan zî „umeyiş“ zi vacîyeno).***Pozîtif****Negatif**

Ez biyerî. (Ben geleyim).	Ez niyerî. (Ben gelmeyeyim).
Ti biyerî. (Sen gelesin).	Ti niyerî. (Sen gelmeyesin).
O (wi) biyero (n). (O gele).	O (wi) niyero (n). (O gelmeye).
A (ya) biyero (m). (O gele).	A (ya) niyero (m). (O gelmeye).
Ma biyeri. (Biz gelelim).	Ma niyeri. (Biz gelmeyelim).
Şima biyerî. (Siz gelesiniz).	Şima niyerî. (Siz gelmeyesiniz).
Ê (yi) biyerî (Onlar geleler).	Ê (yi) niyerî (Onlar gelmeyeler).

Zamîrî zereyî parantezî fekî Çewlîg de yenî şoxilnayiş.

Cmleyo (çeku) nimûne:

Ti têna zani şîyerê keye? Yan ez tu ya biyerê. (Yalnız eve gidebilirmisin? Yoksa ben senin ile geleyim).

7. 2. Raweyî Fermanî (Emir Kipi)**a) Karo transitif (gecişli fiil)**

Fîil: Wendiş / Wendene (Okumak)

Pozitif**Negatif**

Ti biwan! (Sen oku!).

Ti mewan! (Sen okuma!).

Wa o (wi) biwan! (n). (O okusun!).

Wa o (wi) niwan! (n) (O okumasın!).

Wa a (ya) biwan! (m). (O okusun!).

Wa a (ya) niwan!(m). (O okumasın!).

Şima biwanîn! (Siz okuyun!).

Şima mewunîn! (Siz okumayın!).

Wa ê (yi) biwunî!/. (Onlar okusunlar!).

Wa ê (yi) niwanî! (Onlar okumasınlar!).

Zamîrî zereyî parantezî fekî Çewlîg de yenî şoxilnayiş.

b) Karo intransitif (gecişsiz fiil)

Fîil : Amêyiş/Ameyene (Gelmek). (Ca ca de „imeyiş“ yan zî „umeyiş“ zi vacîyeno).

Pozitif**Negatif**

Ti biye! (Sen gel!).

Ti mîye/mey! (Sen gelme!).

Wa o (wi) biyero! (O gelsin).

Wa o (wi) niyero! (O gelmesin!).

Wa a (ya) biyero! (O gelsin!).

Wa a (ya) niyero! (O gelmesin!).

Şima biyerin! (Siz gelin!).

Şima meyrin! (Siz gelmeyin!).

Wa ê (yi) biyeri! (Onlar gelsinler!) Wa ê (yi) niyerê! (Onlar gelmesinler!).

Zamîrî zereyî parantezî fekî Çewlîg de yenî şoxilnayiş.

7. 3. Raweyî Ganîyê (Gereklilik Kipi, Meli , Mali)**a) Karo transitif (gecişli fiil)**

Fîil: Wendiş / Wendene (Okumak)

Pozitif**Negatif**

Ez ganî biwanî. (Ben okumalıyım).	Ez ganî niwanî. (Ben okumamalıyım).
Ti ganî biwanî. (Sen okumalısın).	Ti ganî niwanî. (Sen okumamalısın).
O (wi) ganî biwano (n). (O okumalı).	O (wi) ganî niwano (n). (O okumamalı).
A (ya) ganî biwano (m). (O okumalı).	A (ya) ganî biwano (m). (O okumamalı).
Ma ganî biwani. (Biz okumalıyız).	Ma ganî niwani. (Biz okumamalıyız).
Şima ganî biwanî. (Siz okumalısınız).	Şima ganî niwanî. (Siz okumamalısınız).
Ê (yi) ganî biwanî. (Onlar okumalılar).	Ê (yi) ganî niwanî. (Onlar okumalılar).

Zamîrî zereyî parantezî fekî Çewlîg de yenî şoxilnayiş.

Çewlîg de herindê „ganî“ de „gun“ yan zî „gereka“ vacîyeno.

Cumleyo (çeku) nimûne:

Ti ganî her şan lajî xo re yew sonika kirdkî biwanî. (Her aqşam oğluna zazaca bir masal okumalısın).

b) Karo întansîtîf (geçişsiz fiil)

Fîil : Amêyiş/Ameyene (Gelmek). (Ca ca de „imeyiş“ yan zî „umeyiş“ zi vacîyeno).

Pozitif**Negatif**

Ez ganî biyerî. (Ben gelmeliyim).	Ez ganî niyerî. (Ben gelmemeliyim).
Ti ganî bîyerî. (Sen gelmelisin).	Ti ganî nîyerî. (Sen gelmemelisin).
O (wi) ganî bîyero (n). (O gelmeli).	O (wi) ganî nîyero (n). (O gelmemeli).
A (ya) ganî bîyero (m). (O gelmeli).	A (ya) ganî nîyero (n). (O gelmemeli).
Ma ganî bîyeri. (Biz gelmeliyiz).	Ma ganî nîyeri. (Biz gelmemeliyiz).
Şima ganî biyerî. (Siz gelmelisiniz).	Şima ganî niyerî. (Siz gelmemelisiniz).
Ê (yi) ganî bîyerî. (Onlar gelmeliler).	Ê (yi) ganî nîyerî. (Onlar gelmemeliler).

Zamîrî zereyî parantezî fekî Çewlîg de yenî şoxilnayiş.

Cumleyo (çeku) nimûne:

O ganî siba bêyero gure. (O yarın işe gelmeli).

7.4. Raweyî Şertî (Dilek-Şart Kipinin Hikayesi)**a) Karo transitif (gecişli fiil)**

Fîil: Wendiş / Wendene (Okumak)

Pozitif**Negatif**

Mi biwendeni. (Ben okusaydım).

Mi niwendeni. (Ben okumasaydım).

Tu biwendeni. (Sen okusaydın).

Tu niwendeni. (Sen okumasaydın).

Ey (yi) biwendeni (n). (o okusaydı).

Ey (yi) niwendeni (n). (O okumasaydı).

Aye (yay) biwendeni (m). (O okusaydı).

Aye (yay) niwendeni (m). (O okumasaydı).

Ma biwendeni. (Biz okusaydık).

Ma niwendeni. (Biz okumasaydık).

Şima biwendeni. (Siz okusaydınız).

Şima niwendeni. (Siz okumasaydınız).

Înan (yin) biwendeni. (Onlar okusaydılar).

Înan (yin) niwendeni (Onlar okumasaydılar).

Îta de herîndê biwendeni de (biwendîyeni/biwendêne /biwendîn) zî yeno şoxilnayiş.

Zamîrî zereyî parantezî fekî Çewlîg de yenî şoxilnayiş.

Cumleyo (çeku) nimûne:

To dersê xo biwendeni. (Sen dersini okusaydın).

b) Karo întansîtîf (geçişsiz fiil)

Fîil : Amêyiş/Ameyene (Gelmek). (Ca ca de „imeyiş“ yan zî „umeyiş“ zi vacîyeno).

Pozitif**Negatif**

Ez biameyni. (Ben gelseydım).

Ez niameyni. (Ben gelmeseydım).

Ti biameyni. (Sengelseydın).

Ti niameyni. (Sen gelmeseydın).

O (wi) biameyni (n). (O gelseydi).

O (wi) niameyni (n). (O gelmeseydi).

A (ya) biameni (m). (O gelseydi).

A (ya) niameyni (m). (O gelmeseydi).

Ma biameyni. (Biz gelseydik). Ma niameyni. (Biz gelmeseydik).
Şima biameyni. (Siz gelseydiniz). Şima niameyni. (Siz gelmeseydiniz).
Ê (yi) biameyni. (Onlar gelseydiler). Ê(yi) niameyni. (Onlar gelmeseydiler).

Zamîrî zereyî parantezî fekî Çewlîg de yenî şoxilnayiş.

Ti biameyni keye ma. (Sen bizim eve gelmeliydin).

Hetanî nika nê kitabê ey weşanîyayî:

- 1) Seyîdxan Kurij, Wayê Hot Birayûn: Sanikan û Deyîranê Çewlîgî ra, Weşanên Arya, İstanbul, Nîsane 2002, 128 r.
- 2) Seyidxan Kurij, Filît û Gulîzar, Weqfa Kurdî ya Kulturî Stockholmê, Stockholm, 2004, 28 r.
- 3) Seyîdxan Kurij (Arêkerdax), Arwûnçî û Lûy, Enstîtuya Kelepûrê Kurdî Şaxê Duhokî, Duhok 2010, 223 rîpelî

LÊKER (KAR) DI ZIMANÊ KURDÎ DE (2)

Deham Ebdulfettah

(4)

BIRRÊ ÇAREM

- Aheng û Kategoriya Karan

- Karên Nederhingêv

- Navên Nependî
- Navên Pendî

- Karên Derhingêv

- Navên Nependî
- Navên Pendî

Aheng û Kategoriya Karan:

Mebesta me ji (aheng û kategoriya karan) ew têkilî û girêdana di navbera karan û destnîşankirina nîşandekên jimara kara (kiryar) û berkaran de ye. Anku, çawa û bi çi pergalê ew nîşandekên yekjimar û komjimara nav û cînavên ku di hevokan de dibin kara û berkar li her sê hêmanên (regezên) hevokan (kara - berkar - kar) xuya dibin.

Nîşandekên jimara navan li gora cor û demên karan (derhingêv, nederhingêv) û li gora celebên navan (pendî, nependî) tên xebitandin û li wê gorê jî digihêjin hêmanên hevokan.

Karên Nederhingêv (têneper):

Em dizanin ku karên nederhingêv ew kar in, ên ku wateyên hevokên wan bi kara û karên wan tenê jî sergihayî dibin.

Wek: - Zarok digirî

- Pale westiyan

Navên nependî û yên pendî, her dû jî bi van karan re hevokên sergihayî ava dikin û di wan hevokan de dibin kara. Lê nîşandekên jimara her dû celebên navan (pendî, nependî), ne wekî hev li hêmanên hevokan xuya dibin.

1 - Navên Nependî (nenas):

Nîşandekên navên nependî (ek, in) in. Ev nîşandek, di heman dem de dibin nîşandekên jimara wan navên nependî jî:

- (Ek): Nîşandeka navên nependî, yên yekjimara her du zayendên (nêr û mê) ye.

Wek: - Hespek hat ser êmê xwe

- Mehînek hat ser êmê xwe

- (In): Nîşandeka komjimara navên nependî, yên her du zayendan e.

Wek: - Hespîn hatin ser êmê xwe

- Mehînin hatin ser êmê xwe

Ev nîşandekên jimara navên nependî, di hevokên karên nederhingêv de digihêjin navên ku kara ne û di heman dem de ev nîşandekên jimarê li karan jî (di hemû dem û raweyên wan de) xuya dibin.

Nimûne:

Borî: - Hevalek bûye mêvanê we

- Hevalin bûne mêvanên we

Nuha: - Hevalek dibe mêvanê we

- Hevalin dibin mêvanên we

Paşeroj: - Hevalek dê bibe mêvanê we

- Hevalin dê bibin mêvanên we

Daxwazî: - Xwezî hevalek bibe mêvanê we

- Xwezî hevalin bibin mêvanên we

- Gerek hevalek bibûya mêvanê we

- Gerek hevalin bibûna mêvanên we

-HD.....

2 - Navên Pendî (nas):

Nîşandekên jimara navên pendî bi karên nederhingêv re, li karan tenê xuya dibin. Lê navên ku di hevokan de dibin kara, bê nîşandek dimînin. Wek:

Borî: - Yarîzan (lîstikvan) daket yarîgehê

(Ew daket yarîgehê) (kara yek e)

- Yarîzan daketin yarîgehê

(Ew daketin yarîgehê) (kara kom e)

Nuha: - Yarîzan dadikeve yarîgehê

(Ew dadikeve yarîgehê) (kara yek e)

- Yarîzan dadikevin yarîgehê

(Ew dadikevin yarîgehê) (kara kome)

Paşeroj: - Yarîzan ê dakeve yarîgehê

(Ew ê dakeve yarîgehê) (kara yek e)

- Yarîzan ê dakevin yarîgehê

(Ew ê dakevin yarîgehê) (kara kom e)

Daxwazî: - Bila yarîzan dakeve yarîgehê (kara yeke)

- Xwezî yarîzan dakevin yarîgehê (kara kom e)

-HD.....

- Karên Derhingêv (têper):

1 - Navên Nependî (nenas):

Beriya nuha me gotibû, nîşandekên navên nependî, ew bixwe nîşandekên jimara wan in jî. Ev jî tê wê wateyê, ku ew nîşandek berdewam bi navên nependî ve ne. Ji ber ku navên pendî bi wan nîşandekan dibin nependî . Wek:

- Mirov = Mirovek

- Mirov = Mirovin

Li vê gorê nîşandekên nependî (ek, in) dibin parçeyek ji navên nependî (mirovek, mirovin). Bo vê egerê jî, nîşandekên jimarê di hevokên karên derhingêv de, li navên nependî xuya dibin, çî ew nav kara bin, çî berkar bin. Lê herî nîşandekên jimarê li gora dem û raweyên karan li hêmanên hevokan xuya dibin.

Dema Borî:

Di dema borî de nîşandekên jimarê li her sê hêmanên hevokê (kara - berkar - kar) xuya dibin û pê re jî nîşandekên verêsê (tewangê) (î, ê, an) digihêjin karayên (kiryarên) nependî.Wek.

- Şagirtekî (şagirtek + î) helbestek xwend
- Şagirtekê (şagirtek + ê) helbestek xwend
- Şagirtinan (şagirtin + an) helbestek xwend.

Di van hevokan de ahenga kategoriyê di navbera karan û berkaran de ye. Anku, nîşandekên jimarê, yên ku li karan xuya bûne, ew bixwe nîşandekên jimara berkaran in. Wek:

- Cotyarekî darek çandibû
- Cotyarekî darin çandibûn
- Cotyarinan darek çandibû
- Cotyarinan darin çandibûn

Lê ji ber ku nîşandekên nependiyê (ek, in) gihiştine kara û berkaran, ew girêdan baş zelal nabe ⁽¹⁶⁾

Dema Nuha:

Di dema nuha de girêdana nîşandekên jimarê di navbera kara û karên wan de pêk tên. Anku, nîşandekên jimara navên ku kara ne, li karên wan xuya dibin û nîşandekên verêsê (tewangê) jî digihêjin berkaran .Wek:

- Hevalek dostekî (dostek + î) xelat dike
(Ew wî xelat dike)
- Hevalek dostinan (dostin + an) xelat dike
(Ew wan xelat dike)

¹⁶ - Ev girêdan bi navên pendî re berçav û zelal dibe.

- Hevalin dostekî xelat dikin

(Ew wî xelat dikin)

- Hevalin dostinan xelat dikin

(Ew wan xelat dikin)

- Zarokek sêvekê dixwe

- Zarokin sêvekê dixwin

- Zarokin sêvinan dixwin

Di van mînanan de xuya ye, dema ku kara yekjimar be, nîşandeka yekjimara wî digihêje karê wî jî û ku pirjimar be jî, nîşandeka pirjimara wî digihêje karê wî.

- **Dema Paşeroj:**

Di dema paşeroj de jî (weku dema nuha) nîşandekên jimarê di navbera kara û karên wan de pergala kategoriyê peyda dikin. Anku kara bi çi jimarê be nîşandeka wê jimarê li karê wî jî xuya dibe. Wek:

- Dostek dê hespekî bifiroşe

- Dostek dê hesp û mehînekê bifiroşe

- Dostin dê hespekî bifiroşin

- Dostin dê hesp û mehînekê bifiroşin

- Dostek ê hespinan bifiroşe

- Dostin ê hespinan bifiroşin

- HD.....

- **Raweyên Daxwazî:**

Di zimanê Kurdî (Kurmanciya Jorîn) de, raweyên daxwazî beranberî demên karan, ên pêşkerî raweyên xwe werdigirin⁽¹⁷⁾. Li wê gorê jî têkiliya nîşandekên jimara navan di navbera her sê hêmanên hevokê de destnîşan dibin.

- Di raweyên daxwazî de, yên beranberî karên dema borî: (Min xwest = xwezî te jî bixwesta), girêdan di navbera berkar û karê wî de ye û nîşandekên jimara berkar li kar xuya dibin. Wek:

- Bila hevlekî helbestek bixwenda

¹⁷ - Em ê mijara raweyên daxwazî di babeta veguhestina (kêşana) karan de, bi firehî rave bikin.

- Bila hevalekî helbestin bixwendana
- Gerek hevalinan helbestek xwendibe
- Gerek hevalekê helbestin xwendibin
- Xwezî hevalinan helbestin xwendibana
- Xwezî hevalekî helbestin xwendibûna

- Di daxwaziyên beranberî dema nuha û paşerojê de:

(Ez dixwazim, ez ê bixwazim = Xwezî tu jî bixwazî), girêdan di navbera kara û karê wî de ye û nîşandekên jimara kara digihêjin karê wî.

Wek:

- Belkî hevalek helbestinan bixwîne
- Xwezî hevalin helbestinan bixwînin
- Bila hevalek helbestekê bixwîne
- Bila hevalin helbestekê bixwînin

2 - Navên Pendî (nas):

Di hevoka karên derhingêv de nîşandekên jimara navên pendî, li gora demên karan, li her sê hêmanên hevokê (kara, berkar û kar) xuya dibin:

- Demên Borî:

Di dema borî de kara (kiryar) dikeve raweya verê, anku nîşandekên tewangê digihêjin nav û cînavên ku di hevokê de dibin kara.

Wek:

- Zîne sêv xwarin
- Azêd (azadî) pirtûk xwend

Lê berkarê rasteder wekî xwe (bê nîşandek) cihê xwe digire û nîşanên jimara wî li kar xuya dibin. Anku, ahenga kategoriyê di navbera kar û berkarê wî de ye, eger berkar yekjimar be nîşana yekjimarê digihêje kar. Wek:

- Zîne sêv xwar / yek sêv /

- Zînê sêv xwarin / gelek sêv /
- Vî hevalî rojname xwend / yek rojname /
- Vî hevalî rojname xwendin / gelek rojname/
- Şagirtan xelat digirt / yek xelat /
- Şagirtan xelat digirtin / gelek xelat /

(5)

BIRRÊ PÊNCEM

-Raweya Karên Diyar û Nediya

- Karên Diyar
- Karên Nediya
- Çawa Hevoka Diyar dibe Nediya ?

Raweya Karên Diyar û Nediya

Navlêkirina (karên diyar û nediya) di pirtûkên rêzimana Kurdî de bi gelek navlêkirinên têvel hatiye. Her şarezayekî zimên navek, li gora baweriya xwe, li mijara me kiriye û pê xebitiye:

- Tewfîq Wehbî: (Malûm û Mehol- معلوم و مجهول)
- Reşîdê Kurd: (Dîdar û Nedîdar)
- Cegerxwîn: (Pendî û Nependî)
- Nûrî Elî Emîn: (Aşkera û Win)
- Nesrîn Fexrî: (Nasraw û Nanasraw)
- Sadiq Behadînê Amîdî: (Penî û Nepenî)
- Feqî Huseyn Sagniç: (Lebat û Tebat)

-Samî Tan: (Lebat û Tebat).

Berçav e ku ev navlêkirin tev jî, bi wateya (Xuya û Nexuya) hatine. Mebest ji van navlêkirinan tevan jî, xuyabûn û nexuyabûna kara (kiryar) di pergala hevokê de ye, anku kara diyar e, yan nediyar e. Wek:

1 - Zînê gul çînîn (kara diyar e)

2 - Gul hatin çînîn (kara nediyar e)

-Di hevoka yekem de (Zînê) karayê karê (çînîn) e. Ev hevok di raweya kara diyar de ye.

- Di hevoka duwem de (gul) hatine çînîn, lê nediyar e kê ew çînîne. Ev hevok jî, di raweya kara nediyar de ye. Bo vê têgehê, me jî navê (karên diyar û nediyar) li mijarê kiriye.

Bi vê nêrînê kar dibin du beş

- Karên diyar (kara xuya)

- Karên nediyar (kara nexuya).

- Karên Diyar:

Em dizanin ku kar, ji hêla hêzê ve, du beş in:

- Karên derhingêv (têper)

- Karên nederhingêv (têneper)

Raweya karên diyar û nediyar bi karên derhingêv (tenê) ve girêdayî ye. Her wekî em dizanin, hevoka karên derhingêv bi sê hêmanên sereke ava dibe (kara, berkarê raster û kar).Wek:

- Zîn gulan diçine

Binavkirina rêzimanî (erkûcî)⁽¹⁸⁾ bo hêmanên vê hevokê ev e:

Zîn: Kara ye (kesê ku gulan diçine)

Gulan: Bekarê raster e)

Diçine: Karê (çînîn) di dema nuha de ye.

¹⁸ - Erkûcî (erk + cî) : erkê bêjeyê û cihê wê di pergala hevokê de (parsing) - (اعراب). Me ev navlêkirin ji navê pirtûka Nûrî Elî Emîn wergirtye : (erk û şiwên) Nûrî Elî Emîn - Bexda (1986).

Ev hevoka ku ji kara, berkar û karê derhingêv pêk hatiye, hevokeke diyar e, anku karayê karê wê, yê derhingêv (diçine) diyar û aşkere ye: (Zîn.....diçine). Li vê gorê, karên diyar ew kar in, ên ku karayên wan di hevokan de diyar û xuya ne.

Wek: - Mamoste waneyan şirove dike

- Şagirtan wane xwendin

- Eger cotyar daran biçînin, gerek em jî wan biparêzin.

Di van mînakên de karên (şirove dike, xwendin, biçînin û biparêzin) karinî derhingêv in, karayên (kiryarên) wan (mamoste, şagirtan, cotyar û em) di hevokan de berçav û diyar in. Bi vê pîvanê em karin bibêjin, hemû karên derhingêv, ên ku hevokên sergihayî bi kara û berkarên xwe ava dikin, ew karinî diyar in, anku karayên wan diyar in.

- Karên Nediya:

Di danasîna raweya karên diyar de me got, karên diyar ew kar in, ên ku karayên wan diyar in.

Wek:

- Temo dar şikandiye.

Lê ku bûyerên karan bînin kirin, bêyî ku em zanibin kê ew kar kirine, Wek: (Dar hatiye şikandin), hingê ev hevok dikeve raweya karên (nediyar). Çiku, di vê hevokê de, dar hatiye şikandin, lê kara (ê ku dar şikandiye) nediyar e. Bo vê egerê em navê raweya nediyar, anku kara nediyar lê dikin.

Li vê gorê, hemû hevokên ku ji karên derhingêv, bi alîkariya karê (hatin) pêk hatine û kara di wan de ne berçav û nas bin, ew hevok di raweya karên nediyar de ne, anku karayên wan nediyar in.

Wek:

- Rojname hatiye belavkirin

- Ziman hatiye jibîrkirin

- Pirtûk hatine firoştin

- Darên me dihên (tên) şikandin

- Darên we jî dê bînin şikandin

- HD.....

Çawa Hevoka Diyar Dibe Nediya ?!

Em dizanin ku hevoka diyar ji sê hêmanên bingehîn saz dibe, (kara, berkarê rasteder û karê derhingêv).

Wek: - Temo cam şikand

Raweya vê hevoka diyar: (Temo cam şikand), bi van pêngavên jêrîn dibe nediyar:

1 - Kara ji despêka hevokê tê avêtin:

- (.....) cam şikand

2 - Berkarê rasteder dikeve cihê kara, anku dibe cîgirê karayê avêtî:

- (cam)..... şikand

3 - Karê alîkar (hatin) li gora dem û raweya hevoka diyar, li pey cîgirê kara tê xebitandin

4 - Jêdera karê hevoka diyar (şikandin), li pey karê alîkar (hat) tê xebitandin:

- Cam hat şikandin

Bi vî şêwazî ev hevok (Temo cam şikand), ji raweya karê diyar ketiye raweya karê nediyar (cam hat şikandin). Hêmanên hevoka nediyar jî, bi vî şêweyî binav dibin:

Cam: Cîgirê kara ye.

Hat: Karê alîkar (hatin) di dema borî de ye.

Şikandin: Jêdera karê (şikand) e.

Bi vî pîvanê raweya karên nediyar ji hemû karên derhingêv saz dibe.

Nimûne:

Raweya Diyar

Raweya Nediyar

-Şagirtêkî sirûdek xwend Sirûdek hat xwendin

-Şagirt sirûdan dixwîn Sirûd dihên (tên)xwendin

-Zarokan dar şikandine Dar hatine şikandin

-Zarok ê daran bişikîn Dar ê bên şikandin

-Fatê mirîşkên xwe firotin Mirîşkên Fatê hatin firotin

-Reşo mirîşkek serjêkir Mirîşkek hat serjêkirin

-Eger we dar çandin Eger dar hatin çandin

-Em ê jî wan biparêzin Ew ê jî bên parastin

-Xwezî wan dar çandibin Xwezî dar hatibin çandin

-Gerek hûn jî daran biçînin Gerek dar bèn çandin

- HD.....

Beriya nuha jî me di ber çavan re derbas kiriye, ku karên derhingêv tenê dikarin raweyên nediyar saz bikin, anku karên nederhingêv berdewam di raweya karên diyar de ne û di raweyên hevokên nediyar de nayên xebitandin. Lê ku karên nederhingêv bi alîkariya paşgira (andin) bibin derhingêv.

Wek:

- Bezîn: Bez + andin = bezandin

- Kenîn: Ken + andin = kenandin

- Revîn: Rev + andin = revandin

- Gerîn: Ger + andin = gerandin

- Firîn: Fir + andin = firandin

- HD.....

Hingê ev karên ku bi (andin)ê bûne derhingêv, ew jî dikarin raweyên hevokên nediyar saz bikin:

Raweya Diyar

Raweya Nediyar

- Şêro zarok bezandin Zarok hatin bezandin

- Reşo hevalan dikenîne Heval tên kenandin

- Helo mirîşkek revand Mirîşkek hat revandin

- Hemo kevokan difirîne Kevok tên firandin

- HD.....

Cînav jî weku navan dikarin cihê xwe di raweya hevokên diyar û nediyar de bibînin û di hemû dem û raweyên karan de cihê navan bigirin.

Wek:

Raweya Diyar

Raweya Nediyar

- Min ew perwerde kir Ew hat perwerdekirin

- Ew wan xelat dike Ew dihên (tên) xelatkirin

- Wan ez êşandime Ez hatime êşandin

- Kî kê dixapîne ?! Kî dihê (tê) xapandin ?!
- Tu kê ji wan dinasî ? Kî ji wan tê nasîn ?
- Hûn dê kê û kê helbijêrin ?- Kî û kî dê bèn helbijartin ?
- HD.....

Dema mirov hevoka diyar bike nediyar divê karê alîkar (hatin) di hevoka nediyar de, li gora dem û raweya karê hevoka diyar pêk bê. Anku, karê diyar di çi dem û raweyê de be gerek karê alîkar (hatin) jî di wê dem û raweyê de be. Wek:

Hevoka Diyar**Hevoka Nediya****Borî:**

- Zîne pirtûk xwend Pirtûk hat xwendin
- Zîne pirtûk xwendiye Pirtûk hatiye xwendin
- Zîne pirtûk dixwend Pirtûk dihat xwendin
- Zîne pirtûk xwendibû pirtûk hatibû xwendin

Nuha:

- Zîn pirtûkê dixwîne - Pirtûk dihê/ tê xwendin

Paşeroj:

- Zîn dê pirtûkê bixwîne Pirtûk dê bihê (bê) xwendin

Daxwazî:

- Gerek Zîne pirtûk xwendibe (diyar)
- Gerek pirtûk hatibe xwendin (nediyar)
- Xwezî Zîne pirtûk xwendiba (diyar)
- Xwezî pirtûk hatiba xwendin (nediyar)
- Bila Zîn pirtûkê bixwîne (diyar)
- Bila pirtûk bihê / bê xwendin (nediyar)
- Eger Zîn pirtûkê bixwîne (diyar)
- Eger pirtûk bihê bê xwendin (nediyar)
- Gerek hûn jî wê bixwînin (diyar)

- Gerek ew jî bihê / bê xwendin (nediyar)

- HD.....

Ji hêla aheng û kategoriya hevoka nediyar ve jî, bi egera ku karê alîkar (hatin) karekî nederhingêv e nîşandekên jimara cîgirê kara di hemû dem û raweyan de li karê (hatin) diyar dibin.

Wek:

- Sêv hatiye jêkirin (yek sêv)

- Sêv hatine jêkirin (gelek sêv)

- Sêv tê jêkirin (yek sêv)

- Sêv tèn jêkirin (gelek sêv)

- Sêv ê bê jêkirin (yek sêv)

- Sêv ê bèn jêkirin (gelek sêv)

- Bila sêv bihata jêkirin (yek sêv)

- Bila sêv bihatana jêkirin (gelek sêv)

- HD.....

Seyda Sadiq Behadîne Amêdî di pirtûka xwe ya rêzimanî de (rêzimana Kurdî - Bexda (1987) - Rû (314), dibêje, karê alîkar (dan) jî, weku karê (hatin) raweya karên nediyar saz dike.

Seydayê Amêdî van mînakên bo çespendina vê dîtina xwe berçav dike:

Diyar

Nediyar

- Min ders nivîsîye Min ders (daye) nivîsîn

- Min ders nivîsîbû Min ders (dabû) nivîsîn

- Te zeviya xwe kêlabû Te zeviya xwe (dabû) kêlan

- HD.....

Bi dîtina min, karê (dan) ne wekî (hatin) e û nikare wekî (hatin) jî karên nediyar saz bike. Hevokên ku Amêdî ew kirine mînak jî, hemû di raweya diyar de ne.

Anku, karê (dan)hevokên nediyar saz nekirine. Ji ber ku:

- Mercê bingehîn bo sazkirina hevoka nediyar ew e, ku kara (kiryar) bê avêtin û berkarê rasteder cihê wî bigire. Wek:

- Zî nê karek kir = Karek hat kirin

Lê di hevokên Amêdî de ne kara hatiye avêtin û ne berkarê rasteder cihê wî girtiye:

- Min ders (daye) nivîsîn

Di vê hevokê de:

Min: Kara ye (min..... daye)

Ders: Berkarê rasteder e (min ders daye)

Nivîsîn: Berkarê nersteder e (min ders (daye) bo nivîsînê)

Ew mînakên mayî jî li vê mînakê tîn pîvan û ew jî di raweya hevokên diyar de ne. Lê ku em bixwazin wan hevokên Mamoste Amêdî bikin nediyar em ê karê (hatin) bikar bînin:

Raweya Diyar

Raweya Nediyar

- Min ders daye nivîsîn Ders (bo nivîsînê) hatiye dan

- Min ders dabû nivîsîn Ders (bo nivîsînê) hatibû dan

- Te zeviya xwe dabû kêlan Zevî (bo kêlanê) hatibû dan.

Ji vê ronîkirinê tê zanîn ku karê (dan) bo raweya hevokên nediyar bikar nayê, tenê (hatin) vê raweyê pêk tîne.

(6)

BIRRÊ ŞEŞEM**- Jêderên karan****- Binesaziya Jêderan**

A - Jêderên Xwerû

B - Jêderên Dariştî

- Pêşgir

- Paşgir

C - Jêderên Lêkdayî

- Zayenda Jêderan**- Jêderên Winda**

- Beşîn

- Bêjan

- Çemîn

- Rişan

- Rûtan

- Rengan

- Gemirîn

Jêderên Karan

Jêder bêjeyeke watedar e, têgeha bizavekê yan bûyerekê bi xwe ve digire, bêyî ku pêjna demekê destnîşan bike, anku jêder ew bêje ye, ya ku bûyereke bê dem nima dike, Wek: (hatin, çûn, dan, xwarin.....).

Di pirtûkên rêzimana Kurdî de çend navlêkirinên dîtir jî, li şûna navê (jêder) bikar hatine, wek (rader, makder, çavkanîk, çavik, mesder). Lê ev navlêkirin tev jî, hev wate ne. Hemû cor û celebên karan ji jêderan tene der. Karên derhingêv (têper) ji jêderên xwe yên derhingêv derdiçin. Wek: (xistin, kirin, dan, lêdan, xwarin, xwendin, revandin, hîştin, bihîstin, kuştin, serjêkirin, westandin, avdan,

berdan...). Karên nederhingêv jî, ji jêderên xwe yên nederhingêv têne der, Wek: (hatin, ketin, westan, razan, revîn, livîn, bûn, rabûn, çûn, derçûn, giriyan, kenîn, gihiştin, nalîn, birijîn.....)

Binesaziya Jêderan:

Binesaziya her jêdereke di zimanê Kurdî de, li gora forma wê, dibe du beş:

1 - Binyata (qurmê) karê dema borî (qed).

Wek:

- Bûn: Bû.....(binyata borî)
- Ketin: Ket..... (binyata borî)
- Zanîn: Zanî..... (binyata borî)
- Berdan: Berda.... (binyata borî)

2 - Nîşandeka jêderî, ku li pey binyata dema borî, wek paşpirtik, diyar dibe:

- Bûn:.....n (nîşandeka jêderî)
- Ketin:.....in (nîşandeka jêderî)
- Zanîn:.....n (nîşandeka jêderî)
- Berdan:.....n (nîşandeka jêderî)

Seyda Reşîdê Kurd, di rêzimana xwe de, navên (pêşîng) û (paşîng) li wan her du birrên jêderê dike. Li vê gorê her jêdereke karan dibe du par, (binyata dema borî + nîşandeka jêderî).

Nimûne:

<u>Jêder</u>	<u>Binyata Karê Borî</u>	<u>Nîşandeka Jêderî</u>	
- Daketin		daket	in
- Parastin		parast	in
- Dan		da	n
- Serdan		serda	n
- Çûn		çû	n
- Dirûn		dirû	n
(Dirûtin)		dirût	in

- Kenîn	kenî	n
(keniyan)	keniya	n
- Barîn	barî	n
- HD.....		

Ji rexê bêjesaziya formê ve jî, jêder dibin sê beşên sereke. Wek:

- Jêderên xwerû (sade)
- Jêderên dariştî (xurdehad).
- Jêderên lêkdayî (hevbend)

A - Jêderên Xwerû:

Jêderên Xwerû ew jêder in, ên ku her yek ji wan, ji bêjeyeke rût (bê zêdebûn) pêk hatiye. Wek: (bûn, çûn, ristin, parastin, ketin, xistin, dan, barîn, revîn, sotin, patin, kuştin.....).

Berçav e, ku ev jêderên karan sade ne, ne pêşgir bi ser wan ve hatine berdan û ne paşgir jî ghiştine wan.

B: Jêderên Dariştî:

Jêderên dariştî jî ew jêder in, ên ku ji pêşgir û jêdereke xwerû, yan jî, ji jêdereke xwerû û paşgîrekê pêk tên:

Pêşgir: Dema ku pêşgîrek dikeve ser jêdereke xwerû, jêdereke dariştî, bi wateyê nû pêk tê.

Wek:

- Ra + xistin = raxistin
- Ra + girtin = ragirtin
- Da + xistin = daxistin
- Da + girtin = dagirtin
- Da + dan = dadan
- Ve + ketin = veketin
- Ve + girtin = vegirtin

- Ve + dan = vedan

- Ve + lîstin = velîstin

- Wer + girtin = wergirtin

- Wer + bûn = werbûn

- Wer + kirin = werkirin

- Wer + dan = werdan

- Rû + kirin = rûkirin

- Rû + dan = rûdan

- Rû + niştin = rûniştin

- Hil + kirin = hilkirin

- Hil + bûn = hilbûn

- Hil + firîn = hilfirîn

- Hil + dan = hildan.

- **Paşgir:** Yek paşgir tenê heye bo sazkirina jêderên dariştî, ew jî paşgira (andin) e. Ev paşgir digihêje jêderên xwerû û jêderên dariştî saz dike. Ji bilî vê jî ev paşgir bi du şêweyan bandorê li karên xwerû dike:

1 - Wateyeke nû dide wan

2 - Ji hêla hêzê ve jî, jêderên karên nederhingêv (têneper) dike derhingêv.

Wek:

- Revîn + andin = revandin (rev....+andin)

- Rizîyan + andin = rizandin

- Birijîn + andin = birijandin

- Kenîn + andin = kenandin

- Hejîn + andin = hejandin

- Qelişîn + andin = qelişandin

Wisan jî (çirrandin, çimandin, çivandin, alandin, kişandin, xurandin, şewitandin, westandin, gerandin, weşandin, dawerivandin, çikandin, kelandin, bezandin, revandin û HD.....).

C - Jêderên Lêkdayî:

Jêderên lêkdayî (hevedudanî) ew jêder in, ên ku her yek ji wan ji du bêjeyên watedar, an pirtir pêk tên. Wek: (Avdan, beravêtin, serbirrîn, koçkirin, hezkirin, serjêkirin, dilgirtin, mezinbûn, kurtkirin, pêşketin û HD.....).

Bêjeyên ku bi jêderên xwerû re jêderên lêkdayî saz dikin ev in: (Nav, cînav, hevalnav û hevalkar):

Nimûne:

1 - Nav: - Av + dan = avdan

- Ber + avêtin = beravêtin

- Dil + ketin = dilketin

- Hez + kirin = hezkirin

- Ser + birrîn = serbirrîn

- Rû + dan = rûdan

-HD.....

2 - Cînav:

Em dizanin ku ev cînavên pevxistî (pê, tê, jê, lê) ji pevxistina pêrbest û cînavên kesîn, an jî yên nîşandan pêk hatine. Wek:

- Bi + (wî, wê, vî, vê) = bê / pê

- Di + (wî, wê, vî, vê) = dê / tê

- Ji + (wî, wê, vî, vê) = jê

- Li + (wî, wê, vî, vê) = lê

Hinekan ji şarezayên zimanê me⁽¹⁹⁾ew cînavên

¹⁹ - Sadiq Behadîne Amêdî - Rêzimana Kurdî. Bexda (1987). Rû (413 - 414).

- Dr. Kurdistan Mukiryani (rêzimana Kurdî - قواعد اللغة الكردية). Bexda (1989). Rû (125).

pevxistî kirine pêşgir (pêşpirtik) û jêderine dariştî bi wan saz kirine. Bêguman, ew cînav in, ne pêşgir in. Ev cînav bi ser jêderên xwerû ve tên berdan û jêderine lêkdayî (hevgirtî), bi wateyeke nû saz dikin.

Wek:

Pê: - Pê + xistin = pêxistin

- Pê + dan = pêdan

- Pê + girtin = pêgirtin

- Pê + kirin = pêkirin

Tê: - Tê + dan = têdan

- Tê + xistin = têxistin

- Tê + gihîştin = têgihîştin

- Tê + perîn = têperîn (derbasbûn)

Jê: - Jê + kirin = jêkirin

- Jê + bûn = jêbûn

- Jê + hatin = jêhatin

- Jê + xistin = jêxistin

Lê: - Lê + dan = lêdan

- Lê + borîn = lêborîn

- Lê + kirin = lêkirin

- Lê + hatin = lêhatin

Ji bilî van cînavên pevxistî (pê, tê, jê, lê), ev şêweyên kurtkirin û pevxistina cînavan (pêk / pev, têk / tev, jêk / jev, lêk / lev) jî, li hin herêman bikar tînin û jêderên lêkdayî (hevgirtî) pêk tînin.

Wek:

- Pêk + hatin = pêkhatin

- Pêk + anîn / înan = pêkanîn / pêkînan

- Pev + xistin = pevxistin

- Pev + çûn = pevçûn

- Têk + çûn = têkçûn

- Têk + dan = têkdan
- Tev + ketin = tevketin
- Tev + dan = tevdan
- Jêk + xistin = jêkxistin
- Jêk + birin = jêkbirin
- Jev + kirin = jevkirin
- Jev + girtin = jevgirtin
- Lêk + dan = lêkdan
- Lêk + xistin = lêkxistin
- Lev + hatin = levhatin
- Lev + kirin = levkirin

Carinan jêderên lêkdayî ji navdêr, cînav û jêdereke xwerû jî pêk tên, anku (navdêr + cînav + jêdereke xwerû = jêdereke lêkdayî).

Wek: - Ser + jê + kirin = serjêkirin

Carinan jî cînavêkî pevxiştî û jêdereke dariştî bi hev re jêdereke lêkdayî saz dikin.

Wek:

- Pê + vekirin = pêvekirin
- Pê + vedan = pêvedan
- Tê + werdan = têwerdan
- Tê + rakirin = têrakirin
- HD.....

C - Hevalnav:

Hevalnav jî dikarin bikevin ser jêderên xwerû û jêderine lêkdayî saz bikin.

Wek:

- Mezin + bûn = mezinbûn
- Rast + kirin = rastkirin

- Kurt + kirin = kurtkirin

- Dirêj + bûn = dirêjbûn

- HD.....

Ç - Hevalkar:

Hevalkar (hoker) bi jêderên xwerû re jêderên lêkdayî pêk tînin.

Wek:

- Pêş + ketin = pêşketin

- Der + çûn = derçûn

- Paş + xistin = paşxistin

- Nêzîk + bûn = nêzîkbûn

- HD.....

Ji hêla nîşandekên jêderî ve jî, jêder (li gora tîpên dawîya binyata karê borî) dibin du beş:

- Jêderên ku bi (in) kuta dibin

- Jêderên ku bi (n) kuta dibin

1 - Jêderên ku bi (in) kuta dibin ew jêder in, ên ku dawîya binyata wan a dema borî bi tîpeke dengdar (bêdeng) kuta bûbe.

Wek:

- Hatin = hat + = in

- Çandin = çand + in

- Birin = bir + in

Wisan jî, (gotin, biraştin, kuştin, kişandin, xwendin, revandin, kirin, vexwarin.....).

2 - Jêderên ku bi (n) kuta dibin ew jêder in, ên ku binyata karê dema borî, ya wan bi tîpeke dengdêr kuta bûbe.

Wek:

- Dan = da + n

- Vedan = veda + n

- Viyan = viya + n
- Kolan = kola + n
- Çûn = çû + n
- Bûn = bû + n
- Rabûn = rabû + n
- Bezîn = bezî + n
- Revîn = revî + n
- Danîn = danî + n
- HD.....

Bi baweriya min hemû cor û celebên jêderan bi nîşandeka jêderî (in) kuta dibin. Lê ji ber ku dawiya binyata dema borî, ya hin jêderan bi tîpeke dengdêr kuta dibe, tîpa (i) ji (in) tê avêtin û (n) bi tenê dimîne.

Wek:

- Da + in = da..... n = dan
- Viya + in = viya.....n = viyan
- Bada + in = bada.....n = badan
- Geriya + in = geriya.....n = geriyên
- Lêda + in = lêda.....n = lêdan
- Rûda + in = rûda.....n = rûdan
- Çû + in = çû.....n = çûn
- Derçû + in = derçû.....n = derçûn
- Pevçû + in = pevçû.....n = pevçûn
- Hebû + in = hebû.....n = hebûn
- Rabû + in = rabû.....n = rabûn
- Zanî + in = zanî.....n = zanîn
- Karî + in = karî.....n = karîn
- Çinî + in = çinî.....n = çinîn

- Kalî + in = kalî.....n = kalîn

- Danî + in = danî.....n = danîn

Em dizanin, dema ku, du tîpên dengdêr digihêjin hev, yek ji van her du şêwazan bikar tê:

1 - Tîpa navbirra dengan (y) wan her du dengdêran ji hev dibirre.

WEK:

- Name: Name – y – a te = nameya te

- Perde: Perde – y – a min = perdeya min

2– Bi mebesta sivikbûnê, yek ji wan her du dengdêran (ya pêşîn) tê avêtin

Wek:

- Name: Name - a te = nama te

- Perde: Perde – a min = perda min

Lê bila di bîra me de be, ku ev şêwaz ne destûreke giştî ye di her mînakê de bikar tê.

Her dengdêrek, taybetmendiyeke wê ya dengane heye û li gora wê taybetmendiye tê xebitandin.

Nimûne: (ta, mû, pî)

1 - Ta - a germ = ta – y – a germ = taya germ

- Ta - a germ = ta..... germ = ta germ

2 - Mû - ê bizinê = mû - y - ê = mûyê / mûwê bizinê

-..... ?

3 - Pî - ê min = pî - y - ê = pîyê / piyê min

-..... ?

Diyar e, ku di mînaka / 1 / ê de her du şêwaz (navbirr û avêtina dengdêrekê) bikar hatine. Lê di mînakên / 2, 3 / yê de, şêwazê (navbirrê) tenê bikar hatiye û nedurist e ku yek ji her du dengdêran bê avêtin.

Li hindê herêmên Kurdistanê ev her du jêderên karan, (dan, bûn) bi şêweyê resen (bê avêtina (i) ji (in)ê bikar tên, û navbirra (y) her du dengdêran ji hev dibirre. Wek: - Dan: dayin (dayîn)

- Bûn: bûyin (bûyîn)

Ev jî me piştrast dike, ku (in) nîşandeka jêderî, ya rasteqîne ye û jêderên ku bi (n)yê tenê destnîşan bûne, tîpa (i) (bi egera sivikbûnê) ji (in)a jêderî ketiye.

Melayê Cizîrî dibêje:

Mela, me l (20), gerdina dilber

Ji nû sed bûse mayin deyn

Mecalê dê bixwazin jê

Dibê, deynê te (fewq - el'eyn)⁽²¹⁾

Berçav e ku Cizîrî karê (mayin) li gora raweya jêdera wî (mayîn), li şûna (man) bikar aniye.

Şarezayên zimanê Kurdî, yên ku bi elfebaya Erebiî dinivîsin (li Başûr û Rohilat) jêderên Kurdî, li gora tîpa dawîya binyata karê dema borî binav dikin. Anku, her jêderê bi navê tîpa dawîya binyata karê xwe yê borî binav dibe.

Wek: - Hatin = hat + in. (Ev jêder (ta - î) ye)

Bi vê pîvanê jêderên karên zimanê Kurdî (li gora elfabeya Erebiî) bûne / 5 / cor:

1 - Jêderên (Elifî, الـفي):

- Dan = da + n

- Guran = gura + n

- Kolan = kola + n

2 - Jêderên (ta - î, تائي):

- Hatin = hat + in

- Girtin = girt + in

- Kuştin = kuşt + in

3 - Jêderên (dalî, دالي):

- Xwendin = xwend + in

- Şandin = şand + in

²⁰ - me l: me li

²¹ - Dîwana Cizîrî (şirovekirina Zivingî) Heleb (1987). Bergê duwem. Rû (442).

- Çandin = çand + in⁽²²⁾

4 - Jêderên (wawî, وای)

- Çûn = çû + n

- Bûn = bû + n

- Derbûn = derbû + n

5 - Jêderên (ya - î, یایی)

- Çinîn = çinî + n

- Barîn = barî + n

- Raperîn = raperî + n

- Danasîn = danasî + n

- Pêkanîn = pêkanî + n

Wan şarezayan ev navlêkirinên jorîn, li gora taybetmendiya elfebaya Erebi li jêderên Kurdî kirine.

Di vê elfabeyê de tîpên dengdêr (i, e, u) nîn in.

Li şûna wan ev nîşandekên dengane (jêre, كسره), û sere -, (فتحه) û bore -, (ضمه) bikar tînin. Ev nîşandek jî nakevin rêza tîpan û nayên nivîsîn, tenê hêmayên ⁽²³⁾ bizavên danganî ne.

Bo vê egerê jî, tîpa (i) ji nîşandeka jêderî (in), nayê nivîsîn. Ev jî tê wê wateyê, ku nîşandekên jêderî bi elfabeya Erebi, bo hemû jêderên Kurdî (n) tenê ye.

Mînak: Bi Latîni

- Hatin

- Xwendin

- Çûn

- Berdan

Bi Erebi

هاتن

خوه ندين

جوون

به ردان

²² - Jêderên ku di Kurmancî de bi tîpa (r) kuta dibin, wek (kir - in, bir - in, xwar - in....) di Soranî de bi (d) kuta dibin (kird - in, bird - in, xward - in). Anku, ev jêder jî (dalî, دالي) ne, ne (ra - î, رائي) ne.

²³ - Hêma : Nîşandan (sembol, remiz).

- Kuştin

كوشتن

Vêca, ji bo ku corên jêderan ji hev bêne nasîn, navê tîpa dawîya binyata karê borî di her jêderê de, li jêderê bixwe jî bûye:

Jêder**Navlêkirin**

- Hatin	Ta - î (تائي)
- Xwendin	Dalî (دالي)
- Çûn	Wawî (واوي)
- Berdan	Elif (الفي)
- Nalîn	Ya - î (يائي)

Zayenda Jêderan:

Jêder, weku navinî razber (manewî) û nerasteza, bi hemû corên xwe ve mêza ne. Anku, hemû celebên jêderên karan, di zimanê Kurdî de mêzayên nerast in.

Nîşandekên zayenda mêyînî digihêjin wan.

Wek: (çinîn, çandin, xwendin, karîn....)

- Çinîna ceh berî ya genim e
- Çandina nîskan hêsan e
- Xwendina te çawa ye ?
- Divê her kes li gora karîna xwe bike
- Tu bi vê çinîne qayil dibî ?
- Çinî li gora çandinê ye
- Ronakbîrî berkêşana xwendinê ye
- Dan li gora karînê ye.
- HD.....

Jêderên Winda (jibîrbûyî):

Ziman bixwe berkêşaneke (berhemeke) civakî ye. Bi pêşketina civakê re pêş dikeve û bi paşketina wê re jî qels û lawaz dibe. Bi vê têgehê ziman bûnewerekî jîndar e, rewşa xwe ya giştî ji gorankariya⁽²⁴⁾ civaka xwe werdigire. Li gora vê pîvanê zimanê Kurdî, bi hezarên salan weku zarekî devikî bikar hatiye, bêyî ku xebatek pêdivî, bi şêweyekî zanistî jê re bibe. Ev rewşa zimanê Kurdî ya dîrokî bûye sedema peydabûna gelek diyardeyên aloz û gelemşe, ku di gelek babetên zimên de berçav dibin.

Di vê mijara me de (jêderên karan) em ê hewl bidin ku em mijarê tevbidin û bi kurtî em binasin, ka çawa van jêderan di çarçewa wê rewşa dîrokî de teşeyên (formên) xwe wergirtine û bi çi rewşê jî, gihîştine vê qûnaxa îroyî !.

Pirraniya jêderên Kurdî sergihayî ne, karên wan di hemû dem û raweyan de tîr veguhestin. Ji bilî wan jî, jêderin hene hindêk diyardeyên rêzder (awarte) gihîştine wan. Wek:

1 - Cihên tîpên hinek jêderan bi hev hatine guhertin. Wek (anîn, danîn) û (înan, dînan).

Ev jêder li herêmanan bi teşeya (anîn, danîn) bikar tên:

- Min pirtûk aniye malê
- Min pirtûk daniye ser maseyê

Li herêmine dîtir jî bi teşeya (înan, dînan) tên xebitandin:

- Min pirtûk înaye malê
- Min pirtûk dînaye ser maseyê

2 - Hindêk jêder jî hene, tenê bi forma jêderî û karê dema borî tên xebitandin. Wek:

- Gotin - got
- Dîtin - dît

Lê di dem û raweyên dîtir de bikar nayên.

3 - Hindêk jêder jî hatine jibîrkirin û nayên xebitandin, lê karên ku ji wan hatine dariştin, didin nasîn ku demekê ew jêder hebûn, lê nuha bikar nayên. Wek: (bêjtin, bînan⁽²⁵⁾, heriyan....).

²⁴ - Gorankarî : werar (tetewir)

²⁵ - Li hin herêmanan tê gotin : (Min nedîtiye nebînaye).

Ev jêder, ne di raweya jêderî de û ne di dema borî de, nayên xebitandin. Tenê di dema nuha, paşeroj û raweya fermanî de bikar tên:

- Ew dibêje, dê bibêje, bibêje
- Ez dibînim, dê bibînim, / tu / bibîne
- Hûn diherin, dê herin, herin

- Jêderên Winda ⁽²⁶⁾:

Hindek jêder di zimanê Kurdî yê kevin de hebûn û bikar dihatin, lê bi dirêjahiya demê re ew jêder ji zimanê me yê nuha ketine û nema tên xebitandin. Pêjina hebûna hindekan ji wan jêderên winda di zimanê me de maye. Ev jî diçesipîne ku ew jêder demekê hebûn û dihatin xebitandin.

Nimûne:

- Beşîn:

Jêdereke nederhingêv (têneper) e, bi wateya parvebûn / dabeşbûn bikar dihat.

- Navê jêderî (beş) jê maye û nuha jî bikar tê:
 - Me ev beşê pirtûkê xwendiyê
 - Hûn jî beşên mayî bixwînin.
 - Jêdereke lêkdayî jê hatiye saz kirin (da + beş + bûn / kirin = dabeşbûn, dabeşkirin).
- Nuha ev her du jêderên lêkdayî jî, di zimên de bikar tên. Lê (beşîn)a xwerû bikar nayê.

- Bêjan:

Jêdereke winda ye, nederhingêv e, bi wateya (pakkbûn, paqijbûn) bikar dihat. Nuha ev jêdera xwerû bikar nayê.

- Binyata dema nuha ji vê jêderê (bêj) di zimên de maye. Ev binyat digel pêşgira (wer) û jêdera xwerû (kirin), jêdereke lêkdayî saz dike:

- Wer + bêj + kirin = werbêj kirin

Ev jêdera lêkdayî di zimanê me de heye û bi asayî tê xebitandin:

- Reşo genimê xwe werbêj dike
- Navê alava werbêj kirinê (bêjîng) jî, ji wê jêdera winda hatiye û di zimên de bikar tê.

²⁶ -Dr. Nesrîn Fexrî : (Çawikî Bêwata le Zimanî Kurdî da). Çap. El - Adab. Nefes (1973).

- Çemîn:

Ev jêder nederhingêv e, bi wateya (kombûn, civîn / civiyan) bikar dihat.

- Ji (çemîn), navê (çem) (rûbar) di zimanê me de maye. Bi vê wateyê navê (çem) ji kombûna co û cobarên ku ji kaniyan dertên û digihêjin hev, tev hev dibin, diherikin û dibin (çem).

Melayê Cizîrî dibêje:

Muxbeçeyên meyfiroş her seherê tên sema

Badexoran noşe – noş mane li dorê cema ⁽²⁷⁾

Ravekerê dîwana Cizîrî, Mela Ehmedê Zivingî, derbarê bêjeya (cema) ya ku li dawiya malika Cizîrî hatiye, dibêje: Peyva (cema) peyveke Kurdî yî resen e, bi wateya (kom) e.

Eger ravekirina Zivingî cîgirtî be, jixwe navê cejna Îzîdiyan (cema) dê navekî Kurdî be. Oldarên Îzîdiyan dibêjin, dema ku Şêx Adî hat Laleşa Nûranî pîrên olê hatin cem wî. Ji hingê ve salvegera wê çûna cem wî bûye cejna (cema) yê. Anku, gotina (cema) ji hevalkarê (cem) hatiye, ku ew jî ji çûna cem Şêx Adî ye. Bi vê pîvanê peyva (cemawer) jî gotineke Kurdî ye.

Li vê gorê, girêdana di navbera gotinên (cema) ya Cizîrî û (cema) ya cejnê û (cemawer), ji hêlekê ve û jêdera (çemîn) de ji hêleke dî ve ew e, ku hevguherîn di navbera tîpên (ç) û (c) de pêk hatiye.

- Rişan:

Ev jêdera kevin nederhingêv e, bi wateya (verişîn / verişiyar) dihat xebitandin. Nuha ev jêder bi vî rengê xwerû bikar nayê.

- Pêşgira (ve) bi ser jêdera (rişan) ve hatiye berdan û jêdereke dariştî (ve + rişan), bi wateya wê jêdera wînda û li şûna wê bikar tê:

- Ve + rişan = verişan, verişiyar

Li vê gorê, jêdera (rişan), weku bêje, bi tena xwe bêjeyeke bêwate ye.

- Rûtan:

Jêdera (rûtan) jî, yek ji wan jêderên wînda ye, nederhingêv e, bi wateya (rûtbûn, zelûtbûn) bikar dihat.

- Nuha jî jêdera (rûtan), wek jêder, di zimanê me de nemaye, lê navê jêderî (rût) jê maye û weku hevalnav (rengdêr), bi asayî di zimên de bikar tê:

²⁷ - Diwana melayê cizîrî – Şirovekirina Zivingî – çapxana El- sebah. Heleb (1987 Rû 21).

- Serê Reşo rût bûye.
- Dara rût kurmî bûye.

- Rengan:

Jêdereke xwerû ye, nederhingêv e, bi wateya (rengbûn, rengînbûn) dihat xebitandin.

- Navê (reng) ji wê jêdera kevin maye.
- Bi alîkariya paşgira (andin) jêdera karekî derhingêv saz dibe:
- Reng + andin = rengandin (rengînkirin).

Ev jêdera dariştî li hin herêman tê bihîstin.

Wek: - Min hêk rengandin (rengînkirin).

- Gemirîn:

Jêdereke xwerû ye, nederhingêv e. Ev jêder li gelek herêmên Kurdistanê paşguh bûye û hatiye jibîrkirin. Tenê navê jêderî (gemar) jê maye:

- Ev xalîçe gemarî bûye

Lê jêdera (gemirîn) li hindê herêmên dîtir (weku Efrînê) hêj bikar tê. Nişteciyên Efrînê dibêjin:

- Ev xalîçe gemiriye
- Xwe negemirîne !

Jêdera (gemirî) jî, weku hemû jêderên nederhingêv bi alîkariya paşgira (andin) bûye jêdereke derhingêv:

- Gemirîn + andin = gemirandin

Efrînê dibêjin:

- Kê ev xalîçe gemirandiye ?
- Xwe negemirîne !

Gelek jêder di zimanê Kurdî yê dêrîn⁽²⁸⁾ de bikar dihatin, lê bi dirêjahiya demê re ji zimên ketine û winda bûne. Eger tiştin ji wan jêderên jibîrbûyî mabin jî, ew hinekî dûrî jêderên xwe ketine.

Wek:

- Rencan: Êşiyar rencbûn.(navê / renc / tenê jê maye)

²⁸ - Dêrîn : Kevin, kevnar.

-Geşan: Geşbûn (hevalnavê / geş / jê maye).

- Şartin: Veşartin (xwerû bikar nayê).

Pêşgira (ve) ketiye ser û bûye (veşartin)

- Pirijan: Pijiqîn. (tişteke jê nemaye)

- Koçan: Koçbûn. Ev jêder winda ye. Tenê navê (koç) jê maye. Ji (koç) jî (koçer, koçber, koçkirin)

hatine.

Dê bidome.

Hevdengî û pirdengî di nivîsîna kurdî de

Husein Muhammed

1. Nasandina mijarê û peyvnasiya wê

Kerem bikin li van herdu peyvên inglîzî binêrin:

- cent
- computer

Ew herdu bi herfa C dest pê dikin. Lê gava ku ew peyv ketine zimanê kurdî, ew wiha guherîne:

- sent
- kompûter

Sebebê vê guherînê ew e ku C di zimanê inglîzî de herfeke **pirdeng** (polîfonîk, *polyphonic*) e. Pirdengî (polîfonî, *polyphony*) di dengnasiyê de tê wê maneyê ku eynî herf dikare di peyvên cuda de dengên cuda bide. Bo nimûne, herfa C di zimanê inglîzî de di nimûneyên me dayî de carinan dengê [s] û carinan jî dengê [k] dide:

- cent [sênt]
- computer [kompîyûtir]

Bi taybetî alfabeya inglîzî bi pirdengiya xwe navdar e anku tê de gelek herf ne tenê dengê lê çendîn dangan didin. Herwiha di inglîzî de herfên **hevdeng** (homofon, *homophone*) jî hene ku herfên bi nivîsînê ji hev cuda ne lê bi deng wek hev tên gotin. Bo nimûne, wek ku me li jor diyar kiriye C di peyva "cent" de wek dengê [s] tê gotin. Lê heman deng di peyva "seven" (heft) de jî heye lê di wê peyvê de ev deng ne bi herfa C lê bi herfa S tê nivîsîn.

Hin caran jî di inglîzî de dengê carinan bi herfeke tenê tê nivîsîn lê carinan jî heman deng di hin peyvên din de bi komeke herfên ji wê cuda tê diyarkirin. Bo nimûne, dengê [f] di peyva "five" (pênc, 5) de bi herfa F tê nivîsîn. Lê heman dengê [f] di peyva "philosophy" (felsefe, fîlozofî) bi cotherfên PH tê nivîsîn.

Gelo pirdengî û hevdengî di alfabeya kurdî de jî peyda dibin? Eger peyda bibin, çawan in? Çi herfên alfabeya kurdî pirdeng in û çî jî tenê yekdeng in? Gelo herfên yan komherfên hevdeng jî di kurdî de peyda dibin?

2. Gelo hevdengî di nivîsîna kurdî de peyda dibe?

Me li jor got ku di inglîzî de heman deng herdem bi heman herfê nayê nivîsîn. Ev diyarde ne tenê di zimanê inglîzî de heye. Bo nimûne, di zimanê farisî de jî dengê [z] dikare di peyvên ji hev cuda de bi yekê ji van her çar herfên ji hev cuda were nivîsîn: ز, ذ, ض, ظ

- zer = [zerd] زرد
- zikir = [zikir] ذكر
- remezan = [remezan] رمضان
- zalim = [zalim] ظالم

Sebebê van herfên hevdeng ew e ku piraniya peyvên bi herfên ز, ذ, ض, ظ ji erebî hatine wergirtin û di erebî de ew ne hevdengên herfa ز ne lê di erebî de her yek ji wan dengê ji ز cuda (lê têkilî wê) dide. Ev hemû deng di farisî (yan kurdî) de peyda nabin û ew deng bi peyvên ji erebî wergirtî re jî neqil nebûne. Lê farisî peyvên ji erebî wergirtî bi piranî wek di erebî de dinivîse tevî ku wek erebî nabêje jî.

Di alfabeya kurdî-erebî de rêbazeke din hatiye bijartin: her çar herfên ز, ذ, ض, ظ di peyvên esil-erebî de di kurdî de bi ز tên nivîsîn:

- zer زهر
- zikir زكر
- remezan رهمزان
- zalim زالم

Bi heman awayî alfabeya kurdî-latînî hem di peyvên ji erebî de û hem jî di peyvên ji zimanên ewropî de li gor dengê wan peyvan, ne li gor herfên wan dinivîse. Bo nimûne, dengê [f] di peyva inglîzî "football" (futbol, goga piyan) bi herfa F û di peyva "telephone" (telefon) de jî bi cotherfên PH hatiye diyarkirin. Lê gava kurdî di van herdu peyvan de jî dengê [f] bi herfa F dinivîse.

Loma ne di alfabeya kurdî-latînî de û ne jî di alfabeya kurdî-erebî de wek prensîp herfên hevdeng peyda nabin anku ti diyardeyeke wisa nîne ku heman deng di peyvên cuda de bi herfên cuda were nivîsîn.

Ev rêbaza giştî di kurdî de jî ne bi temamî bê awarteyî û istisna ye. Kurdî jî wek piraniya zimanên din yê latînînivîs bi piranî navên taybet (bo nimûne navên kesan, deveran, markeyan) yê biyanî li gor zimanên jêder dinivîse. Loma bo nimûne, em dengê wek C-ya kurdî, di van navan de carekê bi G û carekê jî bi J dinivîsin:

- George [corc]
- John [con]

Li aliyekî din, di markeya Mercedes [mersedes] de em herfa C ne bo dengê [c] lê bo dengê [s] bi kar tînin.

Ji bilî navên taybet, vê dawiyê hin peyv ji zimanên ewropî, xaseten bi inglîzî hatine ku li gor rastnivîsîna inglîzî di tekstên kurdî de jî tên bikaranîn. Bo nimûne, peyva "out" (der, derve, derketî, derxistin, derxistî) vê dawiyê di hin nivîsên kurdî de tê dîtin.²⁹ Bi dengê xwe ew peyv wek [awt] tê gotin. Anku li vê derê dengê [a] bi herfa O û dengê [w] jî bi herfa U hatiye nivîsîn.

Ji bilî peyvên esil-biyani, di kurdî mirov dikare behsa hin haletên hevdengiyê bike:

R / RR: Dengê [r] yê şidandî hin caran bi R-yekê (R) û hin caran jî bi du R-yan (RR) tê nivîsîn:

- bajar / bajarr, şer / şerr...

Gelo haletên wiha ne hevdengiyên herfan in?

Na. Mebest ji hevdengiya herfan ew e ku heman deng di peyvên cuda de bi herfên cuda were nivîsîn. Nivîsîna bi awayê "bajar, şer" yan "bajarr, şerr" tenê tercîhên nivîseran in. Bo nimûne, ew heman R-ya şidandî di peyva "bajar" de bi R-yekê û di peyva "şer" de bi du R-yan nanivîsin. Yan ew herdem bo R-ya şidandî R-yekê bi kar tînin yan jî herdem du R-yan (hin kes jî du R-yan tenê hingê bi kar tînin eger du peyvên hevdivîs hebin, bo nimûne: pir / pirr, ker / kerr).

U / W: Dengê [u] li pey X hin caran bi U û hin caran jî bi WI tê diyarkirin:

- xurandin / xwirandin, xuşk / xwişk, xuya / xwiya...

²⁹ Nimûneyek ji bikaranîna peyva "out" di kurdî de: http://www.nefel.com/articles/article_print.asp?ArticleNr=6028

Gelo ev jî ne haletên hevdengiyê ne?

Na, "xu-" û "xwi-" jî ne haletên hevdengiyê ne ji ber ku ew jî tenê tercîhên nivîseran in.

Lê li hin cihên din bi rastî jî dengê [u] bi herfa W tê nivîsîn:

- xwarin [xuarin]
- xwe [xue]
- xwê [xuê]
- xwîn [xuîn]

Sebebê ku ev peyv û gelekên din jî di navbera X û vokalekê de bi W (ne bi U) tê nivîsîn ew e ku rastnivîsîna kurdî zû-zû du vokalan li pey hev qebûl nake. Lê ji ber ku W di cotherfên -XW- de di kurdî de dengê [u] dide, em dikarin bibêjin ku di kurdî de U û W carinan hevdeng in.

Hêjayî gotinê ye ku herfên hevdeng dikarin herdem an jî tenê carinan hevdeng bin. Bo nimûne, herfên ز, ذ, ض, ظ di farisî de herdem hevdeng in û herdem dengê [z] ji wan derdikeve. Lê bo nimûne, herfên inglîzî C û K tenê carinan hevdeng in ji ber ku herfa C di inglîzî de tenê hin caran dengê [k] dide, bo nimûne "computer" [kompîyûtir] (kompûter) lê carinan dengê [s] dide, wek mînak "cent [sênt] (sent) û hin caran heta hin dengên din jî dide.

Di kurdî de jî herfa W tenê hin caran hevdenga herfa U ye, bo nimûne di peyva "xwe" [xue] de lê wek mînak ne di peyvên "welat, bawer" de ji ber ku di van peyvên de ew ne dengêkî vokalî [u] ye lê dengêkî konsonantî [w] ye.

3. Pirdengî di nivîsîna kurdî de berbelav e

Wek prensîp, alfabeya kurdî û ya gelek zimanên din jî fonemîk in anku her dengêkî serbixwe bi herfeke cuda tê nivîsîn û her herf jî tenê bo dengêkî tê bikaranîn. Lê di rastiyê de alfabeya normal ya ti zimanî bi temamî ne fonemîk e.

Lê wek ku me li jortir destnîşan kir, di gelek zimanan de hevdengî heye anku heman deng dikare bi du yan zêdetir herfên ji hev cuda bînin nivîsîn. Ji bilî hevdengiyê, di alfabeyan de herwiha pirdengî jî peyda dibe.

Mebest ji pirdengiya herfan ew e ku heman herf bo diyarkirina du yan zêdetir dengan tê bikaranîn. Di kurdî de (xaseten di kurmancî de) pirdengî diyarde û fenomeneke berbelav û pir giring e. Bi gotineke din, gelek ji herfên me bo diyarkirina du yan zêdetir dengan tên nivîsîn.

Mirov dikare konsonantên kurdî li gor yekdemî yan pirdengiya wan wiha parve bike:

Konsonantên yekdemî di kurmanciya giştî ya bi alfabeya latînî de

- B, C, D, F, G, J, M, N, Q, Ş, V, Y

Ev herfên li jor di kurdî de yekdemî in anku her yek ji wan tenê bo diyarkirina dengê di nivîsên kurdî de tên bikaranîn. Di peyv û navên xwemalî û yên di kurdî de cihgirtî de ew herdem heman dengî didin.³⁰

Konsonantên pirdengî di kurmanciya giştî ya bi alfabeya latînî de

- Ç, H, K, L, P, R, S, T, (W), X, Z

Ev herf di nivîsîna kurdî de pirdengî in anku her yek ji bo diyarkirina du yan zêdetir dengan tên bikaranîn.

Piraniya pirdengên kurdî du dudengî in anku her yek ji wan du dengan dide. Lê P û T bi kêmî sêdengî in, ihtimalen çardengî in jî. Li vir em ê her yekê ji wan bi kurtenasandinekê li gel çend nimûneyan pêşkêş bikin. Di nivîsên me yên li ser herf-bi-herf de em berfirehtir behsa pirdengiya her yekê ji wan dikin:

³⁰ Lê dibe ku di hin nav û peyvên biyanî de hin dengên din bidin, bo nimûne, wek ku li jor hatiye behskirin, J di navê "John" de dengê [c] dide û G jî di navê "George" de heman dengê [c] dide.

3.1. R-ya dudeng³¹

Di nivîsîna kurdî de R bo diyarkirina du dengên ji hev cuda tê bikaranîn: "şidandî, req, qelew" (hevberî ڤ ya alfabeya kurdî-erebî) û "sist, nerm, zirav" (hevberî ڤ ya alfabeya kurdî-erebî).

Di kurdî de li destpêka peyvê ew bi jenîna zimanî li hevberî pidûyên jorîn derdikeve: ziman çendîn caran li pey hev bi pidûyan dikeve:³²

- rast, rev, rê, rind, ron, ruh, rû...

Lê li nav û dawiya peyvan di kurdî de di peydakirina R de ziman bi piranî ne çendîn caran lê tenê carekê bi pidûyan dikeve:³³

- agir, baran, mêr, zîrek...

Lê hin caran li nav û dawiya peyvê jî R şidandî ye, bo nimûne:

- bajar, şer, kirîn

Hin caran li nav û dawiyê R-ya şidandî bi du R-yan tê nivîsîn, wek:

- bajarr, şerr, kurrîn

Lê bi piranî bi R-yekê tê nivîsîn. Herwiha hêjayî gotinê ye ku tevî nivîsîna bi du R-yan jî, ew nabin du deng lê her eynî deng dimînin. Loma nivîsîna bi R-yekê yan du R-yan ti tesîrê li kêtekirinê nake:

- ki-rîn / ki-rrîn (ne *kir-rîn)
- ba-ja-rek / ba-ja-rrek (ne *ba-jar-rek)
- şe-ran / şe-rran (ne *şer-ran)

³¹ Bo nivîseke me ya berfireh li ser R, binêrin: <https://zimannas.wordpress.com/2015/11/17/denge-r-varyant-u-guherinen-wi/>

³² Di alfabeya dengnasî ya navenetweyî (IPA) de ev varyanta R bi nîşana [r] tê diyarkirin. Mirov dikare li vê derê guh bide vî dengî: https://en.wikipedia.org/wiki/File:Alveolar_trill.ogg

³³ Di alfabeya dengnasî ya navenetweyî (IPA) de ev dengê bi nîşana [r] tê diyarkirin. Mirov dikare li vê derê guh bide vî dengî: https://en.wikipedia.org/wiki/File:Alveolar_tap.ogg

Kêm caran ev dengê duyem bi herfa Ğ tê nivîsîn lê bikaranîna vê herfê di nivîsên normal de kêm peyda dibe, adeten ev deng jî bi R-ya xwerû tê nivîsîn.

3.2. H-ya dudeng³⁴

Herfa H di kurdî de bo diyarkirina du dengên ji hev cuda tê nivîsîn. Bi piranî ew beramberî dengê هـ yê alfabeya erebî tê bikaranîn:

- heval, hildan, hirmî

Lê ew herwiha bo diyarkirina dengê hevberî herfa ح ya alfabeya erebî jî tê bikaranîn:

- heft, herf, tehl

Car-caran ev dengê duyem bi herfa Ĥ tê nivîsîn lê bikaranîna vê herfê di nivîsên normal de kêm peyda dibe, adeten ev deng jî bi H-ya xwerû tê nivîsîn.

Berevajî ku hin kes texmîn dikin, ev deng ne tenê di peyvên ji erebî de heye lê herwiha di hin peyvên kurdî bi xwe de jî peyda dibe. Rast e ku peyva "herf" ji erebî hatiye wergirtin lê peyvên "heft, tehl" û gelekên din bi eslê xwe kurdî-îranî ne û dîsa jî ev deng tê de peyda dibe.

Carinan jî ev deng di devokan de di hin peyvan de bi "H-ya normal" e lê carinan jî bi "H-ya Hesên û Hisên" e. Wek mînak, ev peyv di kurmanciya rojhilatî de H-ya wek "heval" in lê di kurmanciya navendî de bi H-ya wek "Hesên" in:

- hezar, heşt, hemû, hirç

3.3. S-ya dudeng³⁵

Di nivîsîna kurdî de herfa bo du dengên ji hev cuda tê bikaranîn ku adeten ji yekê re tê gotin S-ya zirav yan S-ya sade û ya din jî bi S-ya qelew tê binavkirin. S-ya zirav yan sade hevberî س ya alfabeya erebî ye û bo nimûne di van peyvan de heye:

³⁴ Li vê derê em bi hûrgilî behsa H û dengên wê dikin: <https://zimannas.wordpress.com/2015/10/29/dengen-h-di-kurdi-de/>

³⁵ Bo nivîseke me ya berfireh li ser S, binêrin: <https://zimannas.wordpress.com/2015/12/30/denge-s-peydabun-u-guherina-wi/>

- ser, sêv, sîr...

S-ya qelew hevdenga ص ya erebî ye. Ew bo nimûne di van peyvên de peyda dibe:

- sed, se(g), sal, sor...

S ne tenê di kurdî de lê di gelek zimanên din de jî berî vokalên paşîn (bo nimûne "a, o") "qelew" e û dişibe ص ya erebî û berî vokalên pêşîn jî (bo nimûne "ê, î") "zirav" e anku hevdenga ya alfabeya erebî ye. Lê di kurdî de dikare berî heman vokalê jî di hin peyvên de zirav û di hinan de jî qelew be:

- ser (S+E, zirav, س)
- sed (S+E, qelew, ص)

Hêjayî gotinê ye ku ti ji van peyvên me yê nimûne ne ji erebî hatine wergirtin anku mesele li vê derê qet ne ew e ku ev deng ji tesîra erebî be.

3.4. X-ya dudeng³⁶

Herfa X jî di kurdî de bo nivîsîna du dengên ji hev cuda tê bikaranîn. Adeten X hevberî herfa خ ya alfabeya erebî û [x] ya alfabeya dengnasî ya naveneteweyî (IPA) ye. Ew deng bo nimûne di van peyvên de heye:

- xal, xet, xêr, xirab, xweş...

Lê dengê din jî bi X tê nivîsîn û hevberî غ ya erebî û [ɣ] ya IPAYê ye û bo nimûne di van peyvên de di kurdî de peyda dibe:

- axa (serokeşîr), bax (baxçe), oxir / wexer...

Kêman ev dengê duyem bi X yan Ğ tê nivîsîn lê bikaranîna van herfan di nivîsên normal yê kurdî de kêman li kar e û ev deng jî adeten bi X-ya xwerû tê diyarkirin.

3.5. Z-ya dudeng

³⁶ Bo zêdetir agahiyan li ser X, binêrin: <https://zimannas.wordpress.com/2015/11/06/604/>

Herfa Z jî di nivîsîna kurdî de bo diyarkirina du dengên ji hev cuda tê bikaranîn. Yek ji van dengan "Z-ya zirav / sade" ye ku hevberî ژ ya erebî ye û bo nimûne di van peyvan de heye:

- zan / zayîn, zer, zêr, ziman, zîv, zû...

Dengê din jî "Z-ya qelew" e ku nêzîkî dengê herfa ظ ya erebî ye lê di devî de ji ظ ya erebî li paşvetir peyda dibe û di dema derketina wê de (berevajî ya erebî) ziman nakeve navbera didanan. Ev deng bo nimûne di van peyvan de di kurmançî de heye:

- zanîn, zerf, zozan

Adeten Z-ya zirav li ber vokalên E, Ê, Î, Û heye û Z-ya qelew jî berî vokalên A û O peyda dibe. Lê wek ku ji van nimûneyên li jêr diyar dibe, ev qeyd û bend herdem ne li kar in:

- zana / zayîna bizinê (Z-ya zirav)
- ew zana ye (Z-ya qelew)

3.6. L-ya dudeng

Herfa L jî di kurdî de bo diyarkirina du dengên ji hev cuda tê bikaranîn. Di kurmançî de L bi piranî "zirav" yan "sade" ye ku hevberî dengê ل ya alfabeya kurdî-erebî ye. Ev deng bo nimûne di van peyvan de peyda dibe:

- lawik, lez, lêzim, lîstin, lome, lûfik...

Lê herfa L herwiha bo diyarkirina dengê "L-ya qelew" jî tê bikaranîn ku di alfabeya kurdî-erebî de adeten bi herfa ل tê nivîsîn. Ev deng di kurmançî de jî bo nimûne di van peyvan de heye:

- silav, welat, sala 2016...

Hin caran ev dengê duyem bi du L-yan yan jî bi ل tê nivîsîn lê adeten ew jî bi L-ya xwerû tê diyarkirin.

Di gelek zimanên din de jî du varyantên wiha yên L hene lê ziraviya yan qelewiya L di gelek zimanan de li gor vokala li pey L ye: vokalên pêşîn wê zirav dikin û vokalên paşîn jî wê qelew dikin. Lê di kurdî de ev qeyd û bend herdem ne li kar e. Bo nimûne, di peyva "silav" de jî û di peyva "lazim" de jî li pey

L dengê A heye lê di "silav"ê de L qelew e û di "lazim"ê de zirav e. Di peyva "belem" de L+E heye û L zirav e lê di peyva "lepik" de dîsa L+E heye lê vê carê L qelew e.

Hêjayî gotinê ye ku L-ya qelew di soranî de ji kurmancî berbelavtir e û li cihê L-ya zirav ya kurmancî gelek caran di soranî de L-ya qelew heye û loma di alfabeya kurdî-erebî de herfeke taybet jê re hatiye danîn.

3.7. W-ya dudeng

Li jortir, di beşa li ser hevdengiyê de me behs kiriye ku W bo diyarkirina dengê [w] tê nivîsîn. Bo nimûne:

- war, welat, wê, wir, wî...

Lê xaseten li pey X, W bo diyarkirina dengê [u] jî were nivîsîn:

- xwarin [xuarin], xweş [xueş], xwê [xuê], xwîn [xuîn]...

Carinan ew ji bilî X li pey hin konsonantên din jî bo diyarkirina heman dengê [u] tê bikaranîn, xaseten di nivîsîna soranî yan kurdiya başûrî ya bi alfabeya kurdî-latînî de. Çend nimûne ji soranî:

- cwên [cuên] = dijûn, sixêr, xeber
- dwênê [duênê] = duh, duhî, roja berî îro
- gwê [guê] = guh
- nwê [nuê] = nû

Yan kurdiya başûrî:

- zwan [zuan] = ziman

3.8. Ç-ya dudeng³⁷

³⁷ Nivîsareke me ya berfireh li ser Ç: <https://zimannas.wordpress.com/2015/07/10/denge-c-peydabun-u-guherina-wi-2/>

Di kurmancî û zazakî de herfa Ç bo diyarkirina du dengên ji hev cuda tê bikaranîn. Yek ji wan Ç-ya bipif anku req (bi inglîzî *aspirated*) e. Mebest ji "bipif" ew e ku di dema derketina vî dengî de pifek yan hilmeke xurt pê re derdikeve. Ev dengê Ç bo nimûne di van peyvên de peyda dibe:

- çar (4), çî, çend...

Di soranî, farisî, tirkî û inglîzî de dengê Ç herdem wiha bipif anku req e (di erebiya standard de Ç nîne).

Lê di kurmancî, zazakî, ermenî û hin zimanên din de Ç-yeke din jî heye. Ew Ç bêpif anku nerm e (bi inglîzî *unaspirated*). Mebest ji "bêpif" ew e ku li gel vê Ç-yê ti pifeke an hilmeke xurt dernakeve. Ev Ç bo nimûne di van peyvên de peyda dibe:

- çav, çiya, çem, çîrok...

Hin peyv di kurmancî de hene ku hevniwîs in û tenê bi van Ç-yên xwe yên ji hev cuda ne:

- çeng (bi Çya bipif / req): amûreke muzîkê
- çeng (bi Ç-ya bêpif): beşek ji destê mirovan

3.9. K-ya dudeng³⁸

Di kurmancî û zazakî de herfa K bo diyarkirina du dengên ji hev cuda tê bikaranîn. Yek ji wan K-ya bipif anku req e. Ev dengê K bo nimûne di van peyvên de peyda dibe:

- kar (îş, şol, şuxl), ked, kurdî, kûr...

Di soranî, farisî, erebî, tirkî û inglîzî de dengê K li destpêka peyvên herdem wiha bipif anku req e. Lê di kurmancî, zazakî, ermenî û hin zimanên din de K-yeke din jî heye. Ew K bêpif anku nerm e. Ev K bo nimûne di van peyvên de peyda dibe:

- kirin, kes, kî, kurmancî...

³⁸ Bo berfirehtir li ser K, binêrin nivîsara me: <https://zimannas.wordpress.com/2015/12/17/denge-k-peydabun-u-guherina-wi/>

Hin peyv di kurmancî de hene ku hevnivîs in û tenê bi dengên cuda yên K-yên xwe yên ji hev cuda ne:

- ka (bi K-ya bipif / req): li kû ye?
- ka (bi K-ya bêpif): giyayê hişkirî

3.10. P-ya pirdeng

Di kurmancî û zazakî de herfa P ne tenê bo yek an du dangan lê bo sê heta çar dengên ji hev cuda jî tê bikaranîn. Parvekirina serekî li ser P-ya bipif (req) û P-ya bêpif e. Lê ji bilî wan, parvekirineke din jî li ser P-ya zirav û P-ya qelew e.

Di soranî, farisî, tirkî û inglîzî de dengê P li destpêka peyvan herdem wiha bipif anku req e (di erebiya standard de P nîne).

P-ya bêpif bo nimûne di van peyvan de heye:

- pênc, pêr, pîvaz

Ev nimûneyên me di heman demê de bi P-ya zirav in anku ev "P-ya bêpif ya zirav" in.

Lê P-ya bêpif dikare herwiha qelew jî be, bo nimûne:

- pez, pazde(h), piling, parzûn

Ev "P-ya bêpif ya zirav" e.

Dengê din yê serekî yê herfa P, P-ya bipif anku req e. Ew bo nimûne di van peyvan de heye:

- parastin, pare/pere, perde, parçe

P-ya bipif adeten di heman demê de jî zirav e. P-ya bipif ya qelew yan qet di kurdî de peyda nabe yan jî pir nadir e. Yek ji peyvên ku bi kêmî di hin devokan de heye û di heman demê de P-ya wê bipif e û qelew e jî ev e:

- pind

Lê ji ber ku nimûneyên "P-ya bipif ya qelew" kêm in yan qet peyda nabin, guman ji hebûna çar dengên cuda yên P hene. Anku bi kêmî sê dengên P hene lê belkî çar jî hebin.

- P-ya bêpif û zirav: pênc, pîvaz
- P-ya bêpif û qelew: pez, piling
- P-ya bipif û zirav: perde, parastin
- (P-ya bipif û qelew: pind)

P-ya bipif û P-ya bêpif hevberî hev du dengên fonemîk yê ji hev cuda û wateguhor in. Anku eger mirov wan dengan bi hev biguherîne, di hin peyvan de wateya peyvê jî dikare biguhere:

- par (P-ya bêpif) = sala borî, sala çûyî, sala berî îsal
- par (P-ya bipif) = pişk, behr, beş, şirkatî

3.11. T-ya pirdeng

Herfa T jî di kurmancî û zazakî de ne tenê bo yek an du dengan lê bo sê heta çar dengên ji hev cuda jî tê bikaranîn. Parvekirina serekî li ser T-ya bipif (req) û T-ya bêpif e. Lê ji bilî wan, parvekirineke din jî li ser T-ya zirav û T-ya qelew heye.

Di soranî, farisî, tirkî û inglîzî de dengê T li destpêka peyvan herdem wiha bipif anku req e (di erebî de jî ت li destpêkê herdem bipif e lê li jêrtir binêrin bo T-ya bêpif ya qelew).

T-ya bipif bo nimûne di van peyvan de heye:

- tarîx, tenê, teşî

Ev nimûneyên me di heman demê de bi T-ya zirav in anku ev "T-ya bipif ya zirav" in.

T-ya zirav dikare herwiha bêpif anku nerm jî be:

- tişt, tîr, tû (dartû), te, tu (kesa/ê ku mirov behsa wî dike)

Lê T-ya bêpif bi piranî qelew e:

- tarî, teng, tenî, tirs, tov...

T-ya bêpif û qelew hevberî ط ya zimanê erebî ye.

Ev her sê dengên T berbelav in lê ji bilî wan bi kêmî di peyvekê de herwiha T-ya bipif ya qelew jî peyda dibe:

- tep (lêdana bi kefa destan)

Lê ji ber ku nimûneyên "T-ya bipif ya qelew" kêr in, guman ji hebûna wê heye. Lê dîsa jî mirov dikare dengên cuda yên herfa T di kurdî de wiha rêz bike:

- T-ya bêpif û zirav: te, tişt, tîr, tû
- T-ya bêpif û qelew: teng, tenî, tav
- T-ya bipif û zirav: tenê, temaşe, teşî
- (T-ya bipif û qelew: tep)

T-ya bipif û T-ya bêpif hevberî hev du dengên fonemîk yên ji hev cuda û wateguher in. Anku eger mirov wan dangan bi hev biguherîne, di hin peyvên de wateya peyvê jî dikare biguhere:

- ta (T-ya bêpif): ben, dezî, benik (inglîzî *thread*)
- ta (T-ya bipif): tasar yan tagerm, heraret (inglîzî *fever*)
- tam (T-ya bêpif): çêj, lezet, te'am (inglîzî *taste*)
- tam (T-ya bipif): tamam, bi tamamî (inglîzî *exact, exactly*)
- tu (T-ya bêpif): kesa/ê ku mirov jê re diaxive (inglîzî *you*)
- tu³⁹ (T-ya bipif): hîç, çu, qet, qetiyen (inglîzî *no one, not any, not at all*)

QELEWÎTÎ

Þ⁴⁰, Ş, Ț, Ț nîşana dengên bêpif yên emfatîk (qelew, bi inglîzî "emphatic") in, wek di peyvên "pez, teng, sed, zanîn" de. Herwiha Þ jî wek wan dengê B-ya qelew e lê ev tenê di hin devokan de heye (wek "berdan" di hin devokan de ku bi B-ya qelewkirî ye).

Ev deng qelew û stûr tên gotin lê bêpif in. Anku ew zêdetir dişibin P, T, ne Þ, Ț.

Ş bi alfabeya erebî ص e, Ț jî ط ye. Ț nêzîkî ظ ya erebî ye lê ne "fis" e: ya kurdî qelewkirina "zeyn" a (ز) erebî ye lê ya erebî qelewkirina "zal" a (ذ) erebî ye. Hevbera Þ di erebî de peyda nabe ji ber ku ti

³⁹ Hin caran wek "ti" tê nivîsîn lê "tu" ya bi maneya "kesa/ê ku jê re tê axiftin" jî (bi inglîzî *you*) dîsa ew jî di hin devokan de bi awayê "ti" tê gotin.

⁴⁰ Þ li vê derê ji ber sebebên teknîkî wek Þ hatiye nivîsîn. Heke mimkin bûya, ew jî wek Ş, Ț, Ț bi P û nuqteyek li binî hatibûya nivîsîn, dê çêtir bûya.

awayên P di erebiya standard de nînin. Li aliyê din, hevbera ض ya erebî anku D-ya qelew (D) di kurdî de peyda nabe.⁴¹ Di peyvên ji erebî wergirtî de ew dibe Z-ya normal, wek "razî, remezan". Lê di aramî de P bi berfirehî heye.

Gelek peyv di kurdî – bi taybetî di kurmancî – de hene ku dengên P, Ş, T, Z hene (nimûne ji her dengê li destpêk, nîvek û dawiya peyvê):

- P: piling, zepzêpe, rep
- Ş: şed, mişaş
- T: têng, miştirb/miştirib, miş
- Z: ziviştan, bezîn, bez (bazdan, bezîn, rev)

Lê dîsa jî ev deng di kurdî de ne fonem in anku ne dengên wisan in ku maneya peyvê ji dengên P, S, T, Z yê "zirav" biguherînin. Ç, K, P, T yê bêpif ji yê bipif serbixwe ne ji ber ku guherandina, bo nimûne, K-ya bipif bi K-ya bêpif dikare di hin peyvên de maneya wê biguherîne, wek ku me li jor nimûne jê dane. Lê P, Ş, T ne ji P, S, T serbixwe ne anku ne fonem in ji ber ku guherandina dengê, bo nimûne T bi T yan P bi P di ti peyvên kurmancî de maneya wê peyvê naguherîne. Mirov peyvên "şed, pazde, têng, zerf" bi dengên ne qelew wek "sed, pez, teng, zerf" bibêje, dibe ku bi piraniya kurmancîxivan ecêb û pêkenok be lê dîsa jî maneya wan peyvên wek xwe dimîne. Ji xwe hin peyv hene ku li hin deveran qelew û li hinan jî zirav tên gotin, wek peyva "penîr".

Lê Z di kurmancî de fonem e, ne tenê alofon e. Veguhastina Z bi Z dikare maneya peyvê biguherîne: "bez" bi Z-ya qelew (bazdan, rev, revîn) lê "bez" bi Z-ya zirav (duhnê / rûnê bi leşê heywan)⁴². Herwiha "baz" (teyrek) û "baş" di gotina "başdan" de. Dîsa peyva "zana" di hevoka "Ew kesekî zana ye" (bi Z) ji heman peyvê di hevoka "zana bizinê" (Z) anku "zayîna bizinê" de cuda ye. Di peyvên îranî de hevberî Z-ya zirav ya peyvên kurmancî bi piranî di farisî de jî Z heye: "zan (zayîn), zer, hezar" ku bi farisî "zayîden, zerd, hezar" in. Lê Z bi piranî dibe D: "zana, zava" ku bi farisî "dana, damad"⁴³.

⁴¹ Tevî ku ew deng di hin zimanên din yê îranî de heye (bo nimûne di peştûyî de ku di wî zimanî de wek ð tê nivîsîn.

⁴² Bi inglîzî "fat", tirkî "iç yağı", erebî شحم, دهن, farisî چربی, پیه

⁴³ "Zava" ya kurmancî û "damad" ya farisî (ku wek "damat" ketiye tirkî jî) ji hev gelek dûr bin jî, di eslê xwe de ji eynî rehî ne. D bi kurmancî bi piranî ji dawiya peyvê dikeve (wek "ba, bû" ku di farisî de "bad, bûd" in) û M di navbera vokalan de yan li dawiyê li peyv vokalekê dibe V (wek "nav, gav" ku bi farisî "nam, gam" in).

PÊŞBÎNÎKIRINA QELEWÎTIYÊ

DI PEYVÊN XWEMALÎ DE

- S di peyvên xwemalî de berî A/O herdem qelew e û berî Ê, Î, Û zirav e (sîr, sê, sûr) û berî E, I bi piranî zirav e (ser, sivik) lê carinan jî qelew e (sed, sim).

- T-ya bêpif berî A/O herdem qelew e (tav, tov), berî Ê, Î, Û zirav e (tîr, tê de, tûrik) û berî E, I bi piranî zirav (te, tivir) lê carinan jî qelew e (tevir, tirs)

- P-ya bêpif berî O herdem qelew e (poz), berî Ê, Î, Û zirav e (pêr, pîr, pûng) lê berî berî A, E, I bi piranî zirav e (par, pehn) lê carinan jî qelew e (parzûn, pembû, pez)

- Z berî O herdem qelew e: zor, zom lê berî A nepayî ye: "zanîn, zal" (qelew) lê "zan" (zirav), berî E, Ê, Î, Û herdem zirav e (zer, zêrr, zîv, zû).

Dengên P, Ş, T, Z di heman demê de di eynî kêteyê de li gel dengên P, S, T, Z yên zirav peyda nabin, wan jî qelew dikin: "pež", ne "pež" yan "pež".

DI PEYVÊN ESIL-EWROPÎ DE

Ç, K, P, T di piraniya peyvên ewropî de bipif in anku dengên Ç, K, P, T didin:

- Ç: çat, çet (suhbeta bi rêya Internetê, ji inglîzî "chat")⁴⁴
- K: kompûter, katarakt, kîmya
- P: partî, polîs, pas
- T: tank, test, trê

Lê hin peyvên bêpif jî hene, wek "tîp" (zirav) û "ton" (qelew).

DI PEYVÊN ESIL-EREBÎ DE

⁴⁴ Peyvên esil-ewropî yên bi Ç di kurdî de kêm in.

Di erebî de K û T-yên bipif (ك, ت) û T̄-ya bêpif û qelew (ط) hene. Ew di kurdî de jî wek K û herdu T bi piranî wek xwe dimînin (heta heke hin dengên din yên peyvê biguherin jî):

- kitêb (ji erebî "kitab"), kilam (ji erebî "kelam"), mekteb
- tamam, tacir, mitercim
- țam, țe'am (ji erebî "te'am), țema' (ji erebî "țema')

Lê di paşpirtika "-et" de T dibe bêpif: "rezalet, heqîqet, riwayet". T̄-ya qelew hin caran jî zirav dibe, wej 'etar (ji erebî 'ețtar / عطار)

D-ya qelew anku Đ (ض) ya erebî – ku di kurdî de peyda nabe - bi piranî li destpêkê dibe Z̄ (zabit, zêft), wek din Z (razî, remezan). Z-ya qelew û "fis" (ظ) dibe Z̄ (wek: z̄alim, mezlûm).

Di erebî de dengên bêpif yên zirav nînin. Herwiha Ç, P di erebiya standard de bi ti awayan (bipif, bêpif, zirav, qelew) nînin.

S-ya qelew Ş (ص) dikare xwe bimîne, bo nimûne "şibe, şebir, şebî" lê hin caran dibe S-ya zirav, wek "sihet". Hin caran jî heta S-ya zirav ya erebî (س) di kurdî de dibe Ş, wek "şifametî, şifametî". Sebebê vê ew e ku L-ya "qelew" (bo L-ya qelew li jêrtir binêre) S-yê jî qelew dike lê ya ecêb ew e ku L jî di van peyvên de di erebî de ne qelew e lê di kurdî de qelew bûye. Lê bi piranî S-ya zirav di peyvên erebî de ziraviya xwe diparêze, heta li berî A jî ku adeten di peyvên kurdî yên xwemalî de A dengê S yê berî xwe qelew dike. Bo nimûne, "Salim" (ne *Şalim) ji ber ku di erebî de jî bi S-ya zirav e lê "Şabir" ji ber ku di erebî de jî bi Ş ye.

DI PEYVÊN JI TIRKÎ Û JI FARISÎ DE

Di tirkî û farisî de P û T̄ nînin tevî ku di farisî de hin peyvên ji erebî wergirtî yên bi T̄ / ط tên nivîsîn hene jî. Ş û Z̄ - heke qet hebin, tenê alofonên S û Z yên berî A/O û tirkî de herwiha berî I-ya bînuqte hene.⁴⁵

Peyvên ji tirkî yan ji farisî wergirtî hingê jî bê qelewîti ne ("sax" ji tirkî û "saz" ji farisî – herdu bi S-ya zirav) li cihê ku di peyvên xwemalî de (berî A/O) zerûrî ye ku ew bi dengên qelew bûna (bide ber

⁴⁵ Di farisî de peyva "sed" (100) wek "صد" / şed" bê nivîsîn jî lê dîsa wek "sed" tê gotin. Lê nivîsîna vê peyva ne-erebî bi vî awayî nîşana wê yekê ye ku carekê di farisî de jî ev deng hebûye.

"sar, sahî" yên kurmanciya xwemalî).

L û Ł

Di kurdî de dengê L-yê hene ku yek bi "L-ya zirav"⁴⁶ û ya din jî bi "L-ya qelew"⁴⁷ tê binavkirin. Di alfabeya kurdî-erebî de L-ya zirav wek ل û L-ya qelew wek ل (wek L-ya zirav lê kumikekî berjêrkirî li ser) tê nivîsîn. Di alfabeya kurdî-latînî de hin caran L-ya qelew bi du L-yan tê nivîsîn lê di rastiyê de ew ne du L ne. Vê dawiyê, bi taybetî di berhemên zimannasî de "ł l" bo diyarkirina dengê L-ya qelew tîk bikaranîn. Di nimûneyên li vê derê de em ê "L-ya zirav" bi nîşana "L, l" û "L-ya qelew" jî wek "ł l" binivîsin.

L-ya zirav, bo nimûne, di peyvên wek "lazim, lerizîn, livandin, lêv, lome, lûlî" de heye. Di kurmancî de, ji bilî destpêkê, ew herwiha li nav û dawiya peyvê jî peyda dibe: "belê, bilbil, dil, gul". Di kurmancî de L-ya zirav hevberî L-ya qelew gelek serdest e.

Lê di kurmancî de L-ya qelew jî peyda dibe: "fep, siřav, weřat, řif" anku "xwazok, temah". Di peyva bi L-ya zirav "řil" (40) de û di peyva bi L-ya qelew "řif" (temah, xwazok) de mirov dikare cudahiya van dengan baş bibîne. Di zimanên din de, bo nimûne di inglîzî de L-ya qelew wek di peyva "all" (hemû) û di erebî de jî di peyva "Allah" (Xwedê) de peyda dibe.

Di kurmancî û zazakî de L-ya qelew roleke marjînal heye. Lê di soranî, kurdiya başûrî û hewramî de L-ya qelew roleke giring heye. Di soranî de ew gelek caran cihê L-ya zirav ya kurmancî digire. Bo nimûne:

- kurmancî: belê, dil, gul, lal (بهلێ، دل، گۆل، لال)
- soranî: beřê, diř, guř, lař (بهلێ، دل، گۆل، لال)

Lê di soranî de L-ya qelew ti caran li destpêkê peyda nabe. Berevajî wê, di kurmancî de ew di hin peyvên de heye, wek di peyva "fep" ya li jor dayî de. Di hin zimanên de dengên A/O li berî L-yê, wê qelew dikin. Lê di kurmancî de ev diyarde nîne. Bo nimûne, peyvên "law, lorik" jî bi L-ya zirav in.

⁴⁶ Mirov dikare li vê derê guhê xwe bide dengê "L-ya zirav":

https://en.wikipedia.org/wiki/File:Alveolar_lateral_approximant.ogg

⁴⁷ L-ya qelew li vê derê tê bihîstin: https://en.wikipedia.org/wiki/File:Voiceless_alveolar_lateral_fricative.ogg

L-ya qelew ne L-ya şidandî yan L-ya dubare ye. Bo nimûne, peyva "gule" (fişek, telqe) yan "gelek" di devê gelek kurmancîxivan de wek "gulle, gellek" tên şidandin. Lê ew dîsa jî ne L-ya qelew ya wek ya di peyvên "sîlav, saî, wefat" de ye.

R û Ŗ

Du cûnên cuda yê R di zimanê kurdî de hene. Li destpêkê R herdem "req, şidandî, qelew" e. Li nav yan dawiya peyvê bi piranî "nerm, sist, zirav" e. Di çêbûna wê de çend caran li pey hev ziman bi banê devî dikeve.⁴⁸ Di peydabûna R-ya "nerm" de ziman tenê carekê bi banê devî dikeve.

Di alfabeya kurdî-erebî de R-ya "nerm" wek ر û R-ya req jî wek ر تê nivîsîn. Alfabeya dengnasî ya navneteweyî R-ya "req" bi nîşana [r] û ya zirav wek [r] diyar dike. Di alfabeya kurdî-latînî de herdu bi "R, r" tên nivîsîn. Lê hin caran R-ya "req" bi du R-yan tê diyarkirin, wek "pirr, cerrik, bajarr, gerrandin, şerr" lê ev bikaranîn kêma e – ji bilî peyva "pirr" (gelek) bo cudakirinê jî peyva "pir" (rêya di ser avê re). Lê nivîsîna bi du R-yan li destpêkê (wek "rrast, rrê") hema-hema qet nayê bikaranîn tevî ku di hin zimanan de (bo nimûne di zimanê albanî de) ev awayê bikaranînê jî peyda dibe.

Di hin zimanan de û bi taybetî di transkrîpsiyonên zimannasî de, gelek caran R-ya nerm wek "R, r" û req jî wek "Ŗ ŗ" nivîsîn. Di nimûneyên xwe yê li vê derê de jî em ê wisa bikin daku cudahiya van dengan baş bê diyarkirin:

Di kurdî de R li destpêkê herdem şidandî ye:

- řast, řev, řê, řikêb, řoj, řuh, řû

Li nava peyvên xwerû R bi piranî nerm e:

- germ, erd, girtin

Herwiha li dawiyê jî R bi piranî nerm e:

- agir, ser, bêr, ger (eger, heke), ker (heywanek)

Lê hin caran li navê yan li dawiyê jî req e:

⁴⁸ Mirov dikare li vê derê guhdariya R-ya "şidandî" yan "qelew" bike:
https://en.wikipedia.org/wiki/File:Alveolar_trill.ogg

- şeř, ceř, geř (geřîn/geřandin), keř (nebihîz, guhgiran)

Di peyvên pêkhatî (hevedudanî) yan bipêşpirtik de R-ya destpêka peyva xwerû ya duyem bi piranî tê parastin:

- xem-řevîn
- bi-řeve, ne-řeve

Lê di hin peyvên cihgirtî de ew nerm dibe:

- îro / evro (ne "îřo / evřo" lê ji "î /ev + řo[j]")
- nîvro/nîro (ne "nîvřo/nîřo" lê ji "nîv+ řo[j]")

Berevajî L û Ł, di meseleya "Ř û R" kurmancî û soranî wek hev in. Anku Ř di kurmancî de hevberî Ř ya soranî ye û R-ya kurmancî hevberî R-ya soranî ye. Di herduyan de li destpêkê R herdem req e û li nav û dawiyê bi piranî – lê ne herdem – nerm e.

DIYARKIRINA DENGÊN CUDA

Gelek çaran gazin ji alfabeya kurdî-latînî ya standard tê kirin ku ew hemû dengên kurdî di xwe de nahewîne. Bo nimûne, tê gilîkirin ku em tenê K-yekê yan T-yekê dinivîsin tevî ku me du K û heta çar T-yên cuda hene.

Lê daxwazkerên zêdekirina herfan li alfabeyê ji bîr dikin ku zêdekirina herfan heke xwandinê piçekê hêsantir bike jî, bi hêsanî rastnivîsînê diwartir dike û xeletiyên nivîsînê zêde dike. Bo nimûne, yek ji daxwazkerên dengbilind yên zêdekirina herfan yan diyarkirina dengên Ç, K, P, T yên cuda bi alîkariya apostrofan nivîskar Ezîzê Cewo ye ku dixwaze em wan dengên bipif û yên bêpif ji hev cuda bikin⁴⁹. Di nivîsên xwe de ew vê cudakirinê li ser navê rastnivîsîn û rastgotina peyvên kurdî diparêze. Lê heke

49

http://www.amidakurd.net/qunciknivis/pisgir%C3%AAk%C3%AAAn_zim%C3%AAAn_%C3%A7awa_div%C3%AA_%C3%A7areser_bibin Herwiha: http://www.amidakurd.net/qunciknivis/d%C3%AEsa_li_ser_pirsa_alfab%C3%AA

mirov nivîsên wî bixwîne, mirov dibîne ku ew bi xwe bi berdewamî wan xelet dinivîse tevî ku mirov dikare wî wek bikarînerê ne-sade yê zimanê kurdî bihesibîne jî.

Bo nimûne, li hin cihan ew apostrofê (') bo diyarkirina pîfdariyê bi kar tîne lê carinan jî di heman sernavê nivîsara xwe de apostrofê wek nîşana bêpîfîyê dixebitîne. Bo nimûne, sernavê nivîsareke wî " LÊ K'A, ÊDÎ R'ASTÎ LI K'U MA?" ye.⁵⁰ Lê her kurmancîzan dizane ku "ka" bi maneya "de ka, hele, ca" bi K-ya bipîf e, wek "kurd, Kurdistan, kar" lê "ku, kû" bi wateya "li kîjan cihî" bi K-ya bêpîf e, wek "kirin, kê, kevîr". Lê "parêzvana nivîsîna rast ya kurdî" bi xwe vê xeletiyê dike. Helbet vê xeletiyê ne carekê û du caran dike. Sernavê nivîseke wî ya din jî "AWIR'EK JI DERVA: PÊVAJOYÊN R'OJHILATA NAVÎN Î PIRSGIRÊKA K'URDÎ BI Ç'AVÊ ZANYARÊ R'ÛS"⁵¹. Anku di peyva "k'urdî" de apostrofê wek nîşana pîfdariyê bi kar tîne ji ber ku "kurdî" bi K-ya bipîf e. Lê di heman demê de di peyva "ç'avê" de apostrofê wek nîşana bêpîfîyê dinivîse ji ber ku "çav" bi Ç-ya bêpîf e. Vêca ku sernavên nivîsaran wiha bin, mirov biçe nav nivîsarên wî, mirov ji xeletiyên heyî nikare sereder bibe û derkeve.

Her kesê ku bi awireke hûr û zîq li van hewldanan binêre, dê bibîne ku ev ceribandî çendî çend sergêjî û xeletiyên peyda dikin. Wek ku me di nivîsara xwe ya bi sernavê "Gelo bi rastî em hewceyî zêdetir herfan in?"⁵² de diyar kiriye, zêdekirina herfan li alfabe ya heyî dê tevlihevî û ziyaneke mezin bigihîne nivîsîna bi zimanê kurdî û xeletiyên nivîsînê gelek zêde bike. Di ser re jî, feyde û menfeetê zêdekirina wan herfan bi rastî gelek kê e. Di nivîsên normal de kurmancîzan bi hêsanî dikarin li gor tekst û kontekstê peyvê rast bixwînin û rast fehm bikin. Imkana xeletfehmkirina di kontekstê de di rastiye yan qet nîne yan li gel tenê çend peyvên heye ku mirov dikare bo rêgirtina li xelettêgihîştinê bi hêsanî bibêje ka mebest çî ye. Tek nimûneya ku alîgirên zêdekirina herfan dikarin pêşkêş bikin ku bi rastî di hevokê de dikare xelet were fehmkirin, gotina "Tu ker î" ye ku dikare bi maneya "tu guhgiran/nebihîz î" yan jî "Tu heywan î" bide. Girankirina barê zimanê kurdî bi çendîn herfên din jî tenê bo rêgirtina li ber xelettêgihîştina gotineke wiha ne di berjewendîya kurdî û kurdîaxivan de ye.

Anku di nivîsên normal de ji her tiştî baştir e ku mirov dest ji van hewl û ceribandînan bêwec û bêxêr berde. Lê di ferhengan û di kitêbên dengnasiya kurdî de mirov dikare – û heta dereceyekê divê jî –

⁵⁰ <http://www.amidakurd.net/qunciknivis/l%C3%AA%20k%20a%20%C3%AA%20d%C3%AE%20r%20ast%C3%AE%20li%20k%20u%20ma>

⁵¹

<http://www.amidakurd.net/qunciknivis/awir%20ek%20ji%20derva%20p%C3%AA%20vajoy%C3%AA%20n%20r%20ojhilata%20nav%C3%AE%20n%20%C3%BB%20pirsgir%C3%AA%20k%20urd%C3%AE%20bi%20%C3%A7%20av%C3%AA%20zanyar%C3%AA%20r%20%C3%BBs>

⁵² http://nefel.com/kolumnists/kolumnist_index.asp?MemberNr=33

ku dengên deqîq yên peyvan bên diyarkirin. Bo nimûne, divê mirov diyar bike ku peyva "teng" bi T-ya qelew û bêpif tê gotin.

Mixabin heta niha tenê di çend ferhengan de têkoşîn bo diyarkirina dengê peyvan hatiye dan. Yek ji wan ferhengan ya zimannasê amerîkî-cihû **Michael L. Chyet** ya kurmancî-inglîzî⁵³ ye û ya din jî ferhenga etîmolojî ya zimanê kurdî (kurmancî û soranî) ya etîmologê rûsî **Ruslan Çabolov**⁵⁴ e. Ji bilî wan, herwiha **Mûsa Anterê** rehmetî jî di ferhenga xwe ya kurdî-tirkî⁵⁵ de cih daye cudakirina pifdarî û bêpifiyê. Lê wî ev cudahî tenê ji herfa K re kiriye: K-ya bêpif wek K û K-ya bipif jî wek KH nivîsiye. Lê ti cudahî li Ç, P û T yên bipif û yên bêpif nekiriye.

Chyet û Çabolov du zimannasên mezin û zîrek in. Ew helbet ji dengnasiya zimanan baş fehm dikin. Ew karê xwe bi sexbêrî û dîqet dikin. Mirov dikare texmîn bike ku tiştê ew dinivîsin rast û durist e. Bi piranî wisa ye jî: em maneyên peyvan, referansên wan, etîmolojiya wan gelek baş pêşkêş dikin. Lê mixabin di meseleya cudakirina dengên bipif û bêpif de ew gelek-gelek xeletiyên dikin.

Bo nimûne, Chyet apostrofê li gel K, P û T wek nîşana pifdariyê anku dengên bipif bi kar tîne. Lê bi Ç re ew apostrofê wek nîşana bêpifiyê dinivîse! Heta heke mirov vê bijartina seyr qebûl bike jî, ew dîsa jî li gor van qeyd û bendan peyvan xelet dinivîse. Bo nimûne, ew dinivîse "ç'are" lê "çareser" tevî ku herdu ji eynî rehî ne û hevdeng in. Bi heman awayî "ç'ep" lê "çeperast, çepgir".

Ew "çel" (çil, 40) û "çel" (kevir) wek hev dinivîse li gel ku "çel" ya bi maneya "40" bi Ç-ya bipif û "çel"ê bi wateya "kevir" bi Ç-ya bêpif e. Chyet p' wek nîşana P-ya bipif dinivîse lê dîsa jî van û gelek peyvên din yên bi P-ya bipif bi P-ya bêapostrof dinivîse: "peyam, peyale, peyman, peywendî, peywir..." Ew t' wek nîşana T-ya bipif dinivîse lê dîsa jî van û hin peyvên din yên bi P-ya bipif bi P-ya bêapostrof dinivîse: "taloq, tabûr, tazî/taziye, tepeser..." Li aliyekî din, peyvên bêpif (lê qelew) bi xeletî wek "t'eraştin, t'erazi, t'ebax, t'eref" dinivîse.

Çabolov jî di ferhenga xwe de hewl dide ku cudahiyên van dengên diyar bike. Ew herfa Ç bo dengê Ç-ya bêpif bi kar tîne, wek "çav, çerm, çem" û herfa Ć jî bo dengê Ç-ya bipif dixebitîne, wek "çar, çi, çend". K, P û T-ya bê nîşan ew li cihê K, P û T-yên bêpif dinivîse û bo diyarkirina pifdariyê jî ew apostrofkê dide ser K, P, T anku wan wek Ḱ, Ṕ û T́ dinivîse. Heta wî peyvên bi van herdu cûnên

⁵³ <http://yalepress.yale.edu/yupbooks/book.asp?isbn=0300091524>

⁵⁴ Руслан Лазаревич Цаболов: Этимологический словарь курдского языка: [в 2 т.] — М.: Восточная литература РАН, 2001—2010.

⁵⁵ Mûsa Anter: Ferhenga Khurdî-Tirkî. Yeni Metbaa 1967.

dengan ji hev cuda jî kirine anku, bo nimûne peyvên bi K û K ne di nav hev re lê pêşî hemû peyvên bi K û paşî jî hemû yên bi K dane.

Lê wek Chyet, Çabolov jî di ferhenga xwe de bê hejmar xeletiyên di nivîsîna Ç, K, P û T-yên bipif û bêpif de dike. Bo nimûne, Ç, K, P û T di soranî de li destpêkê herdem bipif in anku diviyabû li gor rastnivîsîna Çabolovî ew bi Č, K, P û T hatibûna nivîsîn. Lê wî bi xwe hemû peyvên soranî bi Ć, K, P û T nivîsîne. Lê hevberên wan yên kurmancî yên bipif bi piranî bi Č, K, P û T nivîsîne. Di peyvên kurmancî de jî ew di nav K de gelek peyvan bi K dinivîse tevî ku li gor rastnivîsîna wî bijartî diviyabû bi K bûna: "kelek, kenîşte, kereste, kerewiz ("kerefs" ya kurmancî nedaye)...

Helbet xeletiyên ku van herdu ferhengvanan kirine ne tenê hingê kirine ku Ç, K, P yan T li destpêka peyvê heye. Bi taybetî jî hingê ew xeletî hatiye kirin gava ku Ç, K, P yan T di nava peyvê de be. Bo nimûne, li gor awayê nivîsîna xwe rast dinivîse "mak'er, mek't'eb, mek'an". Li gor heman lojîkê, diviyabû mirov binivîse "mak'îne, sek'inîn/sek'inandin, şik'ayet/şik'yat, şik'il" ji ber ku ew bi K-ya bipif in û Chyetî di piraniya ferhenga xwe de K' wek nîşana wî dengê bi kar aniye. Lê ev peyvên nimûne – û helbet bi sedan yên din jî – wî bi xwe wek "mak'îne, sekinîn/sekinandin, şikyat, şikil" nivîsîne. Carinan heta ji du peyvên hevreh (ji eynî rehî) jî ew carekê K û cara din jî K' dinivîse. Bo nimûne, "melek" xelet dinivîse (ya rast li gor nivîsîna wî dê melek' bûya) lê li gor nivîsîna xwe rast dinivîse "milyak'et".

Xeletîkirin ne tenê bi "jibîrkirin" a apostrofê mane. Gelek caran jî apostrof li hin cihan heye ku diviyabû tine bûya. Bo nimûne, peyvên "pê, pêk, pêçan" diviyabû li gor nivîsîna Chyetî bijartî bêapostrof bûna ji ber ku P, Ç û K-yên wan bêpif in. Lê ew bi xeletî dinivîse: "p'ê, p'êç'an/pêç'an, p'êk".

Çabolov jî heman xeletiyên dike. Ew dinivîse "melek" tevî ku li gor nivîsîna wî diviyabû "melek" bûya lê peyva "melkemot" (melekê mewtê, melekê mirinê) ya ji eynî rehî li gor nivîsîna xwe rast wek "melk'emot" dinivîse. Peyvên "hukim, hikûmet" li gor nivîsîna xwe rast wek "hukim, hikûmet" dane lê peyva ji eynî rehî "mehkûm" wek "meħkum" nivîsiye tevî ku li gor nivîsîna wî divê "meħkum/meħkûm" bûya. Wî herwiha "kû" (li kû, li kîjan derê) ya kurmancî ya bi K-ya bêpif bi xeletî wek "kû" nivîsiye lê hevwatera wê ya soranî "kwê" ya bipif bi xeletî wek "kwê" nivîsiye, heçku bêpif be.

Mebest bi eşkerekirina kêmasiyên van herdu ferhengvan û zimannasên mezin ne galtekirina bi xebata wan e. Dixwazim bi van nimûneyan diyar bikim ku cudakirina van dengan û rastnivîsîna wan

çendî dijwar e – heta bo zimannasên haydar û zîrek jî. Vêca mirov dê çawa bikare vê doz û daxwazê ji bikarînerên sade yê zimanê kurdî bike – ku piraniya wan rojekê jî bi resmî zimanê kurdî li xwandingehê nexwandiye.

Zêdekirina hin herfên din jî li alfabe ya kurdî dê bi ti awayî xizmeta zimanê me neke. Heta heke ew rê li ber xeletfehmkirina çend peyvên bigire jî, ew dê nivîsîna bi kurdî gelek diwartir bike û xeletiyên nivîsînê yekcar zêde bike.

Lê dîsa jî di ferhengên ayindeyî de divê em hem awayê nivîsîna peyvên serekî diyar bikin û hem jî awayê gotina wan diyar bikin. Çawa ku inglîz bo nimûne dinivîsin "bear" (hirç) lê wê wek [bêr] dibêjin û vê rastiye di ferhengan de diyar dikin, wisa divê di ferhengên kurdî de jî awayê gotina peyvê bê diyarkirin. Bo nimûne, peyva "zivistan" bi kurmancî bi Z, S û T yê qelew tê gotin. Loma mirov dikare di ferhengan de li ber peyva "zivistan", awayê gotina wê [ziviştan] binivîsin. Yan jî dengên cuda yê peyva "pênc" (P-ya bêpif), "perde" (P-ya bipif) û "pez" (P-ya qelew û Z-ya qelew) wiha diyar bikin:

- pênc [pênc]
- perde [pêrde]
- pez [pêz]

Lê divê ev awayê nivîsînê bo ferhengan bimîne, ne di nivîsên sade yê kitêb, rojname û malperan de hebe daku xwandin û nivîsîn dijwar nebe. Lê heke kesek nizane ka gelo P-ya peyva "pez" bipif e, bêpif e yan qelew e, ew diyar wê zanîne ji ferhengan wergire. Lê 99 % ji kurmancîzanan bêyî ti nuqte yan apostrofan jî li ser wê peyvê, dizanin ku P-ya "pez"ê qelew e. Loma ew ne hewceyî wê nuqteyê ne û xwandin û nivîsîna wê nabe ku li ber wan were dijwarkirin.

Açarnayîş û Açarnayox

Newzad VALÊRÎ

Voltaire wina vano: *“Werrê mi ê açarnayoxanî rê ke, hem herf bi herf açarnayîşê kenê, hem zî her yew cumle de ganê manayî genê û benê.”* La Voltaire zaf zî neheq nîyo. Çunke yew açarnayîş çiqas kalîteyin bo zî ruhê manaya eslî sey vêrî nêbeno, xo ra tayê çîyan vîndî keno.

Ma berê sereyê vateyê xo açarnayîş çî çî yo û açarnayox se keno? Çira karê açarnayoxî asan nîyo? Açarnayîş, bi vateyo bîn tadayîş yanî tercume; tekst/metno ke yew ziwano bîn de nusîyayo yan vajîyayo biaçarinayo/bitadîyo ziwaneko bîn yan zî bînan. Nameyê no kar û şuxulnayîş açarnayîş/tadayîş û tercume yo, karkerdoxê/a no karî açarnayox/tadayox, bi nameyê bîn, bi çekuyê erebkî mutercîm o.

Açarnayîş sey tarîxê însanîyetî kehan o û astengêko *“ziwano xerîb/bîn”* ra peyda beno ke têkilîye de yew qerifinayîş virazeno, seba wedartişê înanî yew firsend/îmkan awan keno. No sebeb ra açarnayîş mabênê ziwano û kulturan de wezîfeyê dayîş-girewtîş (transfer) de cayêko muhîm geno. Ayera ma eşkenê vajî ke açarnayîş yew şuxul o û ziwaneko o, ziwano ra wet/aver o ke seba çareserîyê qerqaşayê/têminbîyayîşê ziwano ke letebîyayîş û vilabîyayîşê merdimî/însanî ra vejîyeyî yo. [2]

Açarnayox, ziwaneko bîn/bînan ra metin açarneno yewna ziwano, la no wina çîyêko asan nîyo, karê tercumeyî yew dîsîplîn, perwerde û xeylek kede wazeno û sewbîna bi sebr û tecrube xurt beno. Tam zî tîya de Koksal Dînçay kitabê xo yo; *“Çeviri Kuramları”* de derheqê açarnayîşêko başî de çend dusturanê bingehî ra behs keno û nê dusturan wina humareno: fehmkerdişê muhtewayê eserî/tekstî, açarnayîşêko moda mod ra xo dur girewtîş, ziwano çîmeyî (kaynak dil) û ziwano hedefî/armancî (hedef dil) de hakîmîyet, kulturê ziwaneko hedefî de şuxulnayîşê çekuyan, îdyoman û îfadeyanê raştêkîn/naturalî û reyna transferê (aktarım) rastî yê uslubî de hostatî. [3] Sewbîna, ganî açarnayox cor de seke Voltaire nîşan kerdibi a mesele de hişdar û haydar bibo ke wa mabenê ziwano

bîn û ziwane wendoxî de bi açarnayîşê xo pirdêk însa bikero û hem mana hem zî form çendin dest ra yena wa nezdîyê orîjînalî bibo.

No şuxulnayîş de tena hostayîyê açarnoyoxî eşkeno ke rayîrê orîjînalîyî de tayê astengan wederto. Na babete de biewnê Nabokov se vano: *“Açarnayîş hewce yo ke herf bi herf bivirazîyo, sewbîna bi notan, bi şerh û şîroveyan dewlemend bibo. Na mesele de beno ke rayîrêko/metodêko tenayî, no yo.”* Yanî bixoraste-rast açarnayîşêko tena seba wendoxan bes nîyo, bîlakîs bi şerh û şîroveyan metin hîna baş bidîyo fehmkerdene ke wa hem hetê sentaksî hem zî hetê retorîk/ustûbî ra zelal bo. Eke wina bibe açarnayîş xurt û dewlemend beno û wendoxan rê se çîyêko bêgane û serdin ney, gane û germin biaseye.

Bi rastîye, karê açarnayîşî, beyntarê wever û naver de mendo? Hem ganî ti girêdayeyê, sadiqê metnî bimanê hem zî metno ke ti açarnenê ziwano açarnaye de ganî bi yew mantiq û estetîkî ziwano açarnaye de newe ra awan bibo. Tîya de vateyê açarnayoxo meşhur Coindeau yo Fransayîj yeno vîrê ma: *“Heqîqatî de karê açarnayîşî sey mehsulêko newe ra bivirazîye yo. Eser ganî wina hol biaçariyayo ke, wa wendox/e nêvajo/e ke no eser, açarnayeyî/tercûme yo. Wa ci ra/ey ra boyê açarnayîşî nêgîro.”* Belê, ma fehm kenê hetêk ra açarnayox/e lazim o ke sadiqê metin bimanoyê û heto bîn ra zî hewce nîyo ke moda mod, ser ra heta cêrî girêdayeyê/pabesteyê ey bimaneyê. Çunke açarnayox/e açarnayîşê xo de seke nê nuşteyî/şîrî bi xo newe ra binuso/a û bi ziwano ke tebîî/rastekîn awan bikero/a. Xo de bifikirîyo/e vajo/e ke ez herinde no/na nuştoxî/e de benê mi no metnî bi ziwano xo yê eslî/ziwanê dayîkî senîn nuştenê û no metnî senîn bi veng û aheng vatenê? Eke wina bifikirîyo û bala xo bido no karî helbet açarnayîşê xo de beno serkewte. Sey vateyê Coindeau, êdî ey ra boya açarnayîşî nêna.

Açarnayoxo namdar yê Tirkan Ülker İnce, ke kitabê Tornî Morrison, Lawrence Durrell, Amanda Filipacci û Italo Calvinoyî açarnayê tirkî, o zî seba no mewzu wina vano: *“Açarnayîş bitemamî metinê açarnayoxî yo. Çunke ey/ayê viraşto/a.”* Yanî vano ke însiyatîfê açarnayoxî, metin de xo zaf mojneno ra. Berdewamî de vateyê xo wina qedînenno: *“Açarnayîş, eke sifetê metno baş heq bike mesele çin a.”* Birastî eke açarnayîş kalîteyî bibo ma eşkenê vajê ke açarnayox karê xo ardo ca, êdî eser ra tam girewtîş hayê wendox de yo. Gama wendişî de wendox eke boya açarnayîşî çendin tay bigîro û seke no metin ziwane ey/ayê de ameyo nuştîş ey/ayê rê natural bêro, kes eşkeno vajo ke no proses, yanî prosesê açarnayîşî bîyo serkewte.[4]

Açarnayoxanê tirkî de tayê nameyê estî ke karê açarnayîşê de hosta yê, bixoy xebata înan wesifanê açarnayîşê înan mojnenoy ra û sewbîna ge bi vateyê wendoxan û ge zî bi fikrê rexnegiran/vatesencan ma eşkenê vajî ke nesîr de sey Tahsîn Yucel, Sebahattîn Eyuboglu û nazim-şîre de zî Behcet Necatîgîl, Can Yucel û Cevat Çapan namêyê balkeşî yê. Franskî ra bi nameyê xo yê orîjînalî “Le Essais” ke destê Montaigne ameybî nuştîş, reya verên bi destê Eyuboglu serra 1940 de bi nameyê “Denemeler” açarnîyaybî tirkî. Zafî açarnayoxan no kitabî açarnayo la hema zî tehmê açarnayîşê Eyuboglu ter û teze yo û hetê kalîte ra başêrê ê bînan o. Soneyanê Shakespeareyî zaf rey açarnayaybî tirkî la tehmê açarnayîşê soneya 66’î bi vengê şaîr Can Yucelî hîna weş û ahengîn a. No her di numuneyan de açarnayoxî bi nuşttoxîyê xo yan bi şaîreyê xo û zîwanê çîmeyî/esasî û zîwanê hedefî/armancî de kafî yê, hosta yê ke tercumeya înan ra boya açarnayîş hîna tay yena.

Açarnayîşî de mîsale sey fariskî ra bi tirkî de Mehmet Kanar nesir ra heta şîre zaf eserî açarnayê. Înan ra yewî zî şîiranê Sohrab Sepehrî “Heşt Kitab” o û bi nameyê “Sekiz Kitap” açarnîyayo tirkî. Qasa vînayîşê mi Kanar, nesr de baş o, la şîir de hendeyê nesrî baş nîyo, çunkî açarnayîşê şîirî de ganî açarnayox, yan şaîr bo yan zî şîire ra baş fehm bikero. No seba açarnayîşî çîyêko zaf muhîm o. Keso ke tirkî û farskî ra û şîire re baş fehm keno no kitabî biwane vînenoy ke tercumeyê tirkî de estetîk û ahengê şîiran vîndîbîyo, sey zîwanê nesrî raste-rast û monoton awan bîyo ke cira tehmêko weş nîno girewtîş.

*“Gecenin kenarında bir renk
Ölmüş tek kelime etmeden
Bir kuş gelmiş, kara; uzak yollardan
Yenilgi çatısında ötmekte yüksekte.”[5]*

La nê rêzî tayî ahengê xo û ritîmê xo vîndîkerdî. Nê rezan ez eşkena bi vengê xo wina tercume bikerî:

*“Gecenin kıyısında bir renk
Sessiz sedasız ölmüş.
Kara bir kuş gelmiş uzak yollardan
Ötüyor kırılmış gecenin çatısından.”*

Reyna şaîr û açarnayoxo Tirk, Behçet Necatîgîl açarnayîşê yew şîra Rainer Maria Rilke'yî *“Die Aufzeichnung des Malte Laurids Brigge”* bi tirkî *“Malte Laurids Brigge'nin Notları”* de[6] wina yew rez vano;

“Hâlbuki o da, kaşları kalkık durakalmıştı, dikkatini dikmiş sanki burun kesilmişti.” (r. 112).

Açarnayox tîya de yew îdyoma ke tirkî de qet nîna vatiş; *“burun kesilmişti”* şuxulnaya ke no seba taybetîyê kulturî û mantiqê ziwani çiyêko rast/baş nîyo, yew xelatî yo.[7] La çî heyf ke wina xeletî zafê açarnayîşan de estî. Ne tena yê Necatîgîlî hema hema her açarnayîşî de wina yew handîkapêko nimiteyî cuyeno. Ayera mi zî açarnayîşê şîranê Ahmed Arifi de; *“Mi Hesreta To Ver Qeydubendî Kerdî Kehan”* de seba îdyom, mecaz û sentaksan de çendin mi dest ra ameyo mi bala xo dayo ser, kirdkî de seba hemmana û hemdengîya yê şuxulnayîşan çî çî yeno vatiş mi ey tercîh kerdo.

Nimûne:

Tirkî: *“Gün açar, / Karın verir yağmurlu toprak*

...

Bulutlarda kartal, / Daha çalımlı.”

Mi wina açarnayo kirdkî:

“Roj akeweno / Hêgayo varanın kerkeşîno we

...

Hewran de hêlîyî / Hîna qure yî.” (r. 24)[8]

Sewbîna nimûne wina ya:

Tirkî: *“Ve dışarda delikanlı bir bahar, / Seviyorum seni, / Çıldırısıya...”*

Kirdkî vatiş: *“Û teber de wisarêko xort, / Ez to ra hes kena, / Qasê gej bîyayîşî...”* (r.36)[9]

Hecimê nuştaya ma zaf destur nêdana ma ayera ez vana, nê çend rêzî seba meramî ma kafî yî. Mi ser de zî vatibi arçanayîşê şîrî de kes çendin baldar bo zî reyna tayî kemasî vejîyenê orte. Muhîm o yo ke wa gam bi gam nê kêmasî tay bibê û boya açarnayîşê ci ra tay bêro.

Wina yo, ma nê nimûneyan ra zî fehm kenî ke karê açarnayîşî seke teber ra aseyno, asan nîyo, hele ke mewzu şîre bo, na mesele hîna bena zor, karê açarnayîşî beno girêyin. Vanê ya; şîre a çîya ke,

eserê hunerîyêka ke açarnayîşê aye, sewbîna ziwana de bêîmkana o. Eynî wina yo. Labelê bi no qayde ma senî Hafizî, Rimbaudî, Shakespeaerî, Cegerxwînî, Kafkayî, Marquezî, Adonîsî wanenê? Ma senî şîre û nuşteyê înan ra hayîdar benê, înan ra yew tehmêko edebî û hûnerî genî? Gelo ma gereka qasê des-davist ziwana bizanîme? Înan rê tena yewî yan diyî ma rê bes î? Yan mavajime, mira (mela) îmkane her kesî esto wa ziwane înan bimuso û bi ziwano orijînalê yê nînanî eseran biwano? Wina yew çî îmkana ra vete yo. Tam no merhele de karê açarnayîşî keweno dewre û yew rayîr akeno. Açarnayîş tiya de beno hetkar û berê edebîyatê dinyayî akeno.

Berê edebîyatê yê bînan bi açarnayoxan ma rê a beno. Nê açarnayoxan ra mavajime ziwane kurdî de lehçeya-dîyalekta kirmanckî-kirdkî-zazakî de yew nameyêko baldar nuşttox, weşanger û açarnayox Roşan Lezgîn o, lehçeya kirdaskî/kurmanckî de sey nuşttox, edîtor û açarnayox Kawa Nemir nê serranê pêyînan de xebatê erjayî kerdî. Lezgîn, qasê des kitabî çend ziwana û lehçeyan ra açarnayê, bitaybetî kirdkî de zaf keda eyî esta. Lezgînî, tirkî ra kurmanckî (Suzan Samanci, Siya Bêdengîye), fariskî ra kurmanckî (Sadiq Hîdayet, *Sê Dilop Xwîn*) kurmanckî ra kirdkî (*Andranîk, Dêrsim Raywanî û Cografya*), kirdkî ra kurmanckî (Roşan Lezgîn, Li Bin Dara bîyê) açarnayîşî kerdê. [10] Nameyêko bînan Nemir, weşanxaneyê Lîsî de edîtorîyê beşa "Edebîyatê Dinya" keno û şîre, hîkaye, roman û çend tîyatroyê Îngîlîzistanî, Amerîka, Îrlanda û Tirkîyayî açarnayo kurmanckî, sewbîna heta nika tena îngîlîzkî ra nezdîyê 5 hezar şîrî açarnayê ziwane ma. [11] Tîya de ma nîşane tayê eseran dayî, la ganî rexnegîrî seba nê eseran rexne û fikrane xo bivajî, çî çî yo, açarnayîşê înan senîn o, baş yan xirab o? Heto bînan ra gelo nê eserî, ziwano çimeyî/eslî ra tadiyahê ziwane kurdî yan ziwano talî/ziwano tercumebîyayî ra, yanî ziwane çimeyîyê/orijînalê kitabî ney, yewna ziwano tercumeyî ra açarnîyayê ziwane ma? Hewce yo ke rexnegîr û cigereyoxî no babete de tesbît û krîtîkanê xo bivajî. Mîsale eserêko almankî verê cû açarnîyayo tirkî û dima açarnayoxêko/a zî ey tirkî ra açarneno kurdî, yan zî eserêko erebkî verê cû açarnîyayo fariskî û dima açarnayoxêko/a bînan ey fariskî ra açarneno tirkî yan kurdî, wina yew çî semedê tercumeyî çiyêko tercîhbîyayî nîyo, heto bînan ra zî rast nîyo.

Açarnayîş de, şîma zî zanê ke, Tirkîya de derheqê kitabane kurdî weşanxaneyanê Tirkan qet eleqedar nîyê, seke no cografya de edebîyata kurdî çin a û riyê no erdî de sey milyonan merdim kurdî qisey nêkenê, nêusenê, nêwanenê; ayera kurdî ra bi tirkî açarnayîşan nêkenê. Na babete de serranê pêyînan de çend gamî mutewazî erzîyayê la qet bes nîyo. Nê gaman ra yewî zî bi destê weşanxaneyê Ayrîntî, binê nameyê "rêza kitabane zerdî" bi destê, edîtor û nuşttox Kurd ke tirkî nuseno, Yavuz Ekincî erzîyayê. Bi na wesîle çend kitabî tercumeyî kurdî (kurmanckî) û tirkî

vîrazîyayê. No rêze de o/a ke kurd bo la ziwana nê sewbînan de nuştê kitabana înan mavajime sey erebkî, fariskî, îngîlîzkî, almankî, ruskî ra açarnîyayê hem kurdkî hem zî tirkî. Na xebate her çend ereymende biba zî reyna gamêka baş û baldar a û semedê açarnayîşê de kurdkî yew firsendêko muhîm a. Ganî sey xebatana winayî roje bi roje zêde bibê ke wa vernîya ma roşt û zelal bibo.[12]

Xûlase açarnayîş seba edebîyatî, hûnerî, felsefe û zanistî (îlm) xora hewceyêko gird o la seba edebîyatê û şîra ma şuxulneyîşêko hîna erjayî û qedrberz o. O ke no mewzû de haydar o, kedkarîya açarnayîşê de areq eşto, bitaybetî rêz bi rêz şîran açarnayo ma hîna baş fehmedeno. Ez xo ra zanena, gama ke mi Sohrab Sepehrî fariskî ra açarnayenê tirkî û kurdkî, Ahmed Arifî tirkî ra açarnenê kurdkî, Sezaî Karakoçî ke tirkî ra açarnayenê kurdkî û farskî, mi zanenê ke no karî seke zerê yew ziwana de yewna ziwana awan bibo, yew şîre ra yewna şîre peyda biba yo. Bi kilmî yew metin/tekst seke ziwano bîn de newe ra saz bibo yo. Sey vateyê Cemal Sureya'yî: "Açarnayox tîya de karê ardiş û berdişê (communicator, investor) dewlemendîyê miyannetewî keno." Bi yewna îfade, açarnayox; wezifadarê/peydamarê kulturî yo. Ayera ma vanê ke edebîyatê kurdkî bitaybetî kirdkî wa bi açarnayîşê tewir-tewrin û renga-rengin aver şîyo û wa dinya ra dûrî nêkewo. Sayeyê açarnayîşanî hem ma hayîdarê edebîyatê mîletê bînan yê dinyayî bibe hem zî edebîyatê ma wa sera-serê dinyaya de bêro naskerdiş. Teyna bi no qeyde ma eşkênê mîyanê edebîyatî yê dinyaya de cayê xo bigerî û axîr serfîraz be.

Çimeyî

1. Dinçay, Köksal (1995). Çeviri Kuramları, Neyir Yayıncılık, Ankara.
2. Göktürk, Akşit (1986). Çeviri: Dillerin Dili. Çağdaş Yayınları, İstanbul.
3. Kanar, Mehmet (1999). Sohrâb-ı Sipihrî, Sekiz Kitap, Şule Yayınları, İstanbul.
4. Nalcioğlu, Ahmet Uğur (2015). "Edebî Eserlerde Çeviri Sorunları", **Atatürk Üniversitesi Edebiyat Fakültesi Sosyal Bilimler Dergisi**, Sayı: 55, Aralık 2015, ss.1-9.
5. Nalcioğlu, Ahmet Uğur (2015). "Edebî Eserlerde Çeviri Sorunları", **Atatürk Üniversitesi Edebiyat Fakültesi Sosyal Bilimler Dergisi**, Sayı: 55, Aralık 2015, ss.1-9.
6. Necatigil, Behçet (1982). Rainer Maria Rilke, Malte Laurids Brigge'nin Notları, Adam yayıncılık, İzmir.
7. Valêrî, Newzat (2014). **Ahmed Arif, Mi Hesrata To Ver Qeydûbendî Kerdî** **Kehan**, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul.

8. [http://egoistokur.com/ulker-ince-tamamen-çevirmenin-metnidir-o-uretmistir/\(03.05.2016\)](http://egoistokur.com/ulker-ince-tamamen-çevirmenin-metnidir-o-uretmistir/(03.05.2016))
9. <http://www.zazaki.net/haber/rosan-lezgn-25.htm> (05.05.2016)
10. [http://www.hthayat.com/yasam/kultur-sanat/haber/1015234-kawa-nemir-\(06.05.2016\)](http://www.hthayat.com/yasam/kultur-sanat/haber/1015234-kawa-nemir-(06.05.2016))
11. <http://t24.com.tr/k24/yazi/kurt-edebiyatina-giris-sari-kitaplar.> (07.05.2016).

* * *

[1] No nuşte verê cû humara yewin ya kovara Ewro de weşanîyaybi, badê cû newe ra saz bîyo û ameyo hîrakerdene.

[2] Biewne; Akşit Göktürk, Çeviri: Dillerin Dili. Çağdaş Yayınları, İstanbul, 1986.

[3] Köksal Dinçay, Çeviri Kuramları, Neyir Yayıncılık, Ankara 1995, s. 25.

[4] [http://egoistokur.com/ulker-ince-tamamen-çevirmenin-metnidir-o-uretmistir/\(03.05.2016\)](http://egoistokur.com/ulker-ince-tamamen-çevirmenin-metnidir-o-uretmistir/(03.05.2016))

[5] Kanar, Mehmet (Açarnayox), Sohrâb-ı Sipihrî, Sekiz Kitap, Şule Yayınları, İstanbul, 1999, s. 38.

[6] Biewne kitabê Necatigil, Behçet, "Rainer Maria Rilke, Malte Laurids Brigge'nin Notları", Adam yayıncılık, İzmir 1982.

[7] Seba hîna zanayîşî biewne na maqale: Doç Dr. Nalcioğlu, Ahmet Uğur; "Edebî Eserlerde Çeviri Sorunları", **Atatürk Üniversitesi Edebiyat Fakültesi Sosyal Bilimler Dergisi**, Sayı: 55, Aralık 2015, s.1-9.

[8] Valêrî, Newzat (Açarnayox), **Ahmed Arif, Mi Hesrata To Ver Qeydûbendî Kerdî Kehan**, Weşanxaneyê Vateyî, İstanbul, 2014, r. 24.

[9] Valêrî, h. b., r. 36.

[10] <http://www.zazaki.net/haber/rosan-lezgn-25.htm> (05.05.2016)

[11] [http://www.hthayat.com/yasam/kultur-sanat/haber/1015234-kawa-nemir-\(06.05.2016\)](http://www.hthayat.com/yasam/kultur-sanat/haber/1015234-kawa-nemir-(06.05.2016))

[12] <http://t24.com.tr/k24/yazi/kurt-edebiyatina-giris-sari-kitaplar.> (07.05.2016).

SEMBOLÎZMA TEYRAN DI ÊZÎDÎTIYÊ DE (1)

Dr. Xanna Omerxalî

Fikr, teyra herî bilez e.

Rigveda

Destpêk

Sembol îmajek e ku tim wateyeke wê ya diyar heye. Sembola ku bi wî awayî tişteki û wateyekê bi hev ve têkildar dike, hevkat mirovan jî têkildar dike; mirovên ku wê têdigihin, lewma ew awayekî veguhastina zanyariyên diyar e (pirî caran zanyariyên pîroz).

Di tradîsyonên mîtopoetîk ên cihê de, teyr, elementên esasî yên sîstemên dînî-mîtolojîk û ayînan in; û gelek fonksiyonên wan ên cihê hene. Di gelek sîstemên tesewwurên dînî û mîtolojîk de teyr, îmajên simbolîk in; bo nimûne simbolên xudayan, cin û heyînên xudayî, Demiurgos (afirînerê kaynatê), qehremanan, hwd. Wekî simbolên esasê xudayî, esman, roj, birûsk, ba, hwd. ne. Teyr, sembola azadiya tevaw, berziya ruh û azadiya ruhanî ye. Lewma sembola teyrê têkildar e ligel xudayî, cavîdanî, û herwiha ligel serkeftina ruhaniyê (Waida 1987).

Di simbolîzm û mîtolojiyê de bi giştî wateyeke erênî ya teyran heye. Di hindêk sîstemên mîtolojîk de teyr simbolên ruhên mirovan in; koma din a sembolan li ser wê fikrê ava bûye ku têkiliya teyran ligel tebeqeyên xudayî heye. Sembola teyr-ruh pir qedîm e; cara ewil li nîgarên şkeftan ên Dordoneyê hatiye peyda kirin, ku digihe rabirdûyeke hevdeh hezar salî.

Herwiha, bi taybetî hunera gelên Îranî zengîna "sembolîzma teyran" e: kafî ye ku bi tenê rolên cihê yên gewre teyra Sîmirê di destana Şahnameyê de û di şîra sofî ya Attar'î "Mantik at-tair" de bi bîr bîn (Bertels 1997: 155).

Tê zanîn ku Şaman heta niha jî cil û bergên xwe bi perran dixemilînin, û di hingama ayînan de maskeyên teyran li xwe dikin, bi arezûya ku bi alîkariya wan "bigihine" balatirîn qedemeyên ilm û zanîne. Lewma, wesa dihate sêwirîn ku teyr, tecessum (şikilgirtin) ilm, aqil û mêjîyê jîr e.

Di gelek efsane, destan û çîrçîrokan de teyr zanyariyên muhîm tînin bo qehremanan. Dibin ew peyambirên xudayî sembolîze bikin, ku peyamên baş digihînine mirovan. Di hindêk kulturana de mirov jî teyran pir şikber in, jê ditirsin ku ew dê xayîntiyê bikin û sîrrên wan bigihînine dijminan. Gotineke berbelav, "Teyrekî li ser dûlika xwe anî", ji wê bawerîya betil a qedîm hatiye pê.

Sembolîzma Teyran di Êzîdîtiyê de

Bêşik e ku dîne êzîdîtiyê yek ji wan ên herî zengîn e bo tradîsyona sembolan. Nexasme, ji ber êzîdîti tradîsyoneke devkî ye sembolan cîyê pir fireh heye tê de. Lewma em dikarin êzîdîtiyê wekî sîstemeke sembolan bibînin ku ew sîstem di teheyyula êzdiyekî/ê ya derbarê dinyayê de xwedan roleke esasî ye.

Amanca vê gotarê ew e ku sembolîzma teyran di dîne êzîdîtiyê de vebikole û nîşan bide ku hemî sembol, wekî elementên dînekî, xwedan roleke taybet in mîna pireke di navbera cîhana rasteqîne û cîhana tecrube û ilmê dîne de.

Em dikarin sembolên di êzîdîtiyê de heyî, di çend koman de bisenifînin, bo nimûne:

1. Cismên Esmanî: roj, heyv, stêrka sibehê;
2. Tiştên Pîroz (Dura Spî, hwd.);
3. Heywan û teyr (ga, tawûs, dîkil, hwd.);
4. Hejmar (3, 7, 40, 72, hwd.);
5. Reng (spî, sor, zer, şîn, hwd.) û komên din.

Di mîtoloji û doktrîna êzîdîtiyê de, sembolîzma teyran xwedanê ciyekî taybet û bingehîn e. Hemî teyrên mîtolojiya êzîdî pozîtîf in; texer an heyînên xudayî (Xuda, serekê melean, melek, hwd.) sembolîze dikin an jî bi awayekî têkildarî tebeqeyên manewî (spiritual sphere) ne. Sembolîzma teyran a êzîdî, babetên cihê yên teyran dihewîne ku ew babet hemî têkildarî destpêka manewî û xudayî ne: bo nimûne, tawus, ku ji nav hemiyan navdartirîn sembola êzîdî ye; dîkil, teyrê E'nqer, gewre Teyrê Spî, Kevoka Spî û teyrên bêheşiya (bêwesf).

Texer (usually-pirî caran) teyr, di efsaneyên kozmogonîk ên êzîdî de têne dîtîn, anku teyr ji destpêka Dema Afirînê ve hene, heta li gorî çend efsaneyan berî hingî hebûne.

Efsaneyek heye di nav êzîdiyên Ermenistanê de derheqê demên berî Afirînê de. Ev efsane qiset dike ku berê Behra Mezin hebû û li nîveka behrê, bineke dara gulê şîn bû. Li ser guliyêke dara gulê Teyrek venişt ku ew teyr Şêx Sîn bû. Xelk dibêjinê "hostayê gulê". Di eynî behrê de Dara Mezin şîn û mezin bû. Li ser guliyên darê du Teyrên Mezin veniştin, yek ji wan spî bû û ew Xudê bi xwe bû, ya dîtir melekê Cebraîl bû¹. Cebraîl bi şiklê teyrê veniştê ser eynî Dara Mezin a ku Xwedê lê, lê belê melekê Cebraîl'î nedizanî ka kî ye li nik wî, heta ku bi alîkariya Şêx Sîn'î (an jî, bi ya varyasyoneke din, ew Tawusê Melek e) têgihîşt ku teyrê mezin ê Spî yê li ser darê, Xudê ye. Bes piştî hingî wan hemiyan dest pê kirin Dinya afirandin.

Dema ku min xebata xwe ya qadê dikir di nav êzîdiyên Ermenistanê de, min hindêk varyantên vê efsaneyê bihîstin ku di wan de li dewsa Şêx Sîn'î, Tawusê Melek xuya dibe; û li dewsa Cibrayîl'î jî Êzîd. Hemî varyantên vê efsaneyê sê heyînên pîroz (Xuda, melekê Cibrayîl û Şêx Sîn; an jî Xuda, Tawusê Melek û Êzîd) qiset dikin, ku berî Afirîna Dinyayê hebûn û veinştine ser guliyên Dara Mezin, ku aşkera ye ew gulî, Dara Jiyânê bû li navenda dinyayê û herwiha dara gulê ku li Behra Mezin a Ewil (seretayî-primordial) şîn bûbû. Hemî jî bi şiklê teyran in ku ev yek pir muhîm e bo sembolîzma êzîdî.

Efsaneya Afirînê ya Ehlî Heq, ku gelekî şibhê ya êzîdî ye², diyar dike ku Xudê Cibrayîlê ku wekî Pîr Binaymîn jî tê zanîn afirand. Sebaret bi vê yekê di hindêk nirxandinan de dibêje ku Cibrayîl li ser beyava avên ewil geriya bêyî ku Afirînerê xwe binase³ (Kreyenbroek 1992: 68). Mîna efsaneya

êzdiyan e. Jê pê ve, efsaneyê Ehlî Heq a afirînê, vê jî dibêje ku Cibrayîlê ku berî afirîna dinyayê li ser avê perwaz dan, bi şiklê teyrekî bû.

Di "Mishefa Reş"ê de dinivîse "Paşî wî Cibrayîl afirand bi şiklê teyrekî û ew da pêşiyê (sent forth) û her çar kinar dane destê wî" (Kreyenbroek 1992: 72-73). Balkêş e ku di hevpeyvîna min a ligel Feqîr Elî (ji Celleyê) de, wî gotibû min ku ew ê ku Xudê "çar kevirên çar kinaran" dane destî, Tawusê Melek bû (4).

Ev efsane nîşan dide ku semboleke teyrê hebû berî ku Xudê hemî giyaneweran, her ligel teyran, biafirîne. Xudê bi xwe di vê efsaneyê de şiklekê Teyrekî Spî û Mezin heye. Spî ye, ji ber ku ev reng, rengê kemala xudayî ye; herwiha li gorî zanistekê, ewilê hemî rengên din di nav xwe de dihawandine. Wekî ku di "Mishefa Reş"ê de dinivîse, Durra ku Destpêkê Xudê ji "esasê pîroz (sur)"ê xwe afirandibû jî, her spî bû. Li vir sembola teyran têkildarî xudayiyê ye, ku binyadên wê yên manewî digihine berî Afirîna cîhana materyal.

Enqer, Senmurv

Di efsaneyên Êzîdiyan ên afirînê de teyrek xuya dibe di hingama Afirînê de, ku navê wî di kitêba pîroz a êzdiyan "Mishefa Reş" de hatiye dayîn; û herwiha di edebiyata devkî ya êzdiyan de jî behs lê dibe. Teyrek e bi navê Enqer. Li gorî "Mishefa Reş"ê, bi wergera Joseph'î, "Berê, Xudê Durra Spî afirand ji sirra xwe ya herî ezîz. Wî teyrek jî afirand bi navê Angar5. Wî Durra Spî li ser piştê teyrê bi cî kir, û çil hezar salan li ser wê îqamet kir" (Joseph 1919: 36).

Di wergera prof. Ph. Kreyenbroek'î (1992: 72) ya "Mishefa Reş" de, ku li gorî versiyonên bi kurdî û erebî çêkiribû, dinivîse ku "Berê, Xudê Durra Spî afirand ji sirra xwe ya ezîz, û Kevokeke Spî afirand ku navê Enfer lê dêra, û Durr li piştê bi cî kir û li serê rûnişt bo çil hezar salan". Anku li vir teyrê "Enfer", Kevoka Spî ye.

Li gorî qewlên êzîdîyan (edebiyata dînî ya devkî), teyrê Enqer vedinişe ser guliyekî Dara Herhereyê (Dara ebediyetê), ku li beheştê şîn dibe. Li gorî wê, teyrê Enqer'ê 72 bask hene, û li ser yek ji wan gayek heye:

Hey mala min, teyrek li e'zmana wî hey, navê wê Enqer e.

Heftî û dû per e.

Perekî gay li ser e.

Çendî teyrek li e'zmana wê hey, navê wî Enqer bi nav e.

Roja 'îd û e'refata derkeft ji Kaniya Sîhanê.

Çeng û baskêt xo ve dewşînê,

Jê diçê şewq û şemal û nûrîn û xonav e.

(Rashow 2004: 1050-1051)

Wiha, teyrekî me yî din jî heye di simbolîzma teyran a di êzîdîtiyê de, ku Xudê ew afirandiye, niha li beheştê dimîne, daniye li ser guliyekî Dara Herhereyê, û hejmareke simbolîk a baskên wê (72(7)) heye.

Dr. Kh.J. Rashow bawer e ku ev teyr semboleke îmajên simbolîk ên Tawusê Melek in (Rashow 2004: 1050).

Di şîra farisan de, şîra suffî jî tê de, teyrê bi navê 'Anqa, miqabilî, heta sînonîmê navê Sîmûrgê yê bi erebî tê qebûl kirin.

Qedîmtirîn beşa Avestayê ku behsa Sîmir'î lê tê kirin Yaşt e. Di Bundahishn de dibêje ku "a triune bird Sen" teyrê herî mezin e (Bundahishn 1997: 282), berî hemî teyrên dinr ew hatibû afirandin, ne ji bo vê dinyayê (Bundahishn 1997: 299). Ew ji teyrê Chamrosh (Pehl. cinamro., Pazend. camro.) balatir e bo qedr û qîmeta xwe (Bundahishn 1997: 300), ku Chamrosh, teyrekî mîtolojîk, vedinişe nik Sîmir'î

her li ser guliyên eynî Darê - "Dara Dermanê Hemî Derdan" (Chunakova 2004: 252) an jî "Dara Hemî Tovan" (Bertels 1997: 167).

Teyrê Sîmir roleke muhîm naleyîze di mîtolojiya êzîdî de: bêtir di edebiyat û pendên kurdî de tê dîtin, bo nimûne: "Emrê te ça emrê Sîmir e", ku tê wateya jiyaneke şad.

Lê belê hemî êzîdî guh li Sîmir bûne.

Di hemî dîrokên têkildarî teyrê Anqayê de, mirov bi aşkerayî elementên efsaneyên Semîtîk dibîne, ku paşî tevli şîra sufî bûye ligel tradîsyona zengîn a îranî ya efsaneyên li ser Sîmir'î (Bertels 1997: 202). Balkêş e, navê Anqa di ferhengên farisî yê sed sala hevdehan de wekî miqabila bi erebî ya kelmeya Sîmir hatiye pênasekirin, an jî wekî "Anqaya Rojavayî" ku ew jî wekhev e ligel Sîmir'î (Bertels 1997: 201). Dema mirov guh bi Bertels (Bertels 1997: 177-178) û hindê akademîsyenên din dike, bi ya wan îmajê teyrê Sîmir digihe demên berî zerdeştîyê, dibe ku navê Enqer ê di tradîsyona êzîdî de piştê li ciyê teyrê Sîmir hatibe bicîkirin.

Dîkil

Teyrekî dîtir ku di tradîsyona êzîdîyan de xuya dibe, dîkil e. Di gelek tradîsyonan de, têkiliya dîkilî ligel rojê, pir aşkera ye û di navenda îmajên mîtolojîk ên dîkilan de ye. Dîkil sembola Fransayê ye ku ji kelepora kultura qedîm a Galyayan tê.

Di Fragard'a hejdehemîn a "Videvdat"⁹ de - yek ji kitêbên pîroz ên kitêba pîroz a zerdeştîyê, "Avesta"¹⁰ - hindê beyt hatine terxan kirin bo pesnê Parodarşa teyrê Sroaş'î, - dîkilê ku di zerdeştîyê de li dijî Devê tiralîyê Buşyatsayê "destdirêj" e (Avesta 1998: 119). Îmajê dîkilê, di piraniya tradîsyonan de têkildarî pîroziya (deities) şefeqa sibehê û rojê, û agirê xudayî ye. Êzîdî, herwekî zerdeştîyan, Rojê dihebînin wekî serkaniyeke jiyane û hebûna Xudayî ya aşkera li dinyayê; û agirê dihebînin wekî cilweya xwezaya Rojê li ser Erdî.

Şêx Amadîn. Babikeke Şêxan heye di tradîsyona Êzîdîyan de ku xwarina goştê dîkilî li wan heram e. Navê vê babikê Şêx Amadîn e¹⁰. Ew şîyan li wan hatiye bexşandin ku zarokan ji zikêşîyê û kabûsan

xelas bikin. Wesa bawer dikin ku heke kesek ji wê babikê, hema bo carekê jî be, goştê dîkilan biçêje, ew dê vê şîyan û behreya xwe heta hetayê winda bike (ji dest bide)¹¹. Ew dibêjin:

Şêx im, Şêxê dila
naxwim goştê dîkila,
destê min dermanê hemû dila.

Babikeke pîran heye di êzîdîtiyê de bi navê Pîrê Cerwan, ku êzîdiyên Îraqê dîkilan wekî xêr didine wan.

Carinan dîkil, wekî teyrekî pîroz jî têtê qebûlkin, ji ber ku ew banga helatina rojê dide, û rasterast di têtîliyê de ye ligel Roj û Ronahiyê.

Tawusê Melek

Yek ji simbolên herî muhîm di êzîdîtiyê de, îmajê tawusî ye. Li rojhilatê tawus sembola bedewî û mukemmeliyê ye¹³.

Herkesê/a ku derbarê êzîdîyan de agahdar e, bêşik dizane ku êzîdî Tawusê Melek dihebînin û zanyariyên gelekî muxtelif û dijî hev têne pêşxistin sebarek bi Tawusê Melekê. Gelek gotar hatin nivîsandin derbarê Tawusê Melekê de. Ez dê behsa hemî zanyariyên heyî nekim li vir, bêtir ez dê bes çend rastiyên balkêş û boçûnan diyar bikim.

Nav. Di "Mishefa Reş" de nivîsî ye: "Xudê, Melek Ezazîl afirand, û ew Tawusê Melek e". Ev nav (Ezazil), nayê bikaranîn di nav êzîdîyan de. Êzîdiyên welatên cihê vê serekmelekê bi awayên cuda bi nav dikin:

- * Ezazîlê ku Tawusê Melek e di Mishefa Reş de;
- * Tawusê Melek Êzîdiyên Îraqê;
- * Xecê Tavus Êzîdiyên Îranê.
- * Melekê Tawus Êzîdiyên Ermenistan û Gurcistanê;

Derbarê Tawusê Melekê de niha gelek fikr û boçûnên cihê hene di navbera lêkolîneran de. Kelepora êzîdî, piranî bi devkî hatiye heta îro, lewma em nikarin berê xwe bidine kitêba pîroz (xwe Mishefa Reşê jî), ku dibêje: "Ev rastî ye". Divêt haya me ji hemî varyasyonên devkî yên destan û îlahiyên êzîdîyan hebe.

Nexwe Tawusê Melek kî ye?

Yekemîn serekmelek. Tawusê Melek ('melekê tawus'), di payeya herî bala de ye di kozmogoniya êzîdî de. Di kitêba pîroz a êzîdîyan "Mishefa Reş"ê de nivîsî ye ku berî afirîna kaynatê Xudê ew wekî yekemê her heft serekmelekan afirandiye, û paşî wekî "serekê wan hemiyar" tayîn kiriye: "Roja ewil, Yekşemê, Xudê, Melekê Ezazîl afirand, û ew Tawusê Melek e, serekê hemiyar" (Joseph 1919: 36), "Û wî Melekê Tawus kir hakimê hemiyar" (Joseph 1919: 37).

Melekê baweriyê. Carinan, Tawusê Melek wekî "melekê baweriyê" têtê binavkirin û bi vê têtîliyê mirov dikare wê ligel Sraoşaya zerdeştîyê muqayese bike¹⁴ - ruhê bawerî, dîsîplîn û fidakariya dînî û dilsoziyê.

Pîr. Gelek êzîdî bawer in ku Melekê Tawus, Pîr e û êzîdî jê re dibêjin "bavê Pîran"¹⁵ (Tosinê Reşî 2004: 156). Ya rastî, heke em dêna xwe bidine pênc ferzan (pênc ferzê heqîqetê) ku divê her êzîdiyek wan bi cî bîne, em dikarin raveya vê fikrê peyda bikin. Pênc prensîbên êzîdîyan ev in:

Şêx, pîr, hosta û merebî,

Yar û birê axiretê¹⁶.

Tê zanîn ku Pîrê çil babikên pîran, Pîr Hesmeman e - "pîrê çil pîra". Lê belê, hindêk babikên pîran hene ku pîrê wan ne Pîr Hesmeman e. Bo nimûne: Pîr Omerxalî û Pîr Hesençinerî (ew herdu bira bûn¹⁷), Pîr Biwal, Pîr Mihemed Reben, û hwd. Pîrê pîr Omerxalî û Hesençinerî, Pîrek e ji eşîra Hecî Mihemed¹⁸. Pîrê pîr Biwalê, pîrek e ji eşîra Pîrê Fatê. Di kitêba Dr. Kh.J. Rashow de, bi aşkerayî dinivîse ku Pîrê pîr Mihemed Reben û Pîrê pîr Hesmeman, Tawusê Melek bi xwe ye (Rashow 1998: 203).

Pîr Tawusê Melek û Pîr Binyamîn. Gotareke balkêş a prof. Ph. Kreyenbroek'î heye bi navê "Mitraand Ahriman, Binyamin and Malaki Tawus" (Mîtra û Ehrîman, Binyamîn û Melekê Tawus) (Kreyenbroek 1992), ku tê de nivîskar nîşan dide ku manendiyeke aşkera heye di navbera Melekê Tawusê êzîdî û Binyamînê Ehlî Heq de. Lê belê ne ehlî heq û ne jî êzîdî wan wekî şeytan şerh nakin.

Şeytan. Ligel vê jî, hindê seferiyan wesa fikiriye ku êzîdî "şeytanperist" in bes ji ber hebandina wan a Tawusê Melek'î. Hindê nivîskaran ji mêj ve ye ew wekî "tecessuma (şiklgirtina) bediyê" bi nav kirine. Tu elaqeya îfadeyên wiha nîne ligel tesewwura êzdiyan a vî serekmelekî.

Bawerî etqata xwe

Tawisî Melek daye.

Li gorî fikrên êzdiyan, Tawusê Melek ne şeytan e, lê hindê zanyar (mn. I. Joseph) wiha dinivîsin: "Bi min wesa ye ku pirs rastî ne ew e ka Melekê Tawus kê ye, lê bêtir, ka çawa şeytan-xuda hat û bi îmajê teyrekî hate simbolîzekirin. Ev pirs cewaba xwe di vê rastiya hanê de peyda dike ku peristina li teyran diyar e qedîmtirîn forma putperistiyê ye" (Joseph 1919: 150).

Ne wekî ya gelek nivîskaran ku zor daran dinivîsin û Tawusê Melekî wekî "şeytan" bi nav dikin, Di nav êzdiyan de Tawusê Melek şeytanî temsîl nake. Riswakirina Xudê li Tawusê Melek'î, ji aliyê hindê nivîskaran ve cihê hatiye ravekirin û şîroveyên cuda li ser hene. Li gorî yekê, ew ji Xudê hate dûr kirin ji ber xurûra wî. Wî nexwest sicdê bibe mirovekî afirandî - bo Adem'î. Li gorî îzahata êzdiyan a ewil, bêtaetiya Tawusê Melek'î, bi dilsoziya wî ya taybet bi Xudê, Afirînerê wî, tête ravekirin.

Demiurg. Hindê zanyar, bo nimûne A. A. Semyanov, Tawusê Melek'î ligel Demiurg'î muqayese dikin (Semyanov 1927), ji ber ku Xudê gote wî: "Min her tişt dane destê te" (Mesh'efa Resh)²⁰. Lewma Tawusê Melek qudreteke mezin bi dest diêxe.

Xuda. Hindê zanyar wesa bawer dikin ku Tawusê Melek ne tenê serekmelekê bala ye, lê, bêtir, ew Xuda bi xwe ye jî. Carinan sifetên Tawusê Melekî yên gelek nêzîkî Xudê têne bikaranîn. Dr. Kh.J. Rashow dinivîse ku Tawusê Melek yek ji 1001 navên pîroz ên Xudê ye (Rashow 2004: 107).

Dema min lêkolîna xwe ya qadê dikir di nav êzdiyan de, û wekî endameke vê kulturê, ez pê hesiyam ku êzîdiyên ehîl û zana ku diyar e rastiyan Tawusê Melekî dizanîn, tu carî û qet vê yekê nabêjin. Dema

behsa wî dikirin jî bi pistepist diaxaftin²¹. Hindek êzîdiyên gelek dîndar û zana, dema bersiva pirsê li ser xususiyet û rastiyên Tawusê Melek'ê didan, bi pistepist digotine min: "Ez nikarim behsa wî bikim bo te". Dema ez dipirsim: "Çima", pirrî caran dibêjin: "Qedexe ye".

Min bi kurtî hindek fikr û boçûnên heyî yên li ser xususiyetên Tawusê Melek nixandî. Xaleke dîtir a muhîm ku divêt di vê çarçoveyê de behs lê bikin, îmajê tawusê ye sebarek bi xususiyetên Tawusê Melek. Anku gelo îmajê tawusê bi xwe dikare ji me re tiştekî bibêje derbarê xususiyetên Tawusê Melek'ê de. Sembol tu carî bêtir sebebeke taybet dernayên; her gav wateyeke wan a taybet, pirrî caran aşkera, heye.

Îmajê tawusê sebarek bi xususiyetên Tawusê Melek

Dor (xelek). Dema dûlika tawusê vekirî be, şiklê dorekê digire ku ew şiklê di êzîdîtiyê de, her di gelek kulturên din de jî, sembolk e. Sembolê pir kevnare ye ku temsîla cawîdanî û kaynatê ye. Dûlika tawusê ya vekirî, dibe ku sembola xelekê Rojê be.

Êzîdî ji xelekê pir ditirsîn. Em dikarin derbarê vê tirsê de çîrokên di vê barê de di nav hindek sefernameyan de peyda bikin; jê pê ve, agahderekî min - êzîdîyê ji Ermenistanê- çîrokek qiset kir ji min re ku li Ermenistanê qewimîbû. Li dora êzîdîyê di çil saliyên xwe de, xelekê dikêşin. Wî nedikarî derkeve ji wê xelekê û herwiha dibehcî ku di nav wê xelekê de ye. Bizor (ancax) piştî çend saetan dema ku ew mirovê ku bi vê mêrikê êzîdî tirane kiribûn, hat û rexekî vê xelekê paqij kir, hingê ew mirovê êzîdî derket ji xelekê. Seferiyên ku rûdanên wesa didîtin, diheyirîn pêş ve: çî quweteke neravebar e ku nahêle êzîdî ji xelekê derkevin?

Heta niha wateya pîrozîyê ya xelekê di dîna hîndûyîyê de hebûye, û xelekê xwedan girîngîyeke mezin e di hingama bicîanîna ayînên dînî de, ku ev jî dikare bibe delîleke dîtir ji gelek delîlên din bo bîngêhên Îndo-Îranî yên dîna êzîdîtiyê.

Sembola rojî (solar). Tawus têkildarî destpêka rojî ye. Îmaja Tawusê Melek bi dirûvê tawusê, korelasyonê datîne di navbera teyrê tawus û sembolîzma rojî de di mîtolojiyên din de, mîtolojiya xirîstiyânên ewil jî tê de.

Em dikarin sembola tawusê, di mîtolojiyên cihê yê rojhilatî de peyda bikin:

- * Li Îranê navekî Rojê yê metaforîk heye - Tavusê Felek ('Tawusa Esmanî').
- * Di Misra Qedîm de tawusê Geliopolis -bajarê ku peristgeheke Rojê lê hebû- sembolîze dikir.
- * Di Yewnana Qedîm de jî tawus sembola Rojê ye.
- * Di îslamê de dûlika tawusê, an kaynatê, an heyva çardeşevî an jî Rojê di heynê ku li nuqteya herî bilind de ye, nîşan dide. Îmaja tawusê ya mîtopoetîk (pêwendîdarê çêkirina efsaneyan) ku li ser taybetiyên batinî yê vî teyrî ne, spektrumeke fireh a sembolên stêrkî diêxe nav çepera xwe -ji kaynat û esmanê bi stêrk heta digihe xelesa rojî.
- * Mîtolojiya Hîndûyiyê. Hîndûyên serdema Vedic, roj bi teyrê mezî dinimandin. Di mîtolojiya hîndûyan de, dûlikê tawusê ya bi hemî cuwaniya xwe vekirî, wekî wêneyê esmanê bi stêrk tê qebûl kirin. Tawus heşayîyeke (attribute) bingehîn e di Hîndûyiyê de: teyrê rojî ya Hindistanê ye. Teyrê gelek xudayan e, bo nimûne, ya Bûdayî. Ev teyr pêwendîdar e ligel xudawendên zanayî, zanyariya pîroz, şîr û mûsîqayê, Sarasvatiyê, jî23. Carinan Sarasvatî ku ew jî jina Brahma'yî ye, wesa tê nimandin ku li tawusekî siwar e û ku dûlika wê tawusê jî bi temamî girtî ye. Çavên li ser perrên dûlika teyrî, çavên bêxew ên ku her tiştî dibînin sembolîze dikin (Entsikloediya simvolov... 2000: 365-366).
- * Xirîstiyânî. Di katakombên (gorrên binerdî) xirîstiyânên pêşîn de tawus, yek ji sembolên dîni yê bingehîn bû, û herwiha wê azîz jî sembolîze dikirin ji ber şiklê dûlika wê ya vekirî ku dişibe sîwanê (di resmên xirîstiyaniyê de xelesa ronîya li dora serê azîzan). Îmaja tawusê xwedanê sembolîzmeke rojî bû di nav xirîstiyaniya pêşîn de û wekî sembola nemiriyê (mîna kûsî di sembolîzma rojhilatî de) û bedewiya ruhê dûrî xirabbûnê (imperishable) (Entsikloediya simvolov... 2000: 365-366).
- * Çîn. Balkêş e ku piraniya teyran, bi taybetî qurîng, tawus û dîkil sembolên rojî ne di nav gelên Çînî de, û emrdirêjî û bextê çê dinimînin.

*Du Tawus. Îmajeke din a sembolîk heye di êzîdîtiyê de, temsîla du tawusan, her yek li aliyekî qurmê Darê li hemberî hevdu disekin. Ev sembol, anku du tawusên li du aliyên "Dara Jiyânê" an jî "Dara Kaynatê", ku li raserî dergehê peristgeheke li Lalişê tê temsîlkirin, hatiye nav musulmanan, û ji wan bo Rojavayê which is represented above an entrance in a temple in Lalish, has come to Moslems, and from them to the West, from Ancient Iran and means dualism and the dual human nature, getting his force in the principle of unity (Entsikloediya simvolov... 2000: 365-366). Tawusek dihate temsîlkirin di nav îmajên şikefta li Bethlehemê ku Îsa lê ji dayik bûbû: du tawusên ku ji tasekê vedixwin, vejîna ruhî nîşan didin.

Di êzîdîtiyê de sem bola tawusê aşkera ye ku têkildarî Rojê ye û semboleke rojî ye, ku bi nêzîkî têkildarî tebeqeya xudayî ye. Sembola tawusê gelek kevnare ye û ihtimaleke mezin e ku digihe dema civakên Îndo-Îranî. Em dikarin bi dilnîyayî îddia bikin ku Tawusê Melek xwedan xususiyetên xudayî ye.

Encam

Hemî sembolên di vê gotarê de hatine nirxandin, bo careke din bi tekûzî piştrast dikin ku mîtolojiya êzîdî, nêzîkî sembolîzma giştî ya cîhanî ye, lê belê ligel vê, mîtolojiya êzîdî muhîmtirîn encamên hemî dînên cîhanê rast didêre, bo nimûne, prensîba bingehîn a Ronahiyê ji Dema Afirîne ve.

Di edebiyata êzîdî ya dînî de dinivîse ku Xudê şeş melek afirandin ji Sirr û Ronahiya Xwe (Kreyenbroek 1992:73), û afirîna wan ronahiyeke ji ronahiyeke dîtir bû (Joseph 1919:41). Di Bundahishn de, dibêje ku ciyê Ormazdî, li qada Ronahiyê ye ku ew bi "ronahiya bêdawî" bi nav dike (Bundahishn 1997: 265). Di efsaneya afirînê ya Ehlî Heqê de dibêje ku Xudê Durrek afirand ji Ronahiya xwe ya saf (Ivanow 1953: 42).

Êzîdîtî dîneke Ronahiyê ye. Gelek mînak dê hebin di vê barê de, bo nimûne: li şikeftên Lalişê divê agir vêketî (helkirî) be; odeyeke bi ciyê pîroz Stêr (di nav êzdiyên Ermenistan û Gurcistanê de), divê her li ber ronahiyê be; divê reqsa pîroz Sema, li dora Cheqeltuya bi heft agirên bê gerandin; êzîdiyên Ermenistanê divê agirekî biçûk dadin li ser gorra dawî û yekî mezin di hingama cejna Kloça Serê Salê

de; wî ciyê ku tîrêja ewil dikevê maçî dikin; rengên êzdiyan ên pîroz sor û kesk in -rengên rojî, û gelek mînakên dîtir.

Tradîsyona hezaran salan a Ronahiya li jiyana ruhanî ya êzdiyan, di simbolîzma wan a sebarete bi Rojê de xuya dibe, heta li ser gorrên êzdiyên Ermenistanê bi şiklê abîdeyan diyar dibin: bo nimûne, simbolên rojî yên wekî şêr, hesp û beran.

Dema mirov li tesîra mezin a dînen cîran difikire, dikare bibêje ku êzdiyan karîn reseniya xwe û boçûna xwe ya mexsûs a li ser dinya û nirxên wê biparêzin. Êzîdî şiyar fikra pirşeng a Tawusê Melek a qedîm û ewil, her ligel dîne xwe, biparêzin.

Li bin kartêkirin û îlhamên cihê, mîtolojiya êzîdî fikra şefeq û Ronahiyê li cem xwe ragirt. Bo xelk û eşîrên ku di bin kelekela rojê de dijiyan, Ronahî û Roj pir dijwar bûn ku li ber deyx bikin; lewma hênikayiya ewil, anku êvar û şev (heyv), serkaniyên vejîn û hêzê bûn. Li layê din, bo xelkên ku li bakur an jî li herêmên çiyayî dijiyan Ronahî, germ û roj (Roj-xurşîd) serkaniyên jiyane bûn. Ji ber vê hindê ye ku tawus û dîkil ne tenê simbolên rojî ne, belkî felsefeya êzîdiyan a Ronahiyê jî di wan de ye.

Heç tawus e -sembola Tawusê Melekî- ew Rojê, Ronahiyê simbolîze dike û lewma bi tu awayî tarîtiyê pêş naxe, bes esasê Tawusê Melekî yê ji Ronahiyê.

Hemî hunera dîni ya êzîdiyan, bi rêka simbolên tawus û dîkilî estetîka Ronahiyê dihûne. Êzîdiyan xwe sond jî hene: "Vê Rojê"- Ez bi vê rojê sond dixwim; "Vê Işiqê" -Bi vê Ronahiyê, Işiqê sond dixwim. Bêguman simbolîzma êzîdiyan dikaribû bi kûrtir û tekûztir bihata vekolan. Xebateke wesa dê pitir zanyariyan bide sebarete bi felsefeya êzîdiyan a heqîqî; herwiha ew dê muheqqeq deriyên girtî yên li ber têgihiştina esasê dogma û dîne êzdiyan veke.

Di encamê de min dil lê ye îfadeyeke pirşeng a derbarê teyran de ku aîde hevçerxê Şêx Adî, Saint (Ewliya) Hildegardê Bingenê (1908-1179) ye bi bîr bînim, ku di kitêba derbarê sirûştê de dinivîse ku çawa teyr bi xêra perrên xwe bilind dibin û li hewa ne li her derê, wesa jî ruhê li bedenî, bi xêra fikran bilind û fireh dibe.

(1) Ev nivîs di kitêba Êzdiyatî - Civak Sembol Rîtûel de wekî beşeke kitêba Xanna Omerxalî ku ji Weşanxaneyê Avestayê derketiye çih girtiye.

Bîbliyografya

Avesta v russkikh perevodakh (1861-1996). Sost., obsh. red., primech., spravochniy razdel I.V. Raka. SPb., 1998. (Çapa Duyem.)

Bertels, A.E. (1997), Khudojestvenniy obraz v iskusstve Irana IX-XV vv. (Slovo, izobrajeniy) / (Sembol û Metaforên di Hunera Farisan a sedsalên 9.-15. (Şîr, Îmaj). Moscow.

Bundahishn (1997), di nav: Zoroastriyskiye teksty. Suzhdeniya Dukha razuma. Sotvoreniye osnovy i drugiye teksty. Podgotovleno O.M. Chunakovoy. M.Chunakova, O.M. (2004), Pekhleviyskiy slovar' zoroastriyskikh terminov, mificheskikh personajey i mificheskikh simvolov. SPb.

Entsiklopediya simvolov, znakov, emblem. Sost. V. Andreyeva i dr. Moskva, 2000.

Frayha, A. (1946), 'New Yezidi texts from Beled Sinjar, Iraq' in: JAOS. Editor Zelling S. Harris. Volume 66. Number 1. March 31. 1946, p. 18-43.

Joseph, I. (1919), Devil Worship: the Sacred Books and Traditions of the Yezidiz, Boston.

Ivanow, W. (1953), The Truth-Worshippers of Kurdistan: Ahl-i Haqq Texts, Leiden.

Kreyenbroek, Ph.G. (1992), 'Mithra and Ahreman, Binyamin and Malak Tawus: traces of an ancient myth in the cosmogonies of two modern sects' di nav: Gignoux (ed.), Recurrent Patterns in Iranian Religions: from Mazdaism to Sufism, Paris.

Omarkhali, Kh. (2005), Yezidizm. Iz glubiniy tysachaletiy. SPb.

Rashow, Kh.J. (1998), An approach to the Essence of Yezidian Religion. Sweden.

Rashow, Kh.J. (2004), Pern ji edebê dînê êzidiyan. Duhok. Cild. I-II.

Semyenov, A.A. (1927), 'Pokloneniye satane u peredneaziatskikh kurdiv-yezidov' in: Byulleten' Sredneaz. Gos. Universiteta. N 16, Tashkent, p. 59-81.

Tosinê Reşît (2004), Êzîdiyatî. Oleke hê jî ne naskirî. Stockholm.

Vilchevskiy, O.L. (1930), 'Ocherki po istorii yezidstva' di nav: Ateist. ?, N 51.

Waida, M. (1987), Birds. The Encyclopaedia of Religion. Vol. 2. N.Y. - L.

Zargotina kurda. Berhevkirin Ordîxan û Celîlê Celîl. Cild. I, Yerevan, 1978.

Werger ji Ingilîzî: Ergin Opendin

www.arsivakurdî.org

DENGÊ C – peydabûn û guherîna wî

Husein Muhammed

Di dengnasiya kurdî de C / C nîşana dengê "paşpidûyî-xişok-nevizok yê bilerz" e. Mebest ji "paşpidûyî" ew e ku di dema gotina vî dengê de ziman bi paşiya pidûyan dikeve. Mebest ji "xişok" ew e ku pêşî deng bi tamamî tê rawestandî û paşî hêdîka tê vekirin û loma xişînek ji hewayê dengî derdikeve. Mexsed ji "bilerz" jî ew e ku di dema derketina vî dengê de perdeyên dengî di gewriyê de dilerizin.

Ji bilî kurdiya bi alfabeya latînî, herwiha di tirkî û azerî de jî ev deng bi vî C / c tê nivîsîn. Lê wek din piraniya zimanên latînînivîs vê herfê li cihê K, S yan Ç ya kurdî bi kar tînin. Li cihê dengê C yê kurdî, hin ziman J, hin G û hin jî cotherfên DZ dinivîsin.

Di alfabeya kurdî-erebî de û di nivîsîna farisî û hin zimanên din yê erebînivîs de ev deng bi herfa ج tê diyarkirin. Di alfabeya kurdî-krîlî de ev deng bi Ц (gir) yan ц (hûr) dihat nivîsîn.

Di alfabeya dengnasî ya navneteweyî de ev deng bi cotherfên [dʒ] tînin diyarkirin. Berê ew wek [dʒ] dihat nîşankirin.

Mirov dikare li vê derê guh bide vî dengê:

https://en.wikipedia.org/wiki/File:Voiced_palato-alveolar_affricate.ogg

Peydabûna C di peyvan de

Dengê C di kurdî de dikare li destpêk, nav û dawîya peyvan peyda bibe:

- **destpêk:** cam, cer, cêwî, cih, cîran, conî, cuda, cûn...
